

1.....

Pirs ên Ziman

Mîral Zîlanî

- Nam ê perrtûkê: Pirs ên Ziman
- Berg ê yekem
- Nam ê nivîskar: Mîral Zîlanî
- Çapxane: Roksana - Hewlêr
- Çap a yekem - 2023
- Hevistî (design): Şaxewan Muhemmed
- Maf ên çapê paraztî ne
- Tîraj: 1000

- Li kehêdarî ya giştî ya perrtûkxane yên giştî / Herêma Kurdistanê, hejmar a sipartinê ya () ya sal a 2023 jê re hatiye dayîn.

Naverok

-Pêşekî.....	5
- Tîp an pît.....	12
- Dengdar û dengdêr.....	17
- Çima pît a (î) ya berî pît a (y) dibe (i) ?.....	26
- Pît a (a) ya ku dibe (ê).....	31
- Wane ya birrgeh a dengdar (kît).....	35
- Bîngeh a peyv a Kurdî – kirde (awa yê serekîn).....	40
- Bîngeh a peyv a Kurdî – kirde (awa yê alîkar).....	50
- Peyv a “kirin” jêder e û “kir in” kirde ye.....	55
- Peyv a “hebûn” jêder e û “he bûn” kirde ye.....	60
- Peyv a “xayan”ango “berdewam” e.....	63
- Amraz ên nayînê.....	66
- Pîrsek li ser kirde, kirdedar û berkirde.....	71
- Alîyekî rêbaz a kêsan a kirde.....	93
- Girêdan û parçekirin a beş ên peyv a Kurdî.....	99
- Du pît ên bê deng ên wek hevdu dihên ber hevdu / Du pît ên dengdar nahên ber hevdu.....	105
- Çima du pît ên “l” di peyv a “gell” de he ne ?.....	110
- Kirde yê bûyînê.....	114
- Çand.....	130
- Şand.....	135
- Perrtûk kirine pirtûk.....	139
- Renkîrin û guherandin a pît ên peyvê.....	143
- Alî yên xaknîgarî.....	149
- Rêvebirî.....	154
- Beş ên peyv a Kurdî.....	158
- Şanîdanan.....	176
- Tê.....	181
- Pê.....	185
- Lê.....	188
- Jê.....	191
- Bê.....	193
- Di.....	196
- Ji.....	199

- Bi.....	201
- Amraz ê gihanekê “ku”.....	203
- Vexwendin çi ye ?.....	206
- Bîrdoz çi watayê dide ?.....	210
- Bînarî wata ya teyoriyê dide.....	213
- Guftûgo / gotûbêj.....	217
- Hatûço ?! (çûn û hatin).....	221
- Derbarê / di bare ya ... de.....	224
- Hanîn (anîn) an hînan (hênan).....	227
- Roj, rok, ron.....	231
- Kengî “a, ya” ye û kengî “ê, yê” ye ?.....	236
- Çawanî ya nivîsandin a nam û peyv ên biyanî.....	240
- Here, were.....	248
- Yanizkirin a “an” li hejmaran û “ê” li kurtî ya naman.....	251
- Sipî û spî.....	255
- Ka, kay, kanê, kahlenê, kanî, kan.....	258
- Xew e, nivistin e, rakevtin e yan razan e ?.....	261
- Nijwe.....	264
- Aya ev şêwaz ê hevguherîn a pît û dangan rast e ?.....	268
- .. Ek a ye, ne ..eke ye / ..inî ye, ne ..ine ye.....	272
- Taybetmendîyek a peyv a hevgir.....	277
- Kar û kir e, êdî “ker” ji kuda hatiye ?.....	285
- Peyv û pêşgir a “hil”.....	289
- Amraz ê bizavdar ê “ane, yane”.....	295
- Amraz ê “ana, yana”.....	299
- Rastî ya peyv a “milmilane”.....	302
- Pirsek di bare ya nam (nav) de.....	306
- Nerînek li ser jêder.....	310
- Hevek û cor ên xwe.....	322
- Nîşeyek di bare ya destewajeyê de.....	326
- Cor ên peyvê ji alî yê hevgirîyê ve.....	328
- Darayî yan diravî ?.....	333
- Wata ya destewaje ya “Kurdmancî” çi ye ?.....	336
- Çima Kurdmancî mak û kanî ya ziman ê Kurdî ye ?	342
- Wata û şirovekirin a peyvvan.....	348

Pêşekî

Di peyivînê de pirs û bersiv herdu jî maf in û ziman peyivîn e. Em peyivîn a xwe weha divekin û em dibêjin; ku kar û xebat a heta niha ji bo ziman ê Kurdî hatiye kirin hîne jî kêm e. Hîne wek pêdivê rajedarî ya (xizmet a) ziman ê Kurdî ne hatiye kirin û hemû taybetmendî yên wî ne hatine dîyarkirin. Ziman ê Kurdî hîne di qonax a tenê nivîsandin, komkirin, berhevkirin û tekela ya (hewl a, pîkol a) şirovekirinê de ye û ev jî xebatek pêroz e. Belê hîne tekela ya nasîn a surîşt a ziman, taybetmendî yên ziman, şihkirin ên (analîz ên) di bare ya ziman de, jîn a ziman û girêdan ên dîrokî yên ziman ji alî yê datakan (vocabulary) ve ne hatiye kirin. Ev tekela ya han û hemû xebat ên girêdayî wê yên ku me wan dan nîşandan jî, tenê qonaxek ji qonax ên ziman e. Qonax ên pêşkevtin a ziman berfireh in û bi sed ên salan dirêj in. Wek çawa mejî yê mindal (zarok) ji dem a zagîn a xwe ve dikeve ber pêl ên pîtan, kîtan, peyvan û hevekan de, weha jî pît, kît, peyv û hevek ên ziman ji alî yê mezinan ve pêwîstî vexwîndinek xayandî (berdewam) ne. Wek çawa mindal qonax bi qonax fêrî (hînî) ziman dibe, weha jî mezin li ber qonax ên pêşkevtin a ziman, li ber pêl ên zimanvanî ye. Wek nimûne.. dihê gotin ku ziman ê Englîzî heta niha di sê qonaxan re derbas bûye (kevn, navîn û nûjen) û em dikarin bibêjin ku niha ew di qonax a çarem de ye, ku di her qonaxekê de kevtiyê bin sirêm a (bandor a) hinek bûyer ên civakî, çandeyî, aborî, siyasî û teknolîjîk de. Ziman ê me yê Kurdî jî weha, ew di bin sirêm ên (bandor ên) siyasî, çandeyî, civakî û aborî de ye û wek me da nîşandan, ew niha di qonax a nivîsandin, berhevkirin û tekela yên şirovekirinê de ye. Dem jî hatiye ku em qonaxek nûtir bihafîrînin, ku ew jî qonax a nasîn a surîşt a ziman e, destnîşankirin

a taybetmendî yên ziman e, heyîkirin a şihkirin ên kûrtir ên di bare ya ziman de ye, naskirin a jîn a ziman e û derxistin a girêdan ên dîrokî yên ziman e. Dê ev qonax a nû bihêle ziman ê me bêtir ayaz (safî) bibe, dê bihêle ew bêtir akincî bibe û dê bihêle em ber bi destnîşankirin û hafirandin a ziman ê petî ve biçin. Tişteki surîştî ye ku di bin evan sirêm ên (bandor ên) destnîşankirî de û di destpêkê de sirêm a dagîrkarîyê, ziman ê Kurdî ne akincî be û ne baş rêxistî be, belê heger em weha zanistîyane kar ji bo derbaskirin a evê qonaxê bikin, em dê bikaribin derbasî qonax a nû ya pêşkevîtîr bibin. Pirs ên ziman û pirs ên ku di bare ya ziman de dihên kirin jî rewşa ne (meşrû` in) ji ber ku rewşek ne xweş he ye. Ne xweşî ya evê rewşê (rewş a ziman) di gelek xalan (nuqteyan) de dihê xuyakirin, ku ji wan ên giring ev in:

1- Rêziman di biwar ê avakirin û rêxistin a hevekê (syntax) de hîne ne akincî ye, li angora Erebi, Turkî û Parsî ye û di baştirîn ast a xwe de, ew li angora ziman ê gell e û ne rêxistî ye.

2- Di pirs a morfologiya de arêşe yên (problema ên) mezin he ne û pêwîstî nerîn û xebatek nû ye. Pirs a kêsan a (tesrîf a, conjugation a) kirdeyan (verb) he ye û pirs a kêsan a naman (navan) jî he ye.

3- Heta niha kirde (verb, fi`l) û kirdedar (subjekt, fa`il) û berkirde (objekt, mef`ûl bihî) bi gelek reng û şêwazan hatine namandin (navandin) û yek ji wan: pîşk, pîşkar û pîşkber e, ku hemû ew namandin ên heyî, baş wata ya rêzimanî nadin û hinek ji wan her şaş in. Ango heta niha rêkevînek û yekbûnek li ser namandin a evan beş ên serekîn ên ziman, li angora wata ya di cihê xwe de tine ye. Em di vir de pêşînyar dikin ku Kirde, Kirdedar û Berkirde be. Herweha, ji bo dem ên serekîn ên rêzimanî jî ew rêkevîtin û yekbûn tine ne û me di vir de pêşînyar kiriye, ku ew

Amad (niha) Mêjîn (derbasbûyî) Ayinde (dem a bihê) û Xizav (emr, imperative) bin.

4- Di biwar ê fonologiya de arêşe he ne û gerek pît ji nû ve bihên şihkirin û şirovekirin û gerek cihder ên wan zanistîyanetir bihên dîyarkirin.

5- Em di biwar ê leksîkolojîk (lexicology) de pêwîstî xebatek zanistîyane ne, çimku hîne lêkolîn ên sipateyî (ciddî) di bare ya peyvan de ne hatine kirin.

6- Lêkolîn ên Etîmolojîk (etymology) ên rast ji ziman ê Kurdî re dihên xwaztin, da ku kok, resenê û bingeh a peyvan baştir bihên naskirin û bi cih bibin. Heger weha jî bibe, dê peyv rasttir bihên bi karhînan û dê rasttir bihên hafirandin.

7- Di biwar ê semantîk (semantic) de arêşe yê wata û bi karhînan a peyvan he ne, ku li angora aksentan dihên guherandin. Bê goman e ku her peyvekê nîşan a xwe ya resen û taybetî he ye û gerek ew nîşan bihê paraztin.

8- Guherîn ên ku di peyv ên ziman de dihên kirin, ne hemû rast in û ne hemû di cih ên xwe de ne. Hinek guherîn he ne zîyanê didin peyvê û bi taybetî jî ew guherîn a ku kok a kirde biguherîne şaş û bi zîyan e.

Di evê perrtûkê de hem rêziman û hem rênivîs he ye û teke-la he ye, ku ev pirs ên han bihên verûjandin û hazirandin, da ku rastî ya ziman bêtir cih ê xwe bigire. Herweha da ku ziman ê xwîndin û nivîsandinê ji ziman ê gellêrî bihê cudakirin. Her pirsê ji evan pirs ên ku di evê perrtûkê de hatine, bi ser ê xwe babetekî berfireh e û lêkolîn a perrtûkekê ye. Ango her pirsê babet ê perrtûkekê ye. Ev pirs ên han bi kurtî dihên pêşkêşkirin, da ku paşê berfirehtir bihên şirovekirin. Herweha, pirs ên ku di ziman de naskirî ne û cih ên xwe yê rast û dirist girtine ne hatine şirovekirin, ji ber ku naskirî ne û êdî heta radeyekî di

cih ên xwe yê n rast de ne û tenê pêwîstî berfirehkirinê ne.

Xuyanî ye ku rêziman rêxistin a ziman ê gell e, ango ziman ê gell ji rêziman re bingeh e, belê rêziman bingeh ên ziman ên nav ziman ê gell rêxistî dike. Rêziman di hemû ziman ên cîhanê de evê gerinê (rolê) dibîne, belê em Kurd ji hemû gell ên cîhanê bêtir pêwîstî evê rêxistinê ne, ji ber ku wek xuya ye tenê ziman ê me xwedî yê çendîn rêzimanan e. Gerek yek rêziman ji ziman ê Kurdî re he baya, wek çawa ku ew rewş di hemû ziman ên cîhanê de weha ye. Em nikarin bibêjin: “ji ber ku Kurd xwedî yê gelek diyalekt ên dûrî hev in, tiştêkî suriştî ye ku ew xwedî yê gelek rêzimanan jî bin” na.. hebûn a çend rêzimanan ji yek zimanî re ne tiştêkî suriştî ye. Ziman ê Englîzî xwedî yê çendîn diyalektan e, belê rêziman a wan yek e.. ziman ê Erebî xwedî yê çendîn diyalektan e, belê rêziman a wan yek e û pirranî ya ziman ên din jî weha ne. Em dikarin bibêjin ku tenê ji ziman ê Kurdî re çendîn rêziman hatine danan û mixabin; ew jî ji ber ewê yekê ye ku zimanvanan tekela kirine, ku ji her diyalektekê re rêzimanekê bidanin. Heger wek nimûne di welat ên Ereban de – bi taybetî rojava ya Erebî – hinek alîyan tekela ya danan a rêzimanekê ji diyalekt a xwe re dabin, wan êdî hîştine ku ew diyalekt a wan bibe zimanek din. Danan a rêziman a gellekî li angora diyalektekê ji diyalekt ên evî gellî, dihêle ku gelek pirs ên zimanvanî yê gell bi giştî bimirin û dihêle ku ew diyalekt bibe zimanek din ê cuda. Herweha dihêle ku şaşî yê nav ewê diyalektê di ziman de bi cih bibin. Ji her gellekî re jî zimanekî ku ji çend diyalektan pêkhatî ye he ye û ji evî zimanî re tenê rêzimanek he ye. Em weha jî dizanin ku rastî yê ziman bi awayekî perş û belav, di nav hemû diyalekt ên ziman de ne. Rastî ya peyvekê di evê diyalektê de hatiye kilêskirin (xerabkirin) belê rastî ya ewê peyvê di diyalektek din de parastî ye. Wek nimûne

jî.. peyv a “dihê” ya ku di diyalekt a Badînî de dihê gotin, ji peyv a “tê” ya ku di diyalekt a Kurdmancî de dihê gotin rasttir e. Ji ber ku di peyv a “dihê” de kok û resenî ya peyvê – ku “hatin” e û kirde ye (verb e, fi`l e) – paraztî ye, belê “tê” amraz e û ji “di wî/wê de” hatiye û bernam û amraz e û ji “tu dê...” hatiye. Ango em sê caran û bi sê coran dibêjin “tê” ku yek ji wan kirde ye, yek ji wan amraz e û yek ji wan bernam û amraz e û ev tevhevîyek e û di aksent û diyalektan de û di ziman ê gell de çê dibe. Rêziman jî evan pirsan ji hev cuda dike – yan jî gerek ji hev cuda bike – û her tiştekî di cih ê xwe yê guncayî û rast de didane (datîne). Divê rêziman ji ziman re bihê danan, ne ku rêziman ji diyalektekê re bihê danan. Heger ji evê diyalektê re rêzimanek bihê danan, ev diyalekt dibe zimanek û diyalekt a din jî dibe zimanekî din û weha dê gell xwedî yê çendîn zimanan be û ev rewşek ne rast e, ji ber ku her gellek xwedî yê yek zimanî ye. Yan jî heger em bixwazin ku em xwedî yên zimanekî tenê bin, gerek yek rêziman ji me re he be, belê heger em weha bawer bikin ku bêtirî zimanekî Kurdî he ye, hîngê pirsek din çê dibe.

Tiştekî gelek giring he ye ku divê bihê gotin û ew jî ew e, ku heger diyalekt ên din ên ziman ê Kurdî bi rêzan û rêxistin bibin, hemû jî gelekî nêzîkî Kurdmancî dibin, an jî her wek Kurdmancî dibin. Ango Kurdmancî mak a hemû diyalekt ên ziman ê Kurdî ye. Wata heger ew diyalekt ên din xwe ji bin sirêm ên (bandor ên) ziman ên Erebi,Turkî û Parsî rizgar bikin, dê rêziman a Kurdî ji wan diyalektan re wek rêziman a Kurdmancî be. Belê dihê xwaztin ku Kurdmancî jî ji bin ewan sirêman (bandoran) rizgar bibe. Ango yek ji engîz ên (sebeb ên) ku hîştîye ji diyalekt ên Kurdî re rêziman ên cuda çê bibin, hebûn a sirêm a (bandor a) ziman ên din e, ji ber ku rêziman ên evan ziman ên din ên biyanî, derbasî nav ziman ê Kurdî bûne. Wek nimûne.. li başûr

dibêjin “destlekarkêşayewe” û “dest-le-kar-kêşayewe” ku her yek ji wan beşekî serbixwe yê peyv a ziman e, bi hev ve girê didin û wan dikin yek peyv, ji ber ku ev wata ya han di ziman ê Erebi de yek peyv e (isteqale). Ango xwaztine wek Erebi lê bikin. Di ziman ê Kurdî de jî, bi giştî weha ye ku her beşek ji beş ên peyvê serbixwe dihê nivîsandin, ango gerek ev peyv a han weha be: “dest le kar kêşayewe” û heger weha bibe, ew dê wek rêziman gelekî nêzîkî Kurdmancî be (dest ji kar kişand) û dê bûwer be (mumkin be) ku rojekê ji rojan bibin yek û rêzimanek yekbûyî he be. Paşê jî “dest le kar kêşayewe” destwaje ye û ne peyv e, belê wan di bin sirêm a (bandor a) hizirkirin a bi ziman ê Erebi de ew kirine yek peyv. Dibêjin: “piyawemerdekan” û Kurdîbûn a evê destwajeyê her li angora diyalekt a başûr, gerek “piyawanî merd” baya û heger ew wek “piyawanî merd” baya, dê gelek nêzîkî Kurdmancî baya (peya yên merd). Dibêjin “poledaxirawekan” û ew bi xwe gerek “polekanî daxiraw” baya û bi sedan nimûne yên weha he ne, ku yan ew di bin sirêm ên (bandor ên) derûnî (psychological, nefsi) de hatine danan û yan jî ew di bin sirêm ên ziman ên Erebi, Turkî û Parsî (biyanî) de hatine danan. Ew hizirkirin a (fikirkirin a) li angora ziman ê Erebi, Turkî û Parsî (biyanî) ye. Ango heger sirêm ên ziman ên biyanî ji ser ziman ê Kurdî birabin, pirs ên derûnî yên ku di nav de he ne bihên çareserkirin û surişt a ziman ê Kurdî bihê paraztin, dê gelek bûwer be ku zimanekî petî yê yekbûyî yê akincî yê Kurdî çê bibe û dê tenê rêzimanek ji evî zimanî re he be, ku dê ew ziman ê xwîndin û nivîsandinê be û dê ew ziman ê fermî û petî be.

Dibe pirs bihê kirin ka pirs ên derûnî di nav ziman de çi ne? Pirs ên derûnî yên ziman bi kurtî girêdayî daxwaz a derûn a mirov in, dem a ku mirov dixwaze wek xwe û li angora dax-

waz a derûn a xwe, peyvekê biguherîne yan li angora awa yê xwe leva bike (levz bike) û hevekekê wek evê daxwaz a xwe ya derûnî saz bike. Ev pirs a han jî di nav gellê Kurd de gelek belav e. Ev di nimûneyekê wek “wek” de dihê xuyakirin, ku hinek dibêjin “weke” hinek dibêjin “weka” hinek dibêjin “wekî” û hinek dibêjin “wekû”. Ew bi xwe jî di kok û resenî ya xwe û surîşt a xwe de “wek” e. Ew pîtên ku li angora devok û aksentan – wek dibêjin – hatine serwazkirin (îzafekirin) ne girêdayî evê peyvê ne, belê derûnê xwaztiye ku ew bihên serwazkirin. Ji ber evê yekê jî bi çar awa yê serekîn derkevtiye û li hinek deveran “weki” û li hinek deverên din jî “weko” he ne û ew dibin awa yê pêncem û şeşem. Herweha û her li başûr, dem a ku dihê xwaztin pît û kîtên beşekî peyvê bi hev ve girêdayî bin, em dibînin ku ew ji hev cuda dikin, wek nimûne.. “kar” û “kirdin” dem a ku mebest jê diristkirin a jêder be gerek “karkirdin” be, ango kar û kirdin bi hevdu ve girêdayî bin, belê ew “kar” û “kirdin” ji hevdu cuda dikin. Dibêjin “kar kirdinî mindalan qedexe ye” û gerek ew weha be: “karkirdinî mindalan qedexe ye”. Beşên me yê bakur û rojava jî hinek çaran – û di evê dawîyê de gelek çaran – şaşîyan ji bira yê xwe yê başûrî diwergirin. Ji hev fêr dibin û şaşî dihê veguhaztin. Rêziman evan pirsan çareser dike, her beşekî ziman li angora kok û resenî ya xwe diparêze û ziman ayaz û akincî dike.

Gerek rêzimanek he be û ew rêziman a zimanê Kurdî bi giştî be, da ku yekbûnek zanistîyane di evî biwarî de he be. Pirsên ku di zimanê Kurdî de dihên rastkirin jî dibin bingeheke a ewê rêziman a yekbûyî, dibin heyvanê diristbûn a zimanê petî yê xwîndin û nivîsandinek yekbûyî û herdem arêşe yê ziman ber bi çareserîyê ve dibin. Di evê perrtûkê de ev kar hatiye kirin.

Tîp an Pît

Dîyar e ku di zarav a bakur de tîp e û di zarav a başûr de pît e. Rastî ya evê pirsê he ye û ew jî ew e, ku tîp wata ya herfê nade, belê ew wata ya tîmê (grûpê) dide. Ji xwe tîm bi xwe ya ku di ziman ên Latînî de dihê gotin û li nik wan paraztî ye, bi wata ya tîmê ye (grûpek e) û ewan zimanan, rastî ya dîrokî ya evê peyvê paraztine. Li nik me Kurdan û di beş ê bakur de, ev peyv a han wergeriyaye û ji pît bûye tîp û weha derbasî rojava jî bûye. Gelek peyv ên din ên ziman ê Kurdî weha hatine wergeran wek “nik” û “kin”.. ku “nik” wata “li cem” e, belê li başûr bûye “kin”. Di ziman ê Kurdî de “kin” wata ya “li cem” nade, ew wata ya “kurt” dide. Bi evî awayî dem a ku peyv dihê wergeran, watayek din jê re çê dibe yan bê wata dibe.

Pît wata ya herfê dide, belê peyv a “pît” a ku li başûr bi wata ya “bereket” e, bi evê peyvê re hevdij dibe û ew jî ji ber ewê yekê ye, ku “bereket” a Erebî ne pît e. Ew ên ku pît bi wata ya “bereket” dibêjin, peyv a “pîhît” a Kurdî ya ku wata ya bereketê dide rast nabêjin û rast wata nakin. Ew peyv a “pîhît” kurt dikin, sivik dikin û wê dikin “pît” û di vir de jî tevhevîyek çê dibe û dihêle ku peyv a pît du watayan bide û ew bi xwe ne weha ye. Di ziman ê Kurdî de peyv a “pîhît” bi wata ya bereketê ye û ew “pîhît” dikin “pît”. Dem a ku ew weha jî dikin, ew rastî ya peyv a “pît” a ku wata ya wê herf e, winda dikin. Em li başûr dibînin ku peyv a “pît” hem bi wata ya herfê ye û hem jî bi wata ya bereketê ye û ev şaşî ye. Di ziman ê Kurdî de “pît” herf e û “pîhît” bereket e.

Peyv a “pît” ji “pit” hatiye, ku peyv a “pit” bi wata ya herî biçûk e û “pit” nîşanek herî biçûk e, ku li ser tiştêkî xuya dibe. Wata ew di gotin û nivîsandinê de beş ê herî biçûk e yê ku ew

êdî parçe nabe û pît weha ye. Em dikarin evê pirsê di nimûne ya “kît” jî de bibînin, ku “kît” jî ji “kit” hatiye û “kit” parçe yê biçûk e yan parçeyekî peyvê ye, herwek çawa ew parçeyekî her tiştêkî din e. Ji ber evê yekê ji kît (kit) re dibêjin birrgeh, ji ber ku ew birrekî peyvê ye, ango parçeyekî peyvê ye. Dibe bihê gotin ku “pit” bi xwe jî “pint” e û ev şaş e, ji ber ku “pint” watayek din e. Di ziman ê Kurdî de “pint” bi wata ya zero (sifir a Erebî) ye. Peyv a “pint” wek “pin” jî dihê gotin, dem a ku pît a “t” jê dihê havêjtin û mebest jê xal e (nuqte ye). Wek nimûne piling ê “pinpin” dihê gotin, wata piling ê ku pêst ê wî (cild ê wî) bi xal e yan xalxalî ye. Weha em dibînin ku “pit” û “pint” ne wek hevdu ne û heryek ji wan xwedî watayek a taybetî ye.

Pît ên ABC ya Kurdî yên li angora danan a zana û xebatkar ê Kurd mîr Celadet Bedirxan, sih û yek (31) pît in û ew in ên ku beşekî Kurdan pê dinivîsin. Me got ABC ya Kurdî û me ne got Elifba ya Kurdî, ji ber ku dem a em (Kurd) pît ên xwe vewêjîn dikin (hece dikin, spell dikin) em dibêjin ABC û em nabêjin Elif Ba. Ew ên ku ji kom a pît ên xwe re dibêjin Elif Ba Ereb in, ango Ereb ji ABC ya xwe re Elifba dibêjin. Ango kom a pît ên ziman ê Kurdî ABC ye û ne Elifba ye. Pirs a ku Elifba Alfabêt jî be girêdayî Yonan a kevn e. Yonanî yên kevn di bin sirêm a (bandor a) Ereban de (Ereb ên Fîniqî) ji kom a pît ên ziman ê xwe re Alfabêta got in. Ew bi xwe jî (yonanî yên kevn) dem a ku pît ên xwe vewêjîn dikin, wek Alfa Bêta vewêjîn dikin. Lewra, ew jî ji kom a pît ên xwe re Alfabêt dibêjin û gell ên din ên wek wan jî, ji koma pît ên xwe re weha gotine û dibêjin.

Dibe ku ji kom a pît ên ABC ya Kurdî re tîp hatiye gotin, ji ber ku her komek a rêzkirî ya ku bi karekî dirabe, jê re tîp dihê gotin. Ev rast e, belê di nav kom a evê tîpê de her yek nasname ya xwe he ye, durv ê xwe he ye, gerin a xwe he ye û nam ê xwe he

ye, ku ew jî pît e. Ango her yek ji nav evê komê (kom a pîtan a ku jê re tîp dihê gotin) û ji nav evê tîpê pîtek e. Weha êdî kom a (tîp a) ABC ya Kurdî ji pîtan pêk dihê, wek çawa ku kom a tîpek a mûzîkê ji çend mûzîkvanan pêk dihê û wek çawa ku tîpek a pagogê (fûtbolê) ji çend lîzvanan pêk dihê. Weha peyv a tîp komekê rêzkirî dide nîşandan û ji bo nasandin a herfê nabe, ku herf “pît” e. Heger kom a “pît” ên ABC ya Kurdî “tîpek” be, gelek jî rast e em bibêjin: tîp a ABC ya Kurdî ji sih û yek pîtan pêk dihê.

Pirs ne tenê ew e ku bakurî dibêjin “tîp” û başûrî dibêjin “pît”. Rastî ya evê pirsê ew e ku her yek ji evan herdu peyvan, watayek a xwe ya taybetî he ye û ne wek hevdu ne. Belê şaşî di danan a watayê de ye û gelek peyv ên weha di zimanê Kurdî de he ne, ku di wata yên xwe de ji hev cuda ne, belê wek yek peyv hatine amarkirin (hesabkirin) û hatiye gotin; ku ew di bêhvan (filan) zaravê de evê watayê dide û di zarav a din de watayek a din dide û ev şaşî ye. Her peyvek a ku di nav yek zimanî de hatibe danan, watayek a xwe ya taybetî he ye. Dibe ku peyvek Kurdî he be wata ya wê bêhvan tişt be û heman peyv di zimanekî din ê ne Kurdî de watayek a din bide, belê ev rewş di nav yek zimanî de çê nabe. Di zimanê Kurdî de levakirin a peyv a “man” ne wata ya peyv a “man” a Englîzî dide, ji ber ku “man” a Englîzî wata ya “mêr” a Kurdî dide. Di zimanê Englîzî de peyv a “put” danan e, belê heman levakirin di zimanê Kurdî de “pût” peygar e, heykel e, senem e. Di zimanê Englîzî de wata ya peyv a “car, kar” otomobîl e, belê peyv a “kar” di zimanê Kurdî de îş e, xebat e. Di zimanê Kurdî de peyv a “dar” xuyanî ye ka çî watayê dide, belê “dar” di zimanê Erebi de wata ya malê dide. Di zimanê din de jî weha ye. Dibe ku peyvek bi levakirin a xwe di evî zimanî de wek zimanê din be, belê

di watayê de ji hevdu ciyawaz bin.

Dem a ku Xweda pît xist in nav mejî yê mirov de û wan danî ser ziman ê mirov, rewşek fexend (muqeddes) hat hafirandin û cîhanek bê dawî çê bû, ku di evê cîhanê de rê û derî yên hizr û dahînanê li pêşî ya mirov hat in vekirin. Di evê rewşê de qonax bi qonax guherîn çê dibin, belê ew qonax gelek berfireh û dûrî hev in. Ango heta ku pîtek nû çê bibe yan pîtek din yaniz (zêde) bibe yan pîtek bihê guherandin, derbasbûn a qonaxek a mezin a pêşkevtin a mirovanîyê pêwîst e. Wek nimûne jî.. heta berî sî-çil salan levakirin a pît a “z” di ziman ê Englîzî de “zêd” bû, belê evroj ew wek “zî” leva dikin. Ji bo zimanekî wek ziman ê Kurdî yê ku hîne qonax ên xwe yên seretayî dibirre, guherîn ên sipateyî pêwîst in. Gerek ew guherandin jî li angora zanist a ziman bin, li angora giyan ê (ruh ê) ziman ê Kurdî bin û li angora surîşt a ziman ê Kurdî bin, da ku ziman ê Kurdî bikeve qonaxek a pêşkevîtîr de û bêtir akincî (istiqrar) bibe. Niha di ziman ê Kurdî de hinek deng he ne, belê wek pît di ABC ya Kurdî de ne hatine danan û dihê gotin ku ev rewş bêtarek e (problemek e). Belê heta niha û li angora evê qonaxê, ABC ya ku mîr Celadet Bedirxan ji ziman ê Kurdî re danîye guncayîtîrîn (munasibîtîrîn) ABC ye. Ew deng ên ku he ne û pît li beramber wan tine ne, nabin bêtar û astengê ji xwîndin û nivîsandin a Kurdî re çê nakin. Herweha, gerek em ji bîr nekin ku dibe ew deng niha êdî ne Kurdî jî bin.

Weha em digihêjin evê encamê, ku li angora surîşt a ziman ê Kurdî peyv a “pît” wata ya herfê dide, belê peyv a “tîp” wata ya komek a rêxistî dide. Belê ev herdu peyv di levakirin a gellêrî de hatine wergeran û awejû bûne (hatine qulipandin). Di levakirin a gellêrî jî de ev rewş gelek caran çê bûye û çê dibe, ku peyv di levakirinê de hatiye serobinkirin. Ango ser ê peyvê bûye dawî

ya wê û dawî ya wê bûye ser ê wê. Di nimûne ya “kin” û “nik” de ev rewş baş xuya dibe, ku herdu peyv yek watayê didin, belê li başûr “kin” e û li bakur “nik” e û bê goman ji bo evê watayê “nik” ji “kin” rasttir e.

Pît nîgar ê deng e, herweha deng ê pîtê alî yê giyanî yê wê ye û reng ê pîtê (nîgar ê wê) alî yê keresteyîn ê wê ye. Jîn jî weha ye, di jînê de giyanî û keresteyîn digihêjin hevdu, da ku bizav a armancdar çê bibe.

Dengdar û dengdêr

Wek çawa naskirî ye; ABC ya ziman ê Kurdî ji sih û yek pîtan pêk dihê, ku bîst û sê (23) pît ji wan bê deng in û heşt (8) ji wan bi deng in. Di ABC ya Kurdî de weha jî hatiye gotin ku pît ên bê deng “dengdar” in û pît ên bi deng “dengdêr” in û hinekan jî weha dane nîşandan ku pît ên “dengdêr” pît ên bê deng in. Bi awa yê xwe dane xuyakirin ku peyv a “dengdar” wata ya bê deng dide û peyv a “dengdêr” wata ya bi deng dide, ji ber ku wata ya “dengdêr” dêran a deng e, ango belavkirin a deng e. Ew hinek ên ku pît ên bê deng kirine “dengdêr” jî weha hizir kirine, ku wata ya “dengdêr” bê deng e û ev jî şaşîyek mezin e.

Bi awayekî serekîn, pît ên bê deng kirine “dengdar” û pît ên bi deng û xwedî deng kirine “dengdêr” û heger weha be, peyv a “namdar” wata ya bê nam û ne xwedî nam dide û em dizanin ku wata ya peyv a “namdar” di ziman ê Kurdî de xwedî nam e, bi nam û deng e. Rastî jî ew e ku dengdar û dengdêr yek in û di peyv a dengdêr de pît a (a) ya paşgir a “dar” hatiye çemandin û xwehkirin, ji ber evê yekê dengdar bûye dengdêr. Xwehkirin û çemandin a pît a (a) di ziman ê Kurdî de he ye û ew xwehkirin û çemandin, di kêsanê de çê dibe. Ev çemandin di kirde (pîşk, verb) de jî çê dibe û ev rast e, belê ew hîngê çê dibe dem a ku kêsan weha dixwaze û ew jî cih ê xwe û binçîn a xwe he ye. Belê çima dê Ciwan bibe Ciwên, çima dê welat bibe welêt, çima dê Kurdmanc bibe Kurdmênc? Ev tenê guherandinek derûnî ye û ne pêwîst e. Ji evê pirsê re binçînek bê binema jî çê kirine. Peyv a dengdar ji “deng” û “dar” pêk dihê, ku “deng” peyv e û “dar” paşgir e û ew paşgir a nam ê kirdedar e. Di ziman ê Kurdî de paşgir a “dar” nam ê Kirdedar (pîşkar, subjekt) û rewş a kirde-dar çê dike. Ji ber evê yekê, pît ên dengdar pît ên xwedî deng

in û ew jî wek çawa naskirî ye “A-E-Ê-I-Î-O-U-Û” ne.

Pît ên bê deng ên ku em dikarin ji wan re “meng” jî bibêjin, ji ber ku wata ya peyv a “meng” ango sakin e, ew bê bi karhînan a pîtek a dengdar naderkevin û nahên kirikkirin (levakirin). Ew jî ji ber ku cihder a pît a bê deng girêdayî û girtî ye. Wek nimûne.. cihder a pît a “B” ew e ku herdu lêv dikevin ser hevdu û heger pîtek a dengdar pê re nederkeve, ew jî nahê derxistin û nahê naskirin. Em pît a “B” nas dikin dem a ku pîtek dengdar pê re biderkeve û hîngê pît a “B” dibe Ba, Be, Bê, Bi, Bî, Bo, Bu, Bû û bi vajî evê yekê jî rast e; ango dem a ku pît a “B” dibe ab, eb, êb, ib, îb, ob, ub, ûb. Ji xwe dem a ku pît ên bê deng ên ABC ya Kurdî dihên vewêjînkirin, bi alîkarî ya pît a dengdar a “E” dihên vewêjînkirin û weha dibe: BE, CE, ÇE, DE, FE, GE, HE, JE, KE, LE, ME, NE, PE, QE, RE, SE, ŞE, TE, VE, WE, XE, YE, ZE.

Di bare ya her heşt pît ên dengdar de weha hatiye gotin ku ew du beş in, ku deng ê beşekî ji wan dirêj e û deng ê beşekî din ji wan kurt e. Weha jî dabeş kirine ku yên deng ên wan dirêj e “A, Ê, Î, O, Û” ne û yên ku deng ê wan kurt e “E, I, U” ne. Me jî gelek sal û deman weha ji xwîndevan ên Kurd re daye xuyakirin. Belê ev dabeşkirin a han ne rast e, ji ber ku pît ên dengdar li angora daxwaz a derxistinê hemû dirêj in û hemû jî kurt in. Ew dengdar in û deng ê her pîtek a dengdar hem dirêj e û hem jî kurt e. Dirêjbûn û kurtbûn a deng ê pît ên dengdar bi ba yê gerdenê ve girêdayî ye û bi daxwaz a derxistinê ve girêdayî ye. Tu dikarî heta henase ya (nefes a) te he be pît a “A” biderxînî û dirêj bikî û bi heman şeweyî jî tu dikarî pît a “E” biderxînî û dirêj bikî, yan jî tu dikarî herduyan jî kurt biderxînî. Rastî ya evê pirsê ew e ku ji her pîtekê ji evan pît ên dengdar re, cihderek taybetî he ye û cihder ên wan ne wek hev in û ya ku gerek lêkolîn li ser bihên encamdan ev e.

Ji bilî ku pît ên dengdar gerin a (rol a) pît ên dengdar dibînin, ew bi xwe gerin a amrazan jî dibînin û pirranî ya wan wek amraz, bêtirî gerinekê dibînin. Ev pît amraz in ji ber ku gerin ên zimanvanî dibînin û kar ên zimanvanî bi wan dihên kirin û encamdan. Ev babetekî din e û lêkolînek berfireh jê re divê û niha tenê em dikarin bi kurtî bidin dîyarkirin, ku wek nimûne..

Pît a (A):

Ev pît a han hîngê “a” ye dem a ku berî wê pîtek bê deng he be, ev pît dibe “ya” dem a ku berî wê pîtek dengdar he be û serbixwe dihê nivîsandin. Weha jî dibe (ji “a” dibe “ya”) ji ber ku di zimanê Kurdî de du pît ên dengdar nahên ber hevdu û bi hevdu re nahên kirikkirin (levakirin).

- Amraz ê tak e.. ku yek tiştî dide xuyakirin û ji peyvê cuda dihê nivîsandin.. wek: “pênûs a te şîn e” ku yek pênûs e.. “zevî ya te mezin e” ku yek zevî ye.

- Amraz ê mê ye û ji peyvê cuda dihê nivîsandin. Ew regez ê mê dide nîşandan.. wek: “kiç a min zîrek e” ku kiç mê ye.. “derya ya sipî ya naverast”.. ku peyv a “derya” mê ye.

- Amraz ê arzû (mulkiyetê) ye û ji peyvê cuda dihê nivîsandin.. wek: “ev perrtûk a te ye” ango ev perrtûk mulkê te ye.. “ev zevî ya te ye” ango ev zevî mulkê te ye.

- Amraz ê dîyarkirin a reng, rewşê û pergala e û ji peyvê cuda dihê nivîsandin.. wek: “gul a sor” ku rengê gulê sor e.. “jin a hêja” ku jinek hêja he ye.. “kiç a nexweş” ku kiçek nexweş he ye, ango pergala e wê ew e ku ew nexweş e.

- Bernamê alîkarê nîşanî yê ne dîyar e, mê ye, tak e û ji peyvê cuda dihê nivîsandin. Dem a em dibêjin: “ew a ku hat.. ew a ku hat dibistanê xwîndevan e”.. ango “a” bi “ew” re dibe alîkar û hatin a ya xwîndevan dide nîşandan.

Pît a (E):

Ev pît a han hîngê “e” ye dem a ku berî wê pîtek bê deng he be, ev pît dibe “ye” dem a ku berî wê pîtek dengdar he be û ew weha dibe, ji ber ku di ziman ê Kurdî de du pît ên dengdar nahên ber hevdu û bi hevdu re nahên kirikkirin (levakirin). Ev pît kirde yê bûyînê ye û dem a ku peyv a wê wata ya xwe bi xwe bide, serbixwe dihê nivîsandin. Ango ev pît a han di gotinekê wek “dike” yan “diçe” de, serbixwe nahê nivîsandin û bi peyvê ve dihê nivîsandin, ji ber ku bê wê wata ji peyvê re namîne. Belê dem a ku peyv wata ya xwe bide wek “ev bajêr...” hîngê dibe “ev bajêr e” û hîngê ji peyvê cuda dihê nivîsandin. Wata dibe ku peyv a bajêr bê pît a “e” bihê nivîsandin û wata ya xwe bide, belê hevek bê “e” gurah (kamil) nabe, ji ber ku “e” kirde yê bûyînê ye.

- Amraz ê tak e û ji peyvê cuda dihê nivîsandin.. wek: “ev dibistan e” yek dibistan e.. “ev derî ye” yek derî ye.

- Kirde (verb) yê bûyînê ye, ji bo tak e û hevek bê evî amrazî gurah (kamil) nabe. Ev amraz wek çawa di ziman ê Englîzî jî de weha ye, gerin a kirde yê bûyînê (verb to be) yê alîkar dibîne û hevek bê wî serrast nabe. Wek: “Azad li dibistanê ye” heger tu bibêjî: “Azad li dibistanê...” hevek gurah nabe û dem a ku hevek gurah nebe watayê jî nade. Heger peyv (kirde) wata ya xwe bi ser ê xwe bide, ji peyvê cuda dihê nivîsandin û heger peyv (kirde) nikaribe wata ya xwe bi ser ê xwe bide, bi peyvê ve (bi kirde ve) dihê nivîsandin.. wek: “ew kar ê xwe dike” ku kirde yê bûyînê “e” di vir de divê bi peyvê ve (bi kirde ve) bihê nivîsandin, ji ber ku heger “e” pê ve nehê nivîsandin, dê kirde bibe “dik” û kirde yê “dik” bê “e” bê wata ye, yan jî nabe kirde.

- Ev amraz wek kirde yê bûyînê ji peyvê cuda dihê nivîsandin û ne nêr e û ne jî mê ye, ew nêtar e û ji herduyan re bi kar dihê wek: “ev kiç e” û wek: “ev xort e”.. “ev xanî ye”.. “ev derî ye”..

“ev mase ye”.

- Ev pît serwaz e (genitive yan additive, îzafe ye) û di nimûneyekê wek: “keskesor” de dîyar dibe, ku di navber a kesk û sor de serwaz bûye. Serwaz jî ji bo rewanîyê û ji bo girêdanê dihê xuyakirin û danan. Ango ji bo rewanî ya peyvê ye û ji bo girêdan a du beş ên peyvê ye. Nimûne yên wek: “çapemenî, canewer, seredan” jî evî pergalî (halî) didin nîşandan, ku wek nimûne.. ew di peyv a “çapemenî” de kevtiye navber a peyv a “çap” û amraz ê “menî” de.

Pît a (Ê):

Ev pît a han hîngê “ê” ye dem a ku berî wê pîtek bê deng he be û ev pît dibe “yê” dem a ku berî wê pîtek dengdar he be. Weha jî dibe ji ber ku di ziman ê Kurdî de, du pît ên dengdar nahên ber hevdu û bi hevdu re nahên kirikkirin (levakirin). Ev pît a han serbixwe dihê nivîsandin, belê ew ji bo dîyarkirin a regez ê mê yê peyvê bi peyvê ve dihê nivîsandin û ji bo dîyarkirin a regez ê nêr ê peyvê ji peyvê cuda dihê nivîsandin.

- Amraz ê tak e û ji peyvê cuda dihê nivîsandin wek: “mirov ê zana”.. ku yek mirovî dide nîşandan.

- Amraz ê nêr e wek: “kurr ê jîr” ku kurr nêr e.. “derî yê malê mezin e” ku derî nêr e. Dem a ku regez ê nêr dide nîşandan, ji peyvê cuda dihê nivîsandin.

- Amraz ê arzû (mulkiyetê) ye û ji peyvê cuda dihê nivîsandin wek: “ev tişt ê te ye”.. “ev xanî yê te ye”.

- Dem a ku bi peyvê ve dihê nivîsandin regez ê mê dide nîşandan wek: “Gulê çû dibistanê” ku Gulê û dibistanê mê ne.. “xebat a jinê pîroz e” ku “jinê” mê ye û “ê” pê ve hatiye nivîsandin, da ku regez ê wê bide nîşandan.

- Bernam ê alîkar ê nîşanî yê ne dîyar e û bernam ê biyaşkirinê jî ye, nêr e û tak e û ji peyvê cuda dihê nivîsandin wek: “ew ê ku

çû bajêr.. ew ê ku çû bajêr Azad bû”.. ango “ê” bi “ew” re dibe alîkar û çûn a Azad dide nîşandan.

- Kes ê tak ê ne xuyanî dide xuyakirin, gihanek e û bi peyvê ve dihê nivîsandin wek: “didimê, dibêjimê, min dayê, min gotê...”.

Pît a (I):

- Serwaz e, ku ji bo rewanî ya peyvê û girêdan a du beş ên peyvê dihê serwazkirin wek: “Kurdistan”.. peyv a Kurdistan ji du peyvan pêkhatî ye ku ew jî Kurd û stan in. Em dibînin ku ji bo rewanîyê û girêdan a evan herdu beşan, pît a (i) dikeve navber a wan, serwaz dibe û di dawî de em evê peyvê ne wek “Kurdistan” dixwînin û dinivîsin, belê em wê wek “Kurdistan” dixwînin û dinivîsin. Em evê serwazê (pît a “i”) wek nimûne di kirde yê “hatiye” de dibînin, ku ev peyv “hat” û “ye” ye belê em nabêjin “hatye”.. em dibêjin “hatiye” û em pît a (i) serwazî navber a “hat” û “ye” dikin. Di nimûne ya kirde yê “kiribû” jî de weha ye, ku em nabêjin “kirbû” belê em (i) serwazî navber a “kir” û “bû” dikin. Di nimûne ya “hatiye” de, dibe bihê gotin ku ev peyv ji “hatî” û “ye” pêkhatî ye û (î) ji ber (y) bûye (i) û ev ne rast e. “Hat” mêjîn e (derbasbûyî ye) û “ye” kirde yê bûyînê yê alîkar e, belê her dem a ku kirde wata ya xwe ya serrast nede “ye” û hemû kirde yê bûyînê bi peyvê ve dihên nivîsandin û jê cuda nabin wek “bûye, bûne, çûye, çûne, kiriye, kirine...”.

Pît a (Î):

Ev pît a han hîngê (î) ye dem a ku berî wê pîtek bê deng he be û ev pît dibe (yî) dem a ku berî wê pîtek dengdar he be. Weha jî dibe ji ber ku di ziman ê Kurdî de du pît ên dengdar nahên ber hevdu û bi hevdu re nahên kirikkirin (levakirin).

- Amraz ê tak e û bi peyvê ve dihê nivîsandin wek: “evî tiştî”.. ango yek tişt e.

- Amraz ê nêr e û bi peyvê ve dihê nivîsandin wek: “evî kurrî”..

ku tak û nêr dide nîşandan.

- Kirde yê bûyînê ye (verb to be) û ji peyvê cuda ye û bi taybetî ji bo bernam ê “Tu” bi kar dihê wek: “tu yî yê ku nîgaran nîgar dikî”. Dem a ku peyv (kirde) wata ya xwe bide, ji peyvê cuda dihê nivîsandin û dem a peyv (kirde) wata ya xwe nede, bi peyvê ve (bi kirde ve) dihê nivîsandin wek: “tu rakevtî yî”.. “tu dixwînî” ku di nimûne ya “rakevtî” de “yî” cuda dihê nivîsandin û di nimûne ya “dixwînî” de “î” bi peyvê ve girêdayî ye.

- Dem a ku ev amraz ê han evan gerinan (rolan) dibîne, serbixwe dihê nivîsandin wek: “tu aza yî” belê dem a ku regez ê nêr dide nîşandan, bi peyvê ve dihê nivîsandin wek: “ewî kurrî”. Ji bilî ku ew dem a kirde wata ya xwe bide, ji kirde cuda dihê nivîsandin û heger kirde wata ya xwe nede, bi kirde ve dihê nivîsandin.

- Bernam ê tekezkirin û biyaşkirinê yê nêr e wek: “welatek î ciwan.. mêrek î çeleng.. kurrek î zîrek...” û di vir de ji peyvê cuda dihê nivîsandin.

- Amraz ê jêder e, ango jêder pê dihê diristkirin wek: “azadî, merdî, qehremanî, bilindî, zordarî, ...”.

- Amraz ê rewş û pergal e.. ango rewşê û pergal (hal) dide nîşandan, wek: “paraztî, girtî, vekirî, xemilandî, sorkirî, kelandî, buhujandî, nermkirî, ...”.

- Amraz ê xunamîtiyê (nisbetê) ye, ango peywendî û peywestî ya xunamîtiyê dide nîşandan wek: gund = gundî, Amed = Amedî, Barzan = Barzanî, Mehabad = Mehabadî, ... hd.

Pît a (O):

- Amraz ê bangê û nîşandan a tak û nêr e û bi peyvê ve dihê nivîsandin wek: “ho kurro” û ji bo nîşandan a komê jî dibe: “ho kurrino”.

- Amraz ê nîşandan a kom û mê ye û bi peyvê ve dihê nivîsan-

din wek: “ha keçino”. Di rewş a mê û tak de jî çê nabe.

- Ev amraz ê han bi peyvê ve dihê girêdan, ango ne serbixwe dihê nivîsandin.

Pît a (U):

Ev pît a han bi ten a xwe nabe amraz, ew wek nimûne bi pît a “k” re dibe “ku” û “ku” amraz ê gihanînê yan gihanekê ye û amraz beşekî peyv a Kurdî ye.

Pît a (Û):

- Amraz ê peywendîyê ye û gerek herdem serbixwe bihê nivîsandin. Belê di nimûne yên wek: “danûstan, kelûpel,...” de evî amrazî difetisînin û li şûn a ku evê peyvê wek: “dayîn û stan” binivîsin û wek “kel û pel” binivîsin, wî difetisînin û dikin “danûstan, kelûpel” û behane ya wan ew e ku ew bi evî awayî peyv û watayek din çê dikin. Ew peyv û wata ya din jî bi xwe di surîşt a ziman ê kurdî de gerek “dayînistan, kelepel” be û ne “danûstan, kelûpel” be, ji ber ku rewanî û girêdan bi serwaz a (i) û (e) çê dibe û bi pît a “û” ya ku amraz ê peywendîyê ye çê nabe.

Ji ber ku gerin a evan pît ên dengdar gelek giring e, gerek ew di cih ên xwe yên rast de û rast bihên nivîsandin. Bi ti awayî jî ne dirist e ku em wata ya peyv a “dengdar” bikin bê deng, ji ber ku peyv a “dengdar” ji nam ê “deng” û paşgir a “dar” pêkhatî ye û paşgir a “dar” wata ya kirdedar dide peyvê. Ango wata ya peyv a “dengdar” bi deng û xwedî deng e, wek çawa ku wata ya peyv a “namdar” ango bi nam û deng e û xwedî nam e.

Nîşe: çawa amraz ên “a, ya – ê, yê” û nîşan ên wan ên komê “ên, yên” beşdarîyê di diristkirin a wazgar û lêwazgar (genitive, mudaf û mudaf îleyhî) de dikin, pirsek naskirî ye û em dê di dem a pêş de li ser taybetmendî yên wan ên di evî biwarî de birawestînin. Me nam ê evî beş ê rêziman kiriye “wazgar” û

“lêwazgar” ji ber ku peyv a “wazgar” ango yanizî (zêdeyî) û ew ji beşê “waz” û paşgir a “gar” pêk dihe. Wata ya peyv a “waz” hîştin, danan, lêkirin û bi cihkirin e û paşgir a “gar” wata ya firehî, dûrî û biwarê destnîşankirî dide. Weha wata ya peyv a “wazgar” dibe lê yanizkirin, lê danan, lêkirin û bi cihkirin a tiştêkî li ser tiştêkî din. Naskirî ye jî, ku wazgar û lêwazgar ji serwazê ne. Ango diristkirin a wazgar û lêwazgar jî, yek ji gerinên pêt û amrazên “a,ê” ne.

Çima pît a (î) ya berî pît a (y) dibe (i)?

Bersiv a wan a ji bo evê pirsê ew e ku di kirikkirinê (levakirinê) de weha dibe. Gelek ne dirist û ne rast e, dem a ku em wata ya peyvê dikin qurbanî levakirin a bê şîraz a peyvê. Dem a ku em li angora levakirin a bê şîraz biçin, em dê kok û resenî ya peyvê winda bikin. Ji ber ku levakirin a bê şîraz ne bizavek biyaş e û ji ber evê yekê nabe bingeh û binçîn. Peyv di nivîsandinê de li angora kok û resenî ya xwe ne û levakirin a bê şîraz çawa dibe bila bibe. Levakirin a bê şîraz jî ew e ya ku li angora daxwaz a derûnê ye û bê vagir û binçîn e û ne li angora surişt a ziman e, belê levakirin a bi şîraz li angora zanist a ziman e, ango li angora dîrok a peyvê û çawanî ya xwîndin a peyvê ye.

Di ziman ê Kurdî de herdu peyv ên “diyar” û “dîyar” he ne û her yek ji wan xwedî ya wata ya xwe ya taybetî ye, ku wata ya “diyar” dayîn, pêşkêşkirin û hezkirin e û ji ber evê yekê peyv a “diyarî” jê ye û ewê watayê dide û wata ya “dîyar” xuyanî û aşkira ye û kok û bingeh a wê “dî” ye. Di ziman ê Kurdî de “dî” amraz ê kişanê ye (nam ê evî amrazî kirine “daçek” ku “da” Kurdî ye, belê “çek” Turkî ye û ji “çekîş” a Turkî hatiye û wata ya wê kişan e) û “yar” bi wata ya hezkirinê û nêzîkbûnê ye. Ji ber evê yekê em dibînin ku peyv a “diyarî” ya ku ji “dî” û “yarî” pêkhatî ye, wata ya hezkirinê û nêzîkbûnê dide, ku ew hezkirin û nêzîkbûn bi diyariyê jî çê dibe yan jî diyariî yek ji nîşan ên hezkirinê ye. Di peyv a “dîyar” de ya ku ji “dî” û “yar” pêkhatî ye “dî” kok a peyv a dîtîne ye û paşgir a “yar” di vir de wata ya nêzîkdar dide û weha wata ya peyv a “dîyar” dibe xuyanî, ji ber ku ew tişt ê ku dihê dîtîne nêzîk e û tişt ê nêzîk, dihê dîtîne û xuyanî ye. Levakirin çawa jî be, divê di nivîsandinê de ev herdu wata her yek di cih ê xwe de paraztî bin. Gerek levakirin a bê

şîraz nebe bingeh a rêziman û rênivîsê, da ku em watayê ji dest nedin.

Peyv a “jîyan” di ziman ê Kurdî de bi tem û mij e, ji ber ku hem bûye jêder û hem jî bûye kirde. Dem a em peyv a “jîyan” wek “jiyan” binivîsin, em dê kok a evê peyvê ya ku “jî” ye, di bin bar ê binçîn a ne rast a levakirinê de winda bikin. Levakirin her çawa jî be, gerek nivîsandin a peyv a “jîyan” – û hemû peyv ên ku pît a “î “ û “y” tê de dihên ber hevdu – bê guherîn bihê nivîsandin da ku wata ya peyvê û kok a peyvê winda nebin. Tenê dem a ku di peyvekê de pît a (i) serwaz be û berî pît a (y) dihê, wek (i) dimîne wek: “kiriye, biriye, xwîndiye, nivîsandiye, ...”. Peyv a “jîyan” a wek jêder ji “jî” ya ku ew kok a evê peyvê ye û ji “an” ku ew amraz ê jêder e pêk hatiye. Belê pît a “y” kev-tiye navber a “jî” û “an” de, ji ber ku du pît ên dengdar di ziman ê Kurdî de nahên ber hevdu. Bi Evî awayî jî, êdî peyv a “jîyan” kev-tiye bin bar ê tevhevî ya rêzimanî de, ji ber ku ew hem jêder e û hem kirde ye û ev pirs di rêziman de şaş e. Şaşbûn ew e ku peyvek hem jêder be û hem kirde be û rastî ew e, ku her peyvek nûnerî ya beşekî peyvê dike, ango yan jêder e yan kirde ye yan tişteki din e. Peyv a “jîyan” wek kirde jî, kirde yê dem a mêjîn a nêzîk e, ji ber ku Kurd dibêjin: “ewan (ew) ji vir çûn û li welateki din jîyan.. ez jîyam, tu jîyayî, ew jîya, em jîyan, hûn jîyan, ewan jîyan”. Kok a “jî” û amraz ê jêder “an” di evê peyvê de, jêder a “jîyan” dirist dikin, belê diristbûn a – an diristkirin a – bi evî awayî ya peyv a “jîyan” pergaleki (haleki) gelek şaş û ne rast çê kiriye, ku em niha li ser ewî pergalî napeyivin.

Pirs a din a ku li ser amraz ê “an, yan” he ye, ew e ku ew evan gerinan dibîne:

1- Amraz ê komê ye û wek “an” û “yan” dihê nivîsandin û di nimûne yê wek: “evan daran, ewan zûran, evan xanîyan,

ewan bêrîyan, hemû zevîyan û... hd” de dihê xuyakirin û amraz ê komê bi peyvê ve dihê nivîsandin. Belê ev amraz ê han (ê komê) kengî wek “an” û kengî wek “yan” dihê nivîsandin? Ew bi kurtî dem a ku pît a dawî ya peyv a berî wî bê deng be wek: mal “an” dihê nivîsandin û “mal” dibe “malan”. Belê heger pît a dawî ya peyvê dengdar be wek: gelî “yan” dihê nivîsandin û “gelî” dibe “gelîyan”.

2- Amraz ê peywendîyê ye û wata ya hevberîyê dide, ku di nimûne ya: “em dê biçin an neçin” de ew wek “an” e û du rewşan hevberî hevdu dike. Di nimûne ya: “ew dê bihê yan nahê” de ew wek “yan” e û du rewşan hevberî hevdu dike. Dem a ku “an, yan” amraz ên peywendîyê bin, serbixwe dihên nivîsandin.

3- Yan peyv e û wata ya cihekî rûniştinê dide, ku bi taybetî li jûr a (ode ya) mêvanan weha bi dest dihat çêkirin û yan alîyekî malê digirt an du yan sê alî yên malê (hinder, hundur) digirt. Mêvan an her kesekî din, dikaribû di hinder de li ser yanê birûnê. Ev peyv di ziman ê Turkî de wata ya “tenişt, kêlek, li cem” dide û ew dûrî wata ya peyv a “yan” a Kurdî ye û ew tenê di levakirinê de wek hevdu ne, belê her yek ji wan wata ya xwe ya taybetî he ye, ku di ziman ê Kurdî de cih ê rûniştinê ye û di ziman ê Turkî de “tenişt, kêlek, li cem” e. Em dikarin “yan” wek kenebe (sofa ya dirêj) a niha bidin nîşandan, ku ev “yan” li mal ên Kurdan bi dest dihatin çêkirin. Ev “yan” ên han biçûk û mezin dihatin çêkirin, ku ya biçûk alîyekî jûr a (ode ya) malê digirt û ya mezin du alî yan sê alî yên jûr a malê digirt. Ev “yan” hinekî bilind dihatin çêkirin û dibûn wek kenebe yên niha.

4- Ji kok a peyvê ye û ne amraz e wek: “liyan, biyan, ziyan, wêran, halan, lêfan, ...”.

Gerek em kok û resenî ya peyvê biparêzin û em di nivîsand-

inê de “î” ya ku bi xwe “î” ye, nekin “i” û levakirin çawa be bila bibe. Belê gerek em “î” ya ku ji kok û resenî ya peyvê ye baş nas bikin. Gerek em nas bikin ku pît a “î” ji kok û resenî ya peyvê ye û em wê wek xwe bixwînin û binivîsin û ji ber levakirin a bi engîz a (bi sebeb a) pît a “y” em “î” nekin “i” çimku weha kok û resenî ya peyvê namînin. Gerek hay a me ji pît a (i) ya ku ew wek serwaz e jî he be û em nas bikin ku ew wek serwaz di nav peyvê de wek xwe “i” jî dihê. Wek nimûne: “Azad kar ê xwe kiriye”. Di peyv a “kiriye” de pît a (i) berî pît a (y) hatiye û ne (î) ye, ew bi xwe weha ye (“i” ye) ji ber ku ew di evê nimûneyê de serwaz e. Di nimûne yê “biriye, xwîndiye, standiye, hatiye...” de jî weha ye. Belê ya ku divê bihê gotin ew e, ku kirde yê “ye” di evan nimûne yê weha de bi peyvê ve dihê nivîsandin, ji ber engîzekê ye. Ew engîz jî ew e ku dem a “ye” bi evan kirde yê weha ve nehê nivîsandin, wata ya wan cihgîr nabe, ango bê wata dibin û heta ku “ye” bi wan ve nehê nivîsandin, ew wata ya xwe nadin. Wek nimûne: “Azad wane ya xwe xwîndiye” heger em “xwîndiye” weha binivîsin: “xwînd ye” nabe, êdî em serwaz a (i) bi kar dihînin û em wê dikin girêdan a navber a wê û kirde yê bûyîne “ye” da ku bibe “xwîndiye” û wata ya xwe ya demane bide, ku ew dem a mêjîn e (dem a derbasbûyî ye). Wata “ye” bi peyvê ve dihê nivîsandin dem a ku ew peyv nikaribe wata ya xwe ya demane (zemenî) bide û heger wata ya xwe ya demane bide, ji peyvê cuda dihê nivîsandin. Wek nimûne.. peyv a “xwariye” bê ku “ye” pê ve bihê nivîsandin wata ya xwe ya demane nade, belê peyv a “rakevtî ye” kirde yê “ye” yê alîkar jê cuda dihê nivîsandin, ji ber ku “rakevtî” bi ten a xwe wata ya xwe dide.

Wata.. paraztin a nivîsandin a peyvê li angora kok û resenî

ya xwe rast e û gerek peyv li angora kok û resenî ya xwe bihê nivîsandin. Peyv li angora levakirinê girêdayî kok û resenîyê ye û ne girêdayî levakirinê bi xwe ye. Ji ber evê yekê, şaş e ku pît a “î” di bin bar ê levakirin a bê şîraz de bibe “ i “ çimku kok a peyvê wêran dibe. Ango gerek peyv wek xwe û resenî ya xwe bihê nivîsandin û levakirin çawa dibe bila bibe.

Pît a (a) ya ku dibe (ê)

Ev guherîn a han di dem a kêsanê (tesrîfê, conjugation) de çê dibe, ku ew kêsan ji jêder çê dibe. Pît a “a” di jêder de wek xwe ye (a ye) belê dem a ku dihê kêsankirin (wata dikeve dem a amad û ayinde de) dihê guherandin û dibe “ê”. Belê ew di dem a mêjîn de wek xwe (a) dimîne. Wek: jêder a “paraztin” dem a ku dikeve dem a amad (niha) de dibe “diparêzim” û dem a ku dikeve dem a ayinde (mand, dem a bihê) de dibe “dê biparêzim” û di dem a mêjîn de dibe “parazt” ango ew “a” di dem a mêjîn de wek xwe dimîne. Herweha wek: jêder a “axavtin, haxavtin” dem a ku dikeve dem a amad de dibe “dihaxêvim” û dem a ku dikeve dem a ayinde de dibe “dê bihaxêvim” û di dem a mêjîn de dibe “axavt, haxavt” wata ew “a” di dem a mêjîn de wek xwe dimîne.

Nîşeyek (têbînîyek) di bare ya evê peyvê de (axavtin) he ye û gerek bihê gotin; ku ev peyv û peyv a “axivîn” tevhev dibe. Peyv a “axivîn, haxivîn” ji peyv a “axavtin, haxavtin” cuda ye. Peyv a “axavtin, haxavtin” bi wata ya peyivînê ye, belê peyv a “axivîn, haxivîn” bi wata ya harbûn û peçivîn a (iltihab a) birînê ye. Dem a ku birîn dihaxive bêtir janê dike, ji ber ku dihazire. Wata bingeh a peyv a haxavtinê “haxav” e, belê bingeh a peyv a axivînê “axiv, haxiv” e. Ango dem a em di dem a mêjîn de dibêjin “Azad axivî” û mebest a me ew be ku “Azad peyivî” em şaşîyê dikin, gerek em bibêjin “Azad haxavt”. Ev peyv (haxavtin) di kêsanê de û di ziman ê petî de, pît a “h” dikeve pêşî ya wê de da ku du pît ên dengdar nekevin ber hevdu de, ku ew jî pît a (i) ya amraz ê “di” ye û pît a “a” ya destpêk a evê peyvê ye. Ev pirs di ziman ê gellêrî de dibe “daxive” û kêman dibe “dihaxive” û dem a ku dibe “daxive” amraz ê ku pêşkok a peyvê ye dimire.

Mirin a evî amraz ê han ji ber engîz a (sebeb a) kurtkirin û levakirinê ye. Weha jî hatiye gotin ku pît a (i) ya amraz ê “di” xwe li ber pît a (a) ya destpêk a peyv a “haxavtinê” nagire û ji ber evê yekê dikeve û ev peyv dibe “daxive” û “baxive” jî her weha ye. “Ew daxive” û “ew dê baxive”. Belê ya rast ew e ku divê amraz ê “di” weha nekeve ber pêl a mirandinê. Di ziman ê petî de amraz û her beşekî din ê peyvê, li angora kok û resenî ya xwe dihên paraztin. Bi taybetî jî gerek amraz bihên paraztin, ji ber ku ew gerinek (rolek) bingehîn di ziman de dibînin. Ji ber evê yekê, di nimûneyekê wek “haxavtin” de dem a ku dihê kêsankirin, pît a gihanekî ya “h” dikeve destpêk a wê de da ku amraz ê “di” paraztî be û di dawî de jî, peyv bi xwe paraztî be û bi engîz a levakirinê û kurtkirinê nehê şêwandin û pûçkirin. Paşê jî, ev peyv a han bi şêwe yê “dihaxêvim, dihaxêve, haxavt” jî di nav gell de he ye, belê kême û ev şêwe yê wê yê rast e. Wata, şêwe yê rast ê peyvê di nav tivêj ên gell de dihê gotin û gerek em lê bigerin û bibînin.

Ev pît a “a” ya ku di nimûne yên wek “paraztin” û “haxavtin” de dihê guherandin û dibe “ê” di birrgeh a (kît a) xwe ya duyem de dihê guherandin. Ango pît a “a” ya yekem nahê guherandin, belê ya duyem dihê guherandin. Ew jî ji ber ewê yekê ye ku birrgeh a yekem (par) beşekî giring û serekîn ê kok a peyvê ye, ji ber evê yekê wek xwe dimîne û nahê guherîn. Di nimûneyekê wek “birajtin” de (û gerek birajtin be, ne biraştin be) dem a ku dihê kêsankirin, di dem a amad de dibe “dibirêjim” di dem a ayinde de dibe “dê bibirêjim” û di dem a mêjîn de dibe “birajt”. Ango pît a “a” ya evê peyvê di dem a amad û ayinde de dihê guherandin, belê di dem a mêjîn de wek xwe dimîne, çimku dem a mêjîn a nêzîk bingeh û resenayetî ya peyvê ye . Ev guherîn a han suriştî ye, ji ber ku girêdayî surişt a ziman ê Kurdî

ye. Ango dem a ku guherîn di peyvê de suriştî be zîyanê nagihîne kok û wata ya peyvê, belê dem a ku guherîn ne suriştî be û di bin barê derûnî û levakirin a bê şîraz de be, zîyanê digihîne peyvê û kok a peyvê û paşê jî zîyanê digihîne zîman bi xwe.

Dem a ku bi taybetî di naman de pît a (a) dikin (ê) ev surişt a zîman dihê kilêskirin (xerabkirin). Dem a ku welat dikin welêt, zîman dikin zimên, lawik dikin lêwik, Ciwan dikin Ciwên û... hd. Ew di evê guherandinê de wata ya peyvê dikujin. Mixabin ku ji evê nacûrkinê re binçîn (qayide) jî çê kirine û ew bi xwe tiştêkî bê binema ye. Binema ya evê guherandinê tenê derûnî ye û ji bo mezinkirinê, şanazîyê û nazdarîyê dihê kirin. Ev guherîn a han û guherîn a din a ku di naman de dihê kirin, watayê dikuje û dem a ku wata hat kujtin peyv pûç dibe. Guherîn a din a ku di naman de dihê kirin ew e dem a Azad dibe Azo, Suleyman dibe Silo û ev pirs a han di zîmanê gellêrî de naskirî ye.

Gell (her gellek) di çarçêweyê surişt û heyîn a zîmanê xwe de dipeyive, belê ji ber ku zîmanê gellê bê vagir e (bê zebt e, bê setting e) hemû beşên peyvê jî dikevin ber kêmkirinê, yanizkirinê (zêdekirinê) û levakirin a corane (cor bi cor) de. Di evê navberê de jî, kok û resenî ya beşên peyvê dihên kilêskirin û nacûrkin. Rêzîman kok û resenîyê diparêze û divê biparêze û heger neparêze ne rêzîman e. Wek nimûne.. di beşekî welatê Kurdan de ev hevek a han weha dihê gotin: “miş ter go wer ti ne hat”.. di evê hevekê de ew kilêskirin û nacûrkin a zîmanvanî aşkira ye, belê rêzîman evê hevekê rast dike û weha lê dike: “min ji te re got were, tu ne hatî”. Dem a ku rêzîman evê hevekê weha rast jî dike, wê li angora surişt a zîman û paraztin a kok a peyvê û resenî ya zîman rast dike. Ji ber evê yekê, rêzîman rêxistin a zîmanê gell e. Êdî peyv û hevekên gell li nik gell dimînin û ew li angora daxwaz a xwe bi wan dipeyive, belê rastkirin a wan dibe

ziman ê petî yê xwîndin û nivîsandinê û dibe ziman ê fermî.

Weha ji me re hat xuyakirin, ku pît a (a) tenê di dem a kêsan a dem a amad û ayinde de dihê guherandin û dibe (ê) û ev pirsek rêzimanî ye û di ziman ê Kurdî de çê dibe. Ev guherîn di kêsanê de çê dibe. Belê rêziman evê guherandin a han di ti awayekî din ê rêzimanî de napejirîne, ji ber ku wata ya peyvê û kok a wê, pê dihên nacûrkin û kilêskirin. Rêziman jî kok a peyvê, wata ya peyvê û resenî ya peyvê diparêze.

Wane ya birrgeh a dengdar (kît)

Divabû ev wane ya han wek perrtûkek taybetî bihatiba nivîsandin, da ku hemû taybetmendî yên birrgeh a dengdar tê de bihatibana şirovekirin. Çimku ev babet ê han di ziman ê Kurdî de gelek giring e. Giringî ya evî babetî girêdayî dîrok a ziman ê Kurdî ye, girêdayî siruşt a ziman ê Kurdî ye û girêdayî fonetîk a ziman ê Kurdî ye. Siruşt a ziman ê Kurdî birrgehîn e û ziman ê birrgehîn, cihekî kevnar û resen di dîrokê de digirin. Ziman ê Somerî yê ku yek ji ewan ziman ên kevnar bûye, zimanekî birrgehîn bûye. Ziman ê birrgehîn ên ji cor ê ziman ên Somerî û Kurdî, dîrok a çêbûn a ziman ên mirovanîyê bi giştî didin nîşandan, ji ber ku dem a mirov ên yekem ên ser evê zemînê peyivîne, bi evî awa yê birrgehîn peyivîne. Birrgeh a ziman ê Kurdî (û Somerî jî) bêtir zelal û akincî ye, belê birrgeh di ziman ên din de – bi taybetî ziman ên Latînî – nema wek berê zelal û akincî ye. Ji ber ku ev pirs ên weha berfireh û giring di babet ê birrgehê (kîtê) de he ne, ev babet gelek giring û berfireh e û pêwîstî perrtûkekê bi ser ê xwe ye. Belê ji ber giringî ya evê pirsê, birrgeh a dengdar wek waneyek a sade û ji bo dîyarkirin a çend taybetmendî yên wê, di vir de dihê pêşkêşkirin.

- Nasandin:

Birrgeh a dengdar (kît) dengekî tenê yê dabirrayî ye û hafîrînar ê wê pît a dengdar e. Wata pît a dengdar bingeh a birrgeh a dengdar e û bi wê çê dibe. Birrgeh a dengdar ji dengekî tenê pêk dihê, ku ew deng bi levakirin a birrgehê re diraweste da ku birrgehekê tenê bide nîşandan. Ango dem a ku birrgeh a dengdar dihê levakirin û wek deng dihê derxistin, rawestaneke pê re he ye. Wek nimûne.. peyv a “baran” a ku ji du birrgehan

pêk dihê, li ber birrgeh a yekem “ba” rawestanek he ye û li ber birrgeh a duyem a evê peyvê “ran” rawestanek he ye. Ango dabirranek he ye. Ev dabirran a han a ku birrgehê çê dike, di-hêle ku pênc cor û şêwe yên birrgeh a dengdar di ziman ê Kurdî de çê bibin.

- Cor û şêwe yên birrgeh a dengdar:

1- Pîtek dengdar bi ser ê xwe birrgehek e (kîtek e). Ew weha ye dem a ku pît a dengdar di destpêk a peyvê de be yan bi ser ê xwe tenê be. Wek peyv a “ayaz” ku ji du birrgehan pêk dihê û birrgeh a wê ya yekem her pît a “a” bi xwe ye. Ji ber ku dem a ev peyv dihê levakirin, pît a wê ya yekem “a” serbixwe û dabirrayî dihê levakirin û derxistin. Ango ev peyv a han ji du birrgehan pêk dihê, ku birrgeh a yekem “a” ye û birrgeh a duyem “yaz” e. Peyv a “êvar” jî her weha ye, ku ji “ê” û “var” pêk dihê û “ê” bi ser ê xwe û ten a xwe birrgehek e.

2- Pîtek dengdar û pîtek bê deng birrgehek e û du şêwe yên evî corî he ne. Peyv a “bakur” ji me re dide xuyakirin ku birrgeh a yekem “ba” ji pîtek bê deng “b” û pîtek dengdar “a” pêk hatiye. Belê peyv a “avdayîn” ji me re dide xuyakirin, ku birrgeh a yekem “av” ji pîtek dengdar “a” û pîtek bê deng “v” pêk hatiye. Ango herdu şêwe yên evê birrgehê ev in: a yekem “bê deng-dengdar” e û ya duyem “dengdar-bê deng” e. Wata bingeh a birrgeh a ji cor ê duyem “bê deng-dengdar” e û “dengdar-bê deng” e. Wek ku nimûne yên.. “ba, kî, ga, mû, za, mê, ji, bi, ... “ û “ av, êm, ên, aş, îm, em, in, ... “ ji me re didin xuyakirin.

3- Pîtek dengdar û du pît ên bê deng birrgehek e û sê şêwe yên wê he ne.

- Şêwe yê yekem “bê deng-dengdar-bê deng” e, wata pît a dengdar dikeve navber a du pît ên bê deng de wek.. “dar, kûr,

ban, zêr, şîr, sor, ...”.

- Şêwe yê duyem “bê deng-bê deng-dengdar” e, wata pît a dengdar di dawî de ye û piştî du pît ên bê deng e wek.. “xwe, xwê, stû...”.

- Şêwe yê sêyem “dengdar-bê deng-bê deng” e, wata pît a dengdar di destpêkê de ye û piştî wê du pît ên bê deng he ne wek.. “erk, ard, îsk, eşk, ...”.

Wata bingeh a birrgeh a ji cor ê sêyem “bê deng-dengdar-bê deng” e û “bê deng-bê deng-dengdar” e û “dengdar-bê deng-bê deng” e.

4- Pîtek dengdar û sê pît ên bê deng birrgehek e û du şêwe yên wê he ne.

- Şêwe yê yekem “bê deng-dengdar-bê deng-bê deng” e wek: “deng, reng, çend, rind, xewn...”.

- Şêwe yê duyem “bê deng-bê deng-dengdar-bê deng” e wek: “xweş, stûn, stêr...”.

Wata bingeh a birrgeh a ji cor ê çarem “bê deng-dengdar-bê deng-bê deng” e û “bê deng-bê deng-dengdar-bê deng” e.

5- Pîtek dengdar û çar pît ên bê deng birrgehek e. Şêwe yê evê birrgehê weha ye: “bê deng-bê deng-dengdar-bê deng-bê deng”.. ango pît a dengdar dikeve nîvê peyvê de, ku du pît ên bê deng li pêş wê ne û du pît ên bê deng li paş wê ne. Wek: “xwînd, stand, şkeft, şkest, kwarg, ...”. Birrgeh ên ji evî corî kêmin û dem a ku yaniz (zêde) û dirêj jî dibin, şêwe yên wan dihên guherandin û dikevin şêwe yên çarem, sêyem û duyem de wek: dem a ku “xwînd” dibe “xwîndin” êdî “xwîndin” nema li angora birrgeh a pêncem e, ew êdî dihê guherandin û dibe “xwîn-din” ku ji du birrgehan pêk hatiye, ku birrgeh a yekem “xwîn” e û birrgeh a duyem “din” e û birrgeh a “xwîn” li angora bingeh a birrgeh a çarem e û wek şêwe yê wê yê duyem e û birrgeh a

“din” li angora bingeh a birrgeh a sêyem e û wek şêwe yê wê yê yekem e.

Ji evan her pênc cor û şêwe yên birrgeh a dengdar ji me re dihê xuyakirin, ku di ziman ê Kurdî de sê pît ên bê deng bi hev re nahên xwîndin û nivîsandin, herwek çawa du pît ên dengdar jî bi hevdu re nahên xwîndin û nivîsandin. Ew ên ku di nimûneyekê wek “stiran, sitran” de evê peyvê wek “stran” dinivîsin şaşîyê dikin. Ji ber ku ev hersê pît ên bê deng “s,t,r” di ziman ê Kurdî de bi hev re nahên xwîndin û di rêzan a birrgeh a dengdar a ziman ê Kurdî de tine ye. Ango di fonetîk a Kurdî de tine ye. Wek nîşeyek (têbînîyek) jî peyv a “sitran” û “stiran” herdu jî di ziman ê Kurdî de he ne, ku yek ji wan wata ya goranîyê dide û ya din wata ya stiran a hevîr, herîyê û tiştinî din dide. Dibêjin: “hevîr ê xwe baş bistirê”. Ji evê nimûneyê ji me re dihê xuyakirin, ku gerek peyv a “stiran” ji bo wata ya kiryar a stiran a hevîr, herîyê û tiştinî din be û peyv a “sitran” ji bo wata ya goranîyê (song) be. Ango li şûn a em bibêjin “stiranbêj” gerek em bibêjin “sitranbêj”. Ew jî ji ber ku çê nabe ev herdu wata bi yek peyvê bihên pêşkêşkirin û ji ber ku resenî ya peyvê ji bo wata ya goranîyê sitran e û ne stiran e.

Ne tenê birrgeh ên dengdar ên peyvvan dihên derxistin, belê birrgeh ên dengdar ên hemû corekî nivîsandinê jî dihên derxistin. Wek nimûne.. birrgeh ên dengdar ên evan du malik ên helbest a helbestvan û nivîskar Osman Sebrî:

Min divê her tu bilind bî ... al a rengîn kesk û zer

Him xweşî him ceng û rûmet ... tèn zanîn ji sor û gewr

Weha dihên derxistin:

Min/ di/vê /her/ tu/ bi/lind/ bî/ ... al/ a/ ren/gîn/ kesk/ û /zer

Him/ xwe/şî/ him/ ceng/ û /rû/met/ ... tèn/ za/nîn/ ji/ sor/ û / gewr

Di evan herdu malik ên helbestane de çend cor û şêwe yê birrgeh ên dengdar dihên xuyakirin, ku em dikarin wan destnîşan bikin.

Birrgeh a dengdar (kît) ji bo xwîndin û nivîsandin a rast pêwîst e, ji ber ku ew beşekî giring û serekîn ê şîraz a (sistem a) deng e. Ew endazyarî ya deng e. Ew di ziman ê Kurdî de wirdî ya (diqet a) wata yê peyvan destnîşan dike û terazû ya rewanî ya ziman diparêze. Herweha, ew kok û resenî ya peyvan dide nîşandan.

Bingeh a peyv a Kurdî – kirde (awa yê serekîn)

Di evê pirsê de beşekî bingeh a peyv a Kurdî dihê xuyakirin, ne pêkhat a peyv a Kurdî dihê xuyakirin. Bingeh a peyvê û pêkhat a peyvê du pirs ên ji hevdu cuda ne. Bingeh a peyvê girêdayî ewan stûnan e yê ku peyv bi wan û li ser wan ava dibe, belê pêkhat a peyvê ji pîtan, kîtan û parçe yê din ên peyvê ye û ji peyv ên girêdayî hev in. Em di peyv a “dixwînim” de bingeh a peyvê ji amraz ê “di” û kok a “xwîn” û kirde yê bûyîne “im” dibînin. Di peyv a “hilgirt” de pêkhat a peyvê ji “hil” û “girt” e. Di peyv a “dixwînim” de kok a peyvê bi xwe “xwîn” e û wek nimûne.. avanî ya wê di dem a amad de weha ye ku amraz ê “di” dibe pêşkok a peyvê û kirde yê bûyîne “im” dibe paşkok a peyvê. Di bingeh a peyv a Kurdî de herdem pêşkok û paşkok ne biyaş in (ne sabit in) ji ber ku ew girêdayî dem a kêsanê ne û girêdayî cor ê bernam û kirdedar in. Ev avanî ye, ango dîyarbûn a bingeh e. Belê di peyv a “hilgirt, hilgirtin” de, em li beramber peyvekê ne ku ji “hil” û “girt, girtin” pêkhatî ye, ango em li vir li beramber pêkhat a peyvê ne.

Wek diristbûn a birrgeh a dengdar, avabûn û bingeh a peyvê jî pirsek giring e. Ew bi xwe jî gerek di nav rûpell ên perrtûkek a taybetî de bihê şirovekirin, da ku hemû taybetmendî yê wê (avabûn û bingeh a peyvê) bihên destnîşankirin û dîyarkirin. Ev babet ê han beşekî lêkolîn a li ser peyv a Kurdî ye û taybetmendî û şêwe yê diristbûn a peyv a Kurdî di dem a peyivîne (kêsanê) de dide nîşandan. Avabûn a peyvê wata dîyarbûn a bingeh a peyvê ye, ka li ser çî stûnan dihê avakirin û bi çî awayî dihê şîrazkirin (tenzîmkirin). Di evê delîve ya kurt de alîyekî evê bingehê bi giştî û bi kurtî dihê pêşkêşkirin.

Bingeh a peyv a Kurdî di awa yê xwe yê serekîn de bi giştî

weha ye, ku jê re pêşkok, kok û paşkok he ye. Ango di dem a kêsanê de ji her peyvekê re kokek he ye, kok a peyvê parztî ye, pêşkok jê re he ye û paşkok jê re he ye û ew herdu di kêsanê de dihên guherandin, belê kok dimîne û nahê guherandin. Kok jî gerek nehê guherandin, ji ber ku ew bingeh û binetar a peyvê ye û ew wata ya peyvê destnîşan dike. Ev awa yê han ê bingeh a peyv a Kurdî, awa yê serekîn e û di evî awayî de gelek taybetmendî yên ziman dihên xuyakirin. Ev rewş a awa yê serekîn, di dem a amad û ayinde de biyaş e (sabit e, cihgîr e) belê di dem a mêjîn de ev bingeh nahê dîtîn, ango di dem a mêjîn de kok a peyvê û paşkok tenê dimînin û kok parztî ye, pêşkok namîne û paşkok li angora dem a kêsanê dibe. Belê pêşkok a peyvê di kêsan a dem a mêjîn a xayan (berdewam) de he ye, wek: “min kar dikir, min name dinivîsandin, te hinar dixwarin, wî/wê perrtûk dixwîndin, ...”.

Ango di awa yê serekîn ê bingeh a peyv a Kurdî de kirde ji pêşkok, kok û paşkokê pêk dihê û di dem a amad û ayinde de kok a peyvê dihê naskirin. Di dem a amad de pêşkok a peyvê (kirde) amraz ê “di” ye, kok parztî ye û paşkok a kirde li angora bernam, kirdedar û dem a kêsanê ye.

Di dem a mêjîn de pêşkok a kirde di kêsan a dem a mêjîn a nêzîk, gurah û dûr de namîne û paşkok jî amraz ên girêdayî bernam, kirdedar û dem a kêsanê ne, belê di kêsan a dem a mêjîn a xayan (berdewam) de dîsan amraz ê “di” dibe pêşkok a kirde.

Di dem a ayinde de pêşkok a kirde amraz ê “bi” ye, kok parztî ye û paşkok li angora bernam, kirdedar û dem a kêsanê ye.

Di dem a xizavê (imperatve) jî de pêşkok amraz ê “bi” ye û paşkok ji bo heyvêz a tak amraz ê “e” ye û ji bo heyvêz a kom amraz ê “in” e.

Di evê nimûneyê de ev herçar dem ên kêsanê û taybetmendî

yên xwe dîyar dibin:

- Di dem a amad de: “ez dinivîsim, tu dinivîsî, ew dinivîse, em dinivîsin, hûn dinivîsin, ewan dinivîsin” xuya dibe ku amraz ê “di” pêşkok a kirde ye, peyv a “nivîs” kok e û paşkok ji bo bernam ê ez “im” e, ji bo bernam ê tu “î” ye, ji bo bernam ê ew “e” ye, ji bo bernam ên em, hûn û ewan jî “in” e.

- Di dem a mêjîn a nêzîk de: “min nivîsand, te nivîsand, wî/wê nivîsand, me nivîsand, we nivîsand, wan nivîsand in” xuya dibe ku pêşkok a kirde tine ye, kok “nivîs” e û paşkok amraz ê diristkirin a dem a mêjîn a nêzîk “and” e.

- Di dem a mêjîn a gurah de: “min nivîsandiye, te nivîsandiye, wî/wê nivîsandiye, me nivîsandiye, we nivîsandiye, wan nivîsandinê” xuya dibe ku pêşkok a kirde tine ye, kok “nivîs” e û paşkok amraz ê diristkirin a dem a mêjîn a gurah “andiye” ye, belê bi bernam ê kom “wan” re ev amraz dibe “andine”.

- Di dem a mêjîn a dûr de: “min nivîsandibû, te nivîsandibû, wî/wê nivîsandibû, me nivîsandibû, we nivîsandibû, wan nivîsandibûn” xuya dibe ku pêşkok a kirde tine ye, kok “nivîs” e û paşkok amraz ê diristkirin a dem a mêjîn a dûr “andibû” ye, belê bi bernam ê kom “wan” re ev amraz dibe “andibûn”.

- Di dem a mêjîn a xayan de: “min dinivîsand, te dinivîsand, wî/wê dinivîsand, me dinivîsand, we dinivîsand, wan dinivîsandin” xuya dibe ku pêşkok amraz ê “di” ye, kok “nivîs” e û paşkok amraz ê diristkirin a dem a mêjîn a xayan “and” e, belê bi bernam ê kom “wan” re ev amraz dibe “andin”.

Wek nîşe (têbînî) jî, amraz ên ku kêsan ên dem a mêjîn dirist dikin gelek in û gerek bi awayekî taybetî bihên şirovekirin.

- Di dem a ayinde de: “ez dê binivîsim, tu dê binivîsî, ew dê binivîse, em dê binivîsin, hûn dê binivîsin, ewan dê binivîsin” xuya dibe ku pêşkok amraz ê “bi” ye, kok “nivîs” e û paşkok ji

bo bernam ê ez “im” e, ji bo bernam ê tu “î” ye, ji bo bernam ê ew “e” ye, ji bo bernam ên em, hûn û ewan “in” e.

Ev bingeh a weha di dem a kêsanê de dîyar dibe, ku di evan çend nimûne yên han ên bi lez de dihê zanîn û pê re jî, bingeh a dirist a evan çend peyvên dihê zanîn:

- **Dixwînim:** ev peyv a han di dem a amad de ye û em dibînin ku amraz ê “di” yê ku dibe pêşkok a peyvê, di destpêk a peyvê de ye û ev amraz ê han (di) di dem a amad de dibe pêşkok a peyvê. Kok a evê peyvê “xwîn” e û paşkok a wê jî kirde yê bûyînê “im” e. Bê goman ev nimûne ya han wek hevek weha ye: “ez perrtûkê dixwînim” ku kirde yê bûyînê “im” girêdayî kes ê yekem ê tak e. Di dirêjî ya kêsan a evê nimûneyê de, di dem a amad de û bi hemû bernaman û kirdedaran re weha dibe: “ez dixwînim, tu dixwînî, ew dixwîne, em dixwînin, hûn dixwînin, ewan dixwînin”. Ango di dem a amad de pêşkok (di) wek xwe dimîne, belê paşkok li angora bernam, kirdedar û dem a kêsanê dihê guherandin. Di nimûne ya “dixwînî” de “di” pêşkok e, belê paşkok “î” ye û kok her wek xwe “xwîn” e. Ev nimûne (dixwînim) di dem a mêjîn de û bi bernam ê “min” re dibe: “min xwînd, min xwîndiye, min xwîndibû, min dixwînd”. Ango pêşkok di kêsan a mêjîn a nêzîk, gurah û dûr de namîne, belê paşkok dimîne û li angora kêsan a demê dibe. Wek nîşeyek (têbînîyek) di vir de xuya dibe, ku kêsan a dem a mêjîn a ku wek “xwend” hatiye naskirin şaş e, ji ber ku kok a evê peyvê “xwîn” e û di dem a mêjîn de parastî ye yan jî gerek parastî be, ji ber ku kok nahê guherandin. Di dem a ayinde de pêşkok a evê peyvê dibe amraz ê “bi” û bi giştî weha ye. Ango ev nimûne di dem a ayinde de dibe: “ez dê bixwînim, tu dê bixwînî, ew dê bixwîne, em dê bixwînin, hûn dê bixwînin, ewan dê bixwînin”. Em dibînin ku di dem a ayinde de kok biyaş e. Di dem a xi-

zav (ferman) de jî “bixwîne, bixwînin” e. Kirde yê “dixwînim” ji jêder a “xwîndin” hatiye, ku amraz ê “in” ê ku jêder çê dike, bi peyvê ve girêdayî ye. Ji xwe heger “in” ji peyvê cuda be kirde yê bûyînê ye. Dem a ku “in” bi peyvê ve girêdayî be peyvê dike jêder, dem a ku jê cuda be kirde yê bûyînê ye û dem a ku wek kirde yê bûyînê bi peyvê ve dihê girêdan, ew ji ber ewê yekê ye ku kirde nikare bê kirde yê bûyînê wata ya xwe bide.

- **Dixwazim:** ev kirde yê han di dem a amad de ye. Jêder a evî kirdeyî “xwaztin” e û ne “xwestin” e, ji ber ku kok a evî kirdeyî “xwaz” e. Amraz ê “di” pêşkok a wî ye û “xwaz” kok a wî ye û “im” paşkok a wî ye. Paşkok a “im” girêdayî kes ê yekem ê tak “ez” e (ez dixwazim). Di kêsan a dem a amad de weha ye: “ez dixwazim, tu dixwazî, ew dixwaze, em dixwazin, hûn dixwazin, ewan dixwazin”. Di kêsan a dem a mêjîn de û di herçar dem ên nêzîk, gurah, dûr û xayana de bi bernamê “min” re weha ye: “min xwazt, min xwaztiye, min xwaztibû, min dixwazt”. Di kêsan a dem a ayinde de weha ye: “ez dê dixwazim, tu dê dixwazî, ew dê dixwaze, em dê dixwazin, hûn dê dixwazin, ewan dê dixwazin”. Di kêsan a xizava (ferman) jî de “bixwaze, bixwazin” e. Di kêsan a dem a mêjîn de wek “xwest” bi kar dihê û ev bi karhînan şaş e, ji ber ku kok di dem a mêjîn de wek xwe dimîne û nahê guherandin. Kok a kirde yê dixwazim “xwaz” e û gerek wek xwe bimîne. Di kokê bi xwe jî de bingeh a watayê he ye û dem a ku kok dihê guherandin, wata jî dihê guherandin. Bi taybetî jî dem a ku kok ji corê xwedî wata ya xwe be.

- **Diveguhêzim:** ev kirde yê han di dem a amad de ye û jêder a wî “veguhaztin” e. Belê di bin barê şaşî ya levakirinê de bûye “veguhastin”. Di zimanê Kurdî de pîta “a” ya jêder di kêsanê de dihê guherandin û dibe “ê”. Ango kok a “veguhaz” di kêsanê de dibe “veguhêz”. Kêsan a dem a amad a evî kirdeyî weha ye:

“ez diveguhêzim, tu diveguhêzî, ew diveguhêze, em diveguhêzin, hûn diveguhêzin, ewan diveguhêzin”. Di kêsan a dem a mêjîn de û bi bernam ê “min” re weha ye: “min veguhazt, min veguhaztiye, min veguhaztibû, min diveguhazt”. Di kêsan a dem a ayinde de weha ye: “ez dê biveguhêzim, tu dê biveguhêzî, ew dê biveguhêze, em dê biveguhêzin, hûn dê biveguhêzin, ewan dê biveguhêzin”. Di kêsan a xizav de jî “biveguhêze, biveguhêzin” e.

- **Dikim:** ev kirde yê han di dem a amad de ye. Aşkira ye ku amraz ê “di” pêşkok e, pît a “k” kok e û kirde yê bûyînê “im” paşkok e û ew girêdayî kes ê yekem ê tak e. Di kêsanê de û bi bernaman û kirdedaran re dibe: “ez dikim, tu dikî, ew dike, em dikin, hûn dikin, ewan dikin”. Di dem a ayinde de dibe “bikim” ango pêşkok di dem a ayinde de “bi” ye û di kêsanê de dibe: “ez dê bikim, tu dê bikî, ew dê bike, em dê bikin, hûn dê bikin, ewan dê bikin”. Di dem a mêjîn de û bi bernam ê “min” re ev kirde yê han dibe “min kir, min kiriye, min kiribû, min dikir”. Jêder a evî kirdeyî “kirin” e, ku amraz ê jêder “in” bi kok a peyvê ve girêdayî ye, da ku wê bike jêder. Di dem a ayinde de weha ye: “ez dê bikim, tu dê bikî, ew dê bike, em dê bikin, hûn dê bikin, ewan dê bikin”. Di dem a xizavê de weha ye: “bike, bikin”.

- **Dixwim:** ev kirde di dem a amad de ye. Pêşkok a evê peyvê “di” ye, kok a wê “xw” ye û paşkok a wê “im” e û ew girêdayî kes ê yekem ê tak e. Kok di peyvek a weha de watayê nade û tenê pîtek an du û bêtir e. Di kêsan a dem a amad de û bi bernaman û kirdedaran re weha dibe: “ez dixwim, tu dixwî, ew dixwe, em dixwin, hûn dixwin, ewan dixwin”. Di dem a ayinde de dibe “bixwim” ku pêşkok dibe “bi” kok wek xwe “xw” dimîne û paşkok “im” e. Di kêsanê de û bi bernaman û kirdedaran re dibe: “ez dê bixwim, tu dê bixwî, ew dê bixwe, em dê

bixwin, hûn dê bixwin, ewan dê bixwin”. Di dem a mêjîn de û bi bernam ê “min” re ev kirde dibe “min xwar, min xwariye, min xwaribû, min dixwar”. Jêder a evê peyvê “xwarin” e, ku amraz ê jêder “in” bi peyvê ve girêdayî ye. Di dem a ayinde de dibe “ez dê bixwim, tu dê bixwî, ew dê bixwe, em dê bixwin, hûn dê bixwin, ewan dê bixwin”. Di dem a xizavê de jî dibe “bixwe, bixwin”.

- **Divexwim:** ev kirde di dem a amad de ye. Ew di ziman ê gell de wek “vedixwim” dihê gotin û weha li angora rêziman şaş e, ji ber ku wata ya peyv a “vedixwim” ango dîsan dixwim. Ji ber ku jêder a evî kirdeyî “vexwarin” e û pêşgir a “ve” di evê nimûneyê de ji kok a peyvê ye û nema pêşgir e (nema prefix e). Naskirî ye ku amraz ê “ve” pêşgir e û bi wata ya “dîsan, ji nû ve” dihê. Belê di nimûne ya “vexwarin” de ya ku jêder a kirde yê “divexwim”e, ji kok a peyvê ye. Di evê peyvê de amraz ê “di” pêşkok e, kok a peyvê “vexw” ye û ew watayê nade û kirde yê bûyînê “im” paşkok e. Di kêsanê de, bi bernaman û kirdedaran re û di dem a amad de weha dibe: “ez divexwim, tu divexwî, ew divexwe, em divexwin, hûn divexwin, ewan divexwin”. Di kêsan a dem a ayinde de pêşkok dibe “bi” kok wek xwe “vexw” dimîne û paşkok “im” e û girêdayî kes ê yekem ê tak e. Di kêsanê de û bi bernaman û kirdedaran re û di dem a ayinde de weha dibe: “ez dê bivexwim, tu dê bivexwî, ew dê bivexwe, em dê bivexwin, hûn dê bivexwin, ewan dê bivexwin”. Di kêsan a dem a mêjîn de û bi bernam ê “min” re dibe “min vexwar, min vexwariye, min vexwaribû, min divexwar”. Di dem a xizavê jî de dibe “bivexwe, bivexwin”.

- **Dirawestim:** ev kirde di dem a amad de ye. Jêder a evî kirdeyî “rawestan” e. Ango pêşgir a “ra” bûye ji kok û wata ya peyvê û amraz ê “an” jêder çê dike û bi peyvê ve girêdayî ye. Ev peyv

di ziman ê gell de wek “radiwestim” dihê gotin û weha li angora rêziman şaş e, ji ber ku pêşgir a “ra” di evê nimûneyê de bûye ji kok û wata ya jêder a “rawestanê”. Ango “ra” ji kok û wata ya peyvê ye. Pêşkok a evê peyvê “di” ye, kok a wê “rawest” e û paşkok a wê “im” e û girêdayî kes ê yekem ê tak e. Di dem a kêsanê de û bi bernaman û kirdedaran re û di dem a amad de weha dibe: “ez dirawestim, tu dirawestî, ew diraweste, em dirawestin, hûn dirawestin, ewan dirawestin”. Di dem a ayinde de weha dibe: “ez dê birawestim, tu dê birawestî, ew dê biraweste, em dê birawestin, hûn dê birawestin, ewan dê birawestin”. Di kêsan a dem a mêjîn de û bi bernam ê “ez” re weha dibe: “ez rawestam, ez rawestame, ez rawestabûm, ez dirawestam” an jî “ez rawestiyam, ez rawestiyame, ez rawestiyabûm, ez dirawestiyam” û bi evî kirdeyê han re bernam ê “ez” di dem a mêjîn de nabe “min” û şirovekirinek taybetî ji evê pirsê re dihê xwaztin.

- **Dihilgirim:** ev kirde yê han di dem a amad de ye. Jêder a evî kirdeyî “hilgirtin” e. Di ziman ê gell de dibe “hildigirim” û weha li angora rêziman şaş e, ji ber ku pêşgir a “hil” di evan nimûne yên weha de ji kok a peyvê ye. Ev nimûne jî wek nimûne yên din di dem a amad de pêşkok a “di” distîne, kok “hilgir” e û paşkok “im” e û girêdayî kes ê yekem ê tak e. Di dem a kêsanê de, di dem a amad de û bi bernaman û kirdedaran re weha dibe: “ez dihilgirim, tu dihilgirî, ew dihilgire, em dihilgirin, hûn dihilgirin, ewan dihilgirin”. Di dem a ayinde de dibe: “ez dê bihilgirim, tu dê bihilgirî, ew dê bihilgire, em dê bihilgirin, hûn dê bihilgirin, ewan dê bihilgirin”. Di dem a mêjîn de û bi bernam ê “min” re dibe “min hilgirt, min hilgirtiye, min hilgirtibû, min dihilgirt”. Di dem a ayinde de dibe “ez dê bihilgirim, tu dê bihilgirî, ew dê bihilgire, em dê bihilgirin, hûn dê bihilgirin, ewan dê bihilgirin”.

Di dem a xizavê jî de dibe “bihilgire, bihilgirin”.

Wek binçînek (qayideyek) giştî ji me re xuya dibe, ku peyv a Kurdî bi giştî di dem a kêsanê de li ser sê bingeh ên serekîn “pêşkok, kok, paşkok” ava dibe. Di dem a mêtînan de jî û di hersê dem ên nêzîk, gurah û dûr de dibe du bingeh ên serekîn “kok, paşkok” ji ber ku amraz ê dem a amad ê ku di destpêk a peyvê de dihê – ku bi xwe amraz ê dîyarkirin a xayandinê jî ye – ne pêwîst e û nabe ku bi evan hersê deman re bihê, belê ew bi kêsan a dem a mêtînan a xayan re dihê. Xuya ye ku taybetmendî ya dem ên mêtînan ên nêzîk, gurah û dûr di ziman ê Kurdî de ew e, ku amraz ê xayandinê (berdewambûnê) pê re nahê, da ku bihê zanîn ku ev dem ne dem a xayandinê ye û ne dem a niha ye.

Di evê delîveyê de hatiye pêşînyarkirin ku nam ên herçar dem ên bingehîn ên kêsanê weha bin: amad (nihayî, dem a niha) – mêtînan (derbasbûyî, dem a buhurî) – ayinde (mand, dem a bihê) û xizav (ferman). Ango nam ên herçar dem ên serekîn ên kêsanê “amad, mêtînan, ayinde û xizav” bin.

Kirde ji jêder dihê kêsankirin û jêder bi xwe jî ji kok a kirde yê kêsan a dem a mêtînan a nêzîk çê dibe û dihê hafirandin, ku kok a kirde yê dem a mêtînan a nêzîk amrazekî jêder pê ve dihê girêdan. Jêder bi xwe peyvek serrast e û beş ên wê ji hev nahên cudakirin. Dem a ku di dem ên amad, mêtînan, ayinde û xizav de jî dihê kêsankirin, amraz ê “di” di dem a amad de pêşkok a kirde ye û divê weha be, di dem a mêtînan a nêzîk, gurah û dûr de pêşkok a kirde tine ye belê di dem a mêtînan a xayan de pêşkok a kirde dîsan amraz ê “di” ye, di dem a ayinde de pêşkok a kirde amraz ê “bi” ye û divê weha be û di dem a kêsan a xizavê jî de amraz ê “bi” pêşkok a kirde ye.

Ev alavînan a han (ev mekanizm a han) di ziman ê Kurdî de biyaş

e (sabit e) û surîşt a zîman ê Kurdî weha ye. Belê ev surîşt a han di bin bar ê levakirin a bê şîraz (bê tenzîm) de dişkê û ji rêzan û awa yê xwe yê rêzîmanî diderkeve. Wek nimûne.. kirde yê “diderkeve” divê ne wek “derdikeve” be, ji ber ku “derdikeve” li derveyî surîşt a zîman ê Kurdî ye. Ev kirde yê han ji jêder a “derkevtin” e û “derkevtin” peyvek e ku nabe bihê parçekirin û li angora kêsan a deman, amraz ên pêdivê lê bihên yaniz-kirin (zêdekirin). Ango jêder a “derkevtin” di kêsan a dem a amad de dibe: “ez diderkevim, tu diderkevî, ew diderkeve, em diderkevin, hûn diderkevin, ewan diderkevin”.. di dem a mêjîn a nêzîk, gura, dûr û xayana de û bi bernamê “ez” re dibe: “ez derkevtim, ez derkevtimê, ez derkevtibûm, ez diderkevtim”.. di dem a ayinde de dibe: “ez dê biderkevim, tu dê biderkevî, ew dê biderkeve, em dê biderkevin, hûn dê biderkevin, ewan dê biderkevin”.. di dem a xizavê jî de dibe: “biderkeve, biderkevin”. Bi evî awayî, beşê peyvê zîman û kêsan a zîman cihê xwe yê rast û pêdivê digirin.

Bingeh a peyv a Kurdî – kirde (awa yê alîkar)

Di şêwazê alîkar de yê bingeh a peyv a Kurdî û wek nimûne.. jêder a “kirin” û kêsan ên xwe yê di herçar deman de – amad, mêjîn, ayinde û xizav – di hevekê de bi kirde re alîkar e û heyvêz a kirde bi alîkarî ya wê dirist û serrast dibe. Jêder a “kirin” di kêsan a dem a amad de û bi bernamê “ez” re dibe: “ez dikim”. Di kêsan a dem a mêjîn de û di herçar kêsan “nêzîk, gurah, dûr û xayan” de dibe: “min kir, min kiriye, min kiribû, min dikir”. Di kêsan a dem a ayinde de dibe: “ez dê bikim” û di kêsan a dem a xizavê de dibe: “bike, bikin”. Ev parzadê ku ji jêder a “kirin” diderkevin, bi peyv a daxwazkirî re dibin alîkar da ku heyvêz a kirde di hevekê de dirist bibe. Ew peyv jî yan nam e, rewş e, pergale e yan kirdeyekî weha ye, ku bêyî jêder a “kirin” û parzadê wê nikare wata ya xwe ya daxwazkirî bide.

Di nimûne ya “kar li kargehê dihê kirin” de, jêder a “kirin” bi kirde yê “dihê” re ji bo serrastkirin a kirde alîkar e. Di evê nimûneyê de, bêyî jêder a “kirin” kirde wata ya xwe ya serrast nade, ango “kar li kargehê dihê ...” kêma e û bi alîkarî ya jêder a “kirin” wata gurah (kamil) dibe. Ev heyvêz a diristkirin a kirde û bingeh a kirde, heyvêz a alîkar e. Ango bi alîkarî ya jêder a “kirin” û kêsan ên wê, kirde di hevekê de dihê avakirin û diristkirin û bi wata dibe.

Peyv a daxwazkirî di hevekê de ew peyv e ya ku bi alîkarî ya jêder a “kirin” û her jêder a din kirde dirist dike, herweha ew kirde ye yê ku bi alîkarî ya jêder a “kirin” û her jêder a din, wata ya xwe ya kirdeyê dide. Wek nimûne.. di hevek a “ez dê evî kevalî reng bikim” de, peyv a dihê xwaztin ku ew bibe kirde yan gerin a (rol a) kirde bibîne “reng” e û ew nam e. Nimûne ya “evî derî yê han sor bike.. ew dê derî sor bike” peyv a ku

dihê xwaztin ew bibe kirde “sor” e û ew rewş e. Di nimûne ya “xebatek baş hat kirin” jî de, peyv a daxwazkirî ya ku bi alîkarî ya “kirin” dibe kirde û bi xwe kirdeyekî pêwîstî alîkarî ya jêder a “kirin” e, kirde yê “hat” e.

Di evê nimûneyê de, ev pirs a han di dem ên kêsan a li angora awa yê alîkar ê bingeh a peyv a Kurdî de û bi bernam ê “ez” re dihê xuyakirin:

- Di dem a amad de: “ez te nas dikim”
- Di dem a mêjîn a nêzîk de: “min tu nas kir”
- Di dem a mêjîn a gurah de: “min tu nas kiriye”
- Di dem a mêjîn a dûr de: “min tu nas kiribû”
- Di dem a mêjîn a xayan de: “min tu nas dikir”
- Di dem a ayinde de: “ez dê te nas bikim”
- Di dem a xizavê de: “nas bike, nas bikin”.

Di ziman ê Kurdî de hinek peyv (kirde) he ne tenê li angora awa yê serekîn dihên kêsankirin, hinek peyv (kirde) he ne tenê li angora awa yê alîkar dihên kêsankirin û hinek peyv (kirde) he ne li angora herdu awayan dihên kêsankirin. Wek nimûne.. peyv a “nas” bi herdu awayan jî dihê kêsankirin wek: “ez dina-sim, min nasî, min nasîye, min nasîbû, min dinasî, ez dê bina-sim, binase, binasin” û ev li angora awa yê serekîn e. Herweha “ez nas dikim, min nas kir, min nas kiriye, min nas kiribû, min nas dikir, ez dê nas bikim, nas bike, nas bikin” û ev li angora awa yê alîkar e.

Ji ewan peyvyan, ên ku tenê li angora awa yê alîkar dihên kêsankirin peyv a “kar” e. Ev peyv a giring di dem ên kêsanê de û bi bernam ê “ez” re weha ye:

- Di dem a amad de: “ez kar dikim”
- Di dem a mêjîn a nêzîk de: “min kar kir”
- Di dem a mêjîn a gurah de: “min kar kiriye”

- Di dem a mêjîn a dûr de: “min kar kiribû”
- Di dem a mêjîn a xayan de: “min kar dikir”
- Di dem a ayinde de: “ez dê kar bikim”
- Di dem a xizavê de: “kar bike, kar bikin”.

Bi peyvekê wek “xebat” re, kêsan bi herdu awayan (serekîn û alîkar) dibe, wek: “ez dixebitim, ez xebitîm, ez xebitîme, ez xebitîbûm, ez dixebitîm, ez dê bixebitim, bixebite, bixebitin” û ev awa yê serekîn e. Herweha “ez xebatê dikim, min xebat kir, min xebat kiriye, min xebat kiribû, min xebat dikir, ez dê xebatê bikim, xebatê bike, xebatê bikin” û ev awa yê alîkar e.

Dem a em dibêjin ku di awa yê alîkar de kirde hêz a xwe ji jêder a “kirin” û her jêderê a din diwergire, mebest a me ew e ku kirde di nav hevekê de bi alîkarî ya jêder a “kirin” û her jêderê a din wata ya xwe gurah dike, belê mebest a me ew e jî ku peyv a dihê xwaztin ew gerin a kirde di hevekê de bibîne, bi kêsan ên deman re yên jêder a “kirin” û her jêderê a din, ewê gerinê dibîne. Kêsan ên deman, ên jêder a “kirin” bi bernam ê “ez” re jî; “ez dikim, min kir, min kiriye, min kiribû, min dikir, ez dê bikim” e û di kêsan a dem a xizavê jî de “bike, bikin” e. Peyv a ku dihê xwaztin ew gerin a kirde di hevekê de bibîne, bi yekê ji evan kêsan ên jêder a “kirin” re dihê girêdan. Di nimûneyekê wek “ev jin hevîr dike, evê jinê hevîr kir, evê jinê hevîr kiriye, evê jinê hevîr kiribû, evê jinê hevîr dikir, ev jin dê hevîr bike” de, ji me re xuya dibe ku peyv a dihê xwaztin ew gerin a kirde bibîne peyv û nam ê “hevîr” e, belê peyv a “hevîr” bi alîkarî ya yek ji kêsan ên jêder a “kirin” evê gerinê dibîne, ku ew kêsan jî “dike, kir, kiriye, kiribû, dikir, dê bike” ne. Belê di nimûneyekê wek “ev xebat hat kirin” de, kirde “hat” e û ew bi xwe jî bêyî alîkarî ya jêder a “kirin” nikare di hevekê de watayê gurah bike.

Jêderê a din a ku ew jî wek “kirin” gerin a awa yê alîkar dibîne

û awa yê alîkar dirist dike, jêder a “dayîn” e. Bi heman şêwe yê alîkarî yê “kirin” jêder a “dayîn” jî awa yê alîkar ê bingeh a peyv a Kurdî dirist dike. Wek nimûne.. bi bernam ê “ez” re û di dem a amad de dibe “ez baz didim”.. di herçar dem ên mêjîn de yên nêzîk, gurah, dûr û xayan de dibe “min baz da, min baz daye, min baz dabû, min baz dida”.. di dem a ayinde de dibe “ez dê baz bidim” û di dem a xizavê de dibe “baz bide, baz bidin”.

Jêder a din a ku ew jî wek “kirin” û “dayîn” awa yê alîkar dirist dike, jêder a “bûyîn” e. Bi heman şêwe yê alîkarî yê “kirin” jêder a “bûyîn” awa yê alîkar ê bingeh a peyv a Kurdî dirist dike. Wek nimûne.. bi bernam ê “ez” re û di dem a amad de dibe “ez şad dibim”.. di herçar dem ên mêjîn de yên nêzîk, gurah, dûr û xayan de dibe “ez şad bûm, ez şad bûme, ez şad bûbûm, ez şad dibûm”.. di dem a ayinde de dibe “ez dê şad bibim” û di dem a xizavê de dibe “şad bibe, şad bibin”.

Ango di awa yê alîkar ê bingeh a peyv a Kurdî de, bi kêmanî du pergala bingehîn he ne ku tê de heyvêz a kirde dihê dirist-kirin:

1- Kirde bi alîkarî ya jêderê heyvêz a kirde dirist dikin wek: “dihê kirin, dihê gotin, dihê encamdan, dihê zanîn, ...” .. “hat kirin, hat gotin, hat encamdan, hat zanîn, ...” .. “dê bihê kirin, dê bihê gotin, dê bihê encamdan, dê bihê zanîn, ...”.

2- Kirde û kok a xwe û kirde yê bûyînê heyvêz a kirde dirist dikin wek: “çê dibe, çê bû, dê çê bibe”.. “rast dibe, rast bû, dê rast bibe”.. “çareser dibe, çareser bû, dê çareser bibe”.

Ango di awa yê alîkar ê bingeh a peyv a Kurdî de, kirde pêwîstî alîkarîyê ye da ku wata ya xwe di hevekê de bide û da ku heyvêz a kirde dirist bibe. Kirde di evê bareyê de evê alîkarîyê jî ji jêderê û kirde yê bûyînê diwergire.

- Nîşeyek: di hevekê de û di heyvêz a dem a mêjîn a nêzîk a kom

de şaşîyek mezin dihê kirin, dem a ku kirde bi jêder a alîkar re wek hev dihên nivîsandin. Wek nimûne.. “deh name hatin nivîsandin” û di evê nimûneyê de kirde yê “hatin” şaş hatiye nivîsandin, ji ber ku ew bi xwe jî jêder e – “hatin” jêder e – û gerek ew wek “hat in” bihê nivîsandin da ku kirde be. Ango rastî ya nivîsandin a evê hevekê weha ye: “deh name hat in nivîsandin” û ev pirs a han tenê di heyvêz a dem a mêjîn a nêzîk de weha ye. Ango di dem ên din ên mêjîn de – gurah, dûr û xayana – ev nimûne weha ye: “deh name hatine nivîsandin, deh name hatibûn nivîsandin, deh name dihatin nivîsandin”. Herweha, di heyvêz a dem a mêjîn a nêzîk a tak jî de şaşî he ye, dem a ku ev nimûne weha dihê nivîsandin: “nameyek hate nivîsandin” ji ber ku kirde yê “hate” şaş e. Heyvêz a evî kirdeyî di dem a mêjîn a nêzîk a tak de “hat” e û ne “hate” ye. Di heyvêz a “hate” de pît a “e” yaniz e (zêde ye) û bê wata jî ye.

Peyv a “kirin” jêder e û “kir in” kirde ye

Ti peyv wek evê peyvê di ziman ê Kurdî de şaş ne hatiye û nahê nivîsandin. Bi awayekî weha ku di herdu heyvêzan de (wek jêder û wek kirde) tenê wek “kirin” dihê nivîsandin, bê ku cudayî ya navber a herduyan dîyar bibe. Herweha, dem a ku dihê xwaztin “kirin” a jêder bi peyvê ve jî be da ku jêder dirist bibe, ew wê jê cuda dikin, dem a ku divê ji peyvê cuda be da ku ew alîkar a kirde be jî, wê bi peyvê ve girê didin. Bi awa yê xwe yê wek kirde jî, ango wek “kir in” her nahê nivîsandin û kirde yê “kir in” jî her wek “kirin” dinivîsin û ji me re dibêjin: “ji xwe re hobar bikin” ango “ji xwe re fam bikin”. Ev jî nîşan a ewê yekê ye, ku surîşt a ziman ê Kurdî ne hatiye hobarkirin (ne hatiye famkirin). Gerek ev herdu peyv ji hevdu bihên naskirin û her yek ji wan, di cih ê xwe yê rast de û bi rastî di hevekê de bihên nivîsandin.

Peyv a “kirin” jêder e û pêkhat a wê weha ye, ku ew ji kirde yê dem a mêjîn a nêzîk “kir” û amraz ê diristkirin a jêder “in” hatiye sazkirin. Ew (kirin) di hevekê de bi peyv a ku dihê xwaztin ew bibe jêder ve dihê girêdan û jêder pê dihê hafirandin. Wek nimûne.. di hevek a “armanc a me azadkirin a welat e” de, peyv a “azadkirin” jêder e. Heger ev peyv a ku jêder e wek “azad kirin” bihê nivîsandin, hîngê ev peyv ji pergal ê jêder diderkeve û heger jêderek tê de he be, tenê peyv a “kirin” e. Weha jî mebest a watayê namîne, ji ber ku mebest a watayê ew bûye ku peyv a “azad” bi alîkarî ya peyv a jêderî ya “kirin” bibe jêder. Di hevekê jî de mebest a me ya watayîn ew e, ku em evê peyvê wek jêder bi kar bihînin. Peyv ên “azadkirin, nûkirin, hevkirin, lêkirin, jêkirin, hilkirin, pirrkirin, kêmkirin, mestkirin, xurtkirin, çêkirin, ...” jêder in û di wan de peyv a “kirin” bi pey-

vê ve dihê girêdan, da ku peyv jêder be. Dem a ku “kirin” ji peyvê bihê cudakirin, hîngê nema peyv a daxwazkirî dike jêder û ew bi ten a xwe jêder e. Ev jî di hevekê de bê wata ye, ji ber ku dihêle em di hevekê de li kirde bigerin û kirde tine ye. Heger em bibêjin: “xurt kirin a hizrê bi xwîndin û ezmonan e” em jêder a “kirin” şaş dinivîsin, ji ber ku mebest a watayîn di evê hevekê de ew e ku peyv a “xurt” bi alîkarî ya “kirin” bibe jêder û bi evî awayî, gerek “kirin” bi peyv a “xurt” ve girêdayî be da ku ew mebest a watayîn pêk bihê, ango gerek “xurtkirin” be. Weha, di nimûneyekê wek “ew hat azad kirin” de şaşî he ye, ji ber ku “ez: bername e.. hat: kirde yê ku di biwar ê mebest a watayîn de pêwîstî gurahkirinê ye.. azad: nam e.. kirin: jêder e” û kirde ne gurah e û ne cihgîr e. Rastî ya evê hevekê jî ew e: “ew hat azadkirin” û tê de kirde yê “hat” bi alîkarî ya “kirin” cih ê xwe di hevekê de digire û cihgîr dibe (istiqrar dibe). Heger em bibêjin: “sazmanek hat çêkirin” ango “sazmanek çê bû” û kirde di evê hevekê de “hat” e û “çêkirin” jêder e. Belê heger di evê nimûneyê de peyv a “çê” û “kirin” ji hevdu cuda bibin, hobarî ya (konsept a) jêderbûn a peyv a “çêkirin” namîne. Ji xwe heger “kirin” bikin kirde jî nabe, ji ber ku “kirin” li angora pêkhat û nivîsandin a xwe ya weha jêder e. Weha hat naskirin ku di heyvêz a jêder de – û “kirin” jêder e – jêder a “kirin” bi peyvê ve dihê nivîsandin, da ku ew peyv a daxwazkirî bibe jêder.

Belê di heyvêz a “kir in” de ya ku ew kirde ye, pirsek din he ye. Ew jî ew e ku her “kir in” wek “kirin” dihê nivîsandin û şaşî ev e. Şaşî ew e ku jêder (kirin) û kirde (kir in) wek hevdu bihên nivîsandin. Di biwar ê rêzimanî jî de naskirî ye, ku cih ê jêder di hevekê de ne wek cih ê kirde ye û gerin ên wan jî ne wek hev in. Wek nimûne.. peyv a “çêkirin” jêder e û di heyvêz a

“çê kir in” de kirde ye. Ev heyvêz a han jî (çê kir in) bi bernam û kirdedaran re û di kêsan a dem a mêjîn a nêzik de çê dibe. Dem a em dibêjin: “wan arêşeyek çê kir in, wan arêşe çê kir in” Em di evê hevekê de akincîbûnek watayîn dibînin, belê dem a ew evê hevekê wek “wan arêşe çê kirin” dinivîsin, ev hevek ne akincî ye û di heyvêz a xwe de şaş e, ji ber ku kirde tê de tine ye. Bi şîkarîyê dîyar dibe ku kirde tê de tine ye, çimku “wan: bernam e.. arêşe: nam e.. çê: kirde yê pêwîstî gurahbûnê ye û kirin: jêder e”. Dem a ku kirde di hevekê de weha bêyî alîkarî dimîne, nikare wata ya xwe ya daxwazkirî bide. Ji ber evê yekê rastî ya evê hevekê ev e: “wan arêşe çê kir in”. Di nimûneyekê wek “wan xebat ên xwe xurt kir in” de, her beşekî peyvê di cihê xwe yê rast de ye û dihê naskirin, ka her yek ji ewan beşan çî ye. Belê heger ev hevek wek “wan xebat ên xwe xurt kirin” be, dê bêyî kirde be. Ji ber ku “wan: bernam e.. xebat: nam e.. ên: amraz ê komê û arzû ye.. xwe: bernam ê vajîn e.. xurt: rewş e û kirin: jêder e”. Em di vir de li kirde dipirsin. Rastî ya evê hevekê jî weha ye: “wan xebat ên xwe xurt kir in”.

Jêder û kirde bi mebest û armanc a watayê dihên naskirin. Ango di peyvînê de dihê xuyakirin ka mebest û armanc bi karhînan a jêder e yan bi karhînan a kirde ye. Di evê nimûneyê de “em bi azadkirin a bîr û nerînan re ne” peyv a “azadkirin” jêder e û kirde “ne” ye. Belê di nimûne ya “hukûmetê bîr û nerîn azad kir in” de, kirde “in” e. Şêwaz ê nivîsandin a jêder di evê hevekê de “azadkirin” e û şêwaz ê nivîsandin a kirde di evê hevekê de “azad kir in” e. Şêwaz ê kirde yê “kir in” jî, tenê di kêsan a dem a mêjîn a nêzik û kom de ye û dem a ku pît a dawî ya peyvê (kirde) dengdar be, kirde yê bûyînê tenê wek pît a “n” bi kirde ve ye. Di kêsan a dem a mêjîn a gurah de amraz ê “in” li angora heyvêz a “ine” bi kirde ve ye, wek: “wan welat ên xwe

azad kirine” û di kêsan a dem a mêjîn a xayan jî de, amraz ê “in” bi kirde ve ye, wek: “wan welat ên xwe azad dikirin”.

Hinek nimûne yên ku evê pirsê bêtir didin xuyakirin:

- Ez ji kar ê komkirin a wêneyan hez dikim.. min hezar wêne kom kir in. Peyv a “wêne” kom e û amraz ê komê “in” evê yekê nîşan dide. Hevek a “min hezar wêne kom kir in” li angora kêsan a dem a mêjîn a nêzîk e.

- Tu naskirin a surîşt a zimanan giring dibînî.. te deh ziman nas kir in. Peyv a “ziman” kom e û amraz ê komê “in” evê yekê dide nîşandan. Hevek a “te deh ziman nas kir in” li angora kêsan a dem a mêjîn a nêzîk e.

- Em çûn seredan a baxçe yê bajêr.. ewan li hev kom bûn. Ev hevekana li angora kêsan a dem a mêjîn a nêzîk in û tê de ji amraz ê komê û kirde yê bûyînê “in” ê bi kirde yên “çûn, bûn” re, tenê pît a “n” maye ji ber ku pît a dawî ya evan herdu kirdeyan dengdar e (çû, bû).

- Ew bi kar ê paqijkirinê dirabe.. wî/wê sê jûr paqij kir in. Hevek a “wî/wê sê jûr paqij kir in” li angora kêsan a dem a mêjîn a nêzîk e.

- Em kar ê bergkirin a perrtûkan dikan.. me deh perrtûk bi berg kir in. Hevek a “me deh perrtûk bi berg kir in” li angora kêsan a dem a mêjîn a nêzîk e.

- Hûn têrkirin a hejaran dixwazin.. we gelek hejar têr kir in. Hevek a “we gelek hejar têr kir in” li angora kêsan a dem a mêjîn a nêzîk e.

- Ewan avakirin a xanîyekî dan ser mil ên xwe.. wan xanîyek ava kir in, wan xanî ava kir in. Di nimûne ya yekem de peyv a “xanîyek” tak e û tê de kirde girêdayî kirdedar e û di nimûne ya duyem de peyv a “xanî” bi amraz û kirde yê bûyînê “in” bûye kom û bi berkirde ve hatiye girêdan, her wek çawa bi kirdedar

ve jî girêdayî ye.

Di zanist a ziman de girêdanek xurt di navber a rêziman û rênivîsê de he ye û ji hevdu cuda nabin. Ji ber evê yekê çê nabe em bibêjin; ku “kirin” a wek jêder û “kirin” a wek kirde bi ho-barîyê (bi famkirinê) ji hevdu dihên naskirin. Tiştêkî weha di nexşe ya zimanan de tine ye û heger ev nexşe ya çewt di hinek ziman ên lawaz de he be jî, belê ew bê goman di ziman ê Kurdî de tine ye û gerek tine be. Di ziman ê Kurdî de her beşekî ziman li angora xwe û taybetmendî ya xwe dihê naskirin û bi awayekî wird (deqîq) jî, cih ê xwe di hevekê de digire û bi nivîsandinê dihê xuyakirin. Her beşekî ziman ê Kurdî xwe dide hobarkirin û heger nivîsandin şaş be, beş ên ziman ê Kurdî jî şaş dibin. Ango heger rênivîs şaş be, rêziman jî şaş dibe.

Peyv a “hebûn” jêder e û “he bûn” kirde ye

Di pirranî ya nivîsandin ên Kurdî de – heger em nebêjin di hemûyan de – ev herdu peyv ji hevdu nahên naskirin. Ango jêder û kirde wek hevdu dinivîsin û ev şaşîyek rêzimanî ye. Peyv a “hebûn” hem wek kirde bi kar dihînin û hem wek jêder bi kar dihînin û rêziman evê tevhevîyê napejirîne. Dibêjin: “gelek zarok ên zîrek di dibistan a me de hebûn” û dibêjin: “hebûn a zarok ên zîrek nîşan a hebûn a perwerdeyek a baş e”.

Di evan herdu nimûne yên li jor de, peyv a “hebûn” hem kirde ye û hem jêder e û ev ne rast e. Ev peyv di nimûne ya yekem de kirde ye û gerek kirde be, belê di nimûne ya duyem de jêder e û gerek jêder be. Belê dem a ku kirde be gerek “he bûn” be û dem a ku jêder be gerek “hebûn” be. Ew ên ku weha dinivîsin ji me re dibêjin: “ji xwe re nas bikin ka kîjan kirde ye û kîjan jêder e !” û ev hevek a han (ji xwe re nas bikin...) di biwar ê rêziman de gelek şaş e, ji ber ku berî her tiştî ne zanistî ye. Rêziman dibêje ku heyvêz a kirde ne wek heyvêz a jêder e. Di rêziman de her peyvek li angora taybetmendî yên sazûn a xwe dihê naskirin. Di nimûne ya “gelek zarok ên zîrek di dibistan a me de he bûn” de peyv a “he bûn” kirde yê dem a mêjîn a nêzîk e. Di nimûne ya “hebûn a zarok ên zîrek nîşan a hebûn a perwerdeyek a baş e” de, peyv a “hebûn” jêder e. Ji ber ku “he bûn” kirde yê dem a mêjîn a nêzîk e û kom e û “hebûn” jêder e. Em dibêjin “gelek perrtûk li nik me he bûn” û “dibe ku hebûn a perrtûkan nîşan a çandedarîyê be”. Di nimûne ya yekem de “he bûn” kirde ye û di nimûne ya duyem de “hebûn” jêder e.

Her bi evî awayî û li angora evê şaşîyê dibêjin: “bûn û nebûn a bêhvan tiştî wek hevdu ye” û “bûn” û “nebûn” jî kirde ne û ne jêder in. Di hevekê jî de mebest bi karhînan a jêder e. Ango

yê ku dibêje “bûn û nebûn” dixwaze ji me re jêder bide nîşandan û ew bi xwe li angora rêziman kirde ne û ne jêder in. Ango yê ku weha dibêje dixwaze ji me re jêder bide xuyakirin, belê kirde bi kar dihîne û ev nezanîn e. Peyv a “bûn” kirde yê kom ê dem a mêjîn a nêzîk e. Em dibêjin “em zarok bûn, hûn cotkar bûn, ewan zana bûn” û weha peyv a “bûn” kirde ye û ne jêder e. Jêder a evê peyvê jî “bûyîn” e û weha rastî ya destewaje ya “bûn û nebûn” bi awa yê “bûyîn û nebûyîn” e.

Ev pirs a han ji me re baş di kêsanê de xuya dibe. Dem a em jêder a “hebûn” di herçar dem ên mêjîn de, bi bernam ên komê “em, hûn, ewan” re kêsan dikin weha dibe:

- Di dem a mêjîn a nêzîk de: “em he bûn, hûn he bûn, ewan he bûn” û “he bûn” kirde ye.

- Di dem a mêjîn a gurah de: “em hebûne, hûn hebûne, ewan hebûne” û “hebûne” kirde ye û di evê heyvêzê de kok a kirde yê “he” û “bûne” bi hevdu ve girêdayî ne.

- Di dem a mêjîn a dûr de: “em hebûbûn, hûn hebûbûn, ewan hebûbûn” û “hebûbûn” kirde ye û tê de kok a kirde yê “he” bi “bûbûn” ve girêdayî ye.

- Di dem a mêjîn a xayan de: “em dihebûn, hûn dihebûn, ewan dihebûn” û “dihebûn” kirde ye. Di dem a mêjîn a xayan de amraz ê “di” pêkhat ên evê peyvê bi hev ve girê dide û ev taybetmendî ya kêsan a evê demê ye.

Jêder a “nebûyîn” a ku hatiye nayînkirin jî, weha dihê kêsankirin: “ez ne bûm, ez ne bûme, ez ne bûbûm, ez ne dibûm”.. “tu ne bûyî, tu ne bûye, tu ne bûbû, tu ne dibû”.. “ew ne bû, ew ne bûye, ew ne bûbû, ew ne dibû”.. “em ne bûn, em ne bûne, em ne bûbûn, em ne dibûn”.. “hûn ne bûn, hûn ne bûne, hûn ne bûbûn, hûn ne dibûn”.. “ewan ne bûn, ewan ne bûne, ewan ne bûbûn, ewan ne dibûn”. Ango:

- Di dem a mêtîn a nêzîk de: “em ne bûn, hûn ne bûn, ewan ne bûn” û “ne bûn” kirde ye.

- Di dem a mêtîn a gurah de: em ne bûne, hûn ne bûne, ewan ne bûne” û “ne bûne” kirde ye.

- Di dem a mêtîn a dûr de: “em ne bûbûn, hûn ne bûbûn, ewan ne bûbûn” û “ne bûbûn” kirde ye.

- Di dem a mêtîn a xayana de: “em ne dibûn, hûn ne dibûn, ewan ne dibûn” û “ne dibûn” kirde ye. Di dem a mêtîn a xayana de amraz ê nayînê “ne” ji peyvê cuda dibe û cuda dihê nivîsandin, ji ber ku kirde bi amraz ê “di” dest pê dibe û amraz ê “di” li angora bingeha peyv a Kurdî, di destpêka peyvê de ye û ti amraz ên din berî wî nahên. Heger amraz ê “di” di destpêka peyvê de bimîne, ti amraz ên din nakevin pêşî ya peyvê de û heger nemîne, hîngê dibe ku amrazinê din bi peyvê ve bihên girêdan.

Engîz a ku hîştîye ev şaşî di nivîsandin a peyv a “he bûn” de çê bibe, ew e ku amraz ê “ûn” wek amraz ê diristkirin a jêder hatiye naskirin û ev jî şaşîyek din e. Şîkarî ya peyv a “bûn” ew e, ku ev kirde yê dem a mêtîn a nêzîk, ji kok a kirde yê “bû” û amraz ê komê “in” pêk hatiye. Belê ji ber ku pît a dawî ya peyv a “bû” dengdar e, amraz ê “in” tenê wek pît a “n” maye û ev pirs di zimanê Kurdî de he ye û li angora surîşt a zimanê Kurdî ye. Peyv a “hebûn” jî jêder e, ji ber ku ew ji kok a kirde yê dem a mêtîn a nêzîk “he bû” û serwazkirin a (îzafekirin a) amraz ê diristkirin a jêder “in” pêk hatiye. Di zimanê Kurdî jî de, heyvêz a jêder ji nam û kok a kirde yê dem a mêtîn a nêzîk û serwazkirin a amraz ê diristkirin a jêder pêk dihê û çê dibe.

Peyv a “xayan” angu “berdewam” e

Di pirranî ya ferheng ên rojhilat a Kurdistanê û başûr ê Kurdistanê de û bi taybetî jî di ferheng a “HenbaneBorîne” ya Hejar Mukrîyanî, ferheng a “Xal” a Şêx Muhemmed ê Xal û ferheng a “Mehabad” a Gîwî Mukrîyanî de, peyv a “xayandin” wata yên “pêçûn a demê, mezaxtin a demê, dirêjî ya demê û berdewamîyê” dide. Ji bo evan watayan jî, li bakur ê Kurdistanê û li rojava ya Kurdistanê destewaje ya “pê ve diçe” bi kar dihê. Ev destewaje jî, bi wata û şirove ya “pêçûn a demê” re yek e û pê re hevpar e.

Hemû ev wata yên destnîşankirî, şirove yên peyv a “berdewam” in. Her kes jî dizane ku peyv a “dewam” Erebi ye, belê ew peyv a “ber” a ku di ziman ê Kurdî de hem pêşgir e û hem paşgir e, bi “dewam” a Erebi ve girê dane da ku wata ya “mudaweme, continuity” bide. Belê pêşgir û paşgir a “ber” evê gerinê di evê peyvê de nabîne. Pêşgir û paşgir a “ber” di ziman ê Kurdî de wata yên “lê, li ser, jê, ji ser, pêş, nik” dide, wek “himber” angu li pêş e û di rû de ye, wek “berpirs” angu pirs li ser e û jê ye, wek “fermanber” angu yê ku xizav (ferman) li ser e û wek “berhingar” angu yê ku li nik û li alî yê dijber diraweste. Weha, peyv a “ber” a ku gerin a pêşgir û paşgir jî dibîne, bi peyv a “dewam” a Erebi re wata ya “li nik dewamê, li pêş dewamê û ji dewamê” dide û weha jî, ew wata ya daxwazkirî nade. Wata ya daxwazkirî ya ji peyv a “berdewam” şirove ya “pêçûn a demê” ye. Angu ka çiqas dem dihê xwaxtin ku derbas bibe. Ev wata ya han jî, di peyv a “xayan, xayandin” de bi dest dikeve. Belê mixabin ku ev pirs wek xwe ne hatiye zanîn.

Peyv a “xayandin” jêder e û ew di kêsan a nav gell de wek “dexayênê, xayand, bixayênê” bi kar dihê û bê goman ew li

angora zarav a rojhilatî û başûrî ye. Mixabin nahê zanîn ku ev peyv li şûn a “dewam, domandin” a Erebi ye. Ev peyv a han li angora ziman ê Kurdî û di dem ên amad, mêjîn, ayinde û xizav de û bi bernam ê “ez” re weha ye: “ez dixayênim.. min xayand, min xayandiye, min xayandibû, min dixayand.. ez dê bixayênim.. bixayêne.. bixayênin”. Jêder a evî kirdeyî “xayandin” e û “xayan” nam û kok a kirde ye.

Bi taybetî jî di ferheng a “Mehabad” a Gîwî Mukrîyanî de, wata ya “idame, berdewamî” ji peyv a “xayandin” re hatiye danan û ev gelek rast e. Wata ya evê peyvê di nav gell de “pêçûn a demê û maweyê” ye û nahê zanîn, ku pêçûn a demê û maweyê bi xwe berdewamî yan domandin e. Dibêjin: “du roj dexayêne heta em kare tewaw bibê” ango “du roj pê ve diçin heta ku ev kar bi dawî bibe” ango du roj berdewam dikin (an dom dikin) heta ku ev kar bi dawî bibe. Şirove ya “pê ve diçe” wata ya “berdewamîyê, domandinê” dide, ango dê du roj bi berdewamî derbas bibin, heta ku ev kar gurahe bibe.

Em peyv a “xayan, xayandin” li beramber peyv a “berdewam, domandin” dibînin û didanin, ne tenê ji ber ku “dewam” peyvek a Erebi ye û em naxwazin ew bi kar bihê, belê ji ber ku peyv a “berdewam” di biwar ê watayê jî de ne rayend e (ne serkevî ye). Dê bihê gotin jî ku evê peyvê (berdewam, domandin) êdî cih ê xwe di ziman ê Kurdî de girtiye. Belê gerek cih ê şaşî ya naskirî di ziman ê Kurdî de tine be. Şaşî hingê he ye, dem a ku naskirin û nezanîn he be û bi zanîn û naskirinê re, şaşî namîne yan dihê rakirin û nehiştin. Gerek weha be. Sosretek a mezin a di biwar ê hizrî û hişmendîyê de ye, dem a ku em şaşîyê nas bikin û em şaşîyê bixayênin (berdewam bikin).

Peyv a “xayan, xayandin” li beramber “berdewam, domandin” e, ne tenê ji ber ku Kurdî ye, belê ji ber ku di biwar ê semantîk

de guncayî ye. Ew li angora ziman ê Kurdî guncayî ye. Ji bo ku ev peyv li şûn a “berdewam, domandin” bi kar bihê, gerek em wata yên ferhengî yên kevn li ber çav bigirin. Herweha, gerek em hobarî ya (têgihîn a) ku ev peyv wata ya “pêçûn a demê” dide baş hobar bikin (baş fam bikin) ku ew bi xwe berdewamî û domandin e. Wata yên ferhengî yên kevn jî ne tenê di ferheng ên kevn de he ne, belê ew di nav gell de û li dever ên corane yên Kurdistanê jî belav in.

Wek encam.. destewaje ya “pêçûn a demê” şirovekirin a peyv a “xayandin” e û şirove ya “pêçûn a demê” berdewamî û domandin e. Weha jî peyv a “xayan, xayandin” li şûn a “berdewamî, domandin” e. Gelek aşkira û xuyanî ye dem a em dibêjin: “çend dixayêne?” ango çiqas dom dike û çiqas pê ve diçe. Belê di hiş ê me yê girêdayî watayê de hatiye naskirin, ku “xayan, xayandin” pêçûn a demê ye û em nizanin ku ev wata di giyan ê peyv a “xayan, xayandin” de ye û bi xwe şirovekirin a peyv a “xayan, xayandin” e. Weha ji me re pirsek giring di biwar ê ziman de dihê naskirin û ew jî ew e, ku dibe peyv rast bihê hobarkirin an şaş bihê hobarkirin. Rastî û şaşî ya hobarkirinê jî bi hiş ê zimanvanî ve girêdayî ye. Dem a ku hiş ê zimanvanî ne di cih ê xwe de be, şaşî ya hobarkirinê he ye û dem a ku hiş ê zimanvanî di cih ê xwe de be, rastî ya hobarkirinê he ye.

Amraz ên nayînê

Ne – ni – na – nî – me

Ev amraz ên nayînê ne. Ew herdem dikevin destpêk a peyvê û dikevin pêşî ya peyvê de û ticaran nakevin naverast û dawî ya peyvê de. Ango ne wek karbirin a (isti`mal a) ziman ê Turkî ye. Dem a dikevin destpêk a peyvê, bi peyvê ve girêdayî ne û dem a ku dikevin pêşî ya peyvê, bi peyvê ve ne girêdayî ne û peyvê (kirde) nayîn dikin, anga nebûyî dikin. Ev amraz ên nayînê nakevin nîv ê peyvan de. Em dikarin amraz ê nayînê – û bi taybetî “ne” – di diyalekt a başûrî de di nîv ê peyvê de bibînin û ev şaş e. Wek nimûne.. dem a ew peyv a “arastekiraw” nayîn dikin, ew dibêjin “arastenekiraw”. Ango ew amraz ê nayînê “ne” dixî nîv ê peyvê de û gerek ev nimûne “ne arastekiraw” baya. Dem a ku li bakur û rojava jî peyvek wek “derdikeve” nayîn dikin, dibêjin “dernakeve”.. di evê nimûneyê de her ji destpêkê ve şaşî he ye û ew jî ew e, ku peyv bi xwe “diderkeve” ye û dem a ku nayîn jî dibê “naderkeve” ye. Amraz ê nayînê di ziman ê Kurdî de herdem di destpêk a peyvê de ye, êdî çî bi peyvê ve be yan ji peyvê cuda be û ew bi giştî jî bi kirdeyan ve û bi jêder ve dihê girêdan û bi naman, bernaman, lîn, rewş û pergala ve nahê girêdan. Herweha, amraz ê nayînê cih ê amraz ê dem a amad “di” û cih ê amraz ê dem a ayinde “bi” digire û wan nayîn dike.

Ne:

Ev amraz ê nayînê bi naman re, bi rewşê re, bi jêder re û bi pergala re jî dihê. Ew di dem a mêjîn û ayinde de bi kar dihê. Bi naman, rewşan, jêderan û pergala re wek: “ev ne Azad e, ew ne xemgîn e, nehîştin a tawanê karekî baş e, em ne nexweş in, ev gul ne li ser maseyê ye...”. Di peyv a “nexweş” de “ne” ji kok a peyvê ye. Ango weha jî he ye ku “ne” ji kok a peyvê be wek:

“nezan, nerît (urf û adet) nemaze, neman, nemir, nepak...” û hîngê ev “ne” dibe ji kok a peyvê, heta heger di hinek peyvan de wek “nezan” wata ya nayînê jî bide. Dem a ku bi jêder ve dihê girêdan, êdî ew dibe ji kok a peyvê. Ew di nimûne yên wek “nezan, nemir, nexwaz, nehing...” de dibe ji kok a peyvê. Ji ber evê yekê jî em dibêjin: “Azad ne nezan e” wata “nezan” peyvek bi ser ê xwe ye û nam ê rewşê ye. Ango dem a ku nam û jêder jê çê dibe, dibe ji kok a peyvê wek: başî = nebaşî, pakî = nepakî, xweşî = nexweşî, pêwîstî = nepêwîstî...hd. Dem a ev peyv ên weha yên ku bi “ne” dest pê dikin û amraz ê nayînê “ne” ji kok a wan be dihên nayînkirin, amraz ê nayînê “ne” dikeve pêşî ya peyvê de, angu ne pê ve ye wek: “Azad ne neçar e, ew ne nexweş e, ev ne nerîtîna baş in, mirov ne nemir e, hemû gul ne sor in...”. Bi kirdeyan re jî nahê wek: “Azad ne kevîtiye bîrê de, ew ne hatiye malê, em ne çûne bazarê, heger ew ne baya em dê ne çûbana dibistanê...”. Ango ev amraz bi kirde yên dem a mêjîn ve nahê girêdan û bi nam, rewş, pergal, bernam, lîn ve jî nahê girêdan. Dem a ku ew bi jêder ve dihê girêdan, wata ya nayînê dide peyvê û dibe beşekî peyvê wek “girtin = negirtin, hatin = nehatin, barîn = nebarîn, kirin = nekirin, çûyîn = neçûyîn ...”. Ango girêdan û negirêdan a “ne” bi evan beş ên peyvê re weha ye:

- Bi nam re wek “ev ne Azad e.. ev ne çiyayekî bilind e.. ev ne gundekî mezin e” ji nam cuda ye.

- Bi rewşê re wek “pêlav a wî ne reş e.. derî yê me şîn e, ne kesk e” ji rewşê cuda ye.

- Bi pergal re wek “ew ne birîndar e.. hûn ne hejar in” ji pergal cuda ye.

- Bi lîn re wek “ev perrtûk ne li ser evî cihî ye.. ew ne li bin darê rûniştî ye” ji lîn cuda ye.

- Bi bernam re wek “ew ê çû baxçe ne ez bûm.. ne hûn in ên ku birawestî” ji bernam cuda ye.

- Bi kirde re wek “av derbasî malê ne bûye.. wî ev kar ne kiriye.. te ev dar ne birriye” bi kirde yê dem a mêjîn a nêzîk ve ne girêdayî ye.

- Bi jêder re wek “nebûyîn a xwîndinê û nexwîndin zîyan e.. nehîştin a tawanê erk e.. nexwîndin sosret e.. nezanîn pêwîstî çareyê ye” bi jêder ve girêdayî ye. Belê jêder ê ku bi pît a dengdar dest pê dike “ne” jê cuda dibe wek “ne encamdan a evî karî şaşî ye.. ne azadkirin a gell kilêsî ye”.

Ev amraz di dem a mêjîn de weha dibe: “min ne zanî, te ne got, wî ev kar ne kir, me dost ê xwe bi tenê ne hîşt, me ne xwazt...”. Di dem a ayinde de jî weha ye: “min dê ev kar ne kiribaya, tu dê ne çûbaya zankoyê, ez dê neçim bajêr, hûn dê evî karî nekin...”. Ev amraz di dem a ayinde de cih ê “bi” digire, ku “bi” di dem a ayinde de pêşkok a peyvê ye, wek çawa ku “di” di dem a amad de pêşkok a peyvê ye û amraz ê nayînê cih ê wî digire. Ev amraz di dem a xizavê jî de cih ê amraz ê “bi” digire wek “bike = neke, bikin = nekin”.

Ev nimûne bi karhînan a amraz ê nayînê “ne” bi kirde re û di dem a mêjîn, ayinde û xizavê de didin nîşandan: “min ev kar ne kir, min ne kiriye, min ne kiribû, min ne dikir, ez dê evî karî nekim, evî karî neke, evî karî nekin”. Em dibînin ku amraz ê nayînê “ne” di dem a mêjîn a xayan de, bi peyvê ve nahê girêdan û ew jî ji ber ewê yekê ye, ku ev amraz di evê demê de nikare cih ê amraz ê “di” bigire, çimku amraz ê “di” di dem a mêjîn a xayan de ji peyvê nahê rakirin.

Di encam de em dibînin ku amraz ê nayînê “ne” weha bi kirde re dihê karbirin:

1- Di dem a amad de bi kar nahê.

2- Di dem a mêtîn de:

A- Di dem a mêtîn a nêzîk de ji kirde cuda ye, wek: “çû = ne çû, bir = ne bir, kir = ne kir, hat = ne hat ...”.

B- Di dem a mêtîn a guruh de ji kirde cuda ye, wek: “çûye = ne çûye, biriye = ne biriye, kiriye = ne kiriye, hatiye = ne hatiye ...”.

C- Di dem a mêtîn a dût de ji kirde cuda ye, wek: “çûbû = ne çûbû, biribû = ne biribû, kiribû = ne kiribû, hatibû = ne hatibû, ...”.

D- Di dem a mêtîn a xayan de ji kirde cuda ye, wek: “diçû = ne diçû, dibir = ne dibir, dikir = ne dikir, dihat = ne dihat, ...”.

3- Di dem a ayinde de bi kirde ve ye, wek: “dê biçim = dê neçim, dê bibim = dê nebim, dê bikim = dê nekim, dê bihêm = dê nehêm, ...”.

4- Di dem a xizavê de bi kirde ve ye, wek: “biçe = neçe, bibe = nebe, bike = neke, bide = nede, ...”.

Ni:

Ev amraz ê nayînê bi nam ve, bi rewşê ve û bi pergal ve nahê girêdan û bi kirdeyan re di hersê dem ên kêsanê (amad, mêtîn û ayinde) de dihê. Ew di dem a amad de şûn a “di” digire, di dem a mêtîn de bi peyvê ve ye û di dem a ayinde de şûn a “bi” digire û kirde nayîn dike û di dem a xizavê jî de nahê.

Di dem a amad de weha dibe: “dizanim = nizanim, dikarim = nikarim...”. Di dem a mêtîn de weha dibe: “zanî = nizanî, karibû = nikaribû...”. Di dem a ayinde de weha dibe: “dê bizanibaya = dê nizanibaya, dê bikaribaya = dê nikaribaya...”.

Dibe ku di hinek peyvên de “ni” ji kok a peyvê be wek: “nimêj, nizar, nihom, nipêj, nikil...” û hîngê ne amraz ê nayînê ye.

Na:

Ev amraz ê nayînê tenê di dem a amad de dihê û bi nam, rewş û pergal re nahê. Ew di dem a amad de bi kirde re weha dibe:

“dixwînim = naxwînim, dilîzim = nalîzim, dinivîsim = nanivîsim, dike = nake, diçe = naçe, dibe = nabe...”. Ango ew di dem a amad de şûn a “di” digire û “di” pêşkok a peyvê ye. Taybetmendî ya evî amrazî ew e, ku ew bi ser ê xwe ye û nîşan a nebûnê, nekirinê û nipêjîyê dide.

Nî:

Ev amraz ê nayînê bi ser ê xwe ye û di ti dem ên kêsanê de nahê. Ew tenê tiştan nayîn dike û di pergala ê tak de “nî ye” ye û di pergala ê kom de “nîn in” e û li angora binçîn a ziman, gerek ew di pergala ê kom de “nî yin” baya. Di nivîsandinê de “nî ye” dibe “nîye” û “nîn in” dibe “nînin”. Ango kirde yê bûyînê “ye, in” bi “nî” ve girêdayî bin baştir e, da ku pê re di serrastkirin a watayê de alîkar bin. Herweha, gerek bû ku “nînin” wek kok a xwe ya resen “nîyin” bihatiba nivîsandin.

Me:

Ev amraz ê nayînê li hinek dever ên Kurdistanê dihê gotin û ew herdem di dem a xizavê (ferman, imperative) de dihê gotin. Ew bi tenê bi kirdeyan re dihê û ew di dem a xizavê de weha dibe: “megire, mehîne, medêre, mehavêje, meke...”.

Tine:

Ev wek amraz ê nayînê dihê dîyarkirin, belê ew peyvek e û wata ya nayînê dide. Ew ji amraz ê “ti” yê ku gihanek e û ji amraz ê nayînê “ne” pêk hatiye. Wata ya evan herdu amrazan bi hevdu re bûye nayîn û nebûn. Ango nebûn a tiştêkî ye. Ji bo wata ya tak “tine” ye û ji bo wata ya kom “tine ne” ye.

Nîşeyek (têbînîyek): her yek ji evan amraz ên nayînê “ne, ni, na” li angora surîşt a kirdeyan bi kirdeyan re dihên. Ew surîşt a han jî girêdayî kok a peyvê ye, ka ew kîlê (birrgeh ên dengdar ên) destpêk a peyvê çawa ne. Ev pirs a han jî pêwîstî lêkolînek berfireh û bi ser ê xwe ye.

Pirsek li ser kirde, kirdedar û berkirde

Ev hersê stûn ên bingehîn ên zimanvanî di her zimanekî de he ne, belê dibe ku bi karhînan a wan di evî zimanî de bi awayekî be û di ewî zimanî de bi awayekî din be. Tiştê biyaş (sabit û ci-hgîr) di hemû zimanan de jî ew e, ku **kirde** kar û kirin a girêdayî demekê ye û bûyerekê dide nîşandan û dihê kirin, **kirdedar** ew kes û alî ne yên ku bi kar dirabin û kar encam didin û **berkirde** ew kes û alî ne yên ku kar li wan dihê kirin û dikevin bin barê kirde de.

Avanî ya evan hersê stûnan di zimanê Kurdî de xwedî ya hinek taybetmendîyan e, belê dîyarkirin a hemû ewan taybetmendîyan di delîveyek teng de girçin e (zehmet e). Ev babet pêwîstî lêkolînek taybetî û berfireh e, da ku ev avanî û taybetmendî yên xwe, ji hemû alîyekî ve bihên dîyarkirin.

Di evî biwarî de tenê rewş a evê avanîyê û taybetmendî yên wê, di dem a mêjîn de dihên dîyarkirin û dê tenê wekirsekê bihê pêşkêşkin. Herweha, dê tenê di bi karhînan a hinek kird-eyan de bihê xuyakirin. Mebest jî ew e, ku taybetmendî ya evê bi karhînanê di zimanê Kurdî de bihê dîyarkirin.

Di bi karhînan a evan hersê stûn ên zimanvanî de, dihê xuyakirin ku her yek ji wan di kîjan cihê de ye, belê ya girîngtir çawanî ya bi karhînanê ye, ango ka dikevin çî corekî heyvizandinê (formulayê) de. Heger em di dem a mêjîn de li kirde binerin, em dê bibînin ku ew di hinek deveran de li angora zimanê Turkî ye û li nik ewan kes ên ku di bin sirêma (bandor a) zimanê Turkî de jî ne, li angora zimanê Turkî ye. Di heyvêzinî din jî de li angora zimanê Erebî ye û ev jî ewê sirêma nîşan dide. Kurd dibêjin: “polîsan Ferhad girt in” û nabêjin: “polîsan Ferhad girt” ji ber ku kirdedar (polîsan) bi hêz e û kirde ji xwe re dibe. Ji nav ber-

nam ên kom ên ziman ê Kurdî jî, bernam ê “wan” xwedî taybetmendîyek giring e û ew jî mezinî û giramîdarî ye. Ne rast e em weha hobar (fam) bikin, ku wata ya hevek a “polîsan Ferhad girt in” ango polîsan hemû ew kes ên ku nam ê wan Ferhad e girt in. Ji ber ku Ferhad tak e û namekî destnîşankirî ye. Ango berkirde di hevek a Kurdî de naskirî ye ka ew tak e yan kom e û gerek jî naskirî be, belê kirde girêdayî bernam û kirdedar ê kom e. Ev di alî yê din de jî rast e dem a em dibêjin: “polîsan du kes girt in” ku kirde yê “girt in” di destpêkê de girêdayî kirde-dar e û paşê jî girêdayî berkirde ye. Ev nimûne di ziman ê Kurdî de weha ye: “parlamentaran kombûnek saz kir in” û heyvêz a “parlamentaran kombûnek saz kir” şaş e, ango kê m e. Rast e ku di ziman ê Kurdî jî de ergatîv di dem a mêjîn de, di hemû heyvêzan (formula, siyaxe) de he ye û kirde diçe ser berkirde, belê kirdedar ê “wan” bi hêz e û kirde ji xwe re dibe û bi xwe ve girê dide. Ev heyvêz a han, di bi karhînan a bernam ê “wan” de û di bi karhînan a kirdedar ê nam ê kom de weha ye. Bernam ê “wan” û kirdedar ê nam ê kom bi hêz in, ji ber ku mezin û giramîdar in. Ev taybetmendîyek ziman ê Kurdî ye. Heger tu bibêjî: “Ferhad girt in” dê bipirsin: “kê wî girt in?” û dê bersiv weha be: “wan wî girt in” an jî “polîsan wî girt in”. Tu dibêjî: “Ferhad girt in” ji ber ku tu dizanî ku gelek (çend polîsan) wî girt in, lewma jî dihê pirsirin: “kê wî girt in” ango yê ku dipirse jî, pirs a ewan kesan dike yê ku Ferhad girt in. Heger tu bibêjî “kê wî girt” tu pirs a kesekî tenê dike ku wî girt. Weha jî kirde rast bi kar dihê, kirdedar xuyanî ye û berkirde ew e yê ku kar lê hatiye kirin. Ango ergatîvbûn di evê heyvêzê de – heyvêz a bernam û kirdedar ê nam ê kom “wan” – çê nabe. Ew jî ji ber ku di heyvêz a bernam û kirdedar ê kom “wan” de, kirdedar bi hêz û giramîdar e û kirde (kar) ji xwe re dibe û bi xwe ve girê

dide. Di kêsan a dem a mêjîn de jî weha dibe: “min Ferhad girt, te Ferhad girt, wî/wê Ferhad girt, me Ferhad girt, we Ferhad girt, wan Ferhad girt in”. Di ewê kêsanê de ya bi kirde yê “kir in” re jî weha dibe: “min kar ê xwe kir, te kar ê xwe kir, wî/wê kar ê xwe kir, me kar ê xwe kir, we kar ê xwe kir, wan kar ê xwe kir in”. Di bi karhînan a “wan kar ê xwe kir in” de kar tak e û kirde bi “wan” ve girêdayî ye û heger “kar” bibe kom, ango heger ev hevek bibe “wan kar ên xwe kir in” dîsan kirde berî ku bi berkirde ve girêdayî be, ew bi kirdedar “wan” ve girêdayî ye û ji herduyan re dihê encamdan. Di nimûne ya “du gencan li gencekî xist in” de, nabe em bibêjin: “du gencan li gencekî xist” ji ber ku kirdedar ê “wan” kirde ji xwe re dibe. Ji ber evê yekê jî bi karhînan a rast a li angora ziman ê Kurdî weha ye: “du gencan li gencekî xist in”. Em nikarin bibêjin, ku “gencekî” gelek genc in, ew yek genc e û ji heyvêz a xwe ve xuyanî ye. Heger em bibêjin ku gencekî nenas e û dem a em bikin nas (genc) dê çawa be ? Ew dê weha be: “du gencan li evî/ewî gencî xist in” ango bernam ê nîşandanê ev/ew bi kar dihê û divê bi kar bihê. Di nimûne ya “wan xanî ava kir in” de, gelek xanî ne, ji ber ku ne hatiye destnîşankirin û gerek destnîşankirî be. Destnîşankirin jî weha ye, ku heger yek xanî be dê bibêjin: “wan ev/ew xanî ava kir in” û heger gelek xanî bin, dê bibêjin “wan ev/ew xanîyana ava kir in”. Resenî ya evê hevekê di bi karhînan a bernam ê nîşanê de dîyar dibe, dem a em dibêjin “wan ev/ew xanî ava kir in” û dem a em dibêjin “wan ev/ew xanîyana ava kir in” ku “ev/ew xanî” destnîşankirî ye û tak e, belê “ev/ew xanîyana” destnîşankirî û kom e.

Ji bo ku ev taybetmendî ya han bêtir bihê xuyakirin, em dipirsin: aya dibe ku ev nimûne ya han weha be: “polîsan Ferhad girt, têr lê xist û wî avêt zindanê”? Bê goman weha nabe, ji ber

ku weha ne li angora ewê taybetmendî ya ziman ê Kurdî ye ya ku me wê destnîşan kir. Ev nimûne ya han di ziman ê Kurdî de weha ye: “polîsan Ferhad girt in, têt lê xist in û wî avêt in zindanê”. Taybetmendî ya din a ku di evê nimûneyê de ji me re dihê xuyakirin ew e, ku berkirde nêr be yan mê be, dihê destnîşankirin. Em dibêjin: “wî avêt in zindanê” û heger berkirde mê baya, me dê bigotiba: “wê avêt in zindanê”. Herweha, şaş e ku em bibêjin: “ew avêt in zindanê”.

+ **Kirde** yê ku kar û kirin a girêdayî demekê ye û bûyerekê dide nîşandan û dihê kirin, di her çar cor ên xwe yên bingehîn de yên dem a mêjîn (nêzîk, gurah, dûr û xayan) weha ye:

- Di dem a mêjîn a nêzîk de wek: “hat, çû, kevt, rabû, xwar, vexwar, girt, kir...” em rastî taybetmendîyekê dihên û ew jî ew e, ku kirde yên wek “hat, çû, kevt, rabû...” di dem a mêjîn de jî her wek di dem a amad de, barnam ê “ez” diwergirin û bernam ê “min” nawergirin. Belê kirde yên wek “xwar, vexwar, girt, kir...” di dem a mêjîn de “min” diwergirin. Wek: “ez hat im, ez çûm, ez kevt im, ez rabûm...” û “min xwar, min vexwar, min girt, min kir...”. Bi bernam ê “tu” re jî her weha ye: “tu hatî, tu çûyî, tu kevtî, tu rabûyî...” û “te xwar, te vexwar, te girt, te kir...”. Aya çima kirde yên wek: “hat, çû, kevt, rabû...” di dem a mêjîn de bi bernam ê “ez” re bernam ê “min” nawergirin? Herwek çawa bernam ên din jî bi wan re nahên guherandin û nabin “te, wî/ wê, me, we, wan” ?. Ev pirs a han ji alîyekî ve girêdayî siruşt a kirde yê Kurdî ye û ji alîyekî din ve girêdayî pergala kirde ye, ka ew pergala berkirdevîn e (transîtîv e) yan kirdedarvîn e (intransîtîv e) û ew babetekî gelek berfireh û xustdar e (hessas e) ji ber ku di ziman ê Kurdî de, taybetmendîyek a berkirdevîn û kirdedarvîn a di evî biwarî de he ye.

- Di dem a mêjîn a gurah (tam, kamil) de ku tê de kirde yên

wek “hat, çû, kevt, rabû, xwar, vexwar, girt, kir...” dibin: “hatiye, çûye, kevtiye, rabûye, xwariye, vexwariye, girtiye, kiriye...” dîsan kirde yê wek “hatiye, çûye, kevtiye, rabûye...” di dem a kêsan a dem a mêjîn de bernam ê “ez” diwergirin, wek çawa ku di nimûne yê wek “xwariye, vexwariye, girtiye, kiriye...” de bernam ê “min” diwergirin, wek: “ez hatime, ez çûme, ez kevtime, ez rabûme...” û “min xwariye, min vexwariye, min girtiye, min kiriye...”. Ango di nimûneyekê wek “hatin” de û di dem a mêjîn a gurah de, kêsan weha ye: “ez hatime, tu hatiye, ew hatiye, em hatine, hûn hatine, ewan hatine”. Belê di nimûneyekê wek “xwarin” de “min” diwergire û weha dibe: “min xwariye, te xwariye, wî/wê xwariye, me xwariye, we xwariye, wan xwarine”.

- Di dem a mêjîn a dûr de ku tê de kirde yê wek “hat, çû, kevt, rabû, xwar, vexwar, girt, kir...” dibin: “hatibû, çûbû, kevtibû, rabûbû, xwaribû, vexwaribû, girtibû, kiribû...” kirde yê wek “hat” dibe: “ez hatibûm, tu hatibû, ew hatibû, em hatibûn, hûn hatibûn, ewan hatibûn” û bi kirde yê wek “hat, çû, kevt, rabû...” re jî her weha ye (her “ez” diwergirin). Belê bi kirde yê “xwar” re weha dibe: “min xwaribû, te xwaribû, wî/wê xwaribû, me xwaribû, we xwaribû, wan xwaribûn”.

- Di dem a mêjîn a xayan (berdewam) de kirde yê wek “hat, çû, kevt, rabû, xwar, vexwar, girt, kir...” dibin: “dihat, diçû, dikevt, dirabû, dixwar, divexwar, digirt, dikir...” û kirde yê wek “hat” dibe: “ez dihatim, tu dihat, ew dihat, em dihatin, hûn dihatin, ewan dihatin”. Bi kirde yê “kir” re jî weha ye: “min kir, te kir, wî/wê kir, me kir, we kir, wan kir in”.

Arêşe (problem) ew e, ku taybetmendî ya bernam ê “wan” û mezinî û giramîdarî ya wî, nahên naskirin û bernam ê “wan” jî wek herdu bernam ên din ên kom “me, we” bi kar dihên. Di

gelek dever ên Kurdistanê de yê ku ne kevtine bin sirêm a (bandor a) ziman ê Turkî de, kirde bi bernam ê “wan” ve girê didin û weha taybetmendîyek a ziman ê Kurdî didin nîşandan û diparêzin.

Kirde di nav gell de çawa jî bi kar bihê her dihê hobarkirin, ango tak ên gell bi her awayekî jî be (şaş jî be) bi karhînan a kirde her ji hev hobar dikin û evê pirsê, tevhevîyek mezin çê kiriye û çê dike. Rêziman evê pirsê çareser dike, dem a ku rêbazekê ji evê bi karhînanê re didane (datîne) û kirde di cihê xwe yê rast de didane. Cihê rastê kirde jî di destpêkê de, di paraztîna a kokê resenî ya kirde de ye, paşê jî di naskirin û biyaşkirin a (naskirin û tesbîtkirin a) bi karhînan a rêzimanî ya li angora taybetmendî ya ziman de ye. Rast e ku taybetmendî ya ziman di nav gell de ye, belê gell di nav deman de û ji ber nebûn a vagir (zabit, setting) xwe girêdayî pirsê zimanvanî ne dîtîye û nabîne. Herweha, zimanê helbestê jî hîştîye ku ev arêşe çê bibin, ji ber ku zimanê helbestê ne gelekî girêdayî vagir e, ango ne gelekî girêdayî rêziman e. Ji hemû jî giringtir ew e, ku sirêm a (bandor a) çande ya dagîrkaran li ser me he ye. Ji ber evê çendê jî taybetmendî ya ziman di nav ajaweyek a bi karhînanê de winda bûye. Rêziman li evê taybetmendîyê digere, dibîne û diparêze.

Di bare ya bi karhînan a kirde de pirsê giring he ye û ev pirs a han, rojane di nav ziman de dîyar dibe. Ew bi taybetî jî di nav zimanê ragihandinê de dîyar dibe. Ew jî dem a ku bi namê tak re kirde yê kom bi kar dihînin wek: “komîteyekê seredan a dever a bakur kirin”.. “şandeyekê kombûnek bi wezîr re saz kirin”.. “grûpek çekdar hatin girtin”. Di evan nimûneyan de nabe ku kirde kom be, ji ber ku “komîte” tak e “şandeyek” tak e û “grûpek” tak e. Rastî ya evan hevekan li angora namê kirde weha

ye: “komîteyekê seredan a dever a bakur kir”.. “şandeyekê kombûnek bi wezîr re saz kir”.. “grûpek çekdar hat girtin”. Ev şaşî ya han ji ber ewê yekê çê dibe, ku peyv ên wek “komîte, şande, grûp” peyv ên komhejmar in, ji çend kesan pêkhatî ne û di hiş de weha bi cih bûye. Belê rêziman dakarîyê (mu`ameleyê) li angora çawanî ya surîşt a ziman dike.

+ **Kirdedar** jî ew kes û alî ne yên ku bi kar dirabin û kar encam didin, di ziman ê Kurdî de baş ne hatine biyaşkirin û ev pirs bi xwe jî pêwîstî lêkolînek taybetî û berfireh e. Di evî biwarî de em dikarin bibêjin, ku ji bilî kes ê kirdedar û alî yê kirdedar, hemû bernam jî kirdedar in, her wek çawa berkirde ne. Bernam bi awayekî serekîn gerin a kirdedar jî dibînin û nasandin a wan gelek giring e.

- **Ez:** bernam ê kesane yê tak ê peyvevan û mizgovan e, ango yê ku dipeyive ew e. Wek: “ez dijîm da ku ez fêr bibim û rastîyan bibînim”. Ez kes ê yekem ê tak e. Di nimûneyekê wek: “ez daxwaz a serxwebûn a welat dikim” de, bernam ê “ez” kirdedar e. Bernam ê “ez” nabe berkirde. Ev bernam ê han di dem a amad û ayinde de bi kar dihê. Di dem a amad de wek: “ez wêne yê te digirim” û di dem a ayinde de wek: “ez dê seredan a bakur bikim”. Gelek caran û li angora hinek merc ên zimanvanî, ev bernam ê han di kêsan a dem a mêjîn jî de bi kar dihê wek: “ez çûm, ez hat im, ez geriyam, ez rabûm, ...” û ev babetekî cuda û serbixwe ye.

- **Tu:** bernam ê kesane yê tak ê mizgober e, ango yê ku peyivîn pê re ye û jê re ye. Wek: “tu kesekî milahîm û zana yî, lewma tu dikarî fêrdar bî”. Tu kes ê duyem ê tak e. Di nimûneyekê wek: “tu nêçîr a masîyan dikî” de, bernam ê “tu” kirdedar e. Bernam ê “tu” nabe berkirde. Ev bernam ê han di dem a amad de bi kar dihê wek: “tu diçî nav baxan” di dem a mêjîn de bi kar dihê

wek: “tu çû nav bîstanan” û di dem a ayinde jî de bi kar dihê
wek: “tu dê biçî dever ên dûr”.

- **Ew:** bernam ê kesane yê tak ê nêtar e, bergo yê penhan e, ji bo nîşandan a dûr e (bernam ê nîşanî yê dûr e) û ji bo ne hişdar jî ye. Nêtar e ango ji bo nêr û mê ye, ku ji bo nêr wek: “ew xebatek rewa dike” û ji bo mê jî wek: “ew kar ên dibistanê dike, çimku ew fêrdar e”. Xuyanî ye jî ku “ew” bi evî awayî bernamekî penhan e (ne dîyar e). Ev bernam ji bo ne hişdaran jî ye, wek dem a şivanek dibêje: “ew mih ên me têr ne bûn”.. “ew pisîk a me ya sipî winda bû”.. “ew çêlek a belek baş şîr dide”. Ew kes ê sêyem ê tak e. Di nimûne ya “ew xebatek rewa dike” de, bernam ê “ew” kirdedar e. Bernam ê “ew” nabe berkirdê. Ev bernam ê han di dem a amad, mêjîn û ayinde de bi kar dihê. Di dem a amad de wek: “ew zarok ji xwe re dilîze, ew zarokana ji xwe re dilîzin” û di dem a ayinde de wek: “ew xort dê xebatê bike, ew xortana dê xebatê bikin” û di evan herdu nimûneyan de, bernam ê “ew” bernam ê nîşandan a dûr jî ye û ji tak û komê re ye. Di nav gell de kirde yê kom evî bernamî dike kom, wek “ew zarok ji xwe re dilîzin” û ew di dem a amad û ayinde de weha ye. Di dem a mêjîn jî de wek xwe (ew) bi kar dihê û ji bo nêr û mê û dûrîyê û komê ye wek: “ew kurr/kiç çû/çûn bazarê, me ew zarok/zarokana bir in dibistanê”. Di dem a mêjîn de û dem a ku mebest ji bernam ê “ew” kom be, bernam ê “ew” dibe “wan” wek “ew dixwin = wan xwar in” û di vir de tevhevîyek bi bernam ê “ewan” re çê dibe, ku gerek û ya rast bernam ê “ewan” bibe “wan”. Herweha, ev bernam ê han di kêsan a dem a mêjîn de wek nêr “wî” ye û wek mê “wê” ye, wek: “wî nan xwar, wê nan xwar” û her di dem a mêjîn de nêrbûn an mêbûn a wî (ango bernam ê ew) dîyar dibe.

- **Em:** bernam ê kesane yê kom e, peyvevan û mizgovan e, ango

ew in ên ku dipeyivin û ew e yê ku bi nam ê komê dipeyive. Wek: “em xwedî yên mafînê rewa ne”.. “em li zanînê digerin”. Di nimûne ya “em li zanînê digerin” de, bernam ê “em” kirdedar e. Bernam ê “em” nabe berkirde. Ev bernam di dem a amad, mêjîn û ayinde de bi kar dihê. Di dem a amad de wek: “em bi erk ên xwe dirabin” .. di dem a mêjîn de wek: “em çûn nav baxçe” û di dem a ayinde de wek: “em dê erk ên xwe bi cih bihînin”. Heyvêz a ku tê de bernam ê “em” dibe berkirde di nav gell de he ye wek: “wan em girt in û xist in zindanê, wî em dan ber pirsînê, we em agahdar kir in” û ev heyvêzek a taybetî ya ziman ê Kurdî ye. Belê pirs a ku di vir de dihê kir in ew e; aya em nikarin bibêjin: “wan me girt in û xist in zindanê, wî me da ber pirsînê, we me agahdar kir” ? û aya ev heyvêz a rêzimanî ji ya yekem ne rasttir e ?

- **Hûn**: bernam ê kesane yê kom ê mizgober e, ango yên ku peyivîn ji wan re ye û bi wan re ye. Wek: “dem a ku hûn azad bin, hûn dê serfiraz bin”.. “hûn wane ya xwe dixwînin”. Di nimûne ya “hûn wane ya xwe dixwînin” de, bernam ê “hûn” kirdedar e. Wek nîşeyek a girêdayî dîrok a ziman, bernam ê “win” li şûn a “hûn” bûye û heger em li heyvêz a bernaman dinerin, em dibînin ku di evê bareyê de bernam ê “win” ji “hûn” rasttir e, ji ber ku “win” ji parzad ên “ew, we, wî, wê” ye. Bernam ê “hûn” nabe berkirde. Ev bernam di dem ên amad, mêjîn û ayinde de bi kar dihê. Di dem a amad de wek: “hûn kinc ên xwe li xwe dikin”.. di dem a mêjîn de wek: “hûn hat in mêvandarî ya me” û di dem a ayinde de wek: “hûn dê bi azadîyê şad bibin”. Di dem a mêjîn de û dem a ku tê de ev bernam dibe berkirde, ev heyvêz di nav gell de he ye wek: “wan hûn bê hêvî kir in, wî/ wê hûn xist in cihekî teng, me hûn kir in berpirs” û pirs ev e; aya em nikarin bibêjin: “wan we bê hêvî kir, wî/wê we xist ci-

hekî teng, me we kir berpirs” ? û aya ev heyvêz a rêzimanî ji ya yekem ne rasttir e ?

- **Ewan:** bernam ê kesane yê kom ê nêtar e, bergo yê penhan e, ji bo nîşandan a kom a dûr e (bernam ê nîşanî yê kom ê dûr e) û ji bo ne hişdar jî ye. Nêtar e ango ji bo nêr û mê ye, ku ji bo nêr wek: “ewan xortan wane ya xwe xwînd in” û ji bo mê jî wek: “ewan jinan kar ên xwe kir in”. Xuyanî ye jî ku ev bernam ê han penhan e (ne dîyar e). Ev bernam ji bo ne hişdaran jî ye wek: “ewan hespan amade bike”.. “sexbêrî ya ewan mahînan bike”.. “bêrîyê ewan mihan bidoşe”. Di nimûneyekê wek: “ewan kes-an li Azad xist in” de, ev bernam kirdedar e. Bernam ê “ewan” nabe berkirdê. Di dem a amad de bi kar dihê û dibe “ew” wek: “ew wane ya dîrokê dixwînin” û ew kombûn a xwe dide kirde, yan jî kombûn a wî di kirde de dihê xuyakirin. Di dem a mêjîn de bi kar dihê û dibe “ew” wek: “ew ji welatekî dûr hatine” û ya rasttir ku her “ewan” be û di dem a amad de bi kar dihê û dibe “ew” wek: “ew dê vexwîndinek baş bikin” û ya rasttir her “ewan” be. Belê.. ya rast bi karhînan a “ewan” e. Di dem ên amad, mêjîn û ayinde jî de, ev bernam dibe “ew” û tak e, belê dem a ku kirde dike kom, kombûn a xwe jî dide nîşandan. Ev pirs a han rast e, belê bi karhînan a evî bernamî wek awa yê “ewan” rasttir e, ango “ewan wane ya xwe dixwînin, ewan ji welatekî dûr hatine, ewan dê vexwîndinek baş bikin”. Belê awa yê ku tê de “ewan” dibe “ew” siviktir e û ji ber evê yekê bêtir bi kar dihê û siviktirbûnê arêşe çê kiriye.

Bernam ên berkirdê yên ku bi xwe kirdedar jî ne, ew di dem a mêjîn de bi kar dihên û di dem a mêjîn de evê salix a xwe ya naskirî diwergirin, ku ew salix wek “min, te, wî, wê, me, we, wan” e.

- **Min:** bernam ê kesane yê tak ê peyvevan û mizgovan e, ango

yê ku dipeyive ew e. Ev bernam ê han girêdayî bernam ê “ez” e û bi giştî di dem a mêjîn de dibe “min” wek: “min xwarin xwar”.. “min derî vekir”.. “min gotar nivîsand” ku di evan nimûneyan de “min” kirdedar e. Belê ev bernam ê han dibe berkirde jî wek: “ewan çeteyan li min xist in”.. “Azad min ji malê hîna der” ku ev heyvêz di ziman ê gell de weha ye: “Azad ez ji malê hînam der”. Nîşeyek jî he ye û gelek taybetî ye û ew jî ew e, ku ev bernam ê han her di dem a mêjîn jî de wek xwe “ez” dimîne û nabe “min” wek: “te ez girtim” ango heyvêz a “te min girt” bi kar nahê, ku li angora binçînê (qayideyê) ew rasttir e, ango “te min girt” rasttir e, belê her çawa be di ziman ê gell de “te ez girtim” dihê gotin. Ev bernam hem kirdedar e û hem berkirde ye. Dem a tu bibêjî: “min nameyek nivîsand” dibe kirdedar û dem a tu bibêjî: “Azad li min xist” dibe berkirde.

- **Te:** bernam ê kesane yê tak ê mizgober e, ango yê ku peyv jê re ye û bi wî re ye. Ev bernam ê han girêdayî bernam ê “tu” ye û bi giştî di dem a mêjîn de dibe “te” wek: “te got ku evsal baran kê m bariya”.. “te kelemek ji pêşî ya xwe rakir”. Ev bernam di dem a mêjîn de dibe “te” belê he ye ku ev bernam di dem a mêjîn jî de wek xwe “tu” bimîne, dem a em dibêjin: “tu çû malê”.. “tu ji ser darê kevî xwarê”.. “tu bû mamosta yê dîrokê”. Ev neguherîn a han jî bi hinek kirdeyan re çê dibe. Ev bernam hem kirdedar e û hem berkirde ye. Dem a em dibêjin: “te darek çand” kirdedar e û dem a em dibêjin: “Azad tê a te li te xist” berkirde ye.

- **Wî:** bernam ê kesane yê tak ê nêr e, bergo yê penhan e û ji bo ne hişdar jî ye. Ev bernam girêdayî bernam ê “ew” e û di dem a mêjîn de dibe “wî” wek: “wî malek ji xwe re ava kir”.. “wî seredan a heval ê xwe kir”. Ev bernam ê han nêr dide nîşandan û nîşandan a dûr e. Dem a em dibêjin “wî” penhan e, ango ne

dîyar e ka ev “wî” kî ye. Bernam ê “wî” ji bo ne hişdar e wek: “wî beranî ji govê biderxîne”.. “wî hespî bi zîn bike”.. “xwarinê bide wî seg ê birçî” û bê goman ew ji nêr re ye. Ev bernam hem kirdedar e û hem berkirde ye. Dem a em dibêjin: “wî savar xwar” kirdedar e û dem a em dibêjin: “Azad li wî xist” berkirde ye.

- **Wê:** bernam ê kesane yê tak ê mê ye, bergo yê penhan e û ji bo ne hişdar jî ye. Ev bernam ê han jî girêdayî bernam ê “ew” e û di dem a mêjîn de dibe “wê” wek: “wê ji xwe re perrtûkek kirrî”.. “wê nîgarek nîgar kir”.. “wê nameyek nivîsand”. Ev bernam ê han mê dide nîşandan û nîşandan a dûr e. Dem a em dibêjin “wê” penhan e, ango ne dîyar e ka ev “wê” kî ye. Bernam ê “wê” ji bo ne hişdar jî ye wek: “wê çêlekê bidoşe”.. “avê bide wê mihê” û bê goman ew ji mê re ye. Ev bernam hem kirdedar e û hem berkirde ye. Dem a em dibêjin: “wê ser ê zarok a xwe şoşt” kirdedar e û dem a em dibêjin: “Azad bar ê xwe li wê kir” berkirde ye.

- **Me:** bernam ê kesane yê kom e, peyvevan û mizgovan e, ango ew in ên ku dipeyivin û ew e yê ku bi nam ê komê dipeyive wek: “me xebat ji bo welat kiriye”.. “gell ê me berxwedanê li dijî dagîrkaran dike”. Ev bernam ê han girêdayî bernam ê “em” e û di dem ên amad û mêjîn de bi kar dihê. Di dem a amad de wek: “xwîndevan ên me wane ya xwe dixwînin” û di dem a mêjîn de wek: “me gelek dar çand in”. Ev bernam hem kirdedar e û hem berkirde ye. Dem a em dibêjin: “me zanîngehek damezrand” kirdedar e û dem a em dibêjin: “polîsan li me xist in” berkirde ye. Di dem a ayinde de wek berkirde bi kar dihê wek: “dê mamosta me fêrî ziman ê Kurdî bike.. ew dê ji me re çîrokan bibêje.. hûn dê me serfiraz bikin”.

- **We:** bernam ê kesane yê kom û mizgober e, ango yê ku peyv

ji wan re û bi wan re ye. Ev bernam ê han girêdayî bernam ê “hûn” e (yan jî girêdayî bernam ê kevn “win” e û “win” rasttir e) û di dem a mêjîn de dibe “we” wek: “we armanc pêk hîna”.. “rizgarî bi we dihê encamdan”. Ev bernam di dem a mêjîn de bi kar dihê û hem kirdedar e û hem jî berkirde ye. Dem a em dibêjin: “we amûrek saz kir” kirdedar e û dem a em dibêjin: “mişextîyê sirêmek ne baş li we kiriye” berkirde ye. Di dem a ayinde de tenê berkirde ye wek: “mamosta we ji polê derxist.. min we di ber evê pirsê de kir berpirs.. wî/wê ji we re da xuyakirin” belê pirs a di evê bareyê de ev e; aya em nikarin bibêjin: “mamosta hûn ji polê derxistin.. min hûn di evê bareyê de kir in berpirs” ? û aya ev heyvêz ji ya yekem ne rasttir e ?

- **Wan:** bernam ê kesane yê kom e, bergo yê penhan e û ji ne hişdar jî re ye. Ew ji bo nîşandan a dûr e. Ev bernam ê han girêdayî bernam ê “ewan” e û di dem a mêjîn de dibe “wan” wek: “wan ji me re got in”.. “em ji wan re dibêjin”.. “wan bar ên xwe hînan”.. “wan bar ê xwe hînan”. Ev bernam ê han bi hêz e û herdem kirde bi xwe ve girê dide û nakeve ber heyvêz a ergatîvê de. Lewma jî hem me got: “wan bar ên xwe hînan” û hem jî me got: “wan bar ê xwe hînan”. Di nimûne yên weha de berkirde bi xwe dihê destnîşankirin û ew xwe dide nîşandan ka ew tak e yan kom e û kirde yê kom bi xwe jî evê yekê dide nîşandan. Em dikarin bibêjin ku ev bernam penhan e, ji ber ku “wan” ne dîyar e ka ew kî ne. Ev bernam ji ne hişdar jî re ye wek: “li wan kevokan binere”.. “wan rovîyan mirîşkek xwar in”.. “wan rovîyan deh mirîşk xwar in”. Ev bernam ê han hem kirdedar e û hem berkirde ye. Dem a em bibêjin: “wan çeteyan li Azad xist in” kirdedar e û dem a em bibêjin: “Azad li wan çeteyan xist” berkirde ye. Di dem a amad de bi kar nahê û di dem a mêjîn de hem kirdedar e û hem berkirde ye. Dem a ku

kirdedar ê dem a mêjîn be wek “wan karek encam dan.. wan kinc ên ciwan li xwe kir in” û dem a ku berkirde be wek “barekî giran li ser mil ên wan e.. me perrtûkek ji wan xwazt”. Di dem a ayinde de tenê berkirde ye wek: “hûn dê wan bidin ber xwîndin û zanînê.. ewan dê ji wan re dibistanan ava bikin.. em dê wan fêr bikin”.

- **Xwe:** bernam ê vajîn e (reflexive) e, xweyîti yan xweyînî ye, ango ji bo nîşandan a derûnê ye û bi wata ya “heman” dihê. Ev bernam mizgovan, mizgober û bergo yê penhan e. Ev bernam bi hemû bernaman re bi kar dihê, çî ew bernam ên kirdedar bin û çî ew bernam ên berkirde bin, wek: “ez bi xwe, tu bi xwe, ew bi xwe...” û “min bi xwe, te/tu bi xwe, wî/wê bi xwe...”. Ew bernamekî vajîn e ango ji bo xwe û li ser xwe ye, ku li xwe divegere wek: “xwe bi xwe çû bazarê”.. “em bi xwe diçin dibistanan”.. “hûn bi xwe dikarin evî karî bikin”. Herweha ew bernamekî xweyîti yan xweyînî ye, ji ber ku ew xwe bi xwe, xwe dide nîşandan wek: “yê ku di evî şerrî de ye ez bi xwe me”.. “ew bi ser ê xwe hat evê deverê”. Ev bernam derûnê dide zanîn, ji ber ku nîşanek a derûnî ye wek: “xwe bide naskirin”.. “ew xwe fêrî ziman dike”. Ew bi xwe bi wata ya “heman” dihê û heman ango “eynî” yan “eynî tişt” e wek: “ev bi xwe ye”.. “evê pirsê wek xwe ji min re bibêje” ango evê pirsê wek çawa ew weha ye, ji min re bibêje. Di dem a amad de dihê wek: “ez bi xwe diçim” û bi kirdedar re alîkar e û wî dide nîşandan, di dem a mêjîn de dihê wek: “ez bi xwe çûm” û bi kirdedar re alîkar e û wî dide nîşandan, di dem a ayinde de dihê wek: “ez bi xwe dê biçim” û bi kirdedar re alîkar e û wî dide nîşandan û di dem a xizavê de dihê wek: “bi xwe biçe, bi xwe biçin” û ew bi xwe kirdedar e û kirdedar dide nîşandan.

- **A – Ya:** ev bernam ê arzû ye, ji bo mê ye û tak e, bernam ê

kesane yê mê jî ye û bergo yê penhan e (ne dîyar e). Ew “a” ye dem a ku pît a dawî ya peyv a berî wî bê deng be û ew “ya” ye, dem a ku pît a dawî ya peyv a berî wî dengdar be. Dem a em dibêjin: “ev mal a min e” ango ev mal arzû yê (mulk ê) min e û di ziman ê Kurdî de peyv a “mal” mê ye, herweha tak e. Dem a em dibêjin: “ev mase ya te ye” ango ev mase arzû yê te ye û mase mê û tak e. Ew bernam ê kesane yê mê ye wek: “ew a ku hat mal a me mamosta bû” ku ev “a” bernam ê kesane yê alîkar e û dide nîşandan, ku ew kes a hat mal a me mamosta bûye û mê bûye. Di nimûneyekê de wek: “bêrî ya ku li zozanan diji” amraz ê “ya” bernam ê girêdayî kes ê bêrîyê ye û pê re alîkar e, mê ye û tak e. Ew penhan e ji ber ku dem a em dibêjin: “a ku hat vir” an dem a em dibêjin: “perî ya ku çû nav çiyayan” herdu jî nadin dîyarkirin ka “ew a ku hat vir” û “perî ya ku çû nav çiyayan” kî bûn. Ev bernam û amraz (a, ya) weha ji peyvê cuda û serbixwe dihê nivîsandin.

- **Ê – Yê:** ev bernam ê arzû ye, ji bo nêr e û tak e, bernam ê kesane yê nêr jî ye û bergo yê penhan e (ne dîyar e). Ew “ê” ye dem a ku pît a dawî ya peyv a berî wî bê deng be û ew “yê” ye, dem a ku pît a dawî ya peyv a berî wî dengdar be. Dem a em dibêjin: “ev text ê min e” ango ev text arzû yê min e (mulk ê min e) û text di vir de tak û nêr e. Dem a em dibêjin: “derî yê me fireh e” ango derî arzû yê me ye û peyv a “derî” di ziman ê Kurdî de nêr e. Ew bernam ê kesane yê nêr û tak e wek: “ew ê ku wane ya xwe nivîsand” ku ev “ê” bernam ê kesane yê alîkar e û dide nîşandan, ku kesekî wane ya xwe nivîsand. Di nimûneyekê de wek: “mamosta yê ku xwîndevanan dike mamosta” amraz ê “yê” bernam ê girêdayî kes ê mamosta ye û pê re alîkar e, tak e û nêr e. Ew penhan e ji ber ku dem a em dibêjin: “ê ku hat” an dema em dibêjin: “yê ku çû” ne dîyar e ka kî bû yê ku hat û

kî bû yê ku çû. Ev bernam û amraz (ê, yê) weha ji peyvê cuda û serbixwe dihê nivîsandin.

- **Ên – Yên:** bernam ê arzû ye, nêtar e, kom e, penhan e û bernam ê kesane yê kom e. Ew “ên” e dem a ku pît a dawî ya peyv a berî wî bê deng be û ew “yên” e, dem a ku pît a dawî ya peyv a berî wî dengdar be. Dem a em dibêjin: “dirav ên min” ango ew dirav arzû yê min in û kom in. Dem a em dibêjin: “zevî yê we” ango ew zevî yê ku arzû yê we ne (mulk ên we ne). Ew nêtar e, ango ew ji mê û nêr re ye yan jî mê û nêr tê de ne xuyanî ne. Ev bernam ê alîkar penhan e, ji ber ku ne xuya ye ka “ên, yê” kî ne. Ew bernam ê kesane yê kom e wek: “ew ên ku derbas bûn” ku “ên” bi “ew” re alîkar e û kesan dide nîşandan. Herweha di nimûneyekê de wek: “hêja yê ku hat in nik me” amraz ê “yên” ê ku bernam e, ji bo nîşandan a ewan kes ên hêja ye. Ev bernam û amraz weha ji peyvê cuda û serbixwe dihê nivîsandin.

- **Hevdu:** bernamekî tevayî ye û tenê du kesan destnîşan dike. Taybetmendî ya “hevdu” ew e, ku ew du kesan û bi tenê du kesan bi hevdu re dide nîşandan. Ango heger du kesan hevdu dît in, çê nabe em bibêjin: “me hev dît” divê em bibêjin: “me hevdu dît” yan “wan hevdu dît in” ji ber ku tenê ew du kes in û “hevdu” bi xwe evê yekê dide nîşandan, ku “hevdu” ji “hev” û “du” pêkhatî ye, ango du kes di evî bernamî de he ne û ji ber evê yekê jî, ew tevayî yê girêdayî du kesan e. Dem a ku ez û hevaleyê bi hevdu re diçin cihekî, divê ez bibêjim: “ez û hevaleyê xwe bi hevdu re çûn bazarê”.. “em bi hevdu re geriyan”. Ango “hevdu” girêdayî tevayî ya navber a tenê du kesan e û ev pirs ji surîşt a peyv a “hevdu” xuyanî ye.

- **Hev:** bernamekî tevayî yê giştî ye, kom e û gelek kesan destnîşan dike. Ev bernam bêtirî du kesan dîyar dike, wek: “em bi

hev re xebatê dikin”.. “xwîndevan bi hev re diçin dibistanê”. Ango ev bernam bêtirî du kesan destnîşan dike û ew bi guraî tevayî ye.

- **Ev:** bernam ê nîşanî ye, nêtar e û ji bo nîşandan a nêzîk e. Heger em bibêjin: “ev mal gelek mezin in” anga ev mal nêzîkî me ne. Dem a em dibêjin: “ev xwîndevan zîrek e” mê û nêr ji hevdu nahên xuyakirin û ji ber evê yekê ew nêtar e, ji ber ku destwaje ya “ev xwîndevan” ji mê re û ji nêr re jî ye. Peyv a “ev” bernam e, ji ber ku “ev” kes jî dide nîşandan wek: “ev ê ku rûniştî ye”.. “ev a ku dixwîne”.. “ev ên ku nêçîrê dikin” û ew bi alîkarî ya bernam ên “a, ê, ên” evê gerinê dibîne.

- **Evaya:** ev bernam ê nîşanî yê destnîşankirin û biyaşkirinê ye, ji bo nîşandan a nêzîk e û tak e. Dem a ku “ev” dibe “evaya” taybetmendî ya destnîşankirin û biyaşkirinê çê dibe. Anga “ev” bi awayekî destnîşankirî û biyaşkirî ye wek: “evaya kesekî hêja ye”.. “evaya nahê pejirandin”.. “evaya pirsek mezin e”. Di hemû evan nimûneyan de xuya dibe ku “evaya” bernam ê tak e, ji ber ku yek kesî û yek tiştî dide nîşandan.

- **Evana:** ev bernam ê nîşanî yê destnîşankirin û biyaşkirinê ye, ji bo nîşandan a nêzîk e û kom e. Dem a ku “ev” dibe “evana” taybetmendî ya destnîşankirin û biyaşkirinê çê dibe. Anga “ev” bi awayekî destnîşankirî û biyaşkirî ye, wek: “evana kesinî çeleng in”.. “evana xebatek mezin dikin”.. “dê evana rojek nû bivejînin”. Di hemû evan nimûneyan de xuya dibe ku “evana” bernam ê kom e, ji ber ku bêtirî kesekî dide nîşandan, herweha bêtirî tişteki jî dide nîşandan.

- **Ewaya:** bernam ê nîşanî yê destnîşankirin û biyaşkirinê ye, ji bo nîşandan a dûr e û tak e. Dem a ku “ew” dibe “ewaya” taybetmendî ya destnîşankirin û biyaşkirinê çê dibe. Anga “ew” bi awayekî destnîşankirî û biyaşkirî ye, wek: “ewaya mêrekî le-

heng e”.. “heger ewaya li vir baya”. Di evan nimûne yê weha de dîyar dibe ku “ewaya” bernam ê tak e, ji ber ku tenê kesekî destnîşan dike.

- **Ewana:** bernam ê nîşanî yê destnîşankirin û biyaşkirinê ye, ji bo nîşandan a dûr e û kom e. Dem a ku “ew” dibe “ewana” taybetmendî ya destnîşankirin û biyaşkirinê çê dibe. Ango “ew” bi awayekî destnîşankirî û biyaşkirî ye, wek: “ewana xwîndevan ên dibistanê ne”.. “heger ewana baş bixwînin, dê serkevî bin”. Bernam ê “ewana” ji bo komê ye, ji ber ku gelek kesan destnîşan dike.

- **Han:** bernam ê alîkar ê nîşanî yê biyaşkirinê û destnîşankirinê ye, ji bo tak û kom e, ji bo nêr û mê ye (nêtar e) û ji bo ne hişdar jî ye. Ew hinek caran di ziman ê gell de dibe “ha” û dem a ku weha dibe wata ya xwe ji dest dide, ji ber ku “ha” nîşan a bangê ye û ew û “han” ne wek hevdu ne. Bernam ê “han” bernam ê alîkar ê nîşanî yê biyaşkirinê û destnîşankirinê ye, çimku ew bi bernam ê bi karhatî re alîkar e û kes û tişt ê nîşankirî û armanckirî, destnîşan û biyaş dike wek: “ew mirov ê han karkir e”.. “ewan xwîndevan ên han zîrek in”.. “ev babet ê han berfireh e”. Ev bernam herdem bi bernam ê nîşanî re dihê û pê re dibe alîkar û bi kar ê destnîşankirin û biyaşkirinê dirabe. Ev bernam nêtar e, ji ber ku ji herdu regezan re (mê û nêr) bi kar dihê wek: “ev kiç a han doktor e”.. “ew xort ê han endazyar e”. Bernam ê “han” ji ne hişdar re jî ye wek: “ew hirç a han gelek girs e”.. “ev şêr ê han gelek dirinde ye”.. “ewan rovî yê han gundî tirsandine”.

- **Kî:** bernam ê alîkar ê pirsînê ye, nêtar e, penhan e, tak û kom e û tenê kirdedar e. Ew bi bernam re alîkar e wek: “ew kî bû yê ku hat nik te ?”.. “ew ên ku çûn başûr kî bûn ?”.. “ev mirov ê han kî ye ?”. Ev bernam nêtar e û ji mê û nêr re ye wek: “ev jin

a han kî bû ?”.. “ew mêr ê han kî bû ?”. Penhanî ya evî bernamî di ewê yekê de ye, ku ew nahê naskirin û ji bo nenas jî ye. Dem a em dibêjin “kî” ango em rewşek a penhan çê dikin. Dem a em dibêjin: “ev kes kî bû ?” mebest a me kesekî tenê ye, belê dem a em dibêjin: “ev kesana kî bûn ?” an “ev kes kî bûn?” mebest a me çend kes in û di herdu pergalan de, em li wan dipirsin. Ev bernam di destpêk a hevekê de û di nav hevekê jî de bi kar dihê. Ev bernam ê pirsînê tenê kirdedar e û nabe berkirdê wek: “kî çû mal a Azad ?” û ev bernam di vir de kirdedar e û li kirdedar dipirse, yan jî wek: “ewê çû mal a Azad kî bû ?” û ev bernam di vir de jî kirdedar dide nîşandan û lê dipirse.

- **Kê:** bernam ê penhan ê pirsînê ye, nêtar e û tak e, kirdedar û berkirdê ye. Ew penhan e ji ber ku ne xuyanî ye ka “kê” kî ye. Ev bernam nêtar e ji ber ku herdu regezan bi xwe ve digire û dem a ku pirsînê li herdu regezan jî dike, wek hevdu bi kar dihê û ti guherîn di heyvêz a wî de çê nabe. Ev bernam kirdedar û berkirdê ye. Dem a em dibêjin: “kê ji te re got ?”.. “kê ev kar kir ?”.. “kê li te xist ?” kirdedar e û dem a em dibêjin: “te li kê xist”.. “wî ji kê bir” .. “wê ji kê stand” berkirdê ye. Ev bernam ê pirsînê herdem tak e û ji bo tak e wek: “kê perrtûk nivîsand ?”.. “kê name xwînd ?”. Dem a em bibêjin: “kê perrtûk nivîsandin” jî, her “kê” wek xwe dimîne û her nîşan a tak e, ango yek kesî gelek perrtûk nivîsandine û pirs li evê yekê dihê kirin. Dem a em bibêjin: “kê ev name xwînd in ?” ango yek kes he ye û gelek name xwîndine û pirs li evê yekê dihê kirin.

- **Kîjan-kîjanî-kîjanê:** bernam ê penhan e, ji bo pirsînê jî ye, nêtar e, tişt jî dide nîşandan, vavêrkar e, bijêrkar e û tak e, kirdedar û berkirdê ye. Ew penhan e, ji ber ku bi xwe ne dîyar e ka çi ye û nêtar e ji ber ku mê û nêr jî tê de ne xuyanî ne. Ev bernam ê han tak û vavêrkar e, ango yekî ji nav komekê vavêr dike û

ew bijêrkar e, ji ber ku yekî ji nav komekê dihilbijêre. Dem a em dibêjin: “te ji ewan xortan kîjan zîrek dît ?” ango te kesekî zîrek ji nav ewan xortan dîtîye û weha ew nîşan a bernam e. Dem a em dibêjin: “te ji ewan otomobîlan kîjan ji xwe re kirrî ?” ango te yek ji wan vavêr kir û hilbijart û ji xwe re kirrî. Dem a em dibêjin: “kîjan ciwantir e ?” ango ji nav komekê ciwantirek he ye û nîşan a pirsînê ye. Di nimûneyekê de wek: “we kîjan caw daxwaz kir dê he be” ne nîşan a pirsînê ye. Ev bernam dibe kirdedar wek: “kîjan bû yê ku helbest xwînd ?” yan jî wek: “yê ku helbest xwînd kîjan bû ?”.. “kîjanî ew çîrok nivîsandibû”. Herweha ev bernam dibe berkirde wek: “te li kîjanî xist ?”.. “we kîjan havêjt zîndanê ?”. Gelek xuyanî jî ye ku kîjan nêtar e, kîjanî nêr e û kîjanê mê ye û kirdedar û berkirde ne.

- **Kîjanan:** bernam ê penhan e, ji bo pirsînê jî ye, nêtar e, tişt jî dide nîşandan, vavêrkar e, bijêrkar e û kom e û kirdedar û berkirde ye. Ew penhan e, ji ber ku bi xwe ne dîyar e ka çi ye û nêtar e, ji ber ku mê û nêr tê de ne xuyanî ne. Ev bernam ê han kom û vavêrkar e, ango komekê ji nav gelean vavêr dike û ew bijêrkar e, ango komekê ji nav gelean dihilbijêre. Dem a em dibêjin: “ji nav evan kişan kîjanan zûtir wane yên xwe nivîsand in ?” ango “kîjanan” nîşan a kes e, kom e û nîşan a pirsînê ye. Dem a em dibêjin: “tu ji nav evan şalan kîjanan dixwazî ?” ango tu bêtirî şalekî ji nav gelek şalan dixwazî û pirs a evê yekê dihê kirin. Dem em dibêjin: “tu kîjanan bixwazî ji xwe re bibe” ango çend ên ku tu dixwazî ji xwe re bibe û ne nîşan a pirsînê jî ye. Ev bernam kirdedar e wek: “kîjanan ev name şewitand in ?” herweha berkirde ye wek: “hûn kîjanan dixapînin ?”.

- **Bêhvan:** bernamekî penhan e, nîşan a kes û tişt e, nêtar e û tak û kom e, kirdedar û berkirde ye. Ew penhan e ji ber ku ne dîyar e ka ew kî ye û bêtir kes dide nîşandan. Herçende ku

wek çawa “bêhvan kes” dihê gotin, herweha jî “bêhvan tişt” jî dihê gotin. Wek nimûne.. “bêhvan kesî ji me re got...”. Ji ber evê yekê jî ew ne bi gurahî (ne bi tamamî) bernam e. Ew nêtar e ji ber ku ji mê re û ji nêr re jî ye wek: “bêhvan kesî sitranek saz kir” ku bêhvan di vir de nîşan a nêr e û wek: “bêhvan kesê seredan a me kir” ku bêhvan di vir de mê ye. Dem a em dibêjin: “bêhvan kes çû bajêr” em tak didin nîşandan û dem a em dibêjin: “bêhvan kesan malek ava kir in” em kom didin nîşandan. Ev nîvbernam ê han li beramber peyv a “filan” a Erebi ye, ku bi Erebi “filan” e û bi Kurdî “bêhvan” e. Ev nîvbernam kirdedar e wek: “bêhvan kes ji bajêr derkevt” û berkirde ye wek: “min bêhvan kes ji bajêr derxist”.

Wek evî nîvbernamî, nîvbernam ên wek “her, ti, hinek” jî he ne û ew tenê dem a ku bi peyv a “kes” re dihên, bernam ê kesane didin nîşandan wek: “her kes, her kesî, her kesê, her kesan – ti kes, ti kesî, ti kesê, ti kesan – hinek kes, hinek kesan”.

+ Berkirde yê ku ew kes û alî ne yê ku kar li wan dihê kirin û dikevin bin bar ê kirde de, ji bilî naman, bernam ên berkirde jî he ne û me wan dan nîşandan. Berkirde yê ku di hevekê de bêtir bi kirde yê berkirdevîn (derbas – transitive) re dihê, wek çawa xuyanî ye ne tenê yek e, belê dibe di hevekekê de bêtirî berkirdeyekî he be. Ev jî babetekî naskirî ye. Di kirde yê berkirdevîn jî de, kirdedar û berkirde bi hevdu re giring in û di hevekê de herdu bi hevdu re bingehîn in û bê wan nabe. Wek nimûne.. “Azad waneyek pêşkêş kir”.. “bêrî çêlekê didoşe”.. “nîgarvan kevalekî nîgar dîke”. Erk ê kirde yê berkirdevîn li ser berkirde ye, ango hevek bi kirdedar re nikare wata ya xwe gurah bike û pêdivêyî berkirde ye û wî dixwaze. Di kirde yê kirdedarvîn (nederbas – intransitive) jî de, tenê kirdedar giring e û ew bi xwe dikare hevekê gurah bike. Di kirde yê kirdedarvîn de tenê

kirdedar serekîn e wek: “xwîndevan diçe dibistanê”.. “Azad li ser text xewiya”.. “divê hûn zû biçin”. Erk ê kirde yê kirdedarvîn li ser kirdedar e, ango kirdedar di hevek a kirdedarvîn de serekî ye û gerin (rol) jê re ye û hevek wî dixwaze.

Di evê pirs a kirde, kirdedar û berkirde de, yek ji tişt ên ku ji me re hat xuyakirin ew e, ku gerek bi karhînan a kirde di ziman ê Kurdî de ji bin sirêm a (bandor a) ziman ên biyanî biderkeve. Çareserî ya evê pirsê jî di danan a rêzimanek a weha de ye, ku palê bide ser zimanekî petî yê rêxistî û şîrazkirî û ev rêxistin û şîrazkirin a han, li angora surişt û resenî ya ziman ê Kurdî be. Bê goman jî ku surişt û resenî ya ziman di nav rûpel ên dîrok a kevn de ne û di nav aksent û diyalekt ên Kurdî de ne. Ji ber evê yekê me daxwaz kir, ku gerek naskirin a pirs ên girêdayî dîrok a ziman, yek ji pêngav ên nû yê vexwîndin a ziman ê Kurdî be.

Bi bone ya peyivîn a li ser kirde yê berkirdevîn (transitive) û kirde yê kirdedarvîn (intransitive) di vir de dihê pêşîniyarkirin, ku nam ê kirde yê derbas “berkirdevîn” be û nam ê kirde yê nederbas “kirdedarvîn” be. Ji ber ku kirde yê derbas – ku têperr jî jê re dibêjin – di hevekê de pêwîstî berkirde ye û wata ya “berkirdevîn” ango kirde yê ku ji bo gurahekirin (temamkirin a) wata ya hevekê berkirde dixwaze. Herweha kirde yê nederbas – ku jê re netêperr an tîneperr jî dibêjin – di hevekê de pêwîstî kirdedar e û wata ya “kirdedarvîn” ango kirde yê ku ji bo gurahekirin a wata ya hevekê kirdedar dixwaze.

Alîyekî rêbaz a kêsan a kirde

Kêsan a kirde ji jêder diderkeve. Jêder bi xwe jî ji nam û kok a kirde yê dem a mêjîn a nêzîk dihê heyvizandin û zagîn dibe (ji dayik dibe). Di evê pirs a han de dê herçar dem ên kêsanê yên serekîn bihên nîşandan, da ku di hevekê de rêbaz a kêsan a kirde bihê naskirin. Ev pirs a han dibe bingehê naskirî yê kêsanê, da ku di nimûneyan de xuyanî be û hercar nehê dubarekirin.

Jêder a “kirin” a ku di ziman ê Kurdî de gerinek mezin û girîng dibîne, baştirîn nimûne ya kêsanê ye. Ev jêder xwedî ya evê gerin a girîng e, ji ber ku girêdayî kar û giyan ê kar e. Kar jî bingeh a hafirandinê ye û peyivîn hafirandin e. Kêsan a bi jêder a “kirin” re û di herçar deman de weha ye:

1- Di dem a amad de: “ez dikim, tu dikî, ew dike, em dikin, hûn dikin, ewan dikin”.

2- Di dem a mêjîn de:

A- Di dem a mêjîn a nêzîk de: “min kir, te kir, wî/wê kir, me kir, we kir, wan kir in”. Hinek kirde he ne di evê demê de bernam ên xwe naguherînin û bernam di wan de wek xwe dimîne. Wek nimûne.. jêder a “çûyîn” weha dihê kêsankirin: “ez çûm, tu çû, ew çû, em çûn, hûn çûn, ewan çûn”. Ev jî pirs û babetekî bi ser ê xwe ye.

B- Di dem a mêjîn a gurah de: “min kiriye, te kiriye, wî/wê kiriye, me kiriye, we kiriye, wan kirine”.

C- Di dem a mêjîn a dûr de: “min kiribû, te kiribû, wî/wê kiribû, me kiribû, we kiribû, wan kiribûn”.

D- Di dem a mêjîn a xayan de: “min dikir, te dikir, wî/wê dikir, me dikir, we dikir, wan dikirin”.

3- Di dem a ayinde de: “ez dê bikim, tu dê bikî, ew dê bike, em dê bikin, hûn dê bikin, ewan dê bikin”.

4- Di dem a xizavê de: ji bo tak tenê bi bernam ê mizgober ê “tu” re bi kar dihê û dibe “bike” û ji bo kom tenê bi bernam ê mizgober ê “hûn” re bi kar dihê û dibe “bikin”.

Ev jêder (kirin) di hevekê de hinek taybetmendîyan dide nîşandan û ew taybetmendî di kêsan a dem a mêjîn de xuya dibin. Wek nimûne.. hevek a ku babet ê wê “avakirin a xanî” ye, di herçar dem ên kêsanê de weha dibe:

1- Di dem a amad de: “ez xanî ava dikim, ez xanîyekî ava dikim, ez xanîyan ava dikim”.. “tu xanî ava dikî, tu xanîyekî ava dikî, tu xanîyan ava dikî”.. “ew xanî ava dike, ew xanîyekî ava dike, ew xanîyan ava dike”.. “em xanî ava dikin, em xanîyekî ava dikin, em xanîyan ava dikin”.. “hûn xanî ava dikin, hûn xanîyekî ava dikin, hûn xanîyan ava dikin”.. “ewan xanî ava dikin, ewan xanîyekî ava dikin, ewan xanîyan ava dikin”. Di evan nimûneyan de yê ku her yek ji wan ji sê alîyan pêkhatî ye, her alîyek watayekê dide. Belê wek nîşe; di nimûnekê wek “tu xanî ava dikî” de, rewş a nepenîyê he ye, ango rewş a ne xuyanî he ye û ew jî di berkirde de ye (xanî). Em weha dibînin ku gerek ew rewş a nepenî û ne xuyanî di ziman de tine be. Dem a “ez xanî ava dikim” dihê gotin, girêdayî rewşek a heyî û ne xuya ye, dem a “ez xanîyekî ava dikim” dihê gotin, girêdayî pirs a takbûn û nenasîne ye û dem a ku “ez xanîyan ava dikim” dihê gotin, girêdayî pergal ê komê ye. Di nimûne ya nenas ê kom jî de dibe “ez xanîyina ava dikim, tu xanîyina ava dikî, ew xanîyina ava dike, em xanîyina ava dikin, hûn xanîyina ava dikin, ewan xanîyina ava dikin”.

2- Di dem a mêjîn de:

A- Di dem a mêjîn a nêzîk de: “min xanî ava kir, min xanîyek ava kir, min xanî ava kir in”. Alî yê yekem ê evê hevekê (min xanî ava kir) girêdayî rewş a heyî û ne xuya ye, alî yê duyem ê evê

hevekê (min xanîyek ava kir) girêdayî pirs a takbûn û nenasîne ye û alî yê sêyem ê evê hevekê (min xanî ava kir in) girêdayî pergala komê ye, ango “xanî” kom e. Di alî yê sêyem de amraz ê komê “in” ê ku bi xwe kirde yê bûyîne jî ye, peyv a “xanî” dike kom. Di nimûne ya nenas ê kom jî de dibe “min xanîyin ava kir in, te xanîyin ava kir in, wî/wê xanîyin ava kir in, me xanîyin ava kir in, we xanîyin ava kir in, wan xanîyin ava kir in”.

Bi bernamê “te” re dibe: “te xanî ava kir, te xanîyek ava kir, te xanî ava kir in”. Bi bernamê wî/wê re dibe: “wî/wê xanî ava kir, wî/wê xanîyek ava kir, wî/wê xanî ava kir in”. Bi bernamê “me” re dibe: “me xanî ava kir, me xanîyek ava kir, me xanî ava kir in”. Bi bernamê “we” re dibe: “we xanî ava kir, we xanîyek ava kir, we xanî ava kir in”.

Bi bernamê “wan” re dibe: “wan ev/ew xanî ava kir in, wan xanîyek ava kir in, wan ev/ew xanîyana ava kir in”. Ev bernamê han (wan) kirde ji xwe re dibe. Di alî yê yekem de (wan ev/ew xanî ava kir in) dihê nîşandan ku peyv a “xanî” tak e û kirde yê “in” girêdayî “wan” e, ango weha ew rewş a nepenî û ne xuya namîne. Di alî yê duyem de (wan xanîyek ava kir in) takbûn a “xanîyek” xuya û dîyar e. Di alî yê sêyem de (wan ev/ew xanîyana ava kir in) kombûn a “xanîyana” xuya û dîyar e. Heyvêz a dirist a evî kirdeyî bi evî bernamî jî re weha ye. Di nimûne ya nenas ê kom jî de dibe “wan xanîyin ava kir in”. Pirs a ku di evê bareyê de kêmanîyê çê dike û dibe engîz a ku li şûn a “kir in” kirde yê “kir” bi kar bihê ew e, ku berkirde bi awayekî zelal û aşkira nahê destnîşankirin. Destnîşankirin jî di evê bareyê de ew e, ku berkirde yê kom bibe kom û tak nemîne û pê re bernamê nîşandanê ev/ew bi kar bihên û yê tak jî takbûn a wî xuya be.

B- Di dem a mêjîn a gura de: “min xanî ava kiriye” tak ê nedî-

yar e û “min xanî ava kirine” kom e û “min xanîyek ava kiriye” tak û nenasîn e. Ango di nimûne ya yekem de “xanî” tak ê nedîyar e û di nimûne ya duyem de “xanî” kom e û di nimûne ya sêyem de “xanîyek” tak û nenasîn e. Bi bernam ê “te” re dibe “te xanî ava kiriye, te xanî ava kirine, te xanîyek ava kiriye”. Bi bernam ê “wî/wê” re dibe “wî/wê xanî ava kiriye, wî/wê xanî ava kirine, wî/wê xanîyek ava kiriye”. Bi bernam ê “me” re dibe “me xanî ava kiriye, me xanî ava kirine, me xanîyek ava kiriye”. Bi bernam ê “we” re dibe “we xanî ava kiriye, we xanî ava kirine, we xanîyek ava kiriye”.

Bi bernam ê “wan” re dibe “wan ev/ew xanî ava kirine, wan ev/ew xanîyana ava kirine, wan xanîyek ava kirine”.

C- Di dem a mêjîn a dûr de: “min xanî ava kiribû” tak e û nepenî ye..“min xanî ava kiribûn” kom e û “min xanîyek ava kiribû” tak û nenasîn e. Ango di nimûne ya yekem de “xanî” tak e û di nimûne ya duyem de “xanî” kom e û di nimûne ya sêyem de “xanîyek” tak û nenasîn e. Bi bernam ê “te” re dibe “te xanî ava kiribû, te xanî ava kiribûn, te xanîyek ava kiribû”. Bi bernam ê “wî/wê” re dibe “wî/wê xanî ava kiribû, wî/wê xanî ava kiribûn, wî/wê xanîyek ava kiribû”. Bi bernam ê “me” re dibe “me xanî ava kiribû, me xanî ava kiribûn, me xanîyek ava kiribû”. Bi bernam ê “we” re dibe “we xanî ava kiribû, we xanî ava kiribûn, we xanîyek ava kiribû”.

Bi bernam ê “wan” re dibe “wan ev/ew xanî ava kiribûn, wan ev/ew xanîyana ava kiribûn, wan xanîyek ava kiribûn” ku di nimûne ya yekem de “xanî” tak e, di ya duyem de “xanî” kom e û di ya sêyem de “xanî” tak û nenasîn e.

D- Di dem a mêjîn a xayan de: “min xanî ava dikir, min xanîyek ava dikir, min xanî ava dikirin”. Di alî yê yekem de (min xanî ava dikir) rewş a takbûn û nexuyabûnê he ye, di alî yê duyem de

(min xanîyek ava dikir) rewş a takbûn û nenasînê he ye û di alî yê sêyem de (min xanî ava dikirin) pergal ê komê he ye. Bi bernam ê “te” re dibe “te xanî ava dikir, te xanîyek ava dikir, te xanî ava dikirin”. Bi bernam ê “wî/wê” re dibe “wî/wê xanî ava dikir, wî/wê xanîyek ava dikir, wî/wê xanî ava dikirin”. Bi bernam ê “me” re dibe “me xanî ava dikir, me xanîyek ava dikir, me xanî ava dikirin”. Bi bernam ê “we” re dibe “we xanî ava dikir, we xanîyek ava dikir, we xanî ava dikirin”.

Bi bernam ê “wan” re dibe “wan ev/ew xanî ava dikirin, wan xanîyek ava dikirin, wan ev/ew xanîyana ava dikirin”.

3- Di dem a ayinde de: “ez dê xanî ava bikim, ez dê xanîyekî ava bikim, ez dê xanîyan ava bikim”. Di alî yê yekem de (ez dê xanî ava bikim) rewş a ne dîyar he ye, di alî yê duyem de (ez dê xanîyekî ava bikim) rewş a tak û nenasînê he ye û di alî yê sêyem de (ez dê xanîyan ava bikim) pergal ê komê he ye. Di nimûne ya nenas ê kom de jî dibe “ez dê xanîyina ava bikin, tu dê xanîyina ava bikî, ...”. Bi bernam ê “tu” re dibe “tu dê xanî ava bikî, tu dê xanîyekî ava bikî, tu dê xanîyan ava bikî”. Bi bernam ê “ew” re dibe “ew dê xanî ava bike, ew dê xanîyekî ava bike, ew dê xanîyan ava bike”. Bi bernam ê “em” re dibe “em dê xanî ava bikin, em dê xanîyekî ava bikin, em dê xanîyan ava bikin”. Bi bernam ê “hûn” re dibe “hûn dê xanî ava bikin, hûn dê xanîyekî ava bikin, hûn dê xanîyan ava bikin”. Bi bernam ê “ewan” re dibe “ewan dê xanî ava bikin, ewan dê xanîyekî ava bikin, ewan dê xanîyan ava bikin”.

4- Di dem a xizavê de: ji bo tak “xanî ava bike, xanîyekî ava bike, xanîyan ava bike” ku di alî yê yekem de (xanî ava bike) rewş a ne dîyar he ye, di alî yê duyem de (xanîyekî ava bike) rewş a takbûn û nenasînê he ye û di alî yê sêyem de (xanîyan ava bike) pergal ê komê he ye. Di nimûne ya nenas ê kom de dibe “xanîy-

ina ava bike, xanîyina ava bikin”.

Pirs a ku em dixwazin di vir de bikin ew e, ku çima dê di hevekê de rewş a ne dîyar, nepenî û ne xuyanî he be ? Belê.. dem a em dibêjin: “wan xanî ava kir in” an “me xanî ava kir” berkirde rewşek ne dîyar dide nîşandan û ev pirs a han arêşeyek a zimanvanî çê dike. Ew arêşe di nexuyabûn a berkirde de ye, ka ew tak e yan kom e. Ji ber evê yekê heyvêz a ku tê de berkirde nehê destnîşankirin şaş e. Destnîşankirin jî bi amraz ên nîşandanê pêk dihê. Ango dem a em bibêjin: “wan ev/ew xanî ava kir in” û “me ev/ew xanî ava kir” rasttir e, ji ber ku berkirde (xanî) di evan herdu nimûneyan de tak e û takbûn a wî bi amraz ê nîşandanê “ev/ew” dihê xuyakirin. Herweha ji ber ku amraz ê nîşandanê dide sepandin ku berkirde yan tak be yan kom be wek: “wan ev/ew xanî ava kir in” û berkirde (xanî) di vir de tak e û berkirde di nimûne ya “wan ev/ew xanîyana ava kir in” de kom e û weha rewş a ne dîyar, nepenî û ne xuyanî, di bare ya berkirde de namîne û hevek aşkira û rohin dibe.

Ev awa yê kêsanê, awa yê alîkar ê bingeh a peyv a Kurdî ye û di evî awayî de taybetmendî ya kêsan a jêder a “kirin” he ye. Belê ev rêbaz a han di bare ya kêsan a hemû kirde yên Kurdî de rast e. Herweha, ev rêbaz a han di bare ya awa yê serekîn ê bingeh a peyv a Kurdî jî de rast e.

Girêdan û parçekirin a beş ên peyv a Kurdî:

Beş ên peyv a Kurdî her yek ji wan bi pirranî û bi giştî serbixwe dihên nivîsandin. Yek ji binçîn ên ku em di evê perrtûkê de didin xuyakirin jî ev e. Ev taybetmendîyek ji taybetmendî yên ziman ê Kurdî ye û yek ji rêçik ên resenî, zelalbûn û paqijbûn a ziman e. Ev rewş a han a ziman ê Kurdî jî, heta berî bîst sal ên dawî yên sedsal a bîstem heta radeyekî di cihê xwe de bûye, belê di evan bîst sal ên destpêk a evê sedsalê de (sedsal a bîst û yekem) yek ji arêşe yên ku ji ziman ê Kurdî re çê bûne, ev girêdan a ne di cihê xwe de ya beş ên peyvê ye û ev parçekirin a ne di cihê xwe de ya beş ên peyvê ye. Ev rewş a han jî bêtir di ziman ê ragihandinê de weha ye, yan jî di ziman ê ragihandinê de diderkeve û bêtir li başûr weha ye û ji başûr derbasî beş ên din ên Kurdistanê jî bûye.

Ew dem a ku gerek beş ên peyvê ji hev cuda bin, bi hev ve girê didin û dem a ku gerek beş ên peyvê bi hev ve bin, ji hev cuda dikin. Ev jî nîşan a ewê yekê ye, ku ew ên weha dikin evê taybetmendî ya ziman nas nakin, an jî di bin sirêm a (bandor a) ziman ên biyanî de weha dikin, an jî herdu engîz (sebeb) bi hevdu re li nik wan li kar in. Ev rewş a han jî li hemû Kurdistanê belav bûye, belê ewê li başûr serî hildaye û li başûr weha bi kar hatiye û sirêm a serekîn a evî pergali, sirêm a ziman ê Erebi bûye. Engîzek din jî he ye û di nav gell de ye, dem a ku gell “ji hev” kiriye “jev” û dem a ku “bi hev” kiriye “pev” û dem a ku “li hev” kiriye “lev” û dem a ku “bi yek” kiriye “pêk” û ev heyvêz ên gellêrî, êdî bûne peyv û wek peyv dakarî bi wan re dihê kirin. Rêziman wek peyv dakarîyê bi wan re dike. Ev heyvêz ên han di ziman ê gell de weha ne û bila di ziman ê gell de her weha bin, belê ne hemû ev heyvêz ên han di rêziman de û di

ziman ê petî de di cih de ne, ji ber ku di evan heyvêz ên weha de kok û resenî ya peyvê winda dibin. Bi tevî evê yekê jî, heyvêz ên “pêk, têk, jêk, lêk, vêk” û yên wek wan, êdî her yek ji wan bûye peyvek û wek peyv dakarî bi wan re dihê kirin û ev dihê pejirandin, belê ya ku rêziman wê napejirîne ew e ku peyv ne li angora surişt a ziman ê Kurdî bihên çêkirin.

Gelek peyv ên diristkirî yên ziman ê Kurdî he ne, ku kes ên wan dirist kirine (çê kirine) daxwaz kirine ku ew wek ziman ê Erebi bi yek peyvê wata ya xwe bidin. Ew ên ku weha xwaztine, li angora ziman ê Erebi hizir kirine û peyv ên Kurdî li angora şêwe yê ziman ê Erebi darijtine. Wek nimûne.. peyv a “pêkewejîyan” dirist kirine ji bo ku wata ya “te`ayuş” a Erebi û “coexistence” a Englîzî bide, belê peyv a “pêkewejîyan” ne li angora surişt a ziman ê Kurdî ye. Kurd dibêjin: “jîyan a bi hev re” yan “jîyan a pêk ve”. Ji xwe ev diristkirin bi xwe şaş e, ji ber ku wata ya “te`ayuş, coexistence” di ziman ê Kurdî de “hevjîyarî” ye. Kurd (bi taybetî li dever a Badînan) ji bo wata ya “me`îşetê” peyv a “jîyarê” bi kar dihînin û gelek rast e. Kurd dibêjin: “tu jîyar a xwe bi çi dikî ?” wata tu bi çi dijî (di`eyişî). Peyv a “feqede” ya Erebi kirine “jidestda” û amraz “ji” û nam “dest” û kirde “da” bi hev ve girê dane, da ku ew jî wek peyv a Erebi wata ya bi yek peyvê be. Bê ku hizir bikin, ku karekî weha ziyaneke mezin digihîne ziman ê Kurdî. Peyv a Erebi “bede `e” wata “dest pê kir” dikin “destpê kir, destpêkir, destîpêkird” bê ku nas bikin, ku ev peyv di ziman ê Kurdî de bi awa yê “dest pê kir” e û di ziman ên Erebi û Englîzî de – wek nimûne – yek peyv e (bede`e, begin). Ev peyv û wata di ewan zimanan de yek peyv e, belê di ziman ê Kurdî de ne weha ye. Di ziman ê Kurdî de taybetmendî ya xwe ya rêzimanî he ye û ew jî di şêwazê “dest pê kir” de ye. Ew ziyaneke mezin jî ew e, ku ziman ê Kurdî taybetmendî ya

xwe û resenî ya xwe ji dest dide, çimku beş ên peyv a Kurdî serbixwe ne û serbixwe dihên nivîsandin, her wek çawa heyvêz a peyv û hevek ên Kurdî ne wek ên Erebi û Turkî ne. Ji bo peyv ên hevgir jî, di ziman ê Kurdî de merc û awa yên xwe he ne. Di ziman ê Kurdî de amraz (bi taybetî jî amraz ê kişanê) serbixwe ye, nam serbixwe ye û kirde jî di pirranî ya heyvêz ên xwe de serbixwe ye. Peyv a “bede`e” ya Erebi ya ku wata ya wê “dest pê kir” e, bi hev ve girê didin û li angora diyalekt a başûrî dikin “destîpêkird” û beş ên din ên Kurdistanê jî ji wan fêr dibin û evê peyvê dikin “destpê kir”. Bê ku bizanibin, ku “destpê” peyvek e û rêziman wek yek peyvê dakarîyê pê re dike. Di vir de wata ya peyv a “destpê” çi ye? Bê goman peyv a “destpê” bê wata ye, yan jî bê wata bûye, ji ber ku resenî ya xwe ji dest daye. Resenî ya evê peyvê weha ye: “dest pê kir” û ew weha jî li beramber peyv a Erebi “bede`e” ye. Herweha, dem a ku di rêziman de dakarî bi evê peyvê re dihê kirin û ev peyv dihê şirovekirin, dihê gotin ku “dest” nam e û “pê” amraz e û “kir” kirde ye û ev hersê beş wata ya peyv a Erebi “bede`e” didin. Di ziman ê Erebi de weha ye û di ziman ê Kurdî de weha ye. Nabe em bibêjin; çimku ev wata ya han (bede`e) di ziman ê Erebi de yek peyv e û bi yek peyvê hatiye darijtin, gerek peyv a Kurdî ya li beramber wê jî weha yek peyv be. Ev ne mercekî rast e.

Di hevekekê wek: “du kes birîndar bûn” de, ew weha dinivîsin: “du kes birîndarbûn”. Ango di evê hevekê de peyv a “birîndar” û kirde yê “bûn” bi hevdu ve girê didin. Herweha, dem a em dibêjin “çareserkirin” em jêder didin xuyakirin, anga peyv a “çareserkirin” jêder e. Belê dem a em dibêjin: “wan ev pirs çareser kir in” û em “çareser” û “kir” û “in” ji hev cuda dikin, em hevekek kirdeyî çê dikin. Mixabin ku di nivîsandinê de şaşîyek rêzimanî û rênivîsî dihê kirin, dem a ku di pergala jêder de “ki-

rin” ji “çareser” cuda dikin û di pergal ê kirdeyî de “kir” û “in” bi “çareser” ve girê didin. Dibêjin: “ev pirs hat çareser kirin” û gerek ev hevek weha be: “ev pirs hat çareserkirin” ango “çareser” û “kirin” bi hevdu ve bin, ji ber ku di vir de em jêder bi kar dihînin û kirde di evê hevekê de “hat” e. Herweha, dibêjin: “çareser kirin a evê pirsê asan e” ango “çareser” û “kirin” ji hevdu cuda dikin, bi tevî ku ew di vir de jêder e û divê herdu bi hevdu ve bin û gerek ev hevek a han weha be: “çareserkirin a evê pirsê asan e”. Ew ên weha dikin, nizanin peyv çawa dibe jêder û nizanin hevek kengî dibe kirdeyî. Bê goman dem a em dibêjin: “birîndarbûn” em jêder çê dikin an em jêder dixwînin û li angora evê yekê, hevek a “du kes birîndarbûn” ne kirdeyî ye, ji ber ku kirde tê de tine ye. Herweha, dibe li angora ziman ê gell bihê hobarkirin, belê li angora rêziman bê wata ye. Rastî ya evê hevekê ev e: “du kes birîndar bûn” ango gerek kirde yê “bûn” ji peyv a “birîndar” cuda bihê nivîsandin, da ku em kirde û jêder ji hevdu nas bikin. Ango “birîndarbûn” jêder e û “birîndar bûn” destwajeyek kirdeyî ye, ango kirde ye. Herweha dibêjin: “teqînek bû engîz a birîndar kirin a du kesan” ku peyv a “birîndarkirin” parçe dikin û “birîndar” û “kirin” ji hevdu cuda dinivîsin. Di evê heyvêzê jî de “birîndarkirin” jêder e û gerek “birîndar” û “kirin” bi hevdu ve bin, da ku jêder dirist bibe, belê ew parçe dikin û bi evî awayî jêder winda dibe. Ev hevek a weha di nav gell de dihê hobarkirin, belê li angora rêziman şaş e.

Dem a em dinivîsin: “windakirin a resenîyê şaş e” em evê hevekê rast bi kar dihînin û em peyv a “windakirin” a ku jêder e, rast bi kar dihînin. Belê dem a em dibêjin: “winda kirin a resenîyê şaş e” û em peyv a jêder “windakirin” weha parçe dikin û em “winda” û “kirin” ji hevdu cuda dikin, em şaşîyek mezin

di bare ya rêziman de dikin. Herweha, dem a em di peyv a “ji bîrkirin” de amraz ê “ji” bi peyv a “bîrkirin” ve girê didin, em şaşîyê dikin, ji ber ku hem amraz ê kîşanê serbixwe ye û hem jî peyv a “bîrkirin” jêder e û nabe ku amrazek pê ve bihê girêdan. Heger em bibêjin ku peyv a “bîrkirin” û “ji bîrkirin” di watayê de du peyv ên ne wek hevdu ne, rast e, belê ev newekhevî ya han di hevekê de dîyar dibe, ku dem a me amraz ê “ji” danî pêşî ya peyv a “bîrkirin” bê ku pê ve girêdayî be, wata ya xwe dide. Rast e, peyv a “bîrkirin” ango dihê bîr a mirov an jî hizirkirin e û “ji bîrkirin” ango ji bîr a mirov diçe, belê gerek amraz ê kîşanê “ji” jî jêder “bîrkirin” cuda be û heger me xwazt wata ya “çûn a ji bîrê” bihînin û wek jêder be, gerek em bibêjin “bîrekirin”. Peyv a “bîrekirin” wek jêder wata ya “çûn a ji bîrê” dide û weha pêwîst nake ku ji bo hînan a evê watayê, amraz ê “ji” pê ve bihê girêdan. Wata ya ku em ji peyv a “ji bîrkirin” dixwazin ew e, ku tiştê ji bîrê diçe.

Di ziman ê Kurdî de amraz ê kîşanê (pêrbest) herdem serbixwe ye û bi peyvê ve nahê nivîsandin û dem a ku bi peyvê ve hat nivîsandin (ango bû ji kok a peyvê) peyvek a din a cuda çê dibe. Di nimûneyekê de wek “lidar xist” şaşî ew e, ku amraz ê kîşanê “li” bi peyv a “dar” ve hatiye girêdan û gerek ew jê cuda be. Ji xwe hinek evê destewajeyê wek “lidarxist” dinivîsin û şaşîyek mezin dikin. Destewaje ya “li dar xist” kirdeyî ye û gerek hersê beş ên wê “li – dar – xist” ji hev cuda bin. belê dem a bihê xwaztin ku jêder jê he be, hîngê jêder “darexistin” e. Ango nabe ku amraz ê kîşanê “li” bi peyv a “dar” ve bihê girêdan, da ku wata ya daxwazkirî nehê guherandin û nebe watayek a din. Di nimûne yê wek: “jîdest da, bidest xist, lihev kevt, bidawî hat...hd” ev şaşî ya han dihê kirin û amraz ên kîşanê “ji, bi, li... hd” bi peyvê ve dihên girêdan û ev şaşîyek rêzimanî ye. Rastî ya

evan destewajeyan jî dem a ku bi karhînan a kirde be ev e: “ji dest da, bi dest xist, li hev kevt, li dar xist, li dar kevt, bi dawî hat... hd” û dem a ku bi karhînan a jêder be ev e: “destedan, destexistin, hevekevtin, darexistin, darekevtin, dawîhatin... hd”. Di nimûneyekê wek: “pêk dihê” de ku wê wek: “pêktê” dinivîsin, ji bilî ku gerek kirde yê “tê” rast û li angora rêziman “dihê” bihê nivîsandin, ew “tê” bi peyv a “pêk” ve girê didin. Bê goman ev jî di bin sirêm a (bandor a) hizirkirin a li angora ziman ê Erebi de ye, ku ev wata di ziman ê Erebi de yek peyv e (yehsel). Nimûne ya “li gel” jî di evî biwarî de gelek xuyanî ye û ew wek “ligel” dinivîsin û heger em li angora evê binçîn a şaş binivîsin, em dê êdî hemû amraz ên kişanê bi peyv an ve girê bidin û weha dê rêzan û resenî ya ziman ê Kurdî winda bibin.

Di ziman ê Kurdî de, hem girêdan di heyvêz a peyv an de xwedî binçîn û rêzan e û hem parçekirin di heyvêz a peyv an de xwedî binçîn û rêzan e. Dem a ku girêdan sirêm a darin (selbî, negatîv) li peyvê bike, gerek ew girêdan nehê kirin û çê nebe. Dem a ku parçekirin jî sirêm a (bandor a) darin li peyvê bike, gerek ew parçekirin nehê kirin û çê nebe. Pîvan a dîtînan a evan herdu pergalan (pergal ê girêdanê û pergal ê parçekirinê) di naskirin a beş ê peyvê de ye, ango dem a em nas bikin ka em çî beş ê peyvê bi kar dihînin, em dikarin girêdan a rast û parçekirin a rast encam bidin. Di evê pirsê de jî, wirdî (diqqet) û zanîn a rêzimanî pêwîst in û ji evê çendê jî giringtir, zanîn a surîşt a ziman ê Kurdî pêwîst e.

Du pît ên bê deng ên wek hevdu dihên ber hevdu / Du pît ên dengdar nahên ber hevdu

Di binçînek a ne rast de hatiye û dihê gotin, ku di ziman ê Kurdî de du pît ên bê deng ên wek hevdu nahên ber hevdu. Weha dane nîşandan ku di ziman ê Kurdî de du pît ên bê deng bi hevdu re tişteki nepejirandî ye, bê ku li angora engîzek a (sebebek a) rêzimanî ya rast bidin xuyakirin, ka çima weha nepejirandî ye. Ewan gotine ku di ziman ê Kurdî de pît a ku nehê levakirin nahê nivîsandin û ev şaşîyek mezin e, ji ber ku di ziman ê Kurdî de hemû pîtek a her peyvekê, dihê yan divê bihê levakirin û nivîsandin. Peyv çawa be û girêdayî çî watayekê be, weha dihê levakirin. Di ziman ê Kurdî de weha ye. Heger pîtek a peyvekê jî nehê levakirin, wata ew e ku şaşî di levakirin û xwîndinê de he ye. Weha didin xuyakirin ku dem a du pît ên bê deng ên wek hevdu rastî hevdu dihên, yek ji wan dimîne. Ew ên weha dibêjin û gotine, pişt a xwe bi binçîna lawaz û ne dirist a levakirin a bê şîraz ve girê dane. Ew dibêjin ku di levakirinê de pîtek ji ewan pît ên wek hevdu yê li ber hevdu, nahê levakirin. Dîsan peyv a Kurdî dikin qurbanî levakirin a bê şîraz û binçîn. Levakirin a bê şîraz û binçîn jî ew e, ku ne girêdayî rêziman û rênivîsê be. Ev hizir a şaş dibe engîz a kujtin a peyv a Kurdî. Peyv di ziman ê Kurdî de bi hemû pît ên xwe ve dihê xwîndin û gerek weha jî bihê nivîsandin. Heger pîtek a peyvekê ji peyvekê bihê rakirin û nehê xwîndin û nivîsandin, ew peyv kilês dibe (xerab dibe).

Di nimûneyekê de wek: “ev gotin ji gotin a din rasttir e” didin xuyakirin ku di levakirinê de peyv a “rasttir” şaş e û gerek “rasttir” wek “rastir” bihê nivîsandin, da ku herdu pît ên “t” nekevin ber hevdu de. Mixabin.. rast dikin şaş û şaş dikin rast. Heger em dakarîyek rêzimanî bi peyv a “rastir” re bikin, em dê bibînin

ku ev peyv a han ji du beşan pêk hatiye, ku beş ê yekem “ras” e û beş ê duyem “tir” e. Belê wata ya peyv a “ras” çi ye ? Aya dem a em peyv a “rast” dikin “ras” em peyv a “rast” nakujin? Bê goman em wê dikujin, ji ber ku em wê bê wata dikin û ziman ê Kurdî evê yekê napejirîne. Ne dirist e bihê gotin, ku gerek em ji ber xwe ve hobar bikin (fam bikin) ku “rastir” ango “rasttir” e, ji ber ku rêziman dakarîyê bi kok û surişt a peyvê re dike û jê re levakirin a bê binçîn ne giring e. Di nimûne ya “birîn” û “birrîn” de baş ji me re dihê xuyakirin, ku ew ên gotine û dibêjin; ku du pît ên bê deng ên wek hevdu nahên ber hevdu, şaşîyek mezin kirine û dikin. Di vir de dîsan jî dibêjin ku divê em ji ber xwe ve hobar bikin, ku “birîn”ek ji bo birînê ye û “birrîn”ek ji bo birrînê ye û ji bîr dikin, ku heta di levakirinê jî de ev herdu peyv ne wek hevdu ne. Belê ev levakirin xwedî binçîn e, ji ber ku li ser bingeh a surişt a ziman e. Çimku heta di evê levakirinê jî de, pît a “r” ya peyv a “birîn” ne wek pît a “r” ya peyv a “birrîn” e, ku pît a “r” ya peyv a “birîn” yek carê dihê derxistin an sivik e û pît a “r” ya peyv a “birrîn” du caran dihê derxistin, ango dihê gîrekirin (şiddandin) û giran e. Nimûne yê wek: “kerr, kurr, berr, terr, perr... hd” jî her weha didin xuyakirin.

Di kanalek a televiziyonî de peyv a “serokkomar” wek “serokomar” dihê nivîsandin, da ku li angora evê binçîn a şaş herdu pît ên “k” nekevin ber hevdu de. Ew ên ku peyv a “serok” dikin “sero” yan peyv a “komar” dikin “omar” çi li evê peyvê dikin? Bê goman evê peyvê ji wata ya xwe ya resen vala dikin û evê peyvê riswa dikin. Erê.. dem a peyv a “serokkomar” bi yek pît a “k” bihê nivîsandin, hîngê yan ew “k” ya mayî ji peyv a “serok” re ye yan jî ji peyv a “komar” re ye û çê nabe ku ji herduyan re be. Heger ev pît a “k” ji “serok” re be, hîngê “komar” dibe “omar” û heger pît a “k” ji peyv a “komar” re be, hîngê peyv a

“serok” dibe “sero”. Di herdu heyvêzan jî de yan peyv a “serok” dimire dem a ku dibe “sero” yan jî peyv a “komar” dimire dem a ku dibe “omar”. Ti caran surişt a ziman ê Kurdî evê şaşî ya mezin napejirîne. Surişt a ziman ê Kurdî kok û resenî ya peyvê diparêz. Heger di levakirin a bê binçîn de ew kok û resenî nahên xuyakirin, ev yek nahê ewê watayê ku ew kok û resenî nînin. Heger çiqas ku ew kok û resenî di levakirinê de ne xuyanî jî bin, belê divê ew di nivîsandinê de xuya û di cih ên xwe de bin.

Peyv a “gel” a ku wata ya wê “pê re, kom, grûp” e, pît a wê ya dawî “l” hem sivik e û hem jî xuyanî ye ku bi ten a xwe ye, belê pît a “l” ya peyv a “gell” a ku millet dide nîşandan, heger hinekî jî be, sert e û xuyanî ye ku gîrekirî (şiddandî) ye. Weha jî ev herdu peyv ji hevdu dihên cudakirin, ku “li gel” wata ya “pê re, kom” û “grûp” dide nîşandan û peyv a “gell” millet dide nîşandan. Ji bilî ku ev pirs a han semantîkî ye, ew bi xwe etîmolojîk jî ye, ji ber ku ew kok a peyvê dide xuyakirin û du peyv ên ku her yek ji wan watayekê dide, ji hevdu cuda dike. Ev cudakirin jî gelek giring e. Dem a em dibêjin pît a “l” ya peyv a “gell” gîrekirî ye, mebest a me ew e ku em giringîyê didin levakirin a ku li ser bingeh a surişt a ziman e, belê wek me da nîşandan, ev pirs a han girêdayî kok a peyvê û çêbûn û zagîn a peyvê jî ye. Ango ev peyv di kok û zagîn a xwe de dîyar e ku pît a wê ya dawî “l” gîrekirî ye yan sivik e. Heger gîrekirî be (gell) wata ya millet dide û heger sivik be (li gel, gel) wata ya “pê re, kom” û “grûp” dide.

Di ziman ê Kurdî de du pît ên dengdar nahên ber hevdu, ku ev surişt a zimanvanî ti caran di ziman ê Kurdî de ne şkestiye. Belê em dikarin di hinek berheman de bibînin, ku ev surişt a han hatiye binpêkirin û şkandin. Ti caran Kurd nabêjin “bêl” û dem a Kurd evî amrazî dixwînin “bêyî” ye. Kurdan gotine û dibêjin

“bêyî te...” û ne gotine û nabêjin “bêî te...”. Kurdan gotine û dibêjin “lawo here...” û ne gotine û nabêjin “lao here...”. Ji bo ku du pît ên dengdar nehên ber hevdu, Kurdan pît ên bê deng ên wek “y, h, w” bi kar hînane, da ku du pît ên dengdar ji hevdu dûr bixin. Ev pirs a han di ziman ê Kurdî de dîyar û aşkira ye û ne pêwîstî hînan a nimûneyan e. Ne tenê ji ber ku ziman ê Kurdî zimanekî birrgehîn e du pît ên dengdar tê de nahên ber hevdu, belê ji ber ku her pîtek a dengdar di ziman ê Kurdî de serbixwe ye û ji ber ku ziman ê Kurdî di biwar ê şîraz a deng de zimanekî zelal e. Dem a ku du pît ên dengdar jî dikevin ber hevdu de nezalalî çê dibe û jûlîn (teşwîş) çê dibe, ango tevhevî çê dibe û ziman ê Kurdî evê tevhevîyê napejirîne. Kengî Kurdan gotine “tu têî cem me” ? Kurdan herdem gotine û dibêjin “tu têyî cem me” û di ziman ê gell de “ti têy cem me”. Ne di ziman ê gell de û ne di ziman ê petî yê Kurdî de, du pît ên dengdar nahên ber hevdu. Ew ên ku weha jî kirine û dikin, di bin sirêm a (bandor a) biyanîyan de weha kirine û dikin. Gerek em nas bikin, ku ev taybetmendîyek ziman ê Kurdî ye û gerek bihê paraztin, da ku rêzan û terazû ya ziman ê Kurdî paraztî bin. Ev pirs a zimanvanî girêdayî şîraz a deng a ziman ê Kurdî ye û dem a ku ev şîraz nacûr û kilês bibe, dê nacûrî û kilêsîyek mezin di ziman ê Kurdî de çê bibe. Heger du pît ên dengdar bi hevdu re bihên, dê ziman ê Kurdî nema zimanekî birrgehîn be û surîşt a yekem a avayî ya ziman ê Kurdî ew e ku ew zimanekî birrgehîn e. Her ji dem a ku ziman ê Kurdî çê bûye, zimanekî birrgehîn bûye û hemû ziman ên ku weha birrgehîn bûne, resen bûne. Heger hinek ziman ên ku ew jî ji gulb a ziman ê Arîyayî bûne, nema xwe girêdayî evê surîşt a birrgehîn dibînin, ew arêşe ya wan e. Ziman ê Kurdî nikare evê taybetmendî ya xwe ya birrgehîn bihêle û dev jê berde, ji ber ku şîraz û terazû ya ziman ê Kurdî û kok û resenî ya

ziman ê Kurdî, bi evê taybetmendîyê ve girêdayî ne.

Binçîn (qayide) jî, ji levakirin a bê binçîn re çê nabin, binçîn ji rastî ya peyvê re, ji kok a peyvê re û ji surîşt a peyvê re çê dibin. Ji bilî ku rêziman ji diyalektan re jî çê nabe, rêziman ji ziman ê petî re çê dibe. Heger em evê pirsê baş hobar bikin, em dê ziman ê Kurdî ji evan şaşî yên kujek rizgar bikin. Heger na.. em dê ziman ê Kurdî bikin xwedî avayîyek ne dirist, ku dê di evê avayîyê de kêmanî yên jîn a ziman he bin û dê ew kêmanî pîr jî bin. Ji ber ku ji ziman re jî jîn he ye û jîn a ziman ne tenê keresteyîn (maddî) e, belê ew giyanî (rûhî) jî ye.

Em dikarin di biwar ê pirs a levakirinê de, du cor ên levakirinê di ziman de bibînin. Levakirin a şîrazkirî ya dîrokî ya ku li ser bingeh a rêzimanî ye û her pîtekê di her peyvekê de ji dev diderxîne û levakirin a bê şîraz a ku bê bingeh û binçîn e û pît ên peyvê winda dike yan diguherîne. Rêziman jî levakirin a şîrazkirî ji xwe re dike bingeh û jêder a hizrê û pişt a xwe bi levakirin a bê şîraz ve girê nade. Levakirin a şîrazkirî rêzimanî ye û girêdayî zanist a ziman e, belê ji bilî levakirin a bê ser û bin ti bingeh ên zanistî ji levakirin a bê şîraz re tine ne.

Çima du pît ên “l” di peyv a “gell” de he ne ?

Goman tê de nîne ku hinek pît ên ABC ya Kurdî û ji wan jî pît a “l” sert, qelew û gîrekirî ne (şiddandî ne) û tişt ê ku evê pirsê nîşan dide, şêwaz ê deng ê ziman ê Kurdî ye. Gîrekirin a pîtek a nav peyvekê, sirê mê (bandorê) li watayê dike û guherandinekê di biwarê etîmolojîk de çê dike. Ango gîrekirin a pîtekê dibê engîz a zagîn a peyvek din an peyvek din dide nîşandan. Cudakirin a ji hev a wata ya peyvan jî, di ziman de rêbaz û qa-nûnek rast û pêdivê ye. Pirs a ku peyvek he be û gelek watayan bide, ji me re lawazî ya ziman dide nîşandan û ziman ê Kurdî ne ewqas lawaz e. Dem a em dibêjin; peyv a “gel” hem wata ya komê dide û hem wata ya millet dide, em ewê lawazîyê derbasî nav zimanê Kurdî dikin. Di rastî ya xwe jî de û li angora rêzan a deng a zimanê Kurdî, peyv a “gel” a ku yek pît a “l” tê de ye, tenê wata ya komê û “pê re, li gel” û gulbê (grûpê) dide û pît a “l” ya evê peyvê (gel) sivik û nerm e. Belê di peyv a “gell” de ya ku wata ya millet dide, em dikarin gîrekirin a pît a “l” nas bikin û pê xust bikin (pê hest bikin) ku di dev de tije ye. Wek nîşe (têbînî) jî, ji bilî gîrekirinê, nermbûn û sivikbûnê, gufbûn (zexmbûn, amplify) jî di biwarê derxistin a pîtan de he ye. Gîrekirin ew e dem a ku pîtek bi xwe di cihderk a xwe de tund bihê derxistin, belê gufbûn an qelewbûn ew e dem a ku pîtek bi tijebûn ji dev biderkeve. Li başûr dem a ku dibêjin “li gel” pît a “l” ya peyv a “gel” qelew (guf) diderxînin, belê gîrekirin tiştêkî din e. Gîrekirin ew e dem a ku pîtek bi xwe bihê tundkirin û wek dubarekirinê be. Pît a gîrekirî dubarekirî ye.

Di evê pirsê de, mebest ne pît a qelew e, belê mebest pît a gîrekirî ye û di peyv a “gell” de pît a “l” gîrekirî ye û ji ber evê yekê dubarekirî ye. Li angora cihderkê jî, pît a “l” ya peyv a

“gel” a ku wata ya “komê, pê re û grûpê” dide sivik û nerm e, ji ber ku dem a ziman evê pîtê diderxîne, bi hêminî bi ziman û ji ezman ê dev diderxîne. Belê dem a ku peyv a “gell” a ku wata ya millet dide diderxîne, ji heman cihderkê û hinekî gîre- kirî diderxîne. Weha jî cudayî dikeve navber a du peyv û du watayan de, ku peyv a “gel” kom, pê re û grûp e û peyv a “gell” millet e.

Ev peyv ên han ên ku ji rêz a peyv a “gel, gell” in, di ziman ê Kurdî de xuya dibin û her yek ji wan watayekê serbixwe dide. Hinek ji wan du pît ên “l” di wan de ne û me ew li angora zanîn a xwe ya ferhengî tomar kirine. Dibe ku babet ê wan firehtir be, belê me ew tenê bi evî awayî tomar kirine:

- Gal: gulîk a pembo ye. Gwîz a pembo ye. Di ser ê tila yên dar a pembo de çê dibe û pembo tê de ye. Heta ku girtî ye wek gwîzekê ye û ku divebe pembo jê diderkeve. Pît a “l” ya evê peyvê sivik û nerm e.

- Gall: gerîn a ziman e. Dem a ku ziman ê zarok ên sava dest bi gerînê dike û peyvîna a destpêkê çê dibe, dibêjin “zarok bi girr û gall kevtiye” ango êdî li ber e ku bipeyive. Pît a “l” ya evê peyvê hem gîrekirî û hem guf (qelew) dihê derxistin.

- Gel: kom e, grûp e. Dem a ku wek “li gel” jî dihê gotin û nivîsan- din wata ya “pê re” dide, ango “pê re” ya bi kom ve ye. Pît a “l” ya evê peyvê nerm û sivik e, belê li başûr guf dihê derxistin û gufbûn a wê ya li başûr girêdayî rêzan a deng a zarav a başûrî bi xwe ye. Gufbûn jî ji gîrekirinê cuda ye.

- Gell: millet e yan beşekî millet e. Pît a “l” ya evê peyvê gîrekirî ye û gîrebûn a wê di navber a ziman û ezman ê dev de bi sivikî çê dibe.

- Gêl: kewden e, ne hobar e, ehmeq e, bê hiş e. Ew mirov e yê ku her kes dikare wî bixapîne û tişteki hobar nake (tişteki fam

nake). Pît a “l” ya evê peyvê bi sivikî diderkeve.

- Gil: ewret e. Cih ê laş ê ku şerm e bihê dîtin û dihê veşartin. Gil peyvek giştî ye û wata ya cih ê laş e yê ku gerek nehê dîtin. Wata ya evê peyvê li hinek deveran û di hinek aksentan de “daw” e. Pît a “l” ya evê peyvê sivik û nerm e.

- Gill: ax a nerm û bê kevir e. Pît a “l” ya evê peyvê gîrekirî ye. Peyv a “gill” wata ya ax a hişk, zuha û hûr dide û taybetmendî ya wata ya evê peyvê di evê rewşê de ye. Ango “gill” axek hûr, hişk û zuha ye. Belê bi giştî bi kar dihê û ev taybetmendî ya han li ber çav nahê girtin.

- Gîl: herî ye, teqn e. Belê ew herîyek tund e. Herîyek weha ye ku wek çespê ye û peyarbûn a (meş a) di nav de gelek dijwar e. Pît a “l” ya evê peyvê sivik û nerm e.

- Gol: derya ya biçûk û girtî ye. Gol derya ya biçûk e ya ku dor a wê xak e û ew di cihekî destnîşankirî de ye. Pît a “l” ya evê peyvê nerm e.

- Goll: girêk e, bendik e, zîrek e, jêhatî ye, karyar e. Ev peyv a han bi peyv a “gurc” re hevbend e û dem a ku mirov ê xweşik, zîrek, çist û çalak didin nîşandan, dibêjin: “ew kesekî gurc û goll e” wata ew kesekî xweşik, zîrek, çist û çalak e. Pît a “l” ya evê peyê guf û gîrekirî ye.

- Gul: gul a gulzarê, gul a baxçe û gul a suriştê ye. Gul nîşan a jînê ye û di derûnê de nîşan a ciwanîyê û evînê ye. Pît a “l” ya evê peyvê sivik û nerm e.

- Gull: nexweşîyek a pêst (cild) e û wek bîrovê ye. Hinek dibêjin ku ew bîrov bi xwe ye. Pît a “l” ya evê peyvê gîrekirî ye.

- Gûl: xişl, xeml û xêz e. Zêr, zîv û mirwarî yên ciwanîyê “gûl” e. Pît a “l” ya evê peyvê sivik û nerm e.

Di nav evan peyvan de dîyar dibe, ku di hinek peyv ên kurdî de pît a “l” gîrekirî yan nerm û sivik diderkeve. Bê goman, ne tenê

pît a “l” weha ye, belê gelek pît ên ziman ê Kurdî yê bê deng, bi evî awayî diderkevin. Bi awayekî taybetî jî, pît a “l” ya peyv a “gell” gîrekirî ye û weha ew hem di wata ya xwe de û hem di rêzan a deng ê xwe de, ji peyv a “gel, li gel” dihê cudakirin.

Kirde yê bûyînê

Kirde yê bûyînê ji kok a “bû” ye û bi kirde re alîkar e. Ew pergal ê bûyînê dide nîşandan û hevek bêyî wî ne gurah e. Kirde yên bûyînê di dem a amad, mêjîn û ayinde de ne wek hev in, belê wata ya hemûyan bûyîn û çêbûn e. Di her demekê de taybetmendîyek a bi karhînanê he ye û pê re jî, hinek taybetmendî yên wan ên nivîsandinê he ne.

1- Di dem a amad de:

- **im:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê yekem ê tak “ez” e (ez im, ez dibim) û dem a ku pît a berî wî bê deng be “im” e wek: “ez kar dikim, ez ji xew dirabim, ez nameyê dinivîsim...”. Ev kirde yê bûyînê ji nam cuda dihê nivîsandin wek: “ez xebatkar im” ku ne pêwîst e kirde yê bûyînê “im” bi peyv a “xebatkar” ve be, belê wek hevek û wata pêwîstî “im” e û jê cuda dihê nivîsandin. Ew her pêwîstî “im” e ji ber ku bê evî kirde yê bûyînê, wata gurah nabe. Di nimûne yên kirdeyî yên dem a amad de yên wek: “ez dixwînim, ez dinivîsim, ez dihilbijêrim, ez divexwim...” kirde yê bûyînê “im” bi peyvê ve (bi kirde ve) dihê nivîsandin, ji ber ku peyv (kirde) bê wî wata ya xwe bi ten a xwe nade. Ango peyv ên “dixwîn..., dinivîs..., dihilbijêr..., divexw...” bê wata ne û tenê dem a ku kirde yê bûyînê bi wan re dibe alîkar û bi wan ve dihê girêdan, dibin xwedî wata.

Ev kirde yê bûyînê di dem a mêjîn a nêzîk de xwedî taybetmendîyekê ye û ew jî ew e, ku ew di heyvêzekê de ji peyvê cuda dihê nivîsandin û di heyvêzekê de bi peyvê ve ye. Wek nimûne.. dem a em bi jêder a “kevtin” re bi kar dihînin, dibe “ez kevt im” û di evê heyvêzê de ji peyvê cuda ye ji ber ku pît a dawî ya peyvê bê deng e (kevt). Belê bi jêdereke wek “çûyîn” re dibe “ez çûm” û bi peyvê ve dihê nivîsandin û ev kirde yê

bûyînê kê m dibe, ji ber ku pît a dawî ya peyvê dengdar e (çû). Ew kê m dibe ji ber ku ji “im” tenê pît a “m” dimîne û xuya ye ji ber ku kê m dibe lawaz dibe û bi peyvê ve dihê girêdan.

Wek nîşe (têbînî) jî, gerek di heyvêz a duyem jî de (heyvêz a ku dawî ya peyvê tê de pîtek dengdar e) ev kirde yê bûyînê wek “yim” baya û li angora surîşt a ziman ê Kurdî ew weha ye, belê ev heyvêz nahê pejirandin ji ber ku weha dihê gotin ku êdî ziman weha cih ê xwe girtiye, ango wek “çûm” ne “çûyim” cih ê xwe girtiye. Em jî evê yekê niha tenê wek nîşe pêşkêş dikin.

Di hersê heyvêz ên din ên dem a mêjîn de (gurah, dûr û xayan) ev kirde yê bûyînê bi peyvê ve dihê nivîsandin. Wek nimûne.. bi jêder a “kevtin” re di heyvêz a dem a mêjîn a gurah de dibe “ez kevertime” di heyvêz a dem a mêjîn a dûr de dibe “ez kevtibûm” û di heyvêz a dem a mêjîn a xayan de dibe “ez dikevtim”.

Ev kirde yê bûyînê di dem a ayinde de, her wek çawa di dem a amad de, bi peyvê ve dihê nivîsandin. Wek nimûne.. “ez dê bixwînim, ez dê biçim, ez dê binivîsim, ...”.

- **me**: ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê yekem ê tak “ez” e û dem a ku pît a berî wî dengdar be “me” ye wek: “ez hosta me, ez perî me, ez bi xanî me, ez rêwî me, ...”. Her ew weha jî ye (me ye) ji ber ku pît a dawî ya peyv a berî wî dengdar e. Ev kirde yê bûyînê herdem ji peyvê cuda dihê nivîsandin. Nîşeyek giring di bare ya evî kirde yê bûyînê de he ye û ew jî ew e, ku ev kirde yê bûyînê bi xwe “yim” bûye û di ziman ê gell de wek “me” cih ê xwe girtiye. Ango di nimûneyekê wek “ez mamosta me” de bi xwe “ez mamosta yim” bûye. Şêwaz ê heyvizandin a evî kirde yê bûyînê weha bûye, ku ji kirde yê bûyînê “im” tenê “m” maye û kirde yê bûyînê “e” pê ve hatiye girêdan û weha, heyvêz a “me” çê bûye.

- **î, yî**: ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê duyem ê tak “tu” ye (tu

yî, tu dibî) û dem a ku pît a berî wî bê deng be “î” ye wek: “tu mirovekî jîr î, tu mirovek a jîr î, tu hevalekî baş î, ...”. Dem a ku pît a berî wî dengdar jî be “yî” ye wek: “tu kesekî hêja yî, tu zerî ya malê yî, tu ji rojava yî, ...”.

- **e, ye:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê sêyem ê tak “ew” e (ew e, ew dibe) û dem a ku pît a berî wî bê deng be “e” ye wek: “ev şagirdekî zîrek e, ew mêrekî çeleng e, xebat a welat erk e...”. Dem a ku pît a berî wî dengdar jî be “ye” ye wek: “ev karekî hêja ye, ev sertagekî bala ye, xanî avayî ye, rev ne mêranî ye, ...”.

- **in:** ev kirde yê bûyînê girêdayî pergal ê kom e. Dem a ku pît a berî wî bê deng be “in” e wek: “em in, hûn in, ewan in – ev dar dirêj in, ev sêv sor in, ew zarok jîr in, ...”. Ev kirde yê bûyînê di dem a amad de bi kirde ve dihê girêdan da ku wata gurahe bibe wek: “em dixwînin, hûn dilîzin, ewan diçin...”. Dem a ku di nimûne yê weha de kirde yê bûyînê “in” ji kirde cuda bihê nivîsandin, kirde bê wata dibe wek: “em dixwî..., hûn dilîz..., ewan diç...”. Belê dem a ku peyv wata ya xwe bide, kirde yê bûyînê “in” ji peyvê cuda dihê nivîsandin wek: “ew kes namdar in, ev newal kûr in, ev bazin ji zêr in, wan kar ên xwe kir in”. Ango tenê bi kirde û jêder ve dihê girêdan, belê bi beş ên din ên peyvê ve nahê girêdan. Ev kirde yê bûyînê peyvê bê bi karhînan a amrazê komê “an, yan” dike kom. Di nimûne yê derbasbûyî de dihê xuyakirin çawa kirde yê bûyînê peyv a daxwazkirî dike kom. Peyv a daxwazkirî ango ew peyv a ku gerek bibe kom an wek kom bihê nîşandan. Di ewan nimûneyan de em dibêjin: “ew kes namdar in” û em nabêjin: “ew kesan namdar in”.. em dibêjin: “ev newal kûr in” û em nabêjin: “ev newalan kûr in”.. em dibêjin: “ev bazin ji zêr in” û em nabêjin: “ev bazinan ji zêr in”. Ango kirde yê bûyînê “in” peyv a ku dihê xwaztin ew di

hevekê de kom be dike kom, bê ku amraz ê komê “an, yan” bi peyv a daxwazkirî re bi kar bihê.

Nîşeyek (têbînîyek) di bare ya “in” de he ye û ew jî ew e, ku dibe ev “in” di peyvekê de ji kok a peyvê be wek: “mezin, bazin, darin, bizin, çetin, ...” û hîngê ev “in” ne kirde yê bûyînê ye. Herweha, nîşeyek jî he ye û dide xuyakirin ku “in” amraz ê diristkirin a jêder e wek: “hatin, kirin, birin, dîtin...” û dem a ku jêder dirist dike, bi peyvê ve dihê nivîsandin. Ji ber evê yekê em dibêjin, ku kirde yê bûyînê “in” di dem a amad de bi kirde ve dihê nivîsandin û bi karhînan a dem a amad xuyanî ye û pê re jî, rastî ya “in” dihê xuyakirin ka ew kirde yê bûyînê ye yan jî amraz ê jêder e. Herweha, peyv ên wek: “hatin, kirin, birin, dîtin...” jêder in û dem a ku bi alîkarî ya kirde yê bûyînê “in” di dem a mêjîn a nêzîk de dibin kirde, weha dibin: “hat in, kir in, bir in, dît in...”. Ango: “ew mirov hat in, ewan ew kar kir in, me ew alav bir in, wan ew dîmen dît in...”. Ango “in” di evê heyvêzê de ji peyvê cuda ye.

Ev kirde yê bûyînê di dem a amad de bi peyvê ve (bi kirde ve) dihê nivîsandin, wek “ew dixwînin, hûn diçin, zarok dilîz-in, ...”. Di heyvêz a dem a mêjîn a nêzîk de û dem a ku pît a dawî ya kirde bê deng be, ji kirde cuda dihê nivîsandin, wek “xwînd in, kir in, bir in, hîlbijart in, nivîsand in, revand in, şewitand in, ...” û weha ew ji jêder cuda dibe, ji ber ku heger di evan nimûneyan de kirde yê bûyînê “in” bi kirde ve be jêder çê dibe, wek “xwîndin, kirin, birin, hîlbijartin, nivîsandin, revandin, şewitandin, ...”. Di heyvêz a dem a mêjîn a nêzîk de û dem a ku pît a dawî ya peyvê dengdar be, kirde yê bûyînê “in” bi peyvê ve dihê nivîsandin û dihê guherandin – anga tenê “n” dimîne – wek “ew çûn, hûn bûn, em man, ...” û di evê heyvêzê de kirde yê bûyînê kême û lawaz e û ji ber evê yekê bi peyvê

ve dihê nivîsandin. Di heyvêz a dem a mêjîn a gurah de kirde yê bûyînê “in” bi peyvê ve ye wek “xwîndine, kirine, birine, hilbijartine, nivîsandine, revandine, şewitandine, ...”. Di heyvêz a dem a mêjîn a dûr de jî kirde yê bûyînê bi peyvê ve ye wek “xwîndibûn, kiribûn, biribûn, hilbijartibûn, nivîsandibûn, revandibûn, şewitandibûn ...”. Di heyvêz a dem a mêjîn a xayan jî de kirde yê bûyînê “in” bi peyvê ve ye wek “dixwîndin, dikirin, dibirin, dihilbijartin, dinivîsandin, ...”.

Ev kirde yê bûyînê di dem a ayinde de bi peyvê ve (bi kirde ve) dihê nivîsandin, wek “ew dê bixwînin, hûn dê birabin, em dê biçin, ...”. Ev kirde yê bûyînê bi naman jî ve nahê girêdan, wek “ew namdar in, ev dar in, hûn şoreşvan in, ..”. Bi Rewşê ve nahê girêdan wek “sor in, baş in, rengîn in, ...”. Bi jêder ve nahê girêdan wek “nehiştin in, xwîndin in, revandin in, zanîn in, ...”. Bi pergal ve nahê girêdan wek “nexweş in, hejar in, birîndar in, ...”. Bi Lîn ve jî nahê girêdan wek “ser in, bin in, jor in, jêr in, ...”.

- **ne:** ev kirde yê bûyînê girêdayî pergal ê kom e. Dem a ku pît a berî wî dengdar be “ne” ye wek: “çend derî ne? deh derî ne”.. “ev kinc zuha ne”.. “ew kaxez sade ne...”. Nîşeyek di bare ya evî kirde yê bûyînê de he ye û ew jî ew e, ku ev kirde yê bûyînê bi xwe “yin” e, belê ji “yin” pît a “n” maye û kirde yê bûyînê “e” pê ve hatiye girêdan û weha bûye “ne”. Ev kirde ji nam cuda ye wek “çiya ne, zevî ne, zerî ne, ...” û gerek pît a dawî ya nam dengdar be. Ji rewşê cuda ye wek “sipî ne, aza ne, keje ne, ...” û gerek pît a dawî ya rewşê dengdar be. Bi jêder a amraz ê “î” re dihê wek “nexweşî ne, azadî ne, hejarî ne, ...”. Bi pergal re dihê wek “kevtî ne, zehî ne, dara ne, weza ne, ...” û gerek pît a dawî ya pergal dengdar be. Bi lîn re dihê wek “li serî ne, li binî ne, li nivê ne, ...” û gerek pît a dawî ya lîn dengdar be.

Di dem a amad de heyvêz a “dibe” ye, wek: “dibe ku ev bûyer çê bibe” û “ev mindal dibe kesekî jîr”.

- **Nîşe:** Kirde yê bûyînê yê dem a amad “ye” di dem a mêjîn a gurah de bi peyvê ve dihê nivîsandin, da ku wata ya wê gurah bike wek: “kevtiye, şkestiye, rabûye, xwîndiye, nivîsandiye, zaniye, biriye, birriye, kiriye, kirrîye, dîtîye...”.

2- Di dem a mêjîn de:

A- Di dem a mêjîn a nêzik de:

- **bûm:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê yekem ê tak “ez” e (ez bûm) wek: “yê/ya ku serkevî bû ez bûm”.. “ez dilgiran bûm”.. “ez bûm doktor ê didanan”.. “ez bûm yê/ya ku gul av dan”. Di evê nimûneyê de “ez bûm ê/a ku gul av dan” peyv a “gul” di kirde yê “dan” de kom e û ev babetekî din ê cuda û giring e.

- **bûyî:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê duyem ê tak “tu” ye (tu bûyî) wek: “tu bûyî yê/ya ku te name xwînd”.. “tu bûyî helbes-tvanekî/a mezin”.

- **bû:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê sêyem ê tak “ew” e (ew bû) wek: “ew bû yê/ya ku name xwînd”.. “ew bû yê/ya ku dar çandin”.. “ew mirovekî çalak bû”.. “ew bû mamostayekî jîr”.. “ew kesekî dilvîn bû”.. “ew bû rezvanekî jêhatî”. Ev kirde yê bûyînê ji nam, rewş, bernam, jêder, kirde, pergala û lîn cuda dihê nivîsandin û serbixwe ye.

- **bûn:** ev kirde yê bûyînê girêdayî pergala û kom e (em bûn, hûn bûn, ewan bûn) wek: “em bûn ên ku ala bilind kir in”.. “hûn bûn ên ku cot kir in”.. “ewan bûn ên ku çûn geryanê”.. “em bûn wek zinar ên çiyayan”.. “em hejar bûn”.. “hûn li nik me mêvan bûn”.. “ewan mirovinî dilsoz bûn”. Ev kirde yê bûyînê bi peyvê ve dihê girêdan û peyvê dike jêder, wek: “jîrbûn, birîndarbûn, havîbûn, zelalbûn, azadbûn, ...” û ji bilî evê yekê, ev kirde serbixwe dihê nivîsandin.

B- Di dem a mêjîn a gurah de:

- **bûme:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê yekem ê tak “ez” e (ez bûme) wek: “ez bûme yê/ya ku wane xwîndiye”.. “yê/ya ku dar çandine ez bûme”.. “ez di dibistanê de rayend bûme”.. “ez bûme yekem ê/a pol a xwe”.

- **bûye:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê duyem ê tak “tu” ye (tu bûye) wek: “tu bûye yê/ya ku şîr kelandiye”.. “yê/ya ku ev kar kiriye tu bûye”.. “tu bûye hostayekî mezin”.. “tu amade bûye”.

- **bûye:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê sêyem ê tak “ew” e (ew bûye) wek: “ew bûye yê/ya ku çûye bazarê”.. “yê/ya ku name nivîsandiye ew bûye”.. “ew bûye mêvan ê me”.. “ew kesekî zîrek bûye”.

- **bûne:** ev kirde yê bûyînê girêdayî pergal ê kom e (em bûne, hûn bûne, ewan bûne) wek: “em bûne yên ku zevî çandine”.. “hûn bûne yên ku baxçe av dane”.. “ewan bûne yên ku dark-esaxî kirine”.. “em herdem bi kêferat bûne”.. “hûn xwedî yên malê bûne”.. “ewan ji hev re baş bûne”.

C- Di dem a mêjîn a dûr de:

- **bûbûm:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê yekem ê tak “ez” e (ez bûbûm) wek: “ez bûbûm dawêrdar ê bajêr”.. “ez ne bûbûm endazyar”.. “ez ji xwe re bûbûm doktorekî suriştî”.

- **bûbû:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê duyem ê tak “tu” ye (tu bûbû) wek: “tu bûbû keya yê tîpê”.. “tu bûbû mezin ê malê”.

- **bûbû:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê sêyem ê tak “ew” e (ew bûbû) wek: “ew bûbû endazyar”.. “ew kaxez ji diwîtê reş bûbû”.

- **bûbûn:** ev kirde yê bûyînê girêdayî pergal ê kom e (em bûbûn, hûn bûbûn, ewan bûbûn) wek: “em bûbûn xebatkar”.. “hûn dilgiran ne bûbûn”.. “ewan bûbûn lîzvan ên pagogê”.

D- Di dem a mêjîn a xayan de:

- **dibûm:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê yekem ê tak “ez” e (ez dibûm) wek: “ez dibûm wek bervedêrekî”.. “ez ji xwe re ne dibûm avdêrek”.

- **dibû:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê duyem ê tak “tu” ye (tu dibû) wek: “tu di malê de dibû”.. “tu dibû kesekî namdar”.

- **dibû:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê sêyem ê tak “ew” e (ew dibû) wek: “ew dibû nivîskarekî baş”.. “ne dibû ew biçê gund”. Belê ev kirde yê bûyînê bi bernam ên din re û bi kirdedaran re jî dihê wek: “Azad li nav bajêr dibû”.. “dibû em biçin malê”.. “dibû ku hûn bikevin”. Weha jî dibe ji ber ku ev kirde yê han, hem wata ya kirde yê bûyînê dide û hem jî ji ber ku ew peyvek e û wata ya bûwerîyê (imkanîyetê) û çêbûnê dide.

- **dibûn:** ev kirde yê bûyînê girêdayî pergal ê kom e (em dibûn, hûn dibûn, ewan dibûn) wek: “em ji bo we dibûn mertal”.. “hûn dibûn pena û palpişt”.. “ewan ji me re dibûn hêvî û awat”. Ev kirde yê bûyînê, di hevekê de wata ya bûwerî û çêbûnê jî dide.

Ev heyvêz ên han jî di dem a mêjîn de, girêdayî rewş, merc û hegerîyê **ne:**

- **bûbim:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê yekem ê tak “ez” e (ez bûbim). Ev kirde yê bûyînê, çêbûn a kirde ya di dem a mêjîn de dide nîşandan û bi rewş, merc û hegerîyê ve girêdayî ye wek: “heger ew ê ev kar kiriye ez bûbim...” .. “heger ez bûbim femandarekî supa, nahê ewê watayê ku ez berpirs im”.. “herçende ez bûbim mamosta jî, ez her xwîndevan im”.. “heger ez lawaz bûbim, ez nema dikarim kar bikim”.

- **bûbî:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê duyem ê tak “tu” ye (tu bûbî). Ew bi rewş, merc û hegerîyê ve girêdayî ye wek: “heger ê ku hat tu bûbî...” û “tu bûbî mamostayekî dibistan a awarteyî”. Ew çêbûn a kirde ya di dem a mêjîn de dide nîşandan.

- **bûbe:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê sêyem ê tak “ew” e

(ew bûbe). Ew bi rewş, merc û hegerîyê ve girêdayî ye wek: “ew ê hat girtin ew bûbe, dê ne baş be” û “ew bûbe çi jî, her dê wek xwe be”. Ew çêbûn a kirde ya di dem a mêjîn de dide nîşandan.

- **bûbin**: ev kirde yê bûyînê girêdayî rewş a kom e (em bûbin, hûn bûbin, ewan bûbin). Nimûne: “em bûbin ên ku xebat kiribin”.. “heger hûn pêşmerge bûbin” û “ewan karkir ên avayîyê bûbin baş e”. Ew çêbûn a kirde ya di dem a mêjîn de dide nîşandan.

- **bûba, biba**: ev kirde yê bûyînê girêdayî rewş a tak e û ji heger re ye wek: “heger xwîndin bûba dê serkevtin jî bihata”.. “heger yekîtî bûba serkevtin misoger dibû”.. “yekîtî çê bûba, dê serkevtin jî biba”. Ew çêbûn a kirde ya di dem a mêjîn de dide nîşandan.

- **bûbana, bibana**: ev kirde yê bûyînê girêdayî rewş a kom e û ji heger re ye wek: “heger şadî bûbana dê dil hêsayî bibana”.. “heger ev kereste bûbana, firroke dihat çêkirin”. Ew çêbûn a kirde ya di dem a mêjîn de dide nîşandan.

Ev kirde yê bûyînê yê girêdayî dem a mêjîn bi du awa ne:
A- Ez bama, tu bayî, ew baya, em bana, hûn bana, ewan bana.
B- Ez bûma, tu bûya, ew bûya, em bûna, hûn bûna, ewan bûna.
Ev herdu awa yê dem a mêjîn in û bi hegerîyê ve jî girêdayî ne.
Ango dem a tu dibêjî: “ez bama/bûma min ev kar ne dikir” tu li ser kirdeyekî mêjîn (derbasbûyî) dipeyivî. Ev herdu heyvêz ên kirde yê bûyînê weha ne:

A- heyvêz a yekem:

- **bama**: ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê yekem ê tak “ez” e (ez bama) wek: “ez bama min ev kar ne dikir”.

- **bayî**: ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê duyem ê tak “tu” ye (tu bayî) wek: “tu bayî tu ne diçûyî ewê deverê”.. “gerek malxwê

tu bayî”.

- **baya:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê sêyem ê tak “ew” e (ew baya) wek: “ew baya ev name ne dinivîsand”. Ev kirde yê bûyînê bi kirde re dihê, da ku rewş a bûwerîyê bide kirde û bi xwe tak e wek: “heger ew rabûbaya ser xwe”.. “ev peyman şkestibaya baş ne dibû”.

- **bana:** ev kirde yê bûyînê girêdayî pergal ê kom e (em bana, hûn bana, ewan bana) wek: “em bana me ev zevî ne digirt”.. “hûn bana hûn dê biçûna gund”.. “ewan bana baştir dibû”. Ev kirde yê bûyînê bi kirde re dihê, da ku rewş a bûwerîyê bide kirde û bi xwe kom e wek: “heger mirovinî baş hebana karekî baş dibû”.. “gerek em biçûbana gund ê xwe”.

B- heyvêz a duyem:

- **bûma:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê yekem ê tak “ez” e (ez bûma) wek: “ez bûma min ev tişt ne dixwazt”.

- **bûya:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê duyem ê tak “tu” ye (tu bûya) wek: “tu bûya te ev bar ne dihilgirt”.. “tu bûya rewş baştir dibû”.

- **bûya:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê sêyem ê tak “ew” e (ew bûya) wek: “ew bûya ew ne dikevt evê bêtarê de”.. “heger weha bûya baştir dibû”.

- **bûna:** ev kirde yê bûyînê girêdayî pergal ê kom e (em bûna, hûn bûna, ewan bûna) wek: “em bûna me dê ev gotar bigotibaya”.. “heger hûn bûna we dê xwe biragirtibaya”.. “ewan bûna em dê bêtir şad bibûna”.

3- Di dem a ayinde de:

- **bibim:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê yekem ê tak “ez” e (ez dê bibim) wek: “ez dê ji bo welat bibim qurban”.

- **bibî:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê duyem ê tak “tu” ye (tu dê bibî) wek: “tu dê di ayinde de bibî rêberek”.. “tu dê dilşad

bibî”.

- **bibe:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê sêyem ê tak “ew” e (ew dê bibe) wek: “ew dê bibe mamosta yê dîrokê”.. “ew dê ji evî pergalî rizgar bibe”.

- **bibin:** ev kirde yê bûyînê girêdayî pergal ê kom e (em dê bibin, hûn dê bibin, ewan dê bibin) wek: “em dê azad bibin”.. “hûn dê hişyar bibin”.. “ewan dê bibin xwedî malek”.

Ev kirde yên bûyînê yên li xwarê, bi dem a ayinde û merc ve girêdayî ne:

- **bim:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê yekem ê tak “ez” e (ez bim). Bi pirranî girêdayî merc û dem a ayinde ye. Di rewş a merc de wek: “heger ez bim evî karî nakim” û di rewş a ayinde de wek: “dê ez bim” û “dê ez bim ê/a ku evî karî bike”.

- **bî:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê duyem ê tak “tu” ye (tu bî). Bi pirranî girêdayî merc û dem a ayinde ye. Di rewş a merc de wek: “heger tu bî ji cih ê xwe bar nakî” û di rewş a ayinde de wek: “dê tu bî” û “dê tu bî yê/ya ku evê xebatê bikî”.

- **be:** ev kirde yê bûyînê girêdayî kes ê sêyem ê tak “ew” e (ew be). Bi pirranî girêdayî merc û dem a ayinde ye. Di rewş a merc de wek: “heger ew be mizgotarê naxwîne” û di rewş a ayinde de wek: “dê ew be” û “dê ew be yê/ya ku mizgotarê bixwîne”.. “me divê ew serkevtî be”. Ev kirde yê bûyînê bi kirde ve dihê nivîsandin da ku wata ya guruh çê bibe wek: “kevtibe, rabûbe, nivîsandibe, xwaribe, bizanibe, bikaribe...”. Ev kirde yê bûyînê bi nam û jêder ve nahê girêdan wek: “bila ew aza be û here ceng a welat”.. “em hêvî dikin ku ew serkevtî be”.. “hatin be”.. “derbasbûn be”. Ev kirde bi nam ve nahê girêdan wek “Azad be, Zîne be,...”. Bi rewşê ve nahê girêdan wek “zer be, baş be, bed be, ...”. Bi jêder ve nahê girêdan wek “dêran be, nivîsandin be, zanîn be, ...”. Bi pergal û lîn ve jî nahê girêdan.

- **bin**: ev kirde yê bûyînê girêdayî pergal ê kom e (em bin, hûn bin, ewan bin). Bi pirranî girêdayî merc û dem a ayinde ye. Di rewş a merc de wek: “heger em bin evê rewşê napejirîn”.. “heger hûn bin hûn naçin bajêr”.. “heger ewan bin nakevin evî biwarî” û di rewş a ayinde de wek: “dê em bin, dê hûn bin, dê ewan bin”.. “dê em bin ên ku berxwedanê bikin”.. “dê hûn bin ên ku biçin geryanê”.. “dê ewan bin ên ku bizavekê bikin”. Ev kirde yê bûyînê bi kirde ve dihê nivîsandin da ku wata ya gurah çê bibe wek: “hatibin, çûbin, reviyabin, şkestibin, kevtibin, rabûbin, xwîndibin, nivîsandibin...”. Ev kirde yê bûyînê bi nam û jêder ve nahê girêdan wek: “kar ên we serkevtî bin”.. “gerek hûn azad bin”.. “divê em dûrî şkestinê bin”. Ev kirde bi rewş, pergal û lîn ve jî nahê nivîsandin, ango ji wan cuda ye.

Di dem a xizavê (ferman) jî de “bibe, bibin” e, wek: “bibe mêrekî ne sitemkar”.. “bibe jinek a ne sitemkar”.. “bibin xebatkar ên welat”.. “bibin daxwazkar ên zanist û zanînê”.

Bi kurtî jî ev pirs a han a rêzimanî weha ye:

+ Di dem a amad de: “ez im, tu yî, ew e, em in, hûn in, ewan in”.

+ Di dem a mêjîn de:

- Di dem a mêjîn a nêzîk de: “ez bûm, tu bûyî, ew bû, em bûn, hûn bûn, ewan bûn”.

- Di dem a mêjîn a gurah de: “ez bûme, tu bûye, ew bûye, em bûne, hûn bûne, ewan bûne”.

- Di dem a mêjîn a dûr de: “ez bûbûm, tu bûbû, ew bûbû, em bûbûn, hûn bûbûn, ewan bûbûn”.

- Di dem a mêjîn a xayan de: “ez dibûm, tu dibû, ew dibû, em dibûn, hûn dibûn, ewan dibûn”.

+ Di dem a ayinde de: “ez dê bibim, tu dê bibî, ew dê bibe, em dê bibin, hûn dê bibin, ewan dê bibin”.

+ Di dem a xizavê de: ji tak re “bibe” ye û ji kom re “bibin” e.

Bi Awayekî berfirehtir jî, kêsan a bi bernaman re rastî ya kirde yê bûyînê weha ji me re dide naskirin:

+ Bi bernam ê “ez” re:

1- Di dem a amad de: ez im, ez dibim.

2- Di dem a mêjîn de:

A- Di dem a mêjîn a nêzîk de: ez bûm.

B- Di dem a mêjîn a gurah de: ez bûme.

C- Di dem a mêjîn a dûr de: ez bûbûm.

D- Di dem a mêjîn a xayan de: ez dibûm.

3- Di dem a ayinde de: ez dê bim, dê ez bim, ez dê bibim, dê ez bibim.

4- Di dem a xizavê de: bibe.

+ Bi bernam ê “tu” re:

1- Di dem a amad de: tu yî, tu dibî.

2- Di dem a mêjîn de:

A- Di dem a mêjîn a nêzîk de: tu bûyî.

B- Di dem a mêjîn a gurah de: tu bûye.

C- Di dem a mêjîn a dûr de: tu bûbû.

D- Di dem a mêjîn a xayan de: tu dibû.

3- Di dem a ayinde de: tu dê bibî, dê tu bibî, dê tu bî, tu dê bî.

4- Di dem a xizavê de: bibe.

+ Bi bernam ê “ew” re:

1- Di dem a amad de: ew e, ew dibe.

2- Di dem a mêjîn de:

A- Di dem a mêjîn a nêzîk de: ew bû.

B- Di dem a mêjîn a gurah de: ew bûye.

C- Di dem a mêjîn a dûr de: ew bûbû.

D- Di dem a mêjîn a xayan de: ew dibû.

3- Di dem a ayinde de: ew dê bibe, dê ew bibe, dê ew be, ew dê be.

4- Di dem a xizavê de: bibe.

+ Bi bernam ê “em” re:

1- Di dem a amad de: em in, em dibin.

2- Di dem a mêjîn de:

A- Di dem a mêjîn a nêzîk de: em bûn.

B- Di dem a mêjîn a gurah de: em bûne.

C- Di dem a mêjîn a dûr de: em bûbûn.

D- Di dem a mêjîn a xayana de: em dibûn.

3- Di dem a ayinde de: dê em bin, em dê bin, dê em bibin, em dê bibin.

4- Di dem a xizavê de: bibin.

+ Bi bernam ê “hûn” re:

1- Di dem a amad de: hûn in, hûn dibin.

2- Di dem a mêjîn de:

A- Di dem a mêjîn a nêzîk de: hûn bûn.

B- Di dem a mêjîn a gurah de: hûn bûne.

C- Di dem a mêjîn a dûr de: hûn bûbûn.

D- Di dem a mêjîn a xayana de: hûn dibûn.

3- Di dem a ayinde de: dê hûn bin, hûn dê bin, dê hûn bibin, hûn dê bibin.

4- Di dem a xizavê de: bibin.

+ Bi bernam ê “ewan” re:

1- Di dem a amad de: ewan in, ewan dibin.

2- Di dem a mêjîn de:

A- Di dem a mêjîn a nêzîk de: ewan bûn.

B- Di dem a mêjîn a gurah de: ewan bûne.

C- Di dem a mêjîn a dûr de: ewan bûbûn.

D- Di dem a mêjîn a xayan de: ewan dibûn.

3- Di dem a ayinde de: dê ewan bin, ewan dê bin, dê ewan bibin, ewan dê bibin.

4- Di dem a xizavê de: bibin.

Di evê şîroveyê de pirsek ji me re diderkeve, ku hevdişî û hevgijîyê çê dike û ew jî pirs a jêder a birinê (birin) ye. Em dixwazin bi evî awayî û bi kurtî, evê pirsê weha şîkar bikin:

Em dizanin ku kirde yên “dibim, bibim, dibî, bibî, dibe, bibe, dibin, bibin” di ziman ê Kurdî de ji parzad ên jêder a “birin” in. Ango: “ez evê maseyê dibim jûr a xwe, ez dê evê maseyê bibim jûr a xwe”.. “tu radiyoyê ji xwe re dibî, tu dê radiyoyê ji xwe re bibî”.. “ew perrtûkê ji xwe re dibe, ew dê perrtûkê bi xwe re bibe”.. “em kel û pelan dibin malê, em dê kel û pelan bibin malê”.. “hûn zarokan dibin dibistanê, hûn dê zarokan bibin dibistanê”.. “ewan keval ên xwe dibin bazarê, ewan dê keval ên xwe bibin bazarê” û ev heyvêz, ên dem a amad û ayinde ne. Di dem a xizavê jî de ji tak re “bibe” ye û ji kom re “bibin” e, wek: “evan xameyan (qeleman) bibe perrtûkxaneyê, evan xameyan bibin perrtûkxaneyê”. Bê goman e jî, ku ev heyvêz di dem a mêjîn de weha ye: “bir, biriye, biribû, dibir.. bir in, birine, biribûn, dibirin”.

Pirs ew e; çima kok a kirde yê ji jêder a “birin” a ku “bir” e, dibe wek kirde yê bûyînê û winda dibe ? Aya ev windabûn rast e ? Bersiv a evê pirsê weha ye; ku herdu heyvêz ên destnîşankirî ne wek hevdu ne, herçende ku wek hevdu dihên xuyakirin. Ji ber ku wek nimûne şîkarî ya kirde yê bûyînê “dibim” ew e, ku ew ji amraz ê dem a amad “di” û kirde yê bûyînê “bim” pêk hatiye û ne wek dihê xuyakirin, ku ew ji amraz ê dem a amad

“di” û kok a kirde yê birinê “b” û kirde yê bûyînê yê kes ê yekem ê tak “im” pêkhatî ye. Tişt ê ku dihêle ew hevdişî û hevgijî jî çê bibe ev e. Jêder a “birin” di kêsanê de dibe “ez dibim” û şîkarî ya kirde yê “dibim” weha ye, ku ew “di – b – im” e. Belê şîkarî ya kirde yê bûyînê “dibim” weha ye, ku ew “di – bim” e. Hemû kirde yê bûyînê û kirde yê ji parzad ên jêder a “birin” jî, weha ji hev dihên cudakirin û weha jî ew hevdişî û hevgijî namînin.

Nîşe 01: kirde yê bûyînê “bûn” jêder dirist dike wek: “ava = av-abûn, birîndar = birîndarbûn, he = hebûn, rizgar = rizgarbûn...”. Di hevekê jî de weha ye: “avabûn a rokê dîmenekî ciwan e”.. “hinek caran birîndarbûn tergize ye”.. “dîrok a hebûnê giring e”.. “çav ê me li rizgarbûnê ye”.

Nîşe 02: bi giştî weha ye, ku di her demekê de, kirde yê nav hevekê li angora dem a kirde yê bûyînê dihê heyvizandin.

Çand

Di ziman de danan a nam pirsek girêdayî surîşt a ziman e û tê de semantîk û etîmolojîk gerinek mezin dibînin. Nam û kirde jî ji hevdu cîyawaz in, belê em nizanin peyv a “çand” çawa li beramber wata ya “kultur” a ku nam e, hatiye danan ?! Li angora surîşt a ziman peyv a “çand” kirde ye, em dibêjin: “min darek çand”.. “te zevî ya xwe kêla û çand”.. “te evê salê çi çand ?...”. Belê ew ên ku peyv a “çand” ji bo wata ya “rewşenbîrî” ya ku nam e bi kar hînane, pişt a xwe bi çi ve girê dane ? Wan li peyv a “culture” (kelçer – kultur) nerîne û bê ku hizrê di pirs a nam an kirde de bikin, peyv a “çand” li beramber wê danîne. Ti pasawe tine ye ku wata ya peyv a “çand” rewşenbîrî be, ji ber ku di ziman ê Kurdî de peyv a “çand” kirde ye ne nam e.

Di ferhengê de wata ya peyv a “culture” çande ye, çandinî ye, çandin e, rewşenbîrî ye û şehristanî ye û wata ya rewşenbîrî û şehristanî, watayek a watayîn a evê peyvê ye. Belê peyv a “culture” nam e û gerek peyv a Kurdî ya li beramber wê jî nam baya. Ango gerek bi kêmanî “çande” baya ne “çand” baya, ji ber ku di ziman ê Kurdî de û ji bo demek a dirêj, peyv a “çande” li beramber peyv a “culture, kultur” bûye û wek wê jî nam bûye. Bi tevî her tiştî jî – ango bi tevî nîşe yê ku di evê bareyê de he ne – em dikarin bibêjin ku çande nam e. Di nav wêjevanî ya Kurdî de ya berî evî serdemî jî, her “çande” bûye û ew ên ku “çand” kirine “çande” zanîne yan pê derxistine, ku divê ev peyv “çande” be ji ber ku “çand” kirde ye. Ji xwe di kok a xwe de peyv a “çand” a ji bo wata ya rewşenbîrîyê û şehristanîyê hatiye danan, ne peyvek a gell e, ew peyvek e ku ji alî yê çînek a zimanvan û rewşenbîr ve hatiye danan û dihê gotin ku ew di destpêkê de ji alî yê mîr Celadet ve hatiye danan, da ku evê

watayê bide. Gell ticaran peyv a “çand” wek wata ya “culture – kultur” bi kar ne hînaye.

Peyv a “çande” ya ku ji her tiştêkî dihê çandin re girov û nîşan e, ji bo wata ya şehristanî û rewşenbîrîyê jî dibe, ji ber ku şehristanî û rewşenbîrî bi xwe jî çande ne û ev watayek a anahîkar e (meczî ye, metaphorical e) û watayîn e. Ew jî wek darekê ye ku dihê çandin û sexbêrkirin û şêwaz ên sexbêrkirinê, nîşan ên rewşenbîrî û şehristanîyê ne û girov ên hebûn a ewê rewşenbîrîyê û şehristanîyê ne. Ew ê ku peyv a “culture” di ziman ê Latîni de bi kar hînbûn, mebest a wan ev bû. Bi evî awayî peyv a “çande” xwedî watayek a watayîn jî ye û ne tenê xwedî watayek a keresteyîn e. Peyv a “culture, kultur” jî weha xwedî watayek a watayîn û keresteyîn e û ji ber evê yekê, ew hemû ewan watayan bi hev re dide. Li angora wata ya ferhengî ya ku peyv a culture - kultur (çande) dide, weha dihê xuyakirin ku çande hemû ew weçe, zanîn, kiryar ên hişmendane û pisporî yên corane ne yên ku di nav gellekî de û di nav mirovanîyê de bi cih bûne (hatine çandin). Weha jî destewaje ya “çande ya me” di biwar ê watayîn de ango hemû ew zanîn, pisporî, sihêt û kiryar ên hişmendane yên me ne yên ku me ew pêşkêşî xwe û mirovanîyê kirine. Bê gomane jî, ku her gellekî li angora sebet a zanîn a xwe, çandeyî encam daye. Ast a ewê çandeyîyê jî di cor ê berhem ên wê bi xwe de xuya dibe.

Wek pirsek semantîk, peyv a “çand” di ziman ê Kurdî de nabe nîşan a evê wata ya destnîşankirî, ji ber ku ev peyv di bûyîn a xwe de kê m e. Engîz a kêmbûn a wê jî ew e, ku ew kirde ye û di dem a mêjîn a nêzîk de ye. Ew ne wek peyv a “çande” nam e û ji ber evê yekê nakeve beramber peyv a “culture – kultur”. Ango divê li beramber peyv a “culture – kultur” a ku nam e, bi kêmanî niha peyv a “çande” ya ku ew jî wek wê nam e bihê

danan. Weha jî, li şûn a ku em bibêjin: “çand a me” em dê bibê-
 jin: “çande ya me” û weha em bêtir nêzîkî wata ya “culture
 – kultur” in, ji ber ku em nam li beramber nam bi kar dihînin.
 Herweha, ji ber ku “çande” wek “culture – kultur” kom a wan
 zanîn, sihêt, pisporî û kiryar ên hişmendane ne yên ku çande
 ya gellekî yan çande ya mirovanîyê, pêk dihînin. Wek pirsek
 etîmolojîk jî, kok a peyv a “çand” girêdayî kar ê daçikandinê
 ye û ew kar, wata dîsan kirde ye û peywendî ya evî kirdeyî (evî
 karî) bi xakê û tovê çandinê ve he ye. Ango çandin a tov di nav
 xakê de ye. Bi evî awayî dem a ku peyv a “çand” dihê gotin,
 peyv a “tov” ê çandinê û peyv a xakê pê re ne, ji ber ku wata
 ya kok a evê peyvê, kar ê çandin a di xakê de ye. Ango ew kar
 û kirde dide nîşandan û li bermaber peyvekê ku nam be nahê
 gotin. Em weha dizanin, ku di sertag ên rêziman û ferhengê
 de nam li beramber nam e, kirde li beramber kirde ye û hemû
 beş ên peyvan li beramber hev in. Ti kesî dîtiye ku kirdeyek
 wata ya namekî bide ? Na.. kirdeyek wata ya kirdeyekî dide û
 nam wata ya namekî dide. Wata ya peyv a “çand” di ferheng û
 rêziman a Kurdî de kar û kirde yê girêdayî tov û xakê ye, anga
 “çand” kiryar a danan a tov di nav xakê de ye û ev pirsek xur-
 rû keresteyîn e. Belê peyv a “çande” hem keresteyîn û hem jî
 watayîn e û weha ew bêtir nêzîkî wata ya “culture – kultur” e,
 ji ber ku “çande” bi xakê ve, herwek bi kiryar ên hişmendane
 ve girêdayî ye û ev alî yê wê yê watayîn ê girêdayî rewşenbîrî
 û şehristanîyê ye. Tiştêkî xuyanî jî ye, ku çande û çandinî yek ji
 kiryar ên hişmendane yên mirov û mirovanîyê bûne û niha jî
 her weha ne.

Peyv a “rewşenbîrî” ya ku ji “kultur, culture” re hatiye danan
 jî, ne girêdayî ewê weçe ya zanîn a gellêrî ye. Peyv a rewşenbîrî
 girêdayî wata û şirove ya rewşenî ya hizr û bîrê ye û ev wata

cih ê zanîn û sihêt ên (tecrube yê) gell û tak ê gell nagire. Rewşenbîrî rewş a rewşenî ya bîrê dide nîşandan û ew watayek a taybetî ye û ne giştî ye, belê “çande” xwedî watayek a giştî û gelemper e. Peyv a “çande, kultur” kom a ewan zanîn, kiryar, sinc, kanis, rewîşt û tîtal ên gellekî û takekî evî gellî ne, belê “rewşenbîrî” tenê bîr a bi rewşen û ronahî ye. Ji ber evê çendê peyv a rewşenbîrî ji wata ya “çande, kultur” re nabe, ji ber ku têr a wê nake û ji ber ku ew peyvek din e û watayek a din dide.

Wek pêşînyarek; aya (gelo) em nikarin peyv a “hezan” li beramber “culture, kultur” û li şûn a “çande” jî bi kar bihînin? Aya dê peyv a “hezan” ji bo wata ya “çande, kultur” ne bêtir gunçayî û di cih ê xwe de be? Heta ku em bikaribin bersiv a evan pirsan bidin, gerek em peyv a “hezan, hezanî” şîkar bikin.

Naskirî ye ku hobarî ya (konsept a) peyv a “kultur” û nasandin a wê, weha didin xuyakirin ku wata yê peyv a “culture, kultur” girêdayî kiryar a rastkirinê ne û girêdayî kom a weçe ya (mîras ê) zanînê ye gell in, ku ew kiryar û ew weçe di nav dem ên dîrok a gellekî de dirist dibin û bi stû yê gell ve dihên hilawîstin. Ango gell pê dihê naskirin, herwek çawa tak ê gell jî pê dihê destnîşankirin. Hezan hemû ew zanîn û nasîn in, ew ên ku tak wan diwergire û li nik tak çê dibin. Weha jî ne tenê çandinî di evê hobarîyê de he ye, belê hemû zanîn, kiryar û naskirin ên corane (cor bi cor) di evê hobarîyê de he ne. Bê goman jî ku mebest ew zanîn û naskirin in, ew ên ku rast in, bi maf in û di cih ê xwe de ne, herwek çawa rastîyê, maf û zanînê diparêzin. Hezan a ku rastîyê, maf û zanînê neparêze ne hezan e (ne çande ye). Peyv a “hezan” ji beş ê “he” û beş ê “zan” pêkhatî ye, ku wata ya “he” heyîn û hebûn e û “zan” kok a peyv a zanînê ye. Ango peyv a “hezan” wata û naverok a nasîn a peyv a kultur dide nîşandan, ku hezan hemû ew zanîn in, ew ên ku li nik gell he ne û çê bûne

û çê dibin. Bi evî awayî em dibînin ku peyv a “hezan, hezanî” ji bo wata ya “çande, kultur” bêtir wata ya xwe ya watayîn û keresteyîn dide û ya giringtir jî ew e, ku ev peyv ji wata ya peyvek a ziman ê Kurdî hatiye. Wek nîşe (têbînî) gerek bihê xuyakirin, ku peyv a “he” di ziman ê Kurdî de wata yê “hebûnê, wicûdê, existing, heyînê” dide û peyv ên “hebûn, heyîn” jêder ên evê watayê ne. Peyv bi xwe “he” ye. Beş ê duyem ê peyv a “hezan” ku “zan” e, ew bi xwe kok a peyv a “zanîn” e, ku peyv a “zanîn” jêder e û ev pirs di kêsanê de xuya dibe. Di kêsan a dem a amad de û bi bernam ê “ez” re dibe: “ez dizanim” ku di evî kirdeyî de amraz ê “di” pêşkok e û “zan” kok e û “im” kirde yê bûyînê yê girêdayî bernam ê “ez” e û paşkok e. Di kêsan a dem a mêjîn de dibe: “min zanî, min zanîye, min zanîbû, min dizanî” û di evan herçar heyvêz ên dem a mêjîn “nêzîk, guruh, dûr û xayan” de jî xuya dibe, ku “zan” kok a kirde ye. Di dem a ayinde jî de dibe: “ez dê bizanim” û di evî kirdeyî de amraz ê “bi” pêşkok e û “zan” kok e û “im” paşkok e. Dem a em dibêjin: “hezanî ya me” em didin xuyakirin ku ew zanî a me ya taybetî ya jînavanî ye ya ku li nik me he ye û li nik me çê bûye. Hezanî ya me zanî a me ya heyî ye û me ew zanî hafirandiye û di dîrok a jîn a xwe de wergirtiye. Ango hezanî çande ye, kultur e.

Şand

Peyv a “şand” – wek peyv a “çand” – a ku kirde ye û di dem a mêjîn a nêzîk de ye, wek nam bi kar dihînin û bi evî awayî şaşîyek rêzimanî dihê kirin. Ev peyv a han wek heyvêz a xwe ya ku kirde ye, nahê beramber nam. Dibêjin: “şand a filan dewletê bi serokatî ya filan kesî...” û mebest a wan ji peyv a “şand” ew fena ya (ew heyet a) fermî ye ya ku ji çend kesan pêk dihê, bi serokatî ya kesekî ye û wek kanis (wek adet) seredan ên fermî encam dide. Mebest a wan ji bi karhînan a peyv a “şand” wata ya “mission, expedition” a Engîzî ye, belê bê ku hizrê di pirs a nam û kirde de bikin, peyv a “şand” bi kar dihînin. Ev bi karhînan dide nîşandan ku şaşîyek di hobarî ya kirde û nam de he ye û ne hatiye zanîn, ka dem a ku peyv a “şand” ji bo wata ya “mission, expedition” bi kar bihê, dê wata bi çî awayî be. Ji bilî evê çendê gerek ew hobarî jî he be, ku di wata ya ferhengî de nam li beramber nam e û kirde li beramber kirde ye. Herweha, hemû beş ên peyvê li beramber hev in. Çê nabe ku wata ya kirde ji nam re be, yan wata ya nam ji kirde re be. Peyv a “şand” jî kirde ye û ji bo nam bi kar hatiye û bi kar dihê û ev şaşîyek rêzimanî ye.

Dem a ku ji peyv a “şand” peyv a “şandek” jî çê kirine ev peyv bi guraî (bi temamî) di nav şaşîyê de nuqum kirine, ji ber ku amraz ê “ek” ê nenasîne bi kirde ve nahê girêdan. Aya em dikarin bibêjin “xwîndek” ku peyv a “xwînd” mêjîn e û wek “şand” e? Gelo em dikarin bibêjin “nivîsandek” ku peyv a “nivîsand” mêjîn e û wek “şand” e? Ev pergala ewê di zimanê Kurdî de nîne. Ev pergala ewê han bi awa yê “xwîndine” û “nivîsandine” dibe, belê hîngê peyv ên “xwîndin” û “nivîsandin” jêder in û ne kirde ne. Mebest jî ew e, ku amraz ê “ek” bi kirde re nahê,

belê di nimûne ya şaş a peyv a “şand” de bi kirde ve girê dane û “şand” kirine “şandek” herwek çawa peyv a “çand” jî kirine “çandek”.

Di nav nivîsandin ên Kurdî yê berî evê serdemê de, peyv a “şande” ji bo evê watayê bi kar dihat. Dibe ew ên ku peyv a “şande” bi kar dihînan, nas dikirin ku divê heyvêz a nam bi kar bihê û dizanîn ku “şand” kirde ye û ne nam e. Ango hobarîyek seretayî he bû ku gerek nam bi kar bihê û ji ber evê yekê, peyv a “şande” bi kar dihînan. Belê wan jî peyv ên Kurdî yê resen ên ku evê watayê didin, ji bîr kiribûn û tekela (pîkol) ne kir in da ku ewan peyvyan dîsan ji bo evê watayê bi kar bihînin.

Di ziman ê Kurdî de peyv a “gizîr” û “fîrsad” hebûne û he ne, belê xuya dike ku ew jî wek bi hezaran peyv ên resen ên Kurdî hatine ji bîrkirin û ev peyv ên han nam ê kirdedar in. Wata ya peyv a “gizîr” kirdedar dide nîşandan, ango gizîr ew kes e yê ku dihê şandin. Kes ê “gizîr” wata ew kes ê ku bi fermî ji bo dewletan dihê şandin. Belê em çawa dikarin nam ji peyv a “gizîr” çê bikin ? Ev pirs a zimanvanî di ziman ê Kurdî de gelek bûwer e û ew jî wek her zimanekî din, xwedî kiryar a parzadîyê (îştîqaqê, derivation) ye. Ji peyv a “gizîr” a ku bi xwe nam ê kirdedar e, nam û jêder bi xwe jî wek “gizîrî, gizîrdarî” çê dibin, ango li şûn a em bibêjin: “şand a filan dewletê” gerek em bibêjin: “gizîrî ya bêhvan dewletê” yan “gizîrdarî ya bêhvan dewletê”. Bi evî awayî jî em nam li beramber nam bi kar dihînin û peyv a “şand” a ku kirde ye, di evî biwarî de bi kar nahê. Di ziman ê Kurdî de dihê gotin: “min ji te re nameyek şand”.. “min ji we re perrtûkek şand”.. “wî Azad şand nik te”. Ev nimûne yê han didin xuyakirin ku peyv a “şand” kirde ye, ne nam e û li beramber nam jî nabe. Peyv a “fîrsad” jî wata ya gizîr û şandevan dide û heger tu gizîr ji bo evê watayê bi kar nehîni, fîrsad bi kar bihîne!

Şaşî şaşîyê dikişîne.. dem a ku xwaztine nam ê kirdedar ji peyv a “şand” parzad bikin, peyv a “şander” bi kar hînane û wata ya peyv a “şander” di ziman ê Kurdî de cih ê nîşanê û der a nîşanê ye, ji ber ku peyv a “şander” ji du beşan pêk dihê ku beş ê yekem “şan” e û ev wata ya kok a peyv a nîşanê ye û beş ê duyem “der” e. Di evê nimûneyê de (şander) peyv nema girêdayî kok a “şand” e, ew bi paşkok a “der” dibe peyvek din û li kok a “şan” dinere û pê ve girêdayî ye. Ji xwe heger bi zorê bibêjî jin ku peyv ji “şand” û “er” pêk hatiye şaşîyek din çê dibe û çê dikin, ji ber ku “er” di ziman ê Kurdî de ne peyv e û ne paşkok e. Heger bi zorê jî peyv û paşkok a “dar” bikin “er” pîrsek mezintir diverûjînin û nacûrîyek din çê dikin, ku tê de şaşî di kopîdê de ye. Paşkok a “dar” a ku nam ê kirdedar çê dike, di ziman ê Kurdî de bûye û dibe “ar” û nabe “er”. Ew ên ku “ar” dikin “er” jî evê paşkokê gelekî dûrî rastî ya wê dibin. Ev şaşî ya han jî di beşê başûr de derkevîye, dem a ku wek nimûne.. peyv a “palinar” kirine “palner” peyv a “derhênar, derhînar” kirine “derhêner, derhîner” û... hd. Di kok a xwe de peyv a “palner” palindar e û peyv a “derhêner, derhîner” jî “derhêndar, derhîndar” e. Belê di bin barê levakirin a bê şîraz û kurtkirin û yanizkirinê de, weha hatine guherandin û bi evê guherandinê re jî, peyv dûrî kok û resenî ya xwe dikevin û dihên wêrankirin.

Engîz a serekîn a ku hîştîye ev şaşî çê bibin ew e, ku em peyv ên resen ên xwe nizanin û em peyvên ji ber xwe ve çê dikin. Kiryar a çêkirin a peyvên bi xwe jî xwedî rêzan û şîraz e, ne weha ji ber xwe ve ye. Yek ji bingeşên çêkirin a peyvekê jî ew e, ku kok a peyv a daxwazkirî bihê naskirin, da ku peyv a nû li ser ewê kokê bihê avakirin. Hîngê jî em pêwîstî çêkirin a peyvekê ne, dem a ku ew peyv di zimanê me de tine be. Ji bo ku em bizanibin ka peyv a daxwazkirî di zimanê Kurdî de he ye yan

nîne, em pêwîstî xwîndinek a ferhengî ya berfireh in û em bi taybetî, pêwîstî xwîndin a babet ên dîrokî yê Kurdî ne. Baş e di evê delîveyê de bihê gotin, ku ferheng û ziman ê Avesta yek ji jêder ên serekîn ên giring ên evan lêkolîn ên weha ne.

Perrtûk kirine pirtûk

Heta çî radeyî (çî heddî) peyv a “perrtûk” ji bo wata ya “kitêbê” rast e babetekî berfireh e, belê ya xuyanî ew e ku peyv a “perrtûk” bi evî şêwaz ê xwe ve (perrtûk) ji kevn ve di ziman ê Kurdî de ji bo wata ya “kitêbê” hebûye. Ew bêtir jî di wêjevanî ya başûr ê Kurdistanê û rojhilat a Kurdistanê de bi kar hatiye û su-rişt a peyvê bi xwe, li angora diyalekt a başûrî ye. Ev peyv a han (perrtûk) ji du beşan pêk hatiye, ku beş ê yekem “perr” e û beş ê duyem “tûk” e. Wata ya “perr” di beş ê başûrî de “pel” a di beş ê bakurî û rojavayî de ye. Ango li başûr jê re “perr” dibêjin û li bakur û rojava jê re “pel” dibêjin. Di ziman ê Kurdî de herdu pît ên “r” û “l” bi hev hatine guhertin û ev yek çê bûye û niha jî li hinek deveran di ziman ê gell de he ye. Rastî ew e ku ev herdu peyv jî (perr û pel) rast in û tişteki giring û serekîn ê kitêbê didin nîşandan, ku ew jî kaxed ên wê ne. Beş ê “tûk” ê ku bi “perr” ve hatiye girêdan, bingeh a wê di ziman ên kevn de he ye û ew ne Turkî ye. Di nav ziman ên beş ên Turkan de – ji Altay bigire heta Azerbaycan û Turkiye – peyvek weha bi wata ya mû yê mirov û ajel dihê dîtîn, belê ew ji ber sirêma (bandor a) ziman ê Kurdî û ziman ên din ên Arî, di nav ziman ên wan de he ye. Wek nimûne.. li Azerbaycanê peyv a “tûk” ji bo wata ya mû yê mirov û ajel bi kar dihê, belê Azerbaycanîyan ev peyv a han ji Kurdan wergirtine, ji ber ku Azerbaycan bi xwe di qonax ên dîrokê de xak a civak a Kurd bûye. Dem a ku Azerbaycan hat Turkandin, çande û ziman ê Kurdî ji xwe re kir bingeh a zanîn ên xwe.

Di ziman ê Kurdî de parzad ên evê peyvê jî he ne; wek: “tûk = tûkin, tûk = tûkedar, tûk = tûkanî...”. Ev jî ji me re dide xuyakirin, ku xwedan ên resen û yekem ên evê peyvê Kurd in. Ev peyv a han di ziman ê Kurdî de xwedî watayek din jî ye. Ji bilî ku

di ziman ê Kurdî de peyv a “tûk” mû ye, peyv a “tûk” di ziman ê Kurdî de wata ya “berg” jî dide û di mirov û ajal de wata ya “pêst – cild” jî dide. Di wata ya watayîn de jî herdu peyv ên “berg” û “pêst” yek in, ji ber ku ew dapoşîn a laş in. Wek nimûne jî.. dem a ku di ziman ê Kurdî de peyv a “sertûk” ji wê kereste ya ser mast re dihê gotin, mebest ew e ku ewê keresteyê mast dapoşîye û bi ser kevtiye û wê berg kiriye, ango ser girtiye. Weha em nas dikin ku wata ya peyv a “perrtûk” ango perr ên bergekiri ye, ku bê goman kitêb perr ên bergekiri ye. Kitêb perr in û bi tûkê hatine bergekirin û di vir de “tûk” wata ya berg e. Kitêb ji perran pêk dihê û bi berg hatiye dapoşîn. Weha peyv a “perrtûk” ji kitêbê re çê dibe û ev peyv li angora surîşt a ziman ê Kurdî hatiye darijtin.

Belê peyv a “pirtûk” gelekî dûrî evê watayê ye. Peyv a “pirtûk” ji “pirt” û paşgir a “ûk” a biçûkkirinê pêk hatiye, ku “pirt” parçe yê hûr û herî biçûk ê keresteyekê ye û paşgir a “ûk” wata ya hûrik û gelek biçûk dide. Ango peyv a “pirtûk” wata ya “pirt ên hûr” dide. Wek nimûne.. dem a tu pirteqalê diwerivînî pirtûk ên wê çê dibin, dem a tu hirîyê dijenînî pirtûk jê çê dibin û dem a tu daran diverojînî pirtûk ên wan çê dibin. Em nikarin bibêjin; ji ber ku kitêb ji pirtûk ên daran çê bûye nam ê kitêbê bûye “pirtûk” ji ber ku pirtûk peyvek girêdayî daran bi tenê nîne. Herweha peyv a “pirtûk” giştî ye, ango ji hemû cor ên pirtûkan re ye û ne tenê ji pirtûk ên daran re ye. Ew ji pirtûk ên hesin bi xwe jî re ye, dem a ku hesin li cih ê kar ê hesinkariyê dikeve ber lêdan û parçekirinê de, pirtûk ên hesin jî çê dibin. Ango bingeh a peyv a pirtûk “pirt” e û bi ti awayî ew ne girêdayî wata ya perrtûkê (kitêbê) ye. Herweha, di ziman ê Kurdî de peyv a “pirtîkî” he ye û ew yek ji parzad ên peyv a “pirtûk” e. Wata ya evê peyv a han (pirtîkî) ango “bû pirt” ango bi awayekî hûr parçe-

parçe bû û wek dibêjin “hûrhûrî” bû. Gerek em bizanibin jî, ku di ziman ê Kurdî de “pirt” ji “hûr” jî biçûktir e.

Peyv a “perrtûk” ji bo durv ê (şeklê) kitêbê ye û ew watayek keresteyîn e, ku wek me da nîşandan perr in û bi tûkê (berg) hatiye pêçan. Belê perrtûk nivîsandin û xwîndin e û weha watayek watayîn jê re he ye. Ango heger ev peyv li angora wata ya keresteyîn be “perrtûk” e û perrtûk nivîsandinek ji bo xwîndinê ye, belê heger li angora wata ya watayîn be gerek peyvek din jê re he be, ku hîne tine ye. Di pergalekî weha de em peyv a “perrtûk” bi kar dihînin û ew wata ya kitêbê dide, herçende ku ew tenê watayek a keresteyîn e.

Di ziman de jî, peyv ên ku li ser bingeh ên keresteyîn avakirî bin giring in, belê peyv ên ku li ser bingeh ên watayîn avakirî bin giringtir û akincîtir in. Aya dibe ku rojekê ji rojan – di dem a dûr a pêş de – peyvek din ji bo wata ya perrtûkê di ziman ê Kurdî de bihê dîtin an jî çê bibe ? Heger zimanzan li angora rê û şêwaz ên zanistî peyar bibin, dê ev pirs bûwer be. Derkevtin a peyvekê ku di ayinde de wata ya watayîn a perrtûkê bide bûwer e, herçende ku peyv a “perrtûk” guncayî û di cihê xwe de ye. Belê em dikarin wek danîşanek (işaretek) bibêjin; ku nivîsandin an xwîndin bingeh a wata ya perrtûkê ye. Aya dibe ku ji kok a peyv ên “nivîsandin” an “xwîndin” ên ku jêder in, peyvek bihê derxistin ku wata ya watayîn a perrtûkê bide ? Em di vir de didin xuyakirin ku kok a peyv a nivîsandin “nivîs” e û kok a peyv a xwîndin “xwîn” e. Di ziman ê Kurdî jî de, kok a her kirdeyekî di kêsan a dem a amad û ayinde de dihê xuyakirin. Di dem a amad de û bi bernamê “ez” re jêder a “nivîsandin” dibe “ez dinivîsim” û tê de amrazê “di” pêşkok e û “nivîs” kok e û “im” paşkok e. Peyv a xwîndin jî di dem a amad de dibe “ez dixwînim” û tê de amrazê “di” pêşkok e û “xwîn” kok e û “im”

paşkok e. Weha ji me re xuya dibe ku kok a jêder a nivîsandin “nivîs” e û kok a jêder a xwîndin “xwîn” e. Aya em dikarin ji evan kokan (nivîs, xwîn) wata ya watayîn û keresteyîn a peyv a perrtûkê biderxin ? Aya em dikarin wek nimûne ji niha ve pêşîniyar bikin ku peyvek wek “nivîsag” an “xwînag” ji bo wata ya perrtûkê bin ? Bersiv ji ayinde re ye.

Renkirin û guherandin a pît ên peyvê

Di bin bar û rewş a levakirin a bê şîraz, yanizkirinê, kêmkirin û sivikkirinê de, pît ên peyvê dihên renkirin (jêbirin) û guherandin. Ev rewş a han di ziman ê gell de asayî ye, belê di ziman ê petî yê rêzimanî de nahê pejirandin, ji ber ku ev pirs a han dibe engîz a nacûrkirin a (xerabkirin a) peyvê. Ew dibe engîz a evê nacûrkirinê jî, ji ber ku kok û wata ya peyvê dihên windakirin û têkdan. Ji bo naskirin a evê pirsê jî, herdem kêsan a dem a amad û ayinde pîvan e û di ewan herdu deman de, kok û resenî ya peyvê di kirde de dihên naskirin. Ango dem a em bixwazin nas bikin ka kok a peyvekê (kirdeyekî) çi ye û çawa ye, divê em ewê peyvê di dem a amad û ayinde de wek kirde kêsan bikin, ji ber ku di ewan herdu deman de û li angora bingeh a peyvê ya ku di wan de dihê xuyakirin, her wek çawa pêşkok û paşkok a peyvê (kirde) dihên xuyakirin, kok a peyvê jî dihê xuyakirin. Yek ji surîşt ên kok a kirde jî ew e, ku dibe pîtek be û dibe bêtîrî pîtekê be û dibe watayê jî bide û dibe watayê jî nede. Wek nimûne.. kirde yê hevek a “ez kar dikim” ji pêşkok a “di” û kok a “k” û paşkok a “im” pêk hatiye û bûye “dikim”. Em di kirdeyek (peyvek) weha de dibînin ku pîtek bûye kok a peyvê. Ji bo bi karhînan a rêzimanî ya rast û dirist jî, gerek kok a peyvê paraztî be, belê ev yek di ziman ê gell de bê vagir e û dikeve jêr bar ê renkirin û guherînê de.

Çend nimûne:

- **Paraztin – parastin:** ev peyv jêder e û di evê nimûneyê de pît a “z” bûye “s”. Ew bi xwe jî paraztin e, ne parastin e, ji ber ku kok a peyvê “parêz” e. Di dem a amad de “diparêzim” e wek: “ez mal a xwe diparêzim” di dem a ayinde de “dê biparêzim” e wek: “ez dê welat biparêzim” û di dem a mêjîn de “parazt” e

wek: “min xwe jê parast”. Belê di dem a mêjîn de û li ser ziman ê gell dibe “parast” û ev guherandin ji ber giranî ya levakirinê çê dibe. Her ji ber giranî ya levakirinê bi xwe, di jêder jî de bûye “parastin” û gerek wek jêder “parastin” be. Wek nîşe û zanîn jî, peyv a “paras” di ziman ê Kurdî de wata ya “rahib” a Erebî û “monk” a Englîzî dide.

- **Bihîztin – bihîstin:** ev peyv jêder e û di evê nimûneyê de pît a “z” bûye “s”. Ev peyv bihîztin e û ne bihîstin e, ji ber ku kok a wê “bihîz” e. Ew di dem a amad de “dibihîzim” e wek: “ez nûçeyan dibihîzim” di dem a ayinde de “dê bibihîzim” e wek: “ez dê nûçe yên xweş bibihîzim” û di dem a mêjîn de “bihîzt” e wek: “min bihîzt ku tu hatî”. Di dem a mêjîn de, li ser ziman ê gell dibe “bihîst” û ew jî ji ber giranî ya levakirinê ye. Ji ber giranî ya levakirinê bi xwe, di jêder jî de dibe “bihîstin” û ew bi xwe “bihîztin” e.

- **Xwaztin – xwestin:** ev peyv jêder e û di evê nimûneyê de pît a “z” bûye “s”. Resenî ya evê peyvê “xwaztin” e û ne “xwestin” e, ji ber ku kok a wê “xwaz” e. Herweha, rastî ya semantîk û etîmolojîk a dîrokî û rêzimanî ya evê peyvê ji me re dibêjin; ku ev peyv “xwaztin” e û ne “xwestn” e. Di dem a amad de “dixwazim” e wek: “ez azadîyê dixwazim” di dem a ayinde de “bixwazim” e wek: “ez dê maf bixwazim” û di dem a mêjîn de “xwazt” e wek: “min perrtûkek ji te xwazt”. Di dem a mêjîn de û ji ber giranî ya levakirinê, li ser ziman ê gell dibe “xwest” û her ji ber giranî ya levakirinê, di jêder jî de dibe “xwestin” û ew bi xwe “xwaztin” e.

- **Guhaztin – guhestin:** ev peyv jêder e û pît a “z” di evê nimûneyê de bûye “s”. Rastî ya evê peyvê “guhaztin” e û ne “guhestin” e, ji ber ku kok a evê peyvê “guhêz” e. Di kêsan a dem a amad de dibe “diguhêzim” wek: “ez awezend ên malê

diguhêzim” di dem a ayinde de dibe “dê biguhêzim” wek: “ez dê kel û pelan biguhêzim” û di dem a mêjîn de “guhazt” e wek: “min ev tişt guhazt”. Di kêsan a dem a mêjîn de li ser ziman ê gell dibe “guhest” û di jêder de dibe “guhestin” ji ber ku giranî di levakirinê de he ye. Ew bi xwe “guhazt” e û di jêder de “guhaztin” e.

- **Kujtin – kuştin:** ev peyv jêder e û ev nimûneyek ne xweş e, belê ji ber ku ew gelekî bi evî awayî bi kar dihê, di vir de bûye nimûneyek li ser guherandin a pît a “j” ya ku bûye “ş”. Di ziman ê gell jî de pît a “j” bi awayekî gelek ne dirist dibe “ş”. Ev peyv a han “kujtin” e û ne “kuştin” e, ji ber ku kok a wê “kuj” e. Di kêsan a dem a amad de dibe “dikujin” wek: “em dijminan dikujin” di dem a ayinde de dibe “dê bikujin” wek: “em dê ziyankaran bikujin” û di dem a mêjîn de dibe “kujt” wek: “wî neyarek kujt”. Belê li ser ziman ê gell û ji ber giranî ya levakirinê dibe “kuşt” û pît a “j” dibe “ş”. Wek nîşandanek jî, pît a “j” di gelek biwaran de dikin “ş” wek: “miş ter go, eş te dixwazim, haş xwe he be, ...” ku rastî ya rêzimanî di evan nimûneyan de weha ye: “min ji te re got, ez ji te dixwazim, hay ji xwe he be, ...”. Ev peyv di heyvêz a jêder de jî “kujtin” e û ne “kuştin” e.

Nîşeyek din jî he ye ku gerek di evê bareyê de bihê gotin û ew jî ew e, ku kok a peyv a kuştin “kuş” e, ango peyv a “kuştin” watayek din dide. Wata ya kok a “kuş” berdan e û xistin a di nav de ye. Ev kok a han wek xwe “kuş” li başûr paraztî maye û wek nimûne.. dem a ku xwarin a keleşçeyê yan nîskê dixwin, dibêjin: “nanî tê bikuşe” ango nan berde nav av a keleşçeyê yan nîskê. Weha ji me re dihê xuyakirin, ku dem a ev pît bi hev dihên guherandin watayek din çê dibe. Wek nimûne jî.. peyv a “bikuşe” xizav e (ferman e) û bingeh a wê weha ye, ku “bi” pêşkok a wê ye “kuş” kok a wê ye û “e” paşkok a wê ye. Dem

a ku tu di dem a ayinde de jî kêsan dikî, dibe “ez dê nan di nav nîskê de bikuşim” an “ez dê nan bikuşim nav nîskê” ango ez dê nan bixim nav nîskê. Di evê demê de “bi” pêşkok a peyvê ye “kuş” kok a wê ye û “im” paşkok a evê peyvê ye û ew girêdayî kes ê yekem ê tak e.

- **Birajtin – biraştin:** ev peyv jêder e û pît a “j” di evê nimûneyê de di bin bar ê giranî ya levakirinê de dibe “ş”. Rastî ya evê peyvê “birajtin” e, ne “biraştin” e, ji ber ku kok a wê “birêj” e (û bi xwe ji “biraj” hatiye). Di dem a amad de dibe “dibirêjim” wek: “ez goşt dibirêjim” di dem a ayinde de dibe “dê bibirêjim” wek: “ez dê goşt bibirêjim” û di dem a mêjîn de dibe “birajt” wek: “min goşt birajt”. Belê ev peyv di dem a mêjîn de û di jêder de, li ser ziman ê gell dibe “biraşt” û “biraştin” û ew bi xwe “birajt” û “birajtin” e.

- **Kevtin – ketin:** ev peyv jêder e û di evê nimûneyê de pît a “v” hatiye renkirin û pît a “v” ji kok a evê peyvê ye, ku kok a evê peyvê “kev” e. Di dem a amad de em dibêjin: “ez dikevim” û di dem a ayinde de em dibêjin: “ez dê bikevim” û di dem a mêjîn de em dibêjin: “ez kevt im”. Em di dem a amad de nabêjin: “ez diketim” û di dem a ayinde de em nabêjin: “ez dê biketim” û “ket” a ku di dem a mêjîn de bi kar dihê, li angora rêziman şaş e, ji ber ku kême ya yan kême dihê levakirin. Ev şaşî ya han jî, ji ber renkirin a pît a giring a “v” ya ku ji kok a evê peyvê ye çê dibe. Herweha, ev peyv a han di jêder de “kevtin” e û ne “ketin” e. Tişt ê hîne nacûrtir (xerabtir) ew e, ku ji “ket” peyvek din bi nam ê “ketwar” çê kirine û dibêjin wata ya “ketwar” rewş a heyî ye (reality ye). Ango şaşî li ser şaşiyê hatiye avakirin.

- **Havêjtin – havêtin:** ev peyv jêder e û pît a “j” di evê nimûneyê de dihê renkirin. Herweha, di hinek aksentan de “avêtin” e, ango pît a “h” jî di bin bar ê kêmkirinê de dihê renkirin. Pît a

“h” jî di destpêk a evê peyvê de he ye da ku kêsan rast be, ango wek nimûne da ku ev peyv di dem a amad de “dihavêjim” be û nebe “davêjim” an “tavêjim”. Rastî ya evî kirdeyî weha ye, ku di dem a amad de dibe “ez dihavêjim” di dem a ayinde de dibe “ez dê bihavêjim” û di dem a mêjîn de dibe “min havêjt”. Kok a evê peyvê jî “havêj” e. Ew di jêder jî de “havêjtin” e û ne “havêtin” an “avêtin” e.

- **Haxavtin – axavtin:** ev peyv jêder e û ev peyv a han ji peyv a “axivîn” cuda ye, ku “haxavtin, axavtin” ango peyivîn e, belê “haxivîn, axivîn” harbûn û peçivîn a (iltihab a) birînê ye. Bingeh û kok a peyv a haxavtin “haxêv” e û bingeh û kok a peyv a haxivîn an axivîn “haxiv, axiv” e. Di dem a amad de dibe “ez dihaxêvim” di dem a ayinde de dibe “ez dê bihaxêvim” û di dem a mêjîn de dibe “ez haxavtim”. Renkirin û guherandin a pît a “h” di bin bar ê giranî ya levakirinê de çê dibe, belê kok a “haxêv” di bin bar ê guherînek şaş de dibe “haxiv, axiv” û dibe engîz a çêbûn a şaşî ya watayê jî. Rastî ya jêder jî “haxavtin” e û ne “axavtin” e, da ku kêsan rast be. Kêsan jî rast e dem a ku di destpêk a peyvê de du pît ên dengdar nekevin ber hevdu. Ango da ku “dihaxêvim” be û ne “daxêvim” an “taxêvim” be, ku “daxêvim, taxêvim” ne li angora rêzan a rêziman e.

- **Şoştin – şîştin:** ev peyv jêder e û ev peyv a han ku ji şoştin dibe şîştin gelekî dihê guherandin. Jêder a evê peyvê şoştin e û kok a wê “šo” ye. Em di dem a amad de dibêjin: “ez dişom” ku “di” pêşkok e “šo” kok e û “m” bi xwe “im” e û paşkok e û girêdayî kes ê yekem ê tak e û ew ji “im” dibe “m” ji ber ku dem a pît a dawî ya peyv a ku “im” dixwaze dengdar be, kirde yê bûyînê “im” dibe “m” . Di dem a ayinde de em dibêjin: “ez dê bişom” û di dem a mêjîn de gerek em bibêjin: “min şot” an “min şoşt” belê di ziman ê gell de dibe “şîşt” ji ber ku “şot, şoşt” di le-

vakirinê de giran e. Rêziman jî li giranî yan sivikî ya levakirinê nanêre û ji xwe re nake bingeh.

Ev çend nimûne ji me re didin xuyakirin, ku rêziman xwedî surîşt a xwe ya girêdayî surîşt a ziman e. Surîşt a rêziman bi şîraz e û jê re binçîn he ne, belê surîşt a ziman ew cîhan a berfireh a bê vagir e ya ku herdem li rêziman digere. Weha girêdanek keresteyîn û watayîn di navber a ziman û rêziman de he ye û ev girêdan, surîşt a ziman destnîşan dike, jîn a ziman dide xuyakirin û dîrok a ziman dîyar dike. Herweha, gerek em bizanibin ku dem a guherîn ziyane û sirêm a darin (negatîv) li peyvê bike, gerek ew guherîn nehê pejirandin û cih ê xwe di ziman de negire. Ew guherîn ên ku dibin engîz a wêrankirin a kok û wata ya peyvê, guherîninî darin û ne baş in û ji ziman re bi ziyana in. Guherîn ên ku di ziman de jî çê dibin bi bingeh in û kok a peyvan naguherînin.

Alî yê xaknîgarî

Di evê delîveyê de tenê çêh li (behs a) herçar alî yê serekîn ên xaknîgarî dihê kirin û tenê alî yê regezî yê wan dihê dîyarkirin. Di zimanê Kurdî de her peyvekê regezê xwe he ye û ji bilî ku regez li angora surîşt a xwe dihê dîyarkirin, ew li angora bi karhînan a amraz û bernamê "a" ji mê re û "ê" ji nêr re dihê dîyarkirin. Belê wek me berî niha daye xuyakirin, ku dem a amrazê "a" ji bo dîyarkirin a mê be wek: "kiç a zîrek" amrazê "a" ji peyvê cuda ye û dem a ku amrazê "ê" ji bo dîyarkirin a nêr be wek: "kurrê zîrek" amrazê "ê" ji peyvê cuda ye. Dem a ku amrazê "ê" bi peyvê ve jî be, regezê mê yê peyvê dîyar dike wek: "evê jinê, evê gulê, ewê dibistanê, ewê malê".

Alî yê xaknîgarî yê serekîn di zimanê Kurdî de bakur, başûr, rojhilat û rojava ne. Berî niha jî ew bakur, başûr, bawêşt (bageşt) û bareşt bûne. Belê niha yê ku bi kar dihên bakur, başûr, rojhilat û rojava ne. Her yek ji evan alîyan jî regezê xwe he ye, ku yan nêr e yan mê ye.

Niha û bi taybetî di ragihandin a Kurdî de, evan herçar alîyan dikin nêr û dibêjin: "bakurê Kurdistanê, başûrê Kurdistanê, rojhilatê Kurdistanê û rojava yê Kurdistanê". Li angora surîşt a zimanê Kurdî jî, bakur û başûr nêr in û rojhilat û rojava mê ne, bê ku kes xwe weris (aciz) bike. Ji bo ku em evê pirsê baş nas jî bikin, gerek em evan peyvên xaknîgarî yek bi yek şirove bikin û gerek mebest a me ya serekîn ji evê şirovekirinê, dîyarkirin a nêrbûn an mêbûn a her yekê ji wan be.

- **Bakur:** bakur nêr e. Ev peyv a han ji du beşan pêk hatiye, ku beşê yekem "ba" ye û beşê duyem "kur" e. Ev peyv nêr e ji ber ku beşê bingehînê wê (ba) di zimanê Kurdî de nêr e. Kurd dibêjin: "ba yê biharê" û "ev ba yê han hênik e". Beşê duyem

ku “kur” e ango yê jor e, ango ji jor ve dihê. Em weha dizanin ku ji bo dîyarbûn a nêrbûn an mêbûn a peyvekê, beş ê bingehîn ê peyvê binçîn e û wek binçîn dihê wergirtin û pê dihê dîyarkirin û beş ê bingehîn ê peyvê, beş ê yekem ê peyvê ye. Ango di peyvek weha dubeş de, beş ê yekem ê peyvê nêrbûn an mêbûn a peyvê destnîşan dike û ew ji bo evê destnîşankirinê bingeh e. Di ziman ê Kurdî jî de peyv a “ba” nêr e, ji ber evê yekê peyv a “bakur” nêr e. Bi evî awayî dem a em dibêjin “bakur ê welat sar e” em peyv a “bakur” nêr divewêjînin û ew bi xwe nêr e.

- **Başûr:** başûr nêr e. Ev peyv a han du beş in, ku beş ê yekem “ba” ye û beş ê duyem “şûr” e. Ev peyv nêr e ji ber ku beş ê wê yê bingehîn (ba) di ziman ê Kurdî de nêr e. Kurd dibêjin: “ba yê xurt û bi hêz” û “ev ba yê sar”. Beş ê duyem ê ku “şûr” e, wata ya xwarê dide û wek şûr dibirre, çimku wek ku di nav çande ya gell de hatiye hobarkirin, ba yê xwarê yê ku ji başûr dihê bi ziyar e. Beş ê bingehîn ê evê peyv ê “ba” ye û ba di ziman ê Kurdî de nêr e, ji ber evê yekê peyv a “başûr” nêr e. Bi evî awayî dem a em dibêjin “başûr ê welat germ e” em peyv a “başûr” nêr divewêjînin û ew bi xwe nêr e.

- **Rojhilat:** rojhilat mê ye. Ev peyv du beş in, ku beş ê yekem û serekîn ê ji bo dîyarbûn a mêbûn a wê “roj” e û beş ê duyem “hilat” e. Ev peyv mê ye ji ber ku beş ê wê yê yekem ê bingehîn “roj” e û ew di ziman ê Kurdî de peyvek a mê ye. Kurd dibêjin: “roj a me hilat” û “roj a we xweş be”. Beş ê duyem ê evê peyvê “hilat” e û ew bi xwe jî di ziman ê Kurdî de mê ye. Kurd dibêjin: “hilatin a rokê” û “hilatin a rojek a geş”. Wek nîşe (têbînî) jî, ew ên ku dibêjin: “rojhilat ê Kurdistanê” û peyv a rojhilat dikin nêr, dem a ku çêh li (behs a) dever a rojhilat a navîn dikin, dibêjin: “rojhilat a navîn” û nabêjin: “rojhilat ê navîn”. Ango rastî her xwe disepîne û her winda nabe, yan jî berê rastî he bû belê

evroj rastî nema ye. Her ji dem a ku me ew naskiriye jî, ev peyv her mê bûye, wata her “rojhilat a navîn” hatiye gotin û peyv a “rojhilat” mê bûye. Peyv a rojhilat peyvek a mê ye û surîşt a ziman ê Kurdî evê pirsê biyaş (isbat) dike. Bi evî awayî, gerek em bibêjin “rojhilat a Kurdistanê” ji ber ku “rojhilat” peyvek a mê ye.

- **Rojava:** wek rojhilat, rojava jî mê ye. Ev peyv a han jî du beş in, ku beş ê wê yê yekem û serekîn “roj” e û beş ê duyem “ava” ye. Ev peyv mê ye ji ber ku beş ê wê yê yekem ê bingehîn “roj” e û ew di ziman ê Kurdî de peyvek a mê ye. Wek nimûne.. “roj a zagîn a te pîroz be” û “ew roj a tu hatî welat” didin zanîn, ku “roj” peyvek a mê ye. Beş ê duyem ê evê peyvê “ava” ye û ew bi xwe jî mê ye, wek: “avabûn a rokê dîmenekî surîştî ye” û “avabûn a welat pîrsek giring e” ku peyv a “ava” weha dibe xwedî ya du watayan; watayek jê avabûn a dem a êvarê ye û wata ya din avabûn a avayîyê ye, ku xanî û hemû tişt ên dihên avakirin avayî ne. Dîsan di peyv a “avabûn” de herdu beş ên evê peyvê “ava” û “bûn” mê ne, belê di ziman ê Kurdî de beş ê yekem bingehîn e û ew mêbûn an nêrbûn a peyvê destnîşan dike. Peyv a “rojava” li angora surîşt a ziman ê Kurdî peyvek a mê ye. Bi evî awayî, gerek em bibêjin “rojava ya Kurdistanê” ji ber ku “rojava” peyvek a mê ye.

Em ji herdu peyv ên “pismam” û “dotmam” nas dikin, ku beş ê yekem û bingehîn ê peyvê ji bo destnîşankirin a mêbûn an nêrbûn a peyvê giring e û ew dibe binçîn a destnîşankirin a evê pirsê. Di peyv a “pismam” de ya ku beş ê wê yê yekem “pis” e û beş ê wê yê duyem “mam” e, beş ê yekem (pis) di ziman ê Kurdî de nêr e û beş ê duyem (mam) jî nêr e, ji ber evê yekê Kurd dibêjin: “pismam ê min” û weha peyv a “pismam” bi awayekî xuyanî nêr e. Belê di peyv a “dotmam” de ya ku beş

ê wê yê yekem (dot) di ziman ê Kurdî de mê ye, bi tevî ku beş ê wê yê duyem (mam) nêr e jî ev peyv mê ye, ji ber ku Kurd dibêjin: “dotmam a min”. Ango beş ê yekem ê evê peyvê (dot) bingeh e û li angora wî beşî, peyv bi xwe jî mê ye, bi tevî ku beş ê wê yê duyem (mam) nêr e. Herweha, di peyv a “jinbav” de jî ev pirs xuya dibe, ku beş ê yekem ê evê peyvê (jin) mê ye û li angora wî beşî peyv bi xwe jî mê ye û Kurd dibêjin “jinbav a min” bi tevî ku beş ê duyem ê evê peyvê (bav) nêr e.

Serwazî evê çendê – wata bi ser evê çendê de – dibe bihê gotin, ku peyvîni wek: “bahoz, bager, babelîsk, barov, bapêş û... hd” beş ê wan ê yekem “ba” ye û “ba” nêr e, belê dîsan jî ev hemû peyv ên weha di ziman ê Kurdî de mê ne. Kurd dibêjin: “bahoz a bi toz” û “evê bagerê terş û tewal belav kir in” û “babelîskê a giran çê bû” û “barov a befrê dijwar e”. Di vir de giring e bihê xuyakirin ku ev “ba” ne beş ê yekem ê evan peyv ên weha ye, belê ew ji kok a peyvê bi giştî ye û ew bi tevî ku wata ya “ba” dide, ew birrgehê (kîtek) ji birrgeh ên peyvê ye û ji kok a evan peyv ên weha ye. Di evan peyv ên weha de “ba” birrgehê ji birrgeh ên peyvê ye û wata ya “ba” dide, belê ne “ba” bi ser ê xwe ye. Wek nimûne.. di peyv a “bahoz” de ev “ba” bê “hoz” nabe, ji ber ku ew ne tenê ba ye, ew bayekî taybetî ye. Ji ber evê yekê ew nema dikare nêrbûn a xwe bi ser evê peyvê de bisepîne. Peyv a “baran” ji me re baş evê pirsê dide xuyakirin. Peyv a “baran” mê ye, bi tevî ku di destpêk a wê de birrgeh a “ba” he ye. Belê ev “ba” birrgehê ji birrgeh ên evê peyvê ye û ji kok a peyvê ye û ne beş e. Ango peyvek wek “bakur” ji du beşan (peyv) pêk hatiye û di vir de em dikarin bibêjin, ku “ba” beşekî peyv a “bakur” e û “kur” beş ê wê yê duyem e, ji ber ku ev herdu beş serbixwe ne û di peyvekê de bi hevdu ve hatine girêdan. Belê di peyvekê wek “bahoz” de rewş

ne weha ye. Peyvek wek “bahoz” watayek a serbixwe dide û ne “ba” beş e û ne “hoz” beş e, belê ev herdu birrgeh wata ya bayekî taybetî ango watayek a taybetî didin.

Weha jî hat gotin; ku peyv ên rojhilat û rojava nêr in ji ber ku peyv ên bakur û başûr nêr in û li ser bingeh a nêrbûn a bakur û başûr, rojhilat û rojava jî nêr in an bûne nêr. Ev behane ya han ne tenê şaşî ye, belê ew hizr û ramanek a çewt e, ji ber ku peyvek li ser bingeh a peyvek din nabe mê yan nêr û ji ber ku her peyvek bi ser ê xwe ye. Mêbûn û nêrbûn a peyvan jî li ser bingehinî rêzimanî dihên destnîşankirin û yek ji wan bingehan, surîşt a peyvê bi xwe ye. Surişt a peyv a “roj” a ku ew di peyv ên rojhilat û rojava de beş ê serekîn e, mê ye û ji ber evê yekê peyv ên rojhilat û rojava mê ne.

Rêvebirî:

Yek ji ewan peyv ên çêkirî û di çêkirin a xwe de gelek ne serkevî, peyv a “rêvebirî” yan “rêvebirin” e. Ev peyv a han ji nam ê “rê” amraz ê “ve” û kirde yê “bir” hatiye çêkirin, ku ev hemû beş ên peyvê bi hev ve girê dane da ku wata ya “îdare, administration” bide. Di ziman ê Kurdî de du peyv, peyv û amrazek, peyv û paşgirek û peyv û pêşgirek bi hev ve dihên girêdan da ku watayek çê bibe, belê peyvek ku ji amrazan, naman û kirdeyan pêkhatî be, di ziman ê Kurdî de ne bûye û nabe û heger he be çêkirî ye û ne rast e.

Li ser evê şaşîyê, parzad ên evê peyvê jî encam dane û “mudîrîyet, directorate” kirine “rêvebirî, berêweberayeti” û “mudîr, director” kirine “rêvebir, berêweber” û kirde kirine “birêve bir, berêwe bird”. Di heyvêz a “birêve bir” de “bi” û “rê” û “ve” kirine yek peyv û em nizanin wata ya peyv a “birêve” çi ye. Ew ên ku ev peyv bi evî awayî çê kirine, wata ya encamdan a kar ji xwe re kirine bingeh û hizir kirine, ku îdarekirin encamdan a kar e û ew bi xwe ne tenê weha ye. Îdare ne tenê encamdan a kar e û ew di her zimanekî de xwedî watayek a keresteyîn û watayîn e. Encamdan a kar, alî yê keresteyîn ê wê ye û şêwaz ên evê encamdanê, alî yê wê ye watayîn e. Îdare sazkirin, gerandin û encamdan a kar e û ew xwedî gelek birrlan û zîvar ên (tefasîl, details) keresteyîn û watayîn e. Ev peyv a han di jêder de kirine “rêvebirin” û beş ên peyvê tê de girê dane, ku divabû bi kêmanî di kirde de ne weha baya. Divabû bi kêmanî di kirde de û di dem a amad de weha baya: “ez bi rê ve dibim, tu bi rê ve dibî, ew bi rê ve dibe, em bi rê ve dibin, hûn bi rê ve dibin, ewan bi rê ve dibin”. Di dem a mêjîn jî de weha baya: “min bi rê ve bir, te bi rê ve bir, wî/wê bi rê ve bir, me bi rê ve bir, we bi

rê ve bir, wan bi rê ve bir in”. Di dem a ayinde jî de weha baya: “ez dê bi rê ve bibim, tu dê bi rê ve bibî, ew dê bi rê ve bibe, em dê bi rê ve bibin, hûn dê bi rê ve bibin, ewan dê bi rê ve bibin”. Di dem a xizav (ferman) de jî weha baya: “bi rê ve bibe, bi rê ve bibin”. Em weha pêşînyar dikin, da ku bi kêmanî ev wata (îdare) akincî be û li angora heyvêz a ziman ê Kurdî be, ku wek me gotiye; her beşekî peyv a Kurdî serbixwe ye û serbixwe dihê nivîsandin û bi taybetî û bi giştî jî amraz ên kişanê serbixwe ne.

Di ferheng a “Mehabad” a zana yê Kurd “Gîwî Mukiryani” de, peyvek resen ji bo wata ya “mudîr, director” he ye û ew jî peyv a “kewên” e. Gîwî Mukiryani dibêje wata ya “kewên” mudîr e û “kewêngeh” jî ji bo wata ya “mudîrîyet, diretorate” e. Ev peyv di kok a xwe de “kehên” yan “keyên” e û reh a wê di ziman ê Avêsta de he ye û zana yê hêja Gîwî Mukiryani, yek ji ewan kesan bûye yê ku vexwîndin a wî li ser evî zimanî hebûye. Ev peyv a han wek nam ê kirdedar di evê ferhengê de hatiye û wata ya “mudîr, director” dide, belê bi xwe nam e û wata ya “îdare, administration” dide. Bi kurtî, dem a ku peyvek weha di ziman ê Kurdî de he be, çima em dê bi kar nehînin û em dê biçin peyvekê weha ji nik xwe ve çê bikin û şaş jî çê bikin ? Ji peyv a “kewên” an “kehên” a ku wata ya “îdare, administration” dide, hemû parzad ên peyvê dihên derxistin. Wek nimûne.. “kehêngeh û kehêndarî = mudîrîyet û îdare ye, kehêndar = mudîr e, kehên dikim = îdare dikim û...hd”. Pirraniya peyv ên çêkirî ji ber ewê yekê hatine çêkirin, ku ew ên wan çê kirine ne xwaztine xwe biwestînin, xwe mandû bikin û di nav ziman ê Kurdî de li peyvekê ku evê watayê bide ne geriyane. Gerek berî çêkirin a peyvekê, em xwe biwestînin, em xwe mandû bikin û em li wata ya daxwazkirî bigerin, ka di ziman ê Kurdî de he ye yan tine ye. Heger wata ya daxwazkirî di ziman ê Kurdî de he be, çima

em dê peyvek din ji nik xwe ve ji ewê watayê re çê bikin û em dê di çêkirinê de jî bikevin şaşîyê de ? Herweha, heger peyv a daxwazkirî di ziman ê Kurdî de he be, çima em dê li şûn a wê peyvek çêkirî yan biyanî bi kar bihînin? Pirs a bi karhînan a peyv ên biyanî jî, di ziman ê Kurdî de pirsek din e.

Ji bilî evê yekê, di ziman ê Kurdî de peyvek a din he ye û ew di wata ya xwe ya watayîn de gelekî nêzîkî peyv a “kewên, kehên” e, heger em nebêjin ew bi xwe ye. Ev peyv a han “key” ye û wata ya wê di ziman ê Kurdî de kes ê berpîrs û kehêndar (rêvebir) e. Em weha nas dikin ku ev peyv a han kes ê berpîrs, mezin, serleşkir û pêşewa dide nîşandan, belê di rastî ya xwe de ew kes ê kehêndar dide nîşandan û kes ê berpîrs kehêndar e. Ev peyv a han di dîrokê de bi naman re hatiye wek: “keyx-usrew, keyqubad, keybanû û...hd”. Hemû ew kes ên ku peyv a “key” bi nam ê wan ve hatiye girêdan, berpîrs, serdar û pêşewa bûne. Di peyv a “keybanû” de ji me re wata ya “key” baş dîyar dibe, ku bi peyv a “banû” re hatiye û hemû kes dizane wata ya “banû” çî ye. Wata ya peyv a “banû” ango jin a malê û jin a pêşewa ye û dem a ku peyv a “key” pê ve dihê girêdan û dibe peyv a wê ya serekîn, wata ya peyv a “banû” dibe jin a kehêndar a ku bi rê ve dibe. Peyv a “kebanî” jî guherandin a “keybanû” ye. Peyv a “key” a ku bi ser ê xwe wek “keya” ye, ew bi xwe wata ya kehêndar (rêvebir) dide. Peyv a “keya” nam ê kirdedar e û kok a wê ya ku parzad jê dihên derxistin “key” ye. Ango wek nimûne.. li ser kok a “key” rêvebirî “keygeh” e, rêvebirin dibe “keyînî, keydarî” û rêvebir dibe “keydar”.

Em dipirsin; aya peyv ên “kehên” û “key” ji peyv a “rêvebirî” ne resentir û çêtir e ? Çima me ev peyv a han a resen windayî kiriye û me peyvek çê kiriye, ku di çêkirinê bi xwe jî de şaş bûye û şaş e? Me xwe ne westandiye û em li peyv ên resen ne geri-

yane. Ziman ê Kurdî jî yek ji ewan ziman ên xwedî gencîneyek a peyv an e, belê me ew gencîne li paş xwe hîştîye û em peyv an ji nik xwe ve çê dikin. Rast e hinek wata he ne peyv an wan di ziman ê Kurdî de tine ne, belê kok a nêzîkî ewan watayan di ziman ê Kurdî de he ye û em dikarin di çêkirin a peyv an de, pişt a xwe bi wan ve girê bidin û li ser ewan kokan peyv an nû û pêdivê çê bikin û weha em şaş nakin. Weha dê peyv an çêkirî bêtir nêzîkî wata ya daxwazkirî be û dê serkevtin di çêkirin a peyvê de he be.

Ji xwe heger bibêjin ku ev peyv a “kewên, kehên” şaş e û kes nizane Gîwî Mukiryânî ji kuda hînaye, şaşîyek mezin di bare ya zanîn ên Gîwî Mukiryânî de dihê kirin, çimku evî mirov ê ziman-zan û zana, gelekî xwe di ber wêjevanî ya Kurdî de mandû kiriye û hay a wî ji gelek ziman ên kevn hebûye, ku ev ziman ên kevn her di ristik a ziman ê Kurdî de bûne. Ango evî mirovî rajedarîyek mezin ji ziman ê Kurdî re kiriye û peyv an resen paraz-tîye.

Di bare ya peyv an “kewên, kehên” jî de xuya ye wek me da nîşandan, ku ev peyv an yek ji mînak ên peyv an “key” ye û ev peyv an di ziman ê Kurdî de gelek resen û xawên e. Di biwar ê etîmolojîk de tişteki biyaş e (sabit e) ku peyv an “key” wata yên berpirs, mezin ê hozê, serdar û pêşewa dide û di wata ya xwe ya watayîn de kehêndar e (rêvebir e). Ango yê ku kar û bar ên hozê bi rê ve dibe keya ye.

Beş ên peyv a Kurdî:

Her parçeyekî peyvê yê ku beşdarîyê di peyvînê de dike, girêdayî peyvê ye, bi peyvê re heval e da ku watayekê bide, beşekî peyvê ye. Beş ê peyvê ew heyîn a zimanvanî ye ya ku alîkarî ya peyvê dike, watayekê dide peyvê û peyvê bi beş ên din ên nav hevekê ve girê dide. Her beşek jî, bi kêmanî gerinekê (rolekê) di nav hevekê de dibîne û ew gerin keresteyîn û watayîn e. Di ziman ê Kurdî de bi giştî her beşekî peyvê serbixwe dihê nivîsandin, ji ber ku ew zimanekî azad e, ango her beşekî peyv a evî zimanî azad e. Belê li angora mercinî rêzimanî yê destnîşankirî, girêdan jî di navber a beşinî peyvê de çê dibe, ku bê goman û bi giştî, ew merc ne girêdayî hinek amrazan in û bi taybetî jî ne girêdayî amraz ên kişanê ne. Di evê perrtûkê de dem bi dem ev pirs a han dihê destnîşankirin û dihê xuyakirin, ka kîjan beş serbixwe ne û gerek serbixwe bin û kîjan dibe ku bi peyvê ve bin.

Bi awayekî bêtir akincî dihê xuyakirin, ku şanzdeh (16) beş ên peyv a Kurdî he ne. Ew beş jî; nam (nav) – bernam (bernav) – jêder – kirde – kirdedar – berkirde – rewş – pergala – lîn – kişan – pêşgir – paşgir – bang – pirsîn – amraz – hejmar (namhejmar, navhejmar) in.

1- Nam (nav): peyv a naskirin û nîşandanê ye, ku her tiştekî dîtî, nedîtî û heyî pê dihê naskirin û nîşandan. Dem a ku ez nam ê te, nam ê kar ê te û nam ê reftar ê te nas bikim, ez dikarim bibêjim ku ez te nas dikim. Wata nam ne tenê ji bo kes e, ew ji bo hemû tiştekî heyî yê keresteyîn û watayîn e. Nam di hemû biwar ên jînê de he ye, ango wek çawa nam ê kes he ye û nam ê kes civakî ye, nam ên surîştî, bûnewerî, zanistî, siyasî, aborî, giyanî û...hd jî he ne. Wek nimûne jî peyv a sosyalizm a ku saz-

waje ye (musteleh e, term e) namekî civakî, aborî û siyasî ye û li angora nerîn a pirranî ya zana yê zimanvan, saz waje bi xwe jî wek nam e. Nam di ziman de destpêk a ewan peyv an bûye yê ku ji alî yê mirov ve hatine hafirandin, ku xuyaye divabû her tiştêkî li dor a mirov namek jê re he be da ku pê bihê naskirin û nîşandan. Di ewê destpêkê de nam birrgehîn bûne û heta evroj jî, di ziman ê Kurdî de, her weha ne. Ew jî ji ber ku ziman ê Kurdî bi xwe zimanekî birrgehîn e, kevnar e û di biwar ê birrgehîn-bûnê de, ji hemû ziman ên din ên Arîyayî yan jî Arayî, zelaltir û akincîtir e. Ji ber evê yekê jî, em dikarin nam ên ku ji yek birrgehê pêk dihên wek: Şad, Pêl, Mah, Ram, Jîr, Merd, Zîn... di ziman ê Kurdî de bibînin. Di bûngadê (kewn, universe) de her tiştêk bi nam dibe, li ser exteran (kewkeb, planet) jî hemû bûnewer bi nam dibin. Di exter a me de (zemîn) bûnewer ên wek mirov, ajal û gul û giya bi nam dibin. Di ziman ê Kurdî de nam dihê guherandin û gerek ne weha baya, ji ber ku dem a nam dihê guherandin wata ya xwe ji dest dide û bê goman e ku ji her namekî re watayek he ye. Herweha, nam serbixwe dihê nivîsandin û nivîsandin a nam li angora ziman ê Kurdî û levakirin a rêzimanî ye.

Ev peyv a han (nav) wek wata ya xwe ya kevnar û resen “nam” e û “nam” ji bo wata ya “isim, noun” rasttir e, ji ber ku wata ya “nav” tiştêkî din e. Di destpêk a dîrok a ziman de wek “nam” hatiye vewêjînkirin. Ji nav hemû ewan gell ên Arîyayî (Arayî) yê ku ji evê peyvê re “nam” gotine û dibêjin, tenê gell ê Kurd ev peyv a xwe guherandiye û ji “nam” kiriye “nav”. Dem a em bi Kurdî dibêjin: “masî di nav avê de dijî” wata ya rast a peyv a “nav” dihê naskirin û pê re jî dihê naskirin, ku peyv a “nam” ji bo wata ya “isim, noun” rasttir e.

2- Bernam: ew peyv e ya ku cih ê nam (nav) digire û bernam ê

kesane mizgovan, mizgober û bergo yê penhan e. Ango hinek ji bernam ên kesane “ez, min, em, me” mizgovan in, hinek ji wan “tu, te, we, hûn” mizgober in û hinek ji wan “wî, wê, ew, wan, ewan, ê, a” bergo yê penhan in. Bernam ê “xwe” yê xweyînî jî hem mizgovan e, hem mizgober e û hem bergo yê penhan e. Bernam ê kesane di ziman de bi engîz a û ji ber nenaskirin a nam çê bûne û ji ber evê yekê, bernam ên kesane yên destpêkê “tu, te, ew, we, wî, wê, hûn, wan, ewan, xwe, ê, a” bûne. Ev jî ji ber ku ew ên peyivîn li ser wan hatiye kirin û ew ên peyivîn bi wan re hatiye kirin – anga bergo yên penhan û mizgober – nam ên wan ne hatine naskirin. Evê yekê rê vekir da ku bernam ên din jî “ez, min, em, me” – anga bernam ên mizgovan – bihên hafirandin, da ku şûn a naman û kom ên naman bigirin. Anga şûn a bernam ên kesane yên tak û bernam ên kesane yên kom bigirin. Bernam ên kesane di ziman de serekîn in û ew yek ji stûn ên avakirin a hevekê ne, ji ber ku ew kirdedar in û kirde bê kirdedar nabe.

3- Jêder: ew peyv e ya ku kirde jê dihê der û jê dihê kêsankirin û ew kok a hemû parzadan e. Jêder bûyerê dide nîşandan, belê dem a çêbûn a bûyerê nade nîşandan. Jêder bê ku dem a çêbûn a kirde bide nîşandan, kirde dide nîşandan. Anga dem a em dibêjin “rawestan” – û “rawestan” jêder e – em kirdeyekî didin nîşandan, belê em dem a çêbûn a evî kirdeyî nadin nîşandan. Dem a em dibêjin “dirûtin” – û “dirûtin” jêder e – em karekî (kirdeyekî) didin nîşandan û em dem a çêbûn a evî karî nadin nîşandan. Dem a em dibêjin “nalîn” – û “nalîn” jêder e – em kirdeyekî didin nîşandan, bê ku em dem a çêbûn a evî kirdeyî bidin nîşandan. Dem a em dibêjin “xwîndin” – û “xwîndin” jêder e – em kirdeyekî didin nîşandan, bê ku em dem a çêbûn a evî kirdeyî bidin nîşandan. Di evan herçar nimûneyan de ji

me re dihê xuyakirin ku amraz ên jêder – amraz ên ku jêder çê dikin – çar hatine dîyarkirin û ew jî ; “an, î, in, ûn” in. Belê “î” û “dan” û “bûn” û “kirin” û “çûn” jî jêder dirist dikin. Herweh, li angora dîd a me, amraz ê “ûn” ne amraz ê diristkirin a jêder e. Di peyv a jêder “rawestan” de amraz ê jêder “an” e, di peyv a jêder “dirûtin” de amraz ê jêder “in” e, di peyv a jêder “nalîn” de amraz ê jêder “în” e û di peyv a jêder “xwîndin” de amraz ê jêder “in” e. Di ziman ê Kurdî de ji bo diristkirin a jêder, amraz ên jêder “in, an, î” bêtir bi kar dihên. Herweha, nîşe ya me jî li ser “ûn” he ye ku ew ne amraz ê diristkirin a jêder e û bi xwe her “bûn” e. Dê di babet ê “Nerînek li ser jêder” de, bêtir bihê xuyakirin ka jêder çi ye.

4- Kirde: peyv a ku encamdan û kirin a kar nîşan dide û kirde kar û kirin a girêdayî demekê ye, bûyerekê dide nîşandan û dihê kirin. Kirde stûn a bingehîn a hevekê ye û wata ya hevekê pê ve girêdayî ye. Kirde di ziman ê Kurdî de û di awa yê serekîn de, li angora dem a amad destpêk a wî “di” ye wek: “dizanim, dixwînim, dirawestim, dihilgirim, divekim...” ango “di” amraz ê dem a amad e û di destpêk a kirde de dihê nivîsandin. Di dem a ayinde de û di awa yê serekîn de destpêk a kirde “bi” ye wek: “ez dê bizanim, ez dê bixwînim, ez dê birawestim, ez dê bihilgirim, ez dê bivekim...” ango “bi” amraz ê dem a ayinde ye û di destpêk a kirde de dihê nivîsandin. Di dem a xizavê (emr, imperative) de jî destpêk a kirde “bi” ye wek: “bizane, bizanin, bixwîne, bixwînin, biraweste, birawestin, bihilgire, bihilgirin, biveke, bivekin, ...” ango “bi” amraz ê xizavê jî ye û di destpêk a kirde de dihê nivîsandin. Ev amraz ên han (di, bi) di dem a mêjîn de bi kirde ve nahên girêdan û heger kirdeyekî dem a mêjîn wek “birajt, biraşt” he be, ew “bi” ji kok a peyvê ye û ne amraz ê destnîşankirin a demê ye. Belê di dem a mêjîn a xayan

de amraz ê “di” bi kirde ve dihê girêdan û jê re dibe paşkok, wek: “min dixwînd, min dikir, min digihand, ...”.

5- Kirdedar: ew peyv e ya ku encamdar ê kar dide nîşandan û kirdedar ew kes û alî ne yê ku bi kar dirabin û kar encam didin. Nam û bernam kirdedar in û her encamdarekî kar û kirde, kirdedar e. Ev peyv a han di hevekê de, wek kirde stûnek serêkîn e, ji ber ku ew xwedî yê kirde ye. Kirdedar di hevekê de hem tak û hem kom in, ango dibe ku kirdedar yek kes û alî be yan jî gelek kes û alî bin. Dem a em dibêjin “Azad perrtûkê dixwîne” kirdedar ê ku “Azad” e tak e, belê dem a em dibêjin “zarokan derî yê dibistanê vekir in” kirdedar ê ku “zarokan” e kom e. Herweha, kirdedar di kirde de jî dibe kom wek: “zarok ji xwe re dilîzin” û hîngê kirdedar kom e, herçende ku peyv a “zarok” tak e. Di ziman ê Kurdî de kirdedar ê kom ê ku wek bernam ê kesan e “wan” e û kirdedar ên ku komek a kesan bin, di dem a mêjîn jî de kirde ji xwe re dibin û bi xwe ve girê didin, ji ber ku ew di hevekê de bi hêz in. Wek nimûne.. “zarokan karek encam dan” û “zarokan gelek kar encam dan”.. an jî; “wan kinc ên xwe li xwe kir in” û “wan nameyek nivîsand in”. Di ziman ê Kurdî de ergatîv bi bernam ê kesane “wan” ê kirdedar re û bi kirdedar ê kom re çê nabe. Heger li hinek deveran bûye “karkiran karek encam da” yan “wan nameyek nivîsand” an “wan karek kir” ew di bin sirêma ergatîv a biyanî de weha bûye. Ev nimûne di ziman ê Kurdî de weha ne: “karkiran karek encam dan, wan nameyek nivîsand in, wan karek kir in”.

6- Berkirde: ew peyv e ya ku kes ê yan alî yê ku kar lê dihê kirin nîşan dide û berkirde ew kes û alî ne yê ku kar li wan dihê kirin û dikevin bin bar ê kirde de. Di nimûneyekê de wek: “te ew dar şkand” dihê xuyakirin ku berkirde “dar” e, ango ne kesek e. Herweha, wek çawa berkirde di dem a amad û mêjîn de

dîyar e wek: “ez avê divexwim” û “min av vexwar” ew di dem a ayinde jî de, li angora demê dikeve bin bar ê kirde de wek: “ez dê evê darê bikesêxim”. Di dem a ayinde de dihê xuyakirin ku dê “dar” bikeve bin bar ê kirde yê kesaxtinê de. Di dem a xizavê jî de her weha ye, ku tê de divê berkirde bikeve jêr bar ê kirde de wek: “ewê darê bikesêxe”. Ango, di dem a amad û mêjîn de kirde kar li berkirde dike û kiriye, di dem a ayinde de dê kirde kar li berkirde bike û di dem a xizavê de divê kirde kar li berkirde bike. Belê di hemû pergalan (halan) de berkirde dîyar dibe. Tiştêkî naskirî jî ye, ku dibe di hevekekê de bêtirî berkirdeyekê he be.

7- Rewş: ew peyv e ya ku durv û hingil nîşan dide. Wata salix ê derve yê tiştan dide nîşandan û bêtir keresteyîn e (maddî ye). Di nimûne ya “ev gul sipî ye” de, peyv a “sipî” rewş e û salix ê derve yê gulê ye. Herweha, di nimûne yê wê wek: “çiya yê bilind, otomobîl a mezin, zarok ên biçûk” de, peyv ên “bilind, mezin, biçûk” rewş in û salix ê derve yê evan peyvên pê hatiye dest-nîşankirin. Wata rewş di hevekê de ji alî yê salixdanê ve giring e û bi xwe gerin a rewşê ev e. Rewş bi ewî namî ve girêdayî ye yê ku salixdan a wî dihê xwaztin. Wata dem a em dibêjin: “ev çiya bilind e” em rewş a çiya dîyar dikin, dem a em dibêjin: “ev keval ciwan e” em rewş a derve ya evî kevalî salix didin, anga em durv û hingil ê wî didin nîşandan. Di ziman ê Kurdî de û wek nimûne dem a dihê gotin: “ev mal bi rewş e” wata ev mal xemilandî ye û xweşik e, anga rewş salixdan a derveyî û keresteyîn e.

8- Pergal: ew peyv e ya ku rewş a watayîn û hinavî dide nîşandan. Pergal salix ê hinav û hinder ê (hundur ê) tiştan dide nîşandan û bêtir watayîn e (me`newî ye). Di nimûneyekê de wek: “Azad nexweş e” peyv a “nexweş” pergalek e, anga salix ê

rewş a watayîn e. Dem a em bibêjin: “laş ê evî zarokî lawaz e” peyv a “lawaz” pergâl e û ew rewşek watayîn e. Pergâl bi ewî namî ve girêdayî ye yê ku naskirin a rewş a wî ya watayîn dihê xwaztin. Wata dem a em dibêjin: “ew mirovekî xizan e” peyv a “xizan” pergâl ê (hal ê) ewî mirov ê xizan e û dem a em dibêjin: “di bûyerê de kesek birîndar bû” peyv a “birîndar” pergâl e û bi ewî kesî ve girêdayî ye, ango pergâl ê ewî kesî dide xuyakirin.

9- Lîn: ew peyv e ya ku cih an demê dide nîşandan û bi pergâl ve jî girêdayî ye. Ew dem a û cih ê bûyerê destnîşan dike û heger demê dîyar bike “lîndem” e û heger cih dîyar bike “lîncih” e. Di nimûneyekê de wek: “ez dê di evê salê de seredan a welat bikim” peyv a “sal” demê dide nîşandan, ango lîndem e. Heger em bibêjin: “ew li bin darê rûnişt” peyv a “bin” cih dide nîşandan, ango lîncih e. Lîn ê ku mirov tê de ye wata pergâl ê mirov e, ango dem a em dibêjin: “di welat ê me de nexweşî he ne” peyv a “nexweşî” lînekî girêdayî pergâl dide nîşandan. Heger em bibêjin: “di nav me de pirtewazî he ye” peyv a “pirtewazî” lînekî girêdayî pergâl dide nîşandan. Ji xwe dem a em pirs a lîn ên hev jî dikin, ango em pirs a rewş a hev û pergâl ê hev dikin. Heger me got: “lîn ên niha çawa ne?” ango me pirs a rewş a niha û pergâl ê niha kir. Dem a em bibêjin: “lîn ê te çawa ye?” ango me daxwaz kir ka tu di çi rewş û pergâlî de yî. Di dem a bersivdan a pirs ên weha de “xweşî, nexweşî, başî, nebaşî, hevî û neyî” dihên dîyarkirin û ev peyv ên han hemû, lîn jî didin nîşandan.

10- Kişan: ew peyv e ya ku peyvê û hevekê bi hevdu ve girê dide, da ku watayek a xuyanî çê bibe. Ango ew peyv ên nav hevekê bi hev ve girê dide û bê peyv ên kişanê, hevek ji hev dikeve. Di nimûneyekê de wek: “Azad li malê ye ” peyv a “li” kişan e û heger peyv a “li” nebe, beş ên din ên evê hevekê

bi hev ve nahên girêdan û watayek a aşkira û xuyanî çê nabe. Wata ya evê hevekê (Azad li malê ye) bi peyv a “li” ya ku kişan e, gurah û biyaş dibe. Dibe di ziman ê gell de ev hevek wek: “Azad malê ye” bihê pêşkêşkirin û bihê hobarkirin jî, belê ziman ê gell bê vagir e û ne girêdayî rêziman e. Di nimûneyekê de wek: “ez dê bi te re bihêm bazarê” peyv a “bi” kişan e û bê evê peyvê (kişanê) hevek watayek a xuyanî nade. Heger di ziman ê gell de hinek caran û li hinek deveran weha be: “ezê te ra bêm bazarê” ziman ê gell xwe bi rêziman ve girê nade. Heger em bibêjin: “ez evê daxwazê ji te dikim” peyv a “ji” kişan e û bê wê, wata ya hevekê serrast nabe. Dem a em dibêjin: “mal a we di nav bajêr de ye” peyv a “di” kişan e û pêwîst e.

Hersê peyv ên kişanê “di, ji, bi” xwedî taybetmendîyekê ne û ew jî ew e, ku heger “di” di hevekê de be, divê hevpar a wê “de” yan “re” jî di hevekê de he bin û kengî “di” hevpar a xwe “de” distîne û kengî “di” hevpar a xwe “re” distîne, babetekî berfireh e û gerek di perrtûkek serbixwe de bihê tomarkirin. Herweha, peyv a kişanê “ji” jî hevpar ên wê “ve” û “re” he ne û ev jî taybetmendîyek a “ji” ye û gerek di perrtûkek a serbixwe de bihê şirovekirin. Herweha, peyv a kişanê “bi” jî xwedî hevpar e û hevpar ên wê “re” û “ve” ne wek: “ez dê bi te re bim” û wek: “ev pirs a han bi te ve girêdayî ye”. Heger em bibêjin: “ew tişt ji min ve xuya ye” pirsek e û heger em bibêjin: “min ji te re rojname hîna” pirsek a din e. Di ziman ê gell de û li hinek deveran weha jî dihê gotin: “da te ra bêjim” wata: “dey ji te re bibêjim” û me berê jî da xuyakirin, ku ziman ê gell bê vagir e û ne girêdayî rêziman e û rêziman ziman ê gell dike xwedî binçîn.

Hemû peyv ên kişanê serbixwe ne û serbixwe dihên nivîsandin. Heger destewaje ya “li gel” wek “ligel” bihê nivîsandin şaşîyek mezin e û di heman demê jî de, heger destewaje yê

“ji ber, bi lez, li ser...” wek “jiber, bilez, liser” bihên nivîsan-din şaşîyek mezin e. Şaşî ya mezin di wir de ye ku dem a wek nimûne tu “bi” û “lez” bi hevdu ve girê didî, tu peyvek din çê dikî ku ew jî peyv a “bilez” e û pirs ew e, ka wata ya peyv a “bilez” çi ye?! Di ziman ê Kurdî de her beşekî peyvê serbixwe ye û bi taybetî jî kişan serbixwe ye. Hemû peyv ên kişanê bi xwe amraz ên kişanê ne, belê ew wek beşekî peyvê dihên destnîşankirin ji ber ku ew bi peyvê re heval in û girêdayî peyvê ne û ji evê yekê jî giringtir, ew xwedî gerinek taybetî ne ji ber ku watayê dirist dikin. Ji ber evê yekê jî me kişan ne xist nav amrazan de û ew bi xwe amraz e, ji ber ku kişan gerin a beşekî serbixwe yê peyvê dibîne.

11- Pêşgir: ew peyv e ya ku li destpêk a peyvê yaniz dibe û pê ve dihê girêdan û watayek nû dide kok a peyvê. Di ziman ê Kurdî de her pêşgirek watayekê dide û ewê watayê dide kok a peyvê. Wek nimûne.. pêşgir a “ve” ya ku bi destpêk a peyvê ve dihê girêdan, wata ya “dîsan, ji nû ve û paşveçûnê” dide. Dem a em dibêjin: “Azad vegeriya mal a xwe” em pêşgir a “ve” bi destpêk a kok a kirde yê “ger” ve girê didin, da ku “veger” wata ya “çûn a ber bi paş ve” bide, wata ya “çûn a ji nû ve” bide û wata ya “dîsan ger” bide. Di evê nimûneyê de, wata “çûn a ber bi paş ve” û “dîsan ger” e. Dibe ku hinek peyv he bin, di wan de “ve” ji kok a peyvê be û ne pêşgir be û ew di jêder de weha ye, wek: “vexwarin” ku li beramber “xwarin” e. Herweha wek: “veder” ku wata ya wê “ne di rêzê de” ye. Herweha wek: “vehesîn, vewejartin, veydan, veresîn, vebûr...” ku di evan nimûneyan de “ve” ji kok a peyvê ye û ne pêşgir e.

Pêşgir a “ra” wata ya rawar (meqam) û bilindîyê dide û rewş û bizav a peyvê ya ji xwarê ber bi ser ve dide nîşandan. Dem a em dibêjin: “me ser ê xwe rakir” ango ser ê me li xwarê bû û

me ser ê xwe bilind kir. Pêşgir a “ra” wata ya bilindî û bilindkirinê dide û di gotinekê jêder wek “ragirtin” de dihê xuyakirin, ku ew hîştin a bi bilindî ye û rawestandî e. Nimûne yên wek: “raxistin, raperrîn, rabûn, rahînan...” didin xuyakirin ku pêşgir a “ra” nîşan a bilindbûn a ji cih e û nîşan a bizavek a li ser pê ye.

Pêşgir a “da” wata ya dayînê dide û ew rewş û bizav a peyvê ya ji ser ve ber bi xwarê ve dide nîşandan. Di peyvekê wek “dahînan” de pêşgir a “da” wata ya dayînê dide, di peyvinî wek: “daber, daçînîn, dabeş...” jî de, her wata ya dayînê dide. Di peyvinî wek: “dakevtin, daçikandin, dariman...” de dîyar dibe ku rewş û bizav a peyvê ya ji ser ve ber bi xwarê ve ye. Heger em bibêjin: “em ji otobosê dakevtin” ango em li jor bûn û em hat in xwarê. Heger em bibêjin: “me ala ya xwe di xakê de daçikand” ango me ala ya xwe ji bilindî ve di xakê de li xwarê çikand. Dibe di hinek peyvan de “da” ji kok a peyvê be û ne pêşgir be wek di peyv ên: “dara, darin, daylan, dabîn, darû...” de “da” ji kok a peyvê ye û ne pêşgir e.

Hemû pêşgir ji beş ên peyvê dihên amarkirin, ji ber ku ew bi peyvê re heval in û girêdayî wata ya peyvê ne.

12- Paşgir: ew peyv e ya ku li dawî ya peyvê yaniz dibe û pê ve dihê girêdan û watayek nû dide kok a peyvê. Di ziman ê Kurdî de her paşgirek watayekê dide û ewê watayê dide kok a peyvê û her paşgirek gerinekê dibîne. Paşgir di ziman ê Kurdî de gelek in û pirranî ya wan xwedî wata yên serbixwe ne, ango bi pirranî her yek ji wan xwedî watayek a serbixwe ye û ji ber evê yekê jî, her yek ji wan bi pirranî peyvek bi ser ê xwe ye.

Paşgir a “dar” a herî namdar e û gerin a wê ew e, ku ew nam ê kirdedar çê dike, ango peyvê dike kirdedar. Belê paşgir a “dar” bi ser ê xwe peyvek e û watayek din dide. Peyv a paşgir a “dar” dar a bi berhem û dar ê bê berhem dide nîşandan, ku dar a bi

berhem û li ser xwe û hîne şîn mê ye û dar ê bê berhem ê hişk û jêkirî yê ne bi qurm ê xwe ve ye nêr e.

Paşgir a “van” jî nam ê kirdedar, parêzdar û kar dide nîşandan. Di nimûneyekê de wek: “Azad şoreşvan e” ango kar ê Azad di nav şoreşê de ye û ew parêzvan ê şoreşê ye.

Paşgir a “kir” a ku di ziman ê gell de “ker” e û “ker” şaş e, gerin û wata ya yê/ya ku kar dike nîşan dide. Ango yê/ya ku kar dike “karkir” e ne “karker” e, ji ber ku “kir” wata ya kirinê dide belê “ker” ewê watayê nade.

Paşgir a “wer” nam ê kirdedar û erk nîşan dide wek: “dadwer, serwer, vêwer...”. Di nimûneyinî wek: “bawer” û “perwer” de “wer” ji kok a peyvê ye û ne paşgir e. Paşgir a “wer” di hinek peyvan de pêşgir e wek “wergirtin, werçerxan, werbadan, wergeran, ...”.

Paşgir a “geh” wata ya cih dide û cih dide nîşandan wek: “zalgeh” ku peyv a “zal” kontrol e û paşgir a “geh” wê dike cih ê kontrolê, ku bi xwe xal a pişkinînê ya leşkirî yan a asayiş a dewletê ye.

Hemû paşgir ji beş ên peyvê dihên amarkirin, ji ber ku ew bi peyvê re heval in û girêdayî wata ya peyvê ne.

13- Bang: peyv a agahdarkirin û daxwazkirinê ye û dengdan û halan e. Bi giştî bang a “ho” ji bo tak ê nêr e û bang a “ha” ji bo tak a mê ye wek: “ho kurro” û “ha kiçê”. Bang a “wa” jî ji bo komê ye wek: “wa hevalino, wa zarokino...”. Bang a herî namdar jî “ey, hey” ye, ku tê de sertag ê agahdarkirinê, daxwazkirinê, dengdan û halanê baştir dîyar e.

Hemû peyv ên bangê amraz ên bangê ne, belê ew wek beşekî peyvê dihên destnîşankirin, ji ber ku ew bi peyvê re heval in û girêdayî watayek a serbixwe ya peyvê ne.

14- Pirsîn: peyv a pirskirinê, lêkolînê û daxwaz a bersivê yan

bersivdanê ye. Dem a em dibêjin: “tu çi dixwazî ?” peyv a “çi” amraz ê pirsînê ye û daxwaz a bersivekê dike, herwek çawa lêkolînê li tişteki dike. Dem a em dibêjin: “çend zarok ên te he ne?” peyv a “çend” a pirsînê ye û bersivê dixwaze. Hemû peyv ên pirsînê xwedî yênan evan gerinan in.

Hemû peyv ên pirsînê amraz ên pirsînê ne, belê ew wek beşekî peyvê dihên destnîşankirin, ji ber ku ew bi peyvê re heval in û girêdayî wata ya peyvê ne.

15- Amraz: ew peyv e ya ku ji bo encamdan a kiryarek a zimanvanî dibe alîkar û karek pê dihê encamdan. Di zimanê Kurdî de amraz gelek in û ji wan:

A- Amraz ê nas û nenas:

- Nas: hemû nam ên bi ser ê xwe nas in wek: “gund, bajêr, mirov, Azad, Zîn, çiya, dar, rûbar...”. Amraz ên “a, ya, ê, yê, ên yênan” nam bêtir dikin nas wek: “mal a mezin, zevî ya fireh” û “şûrê tûj, çiya yê bilind” û “gundê bi av û dar, rê yê dirêj” ku “a, ya” ji bo namê takê mê ye û “ê, yê” ji bo namê takê nêre û “ên, yênan” ji bo namê komê nêre û mê ye. Belê ev amraz ên han “a, ya, ê, yê, ên, yênan” bi rewşê û pergala re û bi bernamanî jî re dihên û wan bêtir dikin nas wek: “gul a sor û ya sipî bi hevdu re ciwantir in” û wek: “nexweşê ser cihan û nexweşê ser payan” û wek: “hevalê minê werzişvan” û wek: “ew a endazyar, ewê reviyayî, tu yê rakevtî, hûn ên kombûyî...”.

- Nenas: namê ku dikeve jêr pirsînê de nenas e wek: “mêrek hat nav baxçe” em dipirsin ka ew mêr kî ye. Heger me got: “zarokî hat in nav baxçe” em dipirsin ka ew zarok kî ne. Amraz ên “ek, in” evê gerinê dibînin û nam dikin nenas, ku “ek” ji bo takê nêre û mê ye û “in” ji bo komê nêre û mê ye.

Amrazê “eke” bi xwe “ek a” ye û dem a ku “ek a” be wata ji aliyê rêzimanî ve rasttir e, ji ber ku di nav zimanê gell de û

li hinek deveran “ek a” bûye “eke” û wata ya xwe winda kiriye. Amraz ê “eke” wata ya xwe winda kiriye, ji ber ku “ek” di rêziman de naskirî ye ka ew çî ye, belê “e” xwedî gerinek (rolek) din e û ne nîşan a mê ye, ango “e” di ziman ê Kurdî de ne amraz ê mê ye. Ew amraz ên nenasînê yên ku bi evê gerinê dirabin “ek a, ek ê, ekî, inî” ne, ku “ek a” ji bo tak ê mê ye “ek ê” ji bo tak ê nêr e û ev amraz (ek ê) bêtir li dever a Badînan bi kar dihê û ji alî yê rêzimanî ve gelek rast e û “ekî” ji bo tak ê nêr e û “inî” ji bo kom a nêr û mê ye. Wek nimûne.. “min mahînek a sipî dît”.. “ew kurrek ê baş e”.. “ew kurrekî baş e”.. “ev perrtûkinî bi nirx in”. Amraz ê “ine” bi xwe jî “inî” ye, ji ber ku “in” amraz ê komê ye belê “e” bê wata ye û bi xwe “î” ye û “î” biyaşkirin e, di ziman ê gell de û li hinek deveran bûye “e”.

B- Amraz ê gihanînê: ev amraz ê girêdan û gihandin a nav hevek û destewajeyan e. Jê re “gihanek” jî dibêjin û yê herî namdar “ku” ye. Dem a em dibêjin: “ev du şal rengîn in, ku yek ji wan kesk e û yê din şîn e” em du alî yên hevekekê bi rê ya amraz ê “ku” bi hevdu ve girê didin. Dem a em dibêjin: “tu mamostayî, belê tu pisporî jî” em du destewajeyan bi rê ya amraz ê gihanînê “belê” bi hevdu ve girê didin. Ev amraz ê han serbixwe dihê nivîsandin. Amraz ê “belê” yê gihanînê carinan wek “lê” û “lê belê” dihê gotin, belê amraz ê “lê” kurtkirî ya “belê” ye. Herweha amraz ê “lê” watayek a din dide û ew wata ne girêdayî amraz ê gihanînê ye. Dem a me got: “tu ji vir çû, tenanet te silav jî nekir” amraz ê gihanînê “tenanet” e û herdu alî yên evê hevekê bi hevdu ve girê dide.

Hemû amraz ên gihanînê di nav hevekê de evê gerinê dibînin û hevek bê wan ne hevgirtî ne.

C- Amraz ê peywendîyê: amraz ê hevsazî ya nav hevekê ye. Ew ne tenê girêdan e, belê ew ji bo sazkirin a hevahengîyê jî ye. Ji

ber evê yekê jî ew hevsazî ya nav peyvîvînê ye. Dem a em dibêjin: “gul evîn e û bilbil evîndar ê wê ye” amraz ê peywendîyê “û” gerin a evê hevsazîyê di evê hevekê de dibîne û ew ne tenê girêdan a navber a du alî yên hevekê ye. Dem a em dibêjin: “tu dê biçî dibistanê yan tu dê biçî cihekî din?” amraz ê peywendîyê “yan” du alî yên nav evê hevekê bi hevdu ve girê dide û pergalekî hevsazîyê dide nîşandan û lê digere.

Hemû amraz ên peywendîyê di hevekê de gerin a hevsazîyê û girêdanê dibînin û ev amraz di hevekê de, bi awayekî berdewerî (mutleq, absolute) serbixwe dihên nivîsandin.

D- Amraz ê zehîmanê: zehîman (te`eccub, exclamation) kardan a derûnê ya li beramber tiştêkî zehî ye. Her ku em tiştêkî zehî (ecêb) dibînin, em hinek peyv dibêjin ku ew peyv nîşan a zehîmanbûn a me ne. Dem a em dibêjin: “bijî! Tu mirovekî hişyarî” bi peyv a “bijî” em ewê zehîmanbûn a xwe ya li beramber hişyarî ya “te” didin nîşandan. Dem a em dibêjin: “mixabin! Ew kesekî lawaz e” em zehîmanî ya xwe li beramber lawazî ya wî kesî didin nîşandan. Ev herdu peyv (bijî, mixabin) kardan ên derûn a me ne. Ji bilî evê yekê, di ziman ê Kurdî de hinek amraz ên zehîmanê jî he ne wek: “hek, pek, wey, aha, wax...” ku ew jî ewan kardan ên derûnî didin nîşandan.

E- Amraz ê ayinde: ayinde (musteqbel, future) dem a bihê ye. Di ziman de “ê” ye, belê dibe “wê, yê, dê”. Ew dibe “wê” dem a ku dikeve bin sirêm a (bandor a) bernam “ew” de wek: “wê seredan a me bike” ango “ ew ê seredan a me bike”. Her di bin ewê sirêmê (bandorê) de bi bernam “tu” re dibe “yê” wek: “tu yê seredan a me bikî”. Ji herduyan rasttir “dê” ye, ji ber ku “dê” xwe ji “ê” ya ku amraz ê gelek gerin ên din e dûr dixê û serbixwe dimîne.

Heger hinek bibêjin ku “dê” peyv a “dayikê” ye şaş dikin, ji ber

ku guherandin a peyv a dayikê bi xwe şaş e. Gerek peyv a “dayik” nebe “dê” ji ber ku ev guherandin a han gelek şaş e. Ji xwe peyv a “dayikê” ya ku bi xwe “day” ye, bi gelek awayan hatiye û dihê gotin; ew wek “ca, ci, di, dî, da, dê” hatiye û dihê gotin û ev heyvêz hemû jî ji bo wata ya “dayikê” ne rast in, ji ber ku di bin bar ê levakirin a şaş a bê şîraz de ne.

16- Hejmar – Namhejmar – Navhejmar: ew peyv e ya ku tibabê hejmartî û dasazî ya tibabê hejmartî dide nîşandan. Ew bi giştî jî du cor in, ku cor ê yekem namhejmar a resen e û cor ê duyem namhejmar a dasazî e. Cor ê yekem (namhejmar a resen) ji evan beşan pêk dihê: hejmar ên tak (bingehîn) – hejmar ên pêksaz – hejmar ên dehkan – hejmar ên peywest – hejmar ên komelîn – hejmar ên beşeyî; ango yên ku beş ên wan dihên dîyarkirin.

Hejmar ên tak ên bingehîn “0, 1, 2, 3, 4, 5, 6, 7, 8, 9” in û “100” û “1000” û dubar ên wan jî pê re ne. Hejmar ên pêksaz “yanizdeh, duyanizdeh, sêyanizdeh, çardeh, panizdeh, şanizdeh, heftdeh, heştdeh, nozdeh” in. Hejmar ên dehkan “bîstem, sihem, çilem, pêncîyem, şêstem, heftêyem, heştêyem, notem” in. Hejmar ên peywest “bîst û yek, bîst û du, bîst û sê, bîst û çar, bîst û pênc, bîst û şeş, bîst û heft, bîst û heşt, bîst û neh” in û wek wan bi hemû dehkan re ji yekê (1) heta nehê (9) ne.

Hejmar ên komelîn jî dubarekirin a hejmarê di yek peyvê de ye, herweha hejmar a komelîn komelkirin an komkirin a hejmarê ye wek: “dehdeh, bîstbîst, sihsih û yekoyeko, dudu, sêsê û çarçar...” û wek “duyan, sêyan, çaran... dehan... yanizdehan... bîstan... sihan... sedan... hezaran... miliyan...” in, ku ji bilî yekê ye û hinek yekê jî dikin yekan. Ango ev hejmar a komelîn, komkirin a hejmarê ye û ev bi alîkarî ya amrazê komê “an, yan” çê dibe. Herweha, dem a em dibêjin: “duyan” ango em

“1 û 2” didin hejmartin, dem a em dibêjin: “nehan” em ji “1 heta 9” didin hejmartin û dem a em dibêjin: “sedan” em ji “1 heta 100” didin hejmartin. Bi evî awayî, em şaş dikin dem a em dibêjin: “sal a du hezar û nehan” û em carek din şaş dikin dem a em di nivîsandin a hejmarîn de jî “an” û “yan” bi hejmarê ve girê didin. Xwîndin û nivîsandin a evê demê “sal a du hezar û neh “ e û hejmar jî “2009” e. Di dekin a (tekist a) nivîsandî de jî weha ye: “em di sal a 2009 (du hezar û neh) de çûn bakur ê Kurdistanê û berê jî, em di sal a 1999 (hezar û neh sed û not û neh) de çûbûn rojhilat a Kurdistanê”.

Hejmar ên beşeyî, ango “ji çaran yek, sê li ser çar, çarîyek...hd” beş ên hejmarê dîyar dikin û ev jî di amarê de gelek giring e. Di cor ê duyem (namhejmar a dasazîn) de, hejmar amraz ên “em, emîn” di dawî ya xwe de diwergirin wek: “yekem = yekemîn, duyem = duyemîn, sêyem = sêyemîn, çarem = çaremîn, pêncem = pêncemîn, şeşem = şeşemîn, heftem = heftemîn, heşttem = heşttemîn, nehem = nehemîn, dehem = dehemîn, yanizdehem = yanizdehemîn, sedem = sedemîn û ...hd”.

Ji bilî evê çendê, peyv ên wek: “pirr, hindik, gelek, çend, hejmarek, tibabek...” girov ên (delîl ên) hebûn a hejmarê ne, belê hejmarek ne destnîşankirî ye. Tişt ê ku em dikarin di bare ya hejmar a “nîv” de bibêjin ew e, ku “nîv” li hinek deveran nêr e û li deverinî din mê ye. Babet ê “nîv” di nimûne yên nivîsandin ên rêzimanî de geh nêr hatiye û geh mê hatiye. Ango hinek dibêjin: “nîvî, nîv ê” û weha nêr e û hinek dibêjin: “nîvê, nîv a” û weha mê ye. Di bawerî ya me de “nîv” nêr e, ango “nîvî, nîv ê” ye. Wata dem a em dibêjin “sêv û nîvê bide min” em şaş dikin, gerek em bibêjin: “sêv û nîvî bide min”. Belê xuya ye ev pirs a han jî weha hatiye, ji ber ku hejmar a “nîv” bi nam ve girêdayî ye, ku dem a nam ê peyv a ku hejmar

a wê dihê xwaztin mê be “nîv” jî dibe mê û dem a ku nam ê peyv a ku hejmar a wê dihê xwaztin nêr be “nîv” jî dibe nêr. Di nimûne ya nam ê “sêv” de ev pirs a han dihê xuyakirin, ku peyv a “sêv” mê ye û “nîv” ê xwe jî di hevekê de kiriye “mê” û bûye “sêv û nîvê bide min”.

+ Namhejmar a jêderî:

Em weha dibînin ku dibe nam ê evê hejmarê jêderî be, ji ber ku bi çar amraz ên diristkirin a jêder dirist dibe û ew jî “î, an, î, bûn” in. Heyvêz a evê namhejmarê jî weha ye:

- Yeksalî, yeksalan, yeksalîn, yeksalbûn.
- Dusalî, dusalan, dusalîn, dusalbûn.
- Dehsalî, dehsalan, dehsalîn, dehsalbûn.
- Yanizdehsalî, yanizdehsalan, yanizdehsalîn, yanizdehsalbûn.
- Bîstsalî, bîstsalan, bîstsalîn, bîstsalbûn.
- Bîst û yeksalî, bîst û yeksalan, bîst û yeksalîn, bîst û yeksalbûn.
- Sedsalî, sedsalan, sedsalîn, sedsalbûn.

Her yek ji evan herçar heyvêzan jî cih û dem a xwe he ye. Wek nimûne: heyvêz a yekem û ya ku bêtir ew bi kar dihê (yeksalî, sedsalî) tenê hejmar a temen dîyar dike wek: “ev zarok yeksalî ye, ev mêr sedsalî ye”. Heyvêz a duyem (yeksalan, sedsalan) hejmar a xayandî (berdewam) û kom dîyar dike wek: “ev pirs di nav sedsalan de çê bûye, yeksalan a me dûr û dirêj bû”. Heyvêz a sêyem (yeksalîn, sedsalîn) hejmar a ku pêk dihê yan pêk hatiye dîyar dike wek: “pirs a me dehsalîn e, temen ê doz a me pêncîsalîn bû”. Heyvêz a çarem (yeksalbûn, sedsalbûn) hejmar a ku bûye yan çê bûye dîyar dike wek: “evî kurrî yeksalbûn a xwe kir, evê dewletê dusedsalî ya xwe gurah kir”.

Ev beş ên peyv a Kurdî, her yek ji wan bi ser ê xwe perrtûkek li ser dihê nivîsandin û gerek jî weha be. Di evê delîveyê (fursetê)

de li ser her beşekî bi kurtî hatiye nivîsandin, ji ber ku armanc
tenê dîyarkirin a evan beşan bûye.

Şanîdanan

Şanîdanan (xal bendî, punctuation) kiryara danan a ewan hêma yên sazwayeyî ye yên ku ji bo şîrazkirin a peyv, destewaje û hevek ên nav nivîsandinê ne û ji bo dîyarkirin a mebest ên peyivînê û hêsankirin a hobarkirin a wata yên hevekan e. Ew di dem a nivîsandin a peyv, destewaje û hevekan de dihên danan, da ku dawî û destpêk a hevekan bihên destnîşankirin û cih ên bizavtin û rawestanê bihên destnîşankirin. Ev hêma yên han, ji bo dîyarkirin a mebest û armanc ên peyivînê ne û ji bo hêsankirin a hobarkirin a wata yên peyv û hevek ên nav babet in. Ew hêma yên ku bêtir bi kar jî dihên – an jî em bêtir wan bi kar dihînin – panizdeh (15) in û ew jî ev in:

1- Xal (.): nuqte ye û bi Englîzî jê re “full stop, point” dibêjin. Xal di dawî ya hevekê de û dem a ku hevek bi dawî dibe, dihê danan. Giringî ya xalê ew e, ku hevekan ji nav hev diderxîne û wan şîraz dike. Xal di nav babet de gerin a terazûyê jî dibîne, ku ew parçe yên peyivînê di cih ê xwe yê pêwîst de diragire.

2- Dabirr (,): bêhnok jî jê re dibêjin û bi Englîzî “coma” ye. Ew di nav nivîsandinê de ji bo rawestanek a kurt e û ew rawestan ji bo bêhnvedanê ye. Herweha dabirr dikeve nav çend hevekan de û wan bi hev ve girê dide wek: “Azad mirovekî baş e, kes jê weris nabe, jêhatî ye û xwîndevan e”. Dabirr di nimûne yên weha de li şûn a amraz ê peywendîyê “û” ye, ango li şûn a ku em bibêjin: “... û weha û weha û weha...” em tenê “û” ya dawî dinivîsin û dabirr şûn a “û” yên din ên destpêkê digire. Dabirr ji bo dabirrîn a hejmaran û nivîsandin a dîrokan jî bi kar dihê wek: “roj a yekşemê, 7, 3, 2020 ez çûm rojhilat a Kurdistanê”. Dabirr di nav nivîsandinê de li dawî ya peyivînê dihê danan û di evî biwarî de nêzîkî xalê ye, belê xal ji bo rawestanê ye û dabirr

ji bo xayandin a (berdewamî ya) peyivîn a piştî bêhnvedanê ye. Dabirr li pêşî û li paşî ya amraz ê peywendîyê “û” nahê danan, ji ber ku amraz ê peywendîyê “û” hevekê berdewam dike û nabirrîne. Herweha, dabirr li pêş û li paş kevanan û nîşan ên dekirinê (dunik) jî nahê danan, ji ber ku du şanîdan ên wek hev an ne wek hev, bi hevdu re nabin.

3- Serxal (;): bi Englîzî jê re “semicolon” dibêjin. Serxal di dem a rawestanek a xayandin a peyivînê de dihê danan wek: “bira yê min mamosta ye; xwîşk a min endazyar e” ango ew ji bo rawestanekê ye ku bêhnvedan tê de nîne, belê xayandin a peyivînê tê de he ye. Di nimûneyekê de wek: “di pol a me de ji çend netewe yên din jî he ne; du Erebin, du Parsin û yek jî Turkmen e”. Beş ên peyivînê piştî serxalê, li duv hev dihên.

4- Duxal (:): bi Englîzî jê re “colon” dibêjin. Duxal ji bo peyivînê û peyivdar dihê danan wek: “min ji te re got: wane yên xwe bixwîne da ku tu rayend bî”. Herweha wek: “ji xwe re bihilbijêre: yan bibe mamosta, yan bibe endazyar”. Duxal ji bo pêşkêşkirin a tiştê ku divê bihê gotin û pêşkêşkirin dihê danan.

5- Kevan (): jê re dukevan jî dibêjin û bi Englîzî “parenthesis” e. Di nav kevan de peyv û wata yên ku naskirin û şirovekirin a wan dihê xwaztin, dihê nivîsandin. Wek nimûne: “heta ku tu rayend bî (serkevtî bî) gerek tu xebatkar bî” em di evê hevekê de peyv a “rayend” şirove dikin û em şirove ya wê dixin nav kevan de. Herweha, di nav babetê nivîsandî de, dabirr (bêhnok) û serxal berî û piştî kevan nahên nivîsandin.

6- Kevançilak []: bi Englîzî jê re “brackets” dibêjin. Di nav kevançilakê de peyv û peyivîn a ku ne di nav babetê de ye – belê pê ve girêdayî ye – dihê nivîsandin. Wek nimûne: “me kombûnek saz kir [kombûn jî bi rêzanî dihên sazkirin] û me babetekî fireh şirove kir”. Berî û piştî kevançilak, dabirr û serxal

nahên nivîsandin.

7- Dekinkirin “ ”: jê re dunik jî dibêjin û bi Englîzî “quotation” e. Peyvîn a ku hatiye wergirtin di nav dekingirinê (dunikê) de dihê nivîsandin. Dabirr û serxal jî berî û piştî dekingirinê (dunikê) nahên nivîsandin. Herweha, peyv, sazweje û destweje yên ku dihê xwaztin biyaş bibin û bêtir bikevin ber çav de, di nav dekingirinê (dunikê) de dihên nivîsandin. Wata ya peyv a “dekingirin” bi xwe jî “tekistkirin” e, ango dem a em peyvekê yan hevekekê yan movikek a nivîsandinê dixin nav dekingirinê de, wata em wê peyvê, wê hevekê, wê movikê û her babetekî din dekin dikin (tekist dikin).

8- Zehîman (!): bi Englîzî jê re “exclamation” dibêjin. Şanîdanan a zehîmanê piştî kardan a derûnî dihê danan. Dem a ku ew di dawî ya hevekê jî de bihê nivîsandin, hevekê bi dawî dike, ango hîngê şûn a xalê digire. Dabirr û serxal berî û piştî evê nîşanê nahên danan.

9- Pirsîn (?): bi Englîzî jê re “question mark” dibêjin, ango hêma ya pirsînê ye. Ev hêma ya pirsînê, di dawî ya hevek a pirsînê de dihê nivîsandin û ew li şûn a xalê ye. Ew piştî her peyvek a pirsînê jî dihê danan, wek: “çima ? kengî ? çi ?...”.

10- Gihanek (–): bendik jî jê re dibêjin û bi Englîzî “hyphen” e. Gihanek di nav a du alî yên hevekê de dihê danan. Ango dem a em di nav hevekê de hevekek a din an destwejeyek a din diniwîsin, em wê dixin navber a du gihanekan de wek: “ew mêrekî leheng bû – û wek wî gelek mêr ên din ên leheng he bûn – û herdem merd û aza bû”.

11- Renkirin (...): bi Englîzî jê re “ellipsis” dibêjin. Renkirin cih ê renkirin a (jêbirin a) peyvekê û peyivînekê ye. Ew cih ê peyv ên negotî ye. Wek nimûne: “min ji te re got ... belê te guh ê xwe neda min” ango min ew a gotî ji te re ne got û min ne da

nîşandan.

12- Asoxal (..): ji bo xayandin a (berdewamkirin a) peyivînê ye. Ango dem a asoxal di nav hevek ên babet de dihê danan, wata peyivîn xayan e (berdewam e). Wek nimûne: “em li nav dexl û dehnan digeriyan .. em diçûn ber qerax ên rûbaran.. me xwe li pal a çiya digirt”. Ev şanîdanan a han, ji nik me ve hatiye pêşkêşkirin.

13- Serbar (`): bi Englîzî jê re “apostrophe” dibêjin. Di diyalekt a başûrî de peyv a “serbar” ji bo wata ya “izafe, addition” bi kar dihê û ev karhînan ne wird e, ji ber ku wata ya “izafe, addition” di ziman ê Kurdî de “serwaz” e. Serbar li şûn a pîtek renkirî dihê nivîsandin, an li şûn a pîtekê ku di ziman ê Kurdî de tine ye dihê nivîsandin wek: “Se`îd mirovekî hişyar e” ku di nam ê “Se`îd” de, serbar li şûn a pît a Erebi “eyn” hatiye. Di nam ê “mes`ûd” de jî her weha ye, serbar li şûn a pît a Erebi “eyn” hatiye û ev pît di ziman ê Kurdî de tine ye. Ango serbar ji bo dabirrîn a du pît ên dengdar ên nav peyvek a ne Kurdî jî dihê danan. Ew serbar e ji ber ku li serî dihê barkirin.

14- Xêzek (– û _): bi Englîzî jê re “dash” dibêjin.– Xêzek di nav beşekî dekinê (tekistê) de ji bo girêdan a peyv û hejmaran e wek: “nû – heyv” û “1999 – 2020”. Xêzek ji bo dabirrîn a peyv ên nav heyvê ye wek: “me li hev kir ku em biçin – û em wan li hev bihînin – da ku aştî çê bibe”. Du cor ên xêzekê he ne, ku cor ê yekem “kinxêzek” e (–) û bi Englîzî “en dash” e û cor ê duyem “dirêjxêzek” e (_) û bi Englîzî “em dash” e. Cor ê yekem “kinxêzek” ji bo destnîşankirin a biwar û girêdanê ye wek: “2012 – 2020”. Cor ê duyem (dirêjxêzek) ji bo xweşkirin û başkirin a xwîndinê û biyaşkirin a mebest a hevekê ye wek: “wê hilwest a xwe dîyar kir û got _ ez evî karî nakim”.

15- Tîxêz (/): bi Englîzî jê re “slash” dibêjin. Tîxêz ji bo dabirrîn

a malik ên helbestan e. Herweha, tîxêz ji bo pirs ên dijgarî hev dihê nivîsandin wek: “du hebûn li dijî hevdu ne; av/agir û av agir dikuje”. Tîxêz di nivîsandin a namnîşanan de bi kar dihê wek: “welat ê ... / parêzgeh a ... / tenişt ... / ...”. Tîxêz di amarkariyê (hisab) de jî bi kar dihê wek: “ $1/3 - 2/6$...”. Herweha, tîxêz ji bo dabirrîn a roj, meh û salê ye wek: “2/7/2020”. Tîxêz ji bo dîyarkirin a qonaxê jî ye wek: “20 km / dem.” ango “20 km di demjimarekê de” ye. Tîxêz wata ya amrazê “an, yan” jî dide.

Peyv a “şanîdanan” a ku di evê perrtûkê de ji bo wata ya “xalbendî, punctuation” hatiye danan, peyvek giştgîr e û hemû nîşan ên nav nivîsandinê dide xuyakirin. Peyv ên “xalbendî, nuqteşanî, nuqtekirin” wata ya giştgîr a evê pirs a zimanvanî nadin, ji ber ku em ne tenê “xalê, nuqteyê” di nav nivîsandinê de bi kar dihînin. Payv a “şanîdanan” a ku beşê wê yê serekîn “şanî” ye, wata ya hemû ewan nîşan ên nav nivîsandinê dide. Peyv a “şanî” wata ya hêma yê nav nivîsandinê dide û ew hêma pirr in, belê me tenê (15) ji wan di vir de destnîşan kirine. Ev her (15) şanîdanan jî, bêtir di nivîsandinê de bi kar dihên.

Tê:

Berê jî me dabû nîşandan, ku em (gell) di ziman ê xwe de sê cor ên peyv a “tê” bi kar dihînin û ji bo sê wata yên cuda bi kar dihê. Ango em bi yek peyvê sê watayan diderxin û ev ne ji surîşt a ziman ê Kurdî ye. Weha em tevhevîyek mezin di bi karhînan a evê peyvê de çê dikin û em xwe ji ewê surîştê dûr dikin. Em dibêjin: “Azad tê malê” û di evê nimûneyê de mebest a me ji evê peyvê (tê) bi karhînan a kirde ye û ew kirde yê dem a amad e. Heger em li jêder û kok a evî kirdeyî bigerin, em dê bibînin ku ew “hatin” e, ku di evî jêderî de “ha” kok a peyvê ye. Di peyv a “tê” de ev kok a han “ha, hatin” windayî ye û tine ye. Êdî çawa ji jêder û kok a “hatin” peyv a “tê” derkevîye? Ew ji peyv a “dihê” derkevîye, ku pît a yekem a evê peyvê “d” bûye “t” û pît a “h” winda bûye û pît a dawî “ê” bi pît a “t” ve hatiye girêdan û weha bûye “tê”. Çi bi ser ê evî kirdeyî hatiye?! Heger em jêder a “hatin” bi awa yê rêzimanî yê rast kêsan bikin, dê weha be: di dem a amad de “ez dihêm” di dem a mêjîn de “ez hat im” û di dem a ayinde de “ez dê bihêm” e û kêsan a rast û dirist a evî kirdeyî weha ye, ji ber ku di evê kêsanê de kok û resenî ya peyvê paraztî ne. Ango di evan hersê dem ên kêsanê de, kok a kirde ku “ha” ye, paraztî ye. Belê di kêsan a peyv a “tê” ya ser ziman ê gell de weha ye: di dem a amad de “ez têm” di dem a mêjîn de “ez hat im” û di dem a ayinde de “ez dê bêm” e. Ango di dem a amad û ayinde de kok a kirde windayî ye û tine ye, belê di dem a mêjîn de kok a jêder a “hatin” hatiye paraztin. Ev jî girov ê (delîl ê) ewê yekê ye, ku “tê” di resenî ya xwe de “dihê” ye û her kirdeyekî ku kok a xwe ji dest bide û ji dest dabe, nema kirdeyekî resen e. Ji bo ku resenî ya peyvê vegere jî, divê em li kok a wê bigerin û em kok a wê bi cih bikin.

Peyv a din a “tê” ya ku em (gell) wê bi kar dihînin, ji “tu dê” hatiye. Destewaje ya “tu dê” bûye “tê” ku pît a “u” ya peyv a “tu” winda bûye û pît a “d” ya amraz ê “dê” yê dem a ayinde jî winda bûye û tenê “ê” jê maye. Weha jî di “tu dê” de tenê “t” û “ê” mane da ku bibin “tê”. Çi bi ser ê evê destewajeyê hatiye?! Dem a ku dixwazin bibêjin: “tu dê biçî bazarê” dibêjin: “tê biçî bazarê”. Ev “tê” ya han a ku bingeh a wê û rastî ya wê “tu dê” ye, gerinek (rolek) mezin di biwar ê etîmolojîk de dibîne, ku ew gerin sirêmê (bandorê) li wata ya evê peyvê dike. Ne rast e bihê gotin; ku gerek peyv a “tê” ji ber xwe ve bihê hobarkirin ka ew çi corekî “tê” ye, yan jî bihê gotin ku ew (tê) di nav hevekê de xuya dibe, ji ber ku pirs pirs a wata û kok û resenî ya peyvê ye û divê ev bingeh ên rêzimanî û zimanvanî parastî bin. Divê her peyvek di cih ê xwe yê resen de be. Gotin a “ji ber xwe ve bihê hobarkirin” ajawe ye û di vir bi xwe de ajaweyek a hizrî ye. Peyvek bi ser ê xwe bihê guherandin û bibe heyvêzek din, pergalekî ne rast e û tiştêkî ne di cih ê xwe de ye, ku ne zanist a etîmolojîk û ne jî semantîk evî pergali û evî tiştî dipejirînin. Wata ev pirs bi zanist a ziman ve girêdayî ye û ji ber evê yekê, gerek li angora zanist a ziman dakarî (mu`amele) pê re bihê kirin.

Peyv a sêyem a “tê” di heyvêz a “tê de” û “tê re” bi kar dihê û tenê em (gell) evê heyvêzê rast bi kar dihînin. Ev heyvêz a han ji “di wî/wê de/re” hatiye û di ziman ê Kurdî de ev cor ê heyvêzê he ye û gelek jî taybetî ye. Di evê destewajeyê de baş xuya ye, ku amraz ê kişanê “di” nahê gotin û ew amraz, bi bernam ê “wî” û “wê” re bûye yek û “tê” çê bûye. Di ziman ê Kurdî jî de pît a “d” bûye “t” û pît a “t” jî bûye “d”. Di hinek dekin ên (tekist ên) dîrokî de û bi taybetî dekin ên serdem a Eşkanîyan, nam ên wek Azad “Azat” û Ferhad “Ferhat” bûne, ku pît a “d” wek “t”

hatiye levakirin. Di nimûneyekê de wek: “me seredan a baxçe yê nav bajêr kir û tê de (di nav evî baxçeyî de) dar ên bilind he ne. Herweha, tê de (di nav evî baxçeyî de) golek a biçûk a avê he ye û werdek jî tê de (di nav evê golê de) he ne” ji me re xuya dibe, ku “tê de” gerin a ewî pergal ê taybetî yê zimanvanî dibîne. Di nimûneyekê de wek: “daristanek mezin he ye û em tê re (di nav daristanê re) derbas bûn” ji me re xuya dibe ku “tê re” gerin a ewî pergal ê taybetî yê zimanvanî dibîne. Ev gerin a taybetî ya “tê de” ya ku ji “di wî/wê de” hatiye, rewş a navînê yan navberê – ango rewş a nav tişteki – dîyar dike û rawestan e, belê gerin a taybetî ya “tê re” ya ku ji “di wî/wê re” hatiye, rewş a peyarbûnê (meşê) û bizavê he ye. Di evî cor ê “tê” de amêtebûn a beş ên peyvê he ye, ku wek me got; amraz ê “di” bi bernam ên “wî, wê” re bûye yek. Ev cor ê amêtebûnê taybetî ye û di ziman de nîşan a hebûn a hêzê ye, ango nîşan a hebûn a hêz a ziman e û nîşan a hebûn a kirdarîniyê (fa`iliyyetê, effectiveness) ye. Ev kirdarîni bi xwe yek ji engîz ên serekîn in, ên ku hîştine ziman ê Kurdî bimîne û di nav gelek ziman ên dor a xwe de û di nav a dem û çax ên dirêj de zindî be.

Belê hevpar û hevkar ê “tê” yê ku “re” ye, di ziman ê gell de wek “ra” bi kar dihê û bi rastî “ra” ne hevpar û hevkar ê amraz e, Ji ber evê yekê jî “ra” ne rast e. Di hevekê de “ra” peyv û pêşgir e. Ew peyv e ji ber ku ew bi xwe wata ya xwe ya taybetî he ye û ew jî bilindbûn û rabûn e û ew pêşgir e jî, ji ber ku bi destpêk a peyvê ve dihê girêdan û wata ya xwe dide peyvê. Herweha, hevpar û hevkar ê “tê” yê ku “de” ye, di ziman ê gell de wek “da” bi kar dihê û ew jî ne rast e, ji ber ku “da” hem peyv e û hem pêşgir e. Ew peyv e û ji jêder a “dayîn” hatiye û kirde yê dem a mêjîn a nêzîk e, herweha ew pêşgir e û wata ya ji jor ve ber bi xwarê ve dide, wek: “dakevtin, dabezîn, daçikan-

din, darimandin, dakutan, ..." û ji ber evê yekê, nabe ev hevpar ê "tê" yê ku "de" ye, wek "da" bi kar bihê.

Dem a ku "tê" ji "di wî/wê" hatibe û wek "tê de" be, amraz ê "tê" amraz ê kişanê ye. Ew bi peyvê ve jî dihê girêdan û jê re dibe wek pêşgir da ku watayek a din bide, wek: "têbînî, têkilî, têraman, têperrîn, têkoşîn, ...". Di nimûne yên wek: "têr, têl, têvil..." jî de "tê" ji kok a peyvê ye û ne amraz ê kişanê ye. Ev amraz ê kişanê wek "têk" jî bi kar dihê û ew ji "di êk, di yek" hatiye, ku ev heyvêz a han bi giştî başûrî ye û li hinek dever ên din ên Kurdan jî dihê gotin. Heyvêz a "têk" jî peyv e û ziman wek peyv dakarîyê pê re dike.

Heger em "tê" ji bo evan hersê watayan bi kar bihînin, em ziman ê xwe lawaz dikin. Ji ber ku yek peyv ji bo çend watayan lawazî ya ziman e. Ziman ê Kurdî jî ne ewqas lawaz e, belê heger her peyvek ji bo çend watayan hat gotin, em dê zimanekî lawaz bibînin. Dibe ku di ziman de peyvek he be çend wata yên nêzîkî hev bide û ev yek di ziman de surîştî ye, belê bi giştî her watayek xwedî ya peyvek a xwe ya taybetî ye û heger weha be, ziman xurt û bi hêz e. Ji bilî evê yekê, di ziman ê bi hêz de ji bo watayekê çend peyv he ne û di gelek biwaran de ziman ê Kurdî weha ye.

Pê:

Ev amraz ê kişanê yê ne dîyar e. Ango ew ji bo tişteki û berkird-eyekî ne dîyar e. Ew ji “bi wî/wê” hatiye û gerinek penhan (ne dîyar) dibîne, anga ew nîşan a tişteki yan berkird-eyekî ne dîyar e. Ew bi taybetî û bêtir bi bernam ên berkird-eyekî “wî, wê” re dihê û bêtir mebest a wî ew in.

Wek çawa amraz ê “dî” di nav hevekê de hevpar an hevkar ên xwe he ne û ew jî “de, re” ne, amraz ê “pê” jî hevpar û hevkar ên xwe he ne û ew “re, ve, de” ne. Her yek ji evan hevpar û hevkar di nav hevekê de watayekê çê dike. Dem a em dibêjin: “ez pê re çûm bajarê” ew ê ku ez pê re çûm bajarê penhan e (ne dîyar e) û destewaje ya “pê re” wata ya “li gel” dide. Dem a em dibêjin: “ji niha û pê ve...” destewaje ya “pê ve” wata ya dirêjayî, hilkişîn û raperrikînê dide. Dem a em dibêjin: “Azad pê de hat û got...” destewaje ya “pê de” wata ya “rêzkirin û çûyîn a bi nav tişteki de” dide.

Amraz ê “pê” yê penhan di ziman ê Kurdî de gelek taybetî ye, ji ber ku bi yek peyvê (pê) wata ya ewê rewş a penhan dihê dayîn. Bi awayekî giştî destewaje ya “pê re” bêtir di ziman ê Kurdî de bi kar dihê, belê “pê ve” û “pê de” jî gerin a xwe dibînin. Ev amraz ê han hevekê diragire û jê re wek terazûyê ye. Belê amraz ê kişanê “pê” bi ten a xwe jî – anga bêyî hevkar ên xwe “re, ve, de” – di hevekê de bi cih dibe wek: “ez pê çûm bazarê” ku ne dîyar e ka ez bi çî çûm bazarê û dîyarbûn a wê ev e: “ez bi otomobîlê çûm bazarê”. Di nimûneyekê de wek: “min pê birinc xwar” ne dîyar e ka min bi çî birinc xwar û mebest a “pê” ew e, ku wek nimûne.. “min bi kevçî birinc xwar”. Ev amraz di wata ya xwe ya wek kişan de, serbixwe dihê nivîsandin û dem a ku bi peyvekê ve bihê girêdan, dibe ji kok a wata ya

ewê peyvê û peyv ên ku ew bi wan ve dihê girêdan, çêkirî yan heyvizandî ne.

Hevpar û hevkar ê evî amrazî yê ku “re” ye, di ziman ê gell de dibe “ra” û “ra” ne hevpar e û ne jî hevkar ê “pê” ye, ji ber evê yekê jî ne rast e ku ew li şûn a “re” be. Ev “ra” bi xwe peyv e û pêşgir e, ku ew wek peyv wata ya bilindbûn û rabûnê dide û wek pêşgir bi destpêk a peyvê ve dihê girêdan û wata ya xwe dide peyvê. Herweha, hevpar û hevkar ê evî amrazî yê ku “de” ye, di ziman ê gell de wek “da” ye û “da” bi xwe jî hem peyv e û wata ya xwe he ye û hem pêşgir e û wata ya xwe dide peyvê û ji ber evê yekê, ew wek “da” ne rast e ku ew li şûn a “de” be.

Amraz ê “pê” bi şaşî dibe “vê” belê ew şaşî ne li hemû deveran he ye. Şaşî ew e, dem a ku wek nimûne peyv ên “pê kevt, pê xist” dibin “vê kevt, vê xist”. Di evî biwarî de tevhevîyek di biwar ê watayê de he ye, ku nahê zanîn ka wata ya evan herdu peyvyan wek hevdu ye yan ne wek hevdu ye. Di nimûneyekê de wek: “min agir vê xist” peyv a “vê xist” a ku kirde ye, di cih ê xwe de ye û bi karhînan a wê rast e, belê di nimûne ya “min agir pê xist” de ew tevhevî û nerastî he ye, ji ber ku ev wata (pê xist) ne ji bo vêxistinê ye. Ji ber ku ev kiryar a han “vêxistin” e û ne “pêxistin” e. Di ziman ê gell de “pêxistin” û “vêxistin” wek yek watayê bi kar dihên û şaşî di vir de ye. Peyv a “vêxistin” wata ya hilkirinê dide, belê peyv a “pêxistin” wata ya kevtin a bi tiştêkî ye. Ango dem a em dibêjin: “ew pê kevt” mebest a me ew e ku ew wek nimûne.. bi nexweşîyekê kevt, an bi xwarinekê kevt û kevtin a bi xwarinê wata jehrîbûn e. Dem a em dibêjin: “ew vê kevt” mebest a me ew e ku çira vê kevt û hil bû yan kehreba vê kevt û hil bû. Peyv a “vê” di ziman ê Kurdî de xwedî gerin û vatinîyek mezin e û gelek watayan dide. Di nimûne ya “min agir pê xist” de, ne dîyar e ka min agir bi çi xistiye, herweha di

nimûne ya “min agir vê xist” de, dîyar e ku min agir hil kiriye.

Ev amraz ê han bi peyv a “pa” re hevdij dibe û “pê” ji bo wata ya “ling” bi kar dihê û ev şaş e. Ling “pa” ye û ne “pê” ye, belê ew a ku jê re çemandin dibêjin çê dibe û “pa” dibe “pê” û ew çemandin di pît a “a” de çê dibe û dibe “ê”. Di vir de ji me re xuya dibe ku ne hemû çemandinek rast e. Bi taybetî jî dem a ku ev çemandin wata ya peyvê biguherîne ne rast e. Ev çemandin a ku hinek caran ne di cihê xwe de ye, dibe engîz a windabûn a wata ya peyvê, yan guherandin a wata ya peyvê. Dem a ku “pê” ji bo wata ya ling bi kar dihê, bi wata ya “pê” re ya ku amraz e hevdij dibe. Pirs ew e: dê çi çê bibe heger her peyvek li angora kok û resenî ya xwe bihê vewêjînkirin, xwîndin û nivîsandin? Bê goman dê hîngê her peyvek di cihê xwe yê rast de be, dê kok û resenî ya peyvan parzîtî bin û dê zimanekî petî ji me re çê bibe.

Ev amraz ê han bi peyvê ve jî dihê girêdan û watayek din çê dike. Di nimûne yê wek: “pêç, pêçan, pêj, pêr, pêş...” de “pê” ji kok a peyvê ye û ne amraz e. Belê di nimûne yê wek: “pêdan, pêşangeh, pêxur, pêzan, pêzanîn, pêkevtin, pêsor...” de, amraz ê “pê” bi peyvê ve hatiye girêdan û jê re bûye wek pêşgir û watayek din daye. Yek ji peyvên giringên ku bi evî amrazî çê bûne peyv a “pêk” e. Peyv a “pêk” ji “bi êk, bi yek” çê bûye û wata ya çêbûn, amêtebûn û hafirandinê dide. Ji evê peyvê bi xwe jî parzad derkevîne û “pêkhatin, pêk ve, pêkhînan, pêkhênar...” hinek ji wan parzadan in. Peyv a “êk” bi xwe “yek” e, belê li angora zarav a Başûrî ya Badînî “êk” e û ji “bi” û “êk, yek” peyv a “pêk” derkevîtiye.

Lê:

Ev amraz ê kişanê yê ne dîyar e. Ango ew ji bo tiştêkî û berkird-eyekî ne dîyar e. Ew ji “li wî/wê” hatiye û gerinek penhan (ne dîyar) dibîne. Ango ew nîşan a tiştêkî yan berkirdyekî ne dîyar e. Ew bi taybetî û bêtir bi bernam ên berkirdê yê “wî, wê” re dihê û bêtir mebest a wî ew in. Wek nimûne: “min bang lê kir da ku bihê nik me” anga bangkirin a min ji bo hatin a wî/wê bûye û ew bang li wî/wê hatiye kirin. Dem a em dibêjin: “me lê nerî û me dît ku ew baş e” dîyar nabe ka ew tişt ê me lê nerî çî ye, herweha dîyar nabe ka ew ê/a ku me lê nerî kî ye. Ev nimûne di pergalê xwe yê dîyar de weha ye: “me li wî/wê; yan me li bêhvan tiştî nerî û me dît ku ew baş e”. Di nimûne ya “min lê xist” de ne dîyar e ka min li kê xist, ku ne wî ye yan jî wê ye, herweha ne dîyar e ka ew tişt û kesê ku min lê xist çî ye û kî ye.

Ev amrazê han bi peyvê ve dihê girêdan û jê re dibe wek pêşgir û watayek din dide wek: “lêzan, lêdan, lêxistin, lêborîn...” û ew jêder in. Di nimûne ya “lêzan” de kok a “zan” a peyv a zanîne li amrazê “lê” yaniz bûye, da ku wata ya zanîn a di bare ya tiştêkî de bide. Di nimûne ya “lêborîn” de peyv a “borîn” li amrazê “lê” yaniz bûye, da ku wata ya derbaskirin a pirsekê yan peyarkirin a rewşekê bide, ku ew wata jî amerzî ye (efûkirin e). Di nimûne yê wek: “lêmişt, lêr, lêj, lêv, lêl...” de jî “lê” ji kok a peyvê ye û ne amraz e. Ango dibe ku “lê” ji kok a peyvê be, çimku di dawî de “lê” birrgehek (kîtek) e û dibe kîtek ji kîte ên peyvê. Dem a ku ew dibe beşekê peyvê û bi destpêk a peyvê ve divebe, wata ya “li ser wî/wê û li ser tiştêkî ji tiştan” dide û ev jî taybetmendîyek a zimanvanî ye.

Amrazê “lê” wek kurtkirin a peyv a “belê” jî bi kar dihê û hinek caran dibe “lê belê” ku gerek peyv a “belê” kurt nebe

û weha wek “lê belê” jî yaniz (zêde) nebe. Em dibînin ku kurtkirin, yanizkirin û levakirin a şaş dibin engîz a (sebeb a) windabûn a wata û resenî ya peyv. Peyv a “belê” ya ku di zarav a başûr de “belam” e, dide xuyakirin ku reh a wê “bel” e û di zarav a bakurî de “ê” lê yaniz bûye û di zarav a başûrî de “am” lê yaniz bûye. Yanizbûn a pît a “ê” li kok a “bel” di zarav a bakurî de rasttir e, ji ber ku pît a “ê” bi kok a “bel” re vatinî ya girêdan a bi beş ên din ên hevekê re dibîne. Yanizbûn a birrgeh a “am” li kok a “bel” di zarav a başûrî de jî heman gerinê dibîne, belê “am” birrgehek a taybetî ya zarav a başûrî ye.

Amraz ê “lê” hinek caran wek nîşan a zehîmanîyê jî bi kar hatiye û bi kar dihê, dem a ku dibêjin: “ma te ev kar kir? Lê.. çawa min nekir!”. Ev bi karhînan a ji bo zehîmanîyê jî di kok a xwe de ne “lê” ye, belê “lêh” e û hatiye kurtkirin. Ango nîşan a zehîmanîyê “lêh” bûye “lê” û bi evê kurtkirinê re, bi amraz ê “lê” re hevdij bûye. Engîzek din jî he ye ku dihêle kurtkirin çê bibe û ew jî giranbûn a levakirin a peyvê ye. Dem a ku peyv a “lêh” dihê gotin, giranîyek a levakirinê he ye. Belê gerek ev engîz ne giring be, ji ber ku rêziman kok û resenîyê diparêze. Ango peyv giran be yan ne giran be, gerek wek xwe bihê levakirin, xwîndin û nivîsandin. Dem a em peyvekê ku li ser ziman giran e sivik dikin, em wê peyvê bê kok û bê resenî dikin.

Ji alîyekî din ve amraz ê “lê” wek bangkirin a ji bo kes a mê bi kar hatiye û bi kar dihê û li beramber “lo” ye ya ku ji bo kes ê nêr bi kar hatiye û bi kar dihê. Belê di rastî ya xwe de, ev “lê” ya ji bo mê bi xwe “lelê” ye û “lo” jî “lelo” ye. Peyv a “lelê” hatiye kurtkirin û bûye “lê” û peyv a “lelo” hatiye kurtkirin û bûye “lo”. Peyv a “lelê” ya ji bo mê nîşan a nazkirin û şadbûnê ye, herwek çawa peyv a “lelo” ji bo nazkirin û şadbûnê ye. Wata ya serekîn a “lelê” jî “sebiyye, girl” e û wata ya serekîn a “lelo” jî

“sebî, boy” ye. Herdu jî “lêlê û lelo” di çax û beng a xwe de ne û nûgihayî ne. Herdu peyv ên “lêlê û lelo” ji bo bangkirin a wan e û ji bo nazkirin û şadbûnê ne. Kurtkirin a peyv a “lêlê” ya ku kirine “lê” hîştîye ku ew bi amraz ê “lê” re hevdij bibe. Kok a herdu peyv ên “lêlê” û “lelo” jî peyv a “lê” e û wata ya peyv a “lêlê” nûgihayî yê nazdar e, ku pît a destnîşankirin a regez ê mê “ê” lê yaniz dibe da ku bibe “lêlê” û ji bo nazandin û bangkirin a mê be, herwek çawa pît a “o” ya destnîşankirin a regez ê nêr lê yaniz dibe da ku bibe “lelo” û ji bo nazandin û bangkirin a nêr be.

Bi taybetî di zarav a başûrî de amraz ê “lê” peyv a “lêk” jê çê dibe û ew ji civîn a “li” û “êk, yek” e. Ango amraz ê kişan ê “li” bi peyv a “êk, yek” re dibe yek û peyv a “lêk” çê dibe. Nimûne yê wek: “lêkdan, lêkçûn, lêkdar (lêkder)...” didin xuyakirin ku peyv a “lêk” a ku ji “li û êk, yek” çê bûye, watayek a din dide peyv a ku pê ve dihê girêdan û jê re dibe wek pêşgir an beşekî peyvê.

Jê:

Ev amraz ê kişanê yê ne dîyar e. Ango ew ji bo tiştêkî û berkird-eyekî ne dîyar e. Ew ji “ji wî/wê” hatiye û gerinek penhan (ne dîyar) dibîne. Ango ew nîşan a tiştêkî yan berkirdyekî ne dîyar e. Ew bi taybetî û bêtir bi bernam ên berkirdê yê “wî, wê” re dihê û bêtir mebest a wî ew in.

Ev amraz ê han du hevpar û hevkar ên wî he ne û ew jî “re” û “ve” ne, belê ew di hevekê de bi ten a xwe jî dihê. Dem a em dibêjin: “min jê re got evî karî neke” anga min ji wî/wê re got û hevpar ê yan hevkar ê “re” bi “jê” re dihê. Dem a em dibêjin: “ew tişt jê ve xuya ye” anga hevpar ê yan hevkar ê “ve” bi “jê” re hatiye û nîşan a nerîn a dûr û kûr e. Destewaje ya “jê re” anga ji bo wî/wê ye û destewaje ya “jê ve” anga ji alî yê wî/wê ve ye.

Hevpar û hevkar ê evî amrazî yê ku “re” ye, di nav gell de wek “ra” dihê gotin û “ra” peyv e û wata ya bilindbûn û rabûnê dide û pêşgir e û wata ya xwe dide peyvê û ji ber evê yekê, ne rast e ku ew “ra” be û li şûn a “re” be. Herweha, hevpar û hevkar ê evî amrazî yê ku “ve” ye, di nav gell de wek “va” dihê gotin û “va” kok a peyv a “divê” ye û ti peywendî ya wî bi amraz ve tine ye û ji ber evê yekê, ne rast e ku ew li şûn a “ve” be. Ango dem a dihê gotin: “ji alî yê min va..” şaşî ye û rastî ya evê hevekê “ji alî yê min ve..” ye.

Amraz ê “jê” di hevekê de bi ten a xwe jî dihê wek: “min jê xwazt ku nameyekê binivîse”. Ev amraz di pergalekî weha de gerin a kişanê û girêdanê dibîne. Ango watayek a taybetî dide. Dem a ku “jê” di evê hevekê de bi kar dihê, ew girêdan çê dibe, ew biyaşbûn jî çê dibe û hevek bêtir bi cih dibe. Belê ev hevek jî hevek a tişt û bernam ê (berkirdê yê) penhan e, ku ew bernam

an berkirde yê penhan “wî” û “wê” ne. Ango dem a em “jê” di hevekê de bi kar dihînin, em rewş a penhan a girêdayî tiştêkî û berkirdeyekî (bernamekî) didin nîşandan û ew bernam ên “wî” û “wê” ne.

Di nimûne yê wek: “jêr, jêlî, ...” de “jê” ji kok a peyvê ye, belê di nimûneyinî wek: “jêder, jêkirin, jêhatî, jêbirin...” de “jê” bi destpêk a peyvê ve hatiye girêdan û jê re bûye wek pêşgir, da ku watayek a din bide. Di nimûne ya “jêkirin” de ya ku ji “ji wî/wê û tiştêkî” hatiye, dihê xuyakirin ku tiştêk ji tiştêkî hatiye dabirrîn. Dem a em dibêjin: “bêhvan kes jêhatî ye” anga tişt, kar û kirde ji wî/wê û bi wî/wê dihên kirin û jê dihê ku bi kar, kirde û tiştan birabe. Ango wata ya peyv a “jêhatî” ew e, ku ji wî/wê dihê kirin.. jê dihê kirin û dikare bi bêhvan karî birabe.

Ev amraz ê han peyv a “jêk” jê çê dibe û bêtir li başûr weha ye. Ew ji “ji êk, yek” hatiye û wata ya tiştêk ji tiştêkî dide. Di nimûneyekê de wek: “ev herdu jêk in” anga ev herdu tişt ji hevdu ne û girêdayî hevdu ne. Dem a em jêderêkê wek “jêkvebûn” bi kar dihînin, wata ya evê jêderê ew e ku du tişt an gelek tişt, ji ber hevdu yan ji ber hev kevtine û nema bi hevdu ve yan bi hev ve ne. Belê di zarav a Kurdmancî de “jev” li beramber “jêk” e û “jev” ji “ji hev” hatiye. Bê goman e jî ku di ziman ê petî de gerek “ji hev” be ne “jev” be. Herweha gerek di ziman ê petî de “jêk” jî “ji êk, ji yek” be.

Bê:

Ev amraz ê kişanê dikeve û kevtiye bin bar ê tevhevîyek nacûr de, dem a ku hem wek amraz û hem wek kirde bi kar dihê. Bê goman e ku dem a em dibêjin: “em bê we bê pişt in” amraz ê “bê” kişan e, belê dem a em dibêjin: “ew dê bê nik we” mebest ji peyv a “bê” kirde ye û ew kirde yê dem a ayinde ye û tevhevî di vir de ye. Tevhevî ew e, ku ev peyv (bê) hem amraz be û hem jî kirde be û amraz ticarî nabe kirde û kirde jî ticarî nabe amraz. Dibêjin ku ev pirs ên weha di nav hevekê de dihên xuyakirin û gerek mirov wan ji ber xwe ve hobar bike, ku ev herdu behane jî ne di cih ê xwe de ne, ji ber ku herdu jî ne zanistî ne. Di zanist a ziman de her beşekî peyvê xwedî yê wata, durv û naverok a xwe ye û tev li hev nabin, an jî gerek tev li hev nebin. Di nimûne ya “ew dê bê nik we” de mebest ji “bê” kirde yê “bihê” yê dem a ayinde ye, ku di ziman de ev kirde hatiye kurtkirin û di levakirin a şaş a bê şîraz de bûye “bê”. Dîsan em bi kurtkirinê, yanizkirinê û bi levakirin a şaş a bê şîraz, resenî ya peyvan wêran dikin.

Ev amraz ê han wek “bêyî” jî dihê gotin, ji ber ku “yî” ya ku lê yaniz (zêde) dibe vatinî ya (wezîfe ya) girêdanê û gihanînê dibîne. Belê di bingeh a xwe de ev amraz “bê” ye. Dem a ku di nav hevekê de “bêyî” dihê gotin, ji bo ewê yekê ye da ku “bê” bêtir bi hevekê ve girêdayî be û di cih ê tekezîyê (te`kîdê) de be. Dem a em dibêjin: “em bê te naçin bajêr” hevek di cih ê xwe de ye û ti şaşî tine ye, belê dem a em dibêjin: “em bêyî te naçin bajêr” em bêtir girêdanekê di navber a “bê” û beş ên din ên hevekê de çê dikin. Bi evê girêdanê jî amraz ê “bê” bi awayekî gurah (kamil, tamam) vatinî ya kişanê dibîne, ku di nav hevekê de gerin a kişanê biyaş dike.

Tişt ê ku di evê pirsê de dihê xwaztin ew e, ku amraz ê kişanê

“bê” di peyvîn û nivîsandinê de wek xwe “bê” be û kirde “bihê” be û kirde yê “bihê” kirde yê dem a ayinde ye. Ango gerek em bibêjin: “ez dê bihêm, tu dê bihê, ew dê bihê, em dê bihên, hûn dê bihên, ewan dê bihên”. Heger em weha bibêjin: “ez dê bê, tu dê bê, ew dê bê, em dê bê, hûn dê bê, ewan dê bê” em amraz ê kîşanê “bê” û kirde yê dem a ayinde “bihê” tev li hev dikin û ev yek, di ziman ê gell de çê dibe. Ev heyvêz a weha: “ez dê bê, tu dê bê, ew dê bê, em dê bê, hûn dê bê, ewan dê bê” di rêziman de şaş e. Ji bilî evê yekê, şaşî di wir de ye ku amraz ê “bê” û kirde yê dem a ayinde “bihê” tev li hev dibin, şaşî di wir jî de ye ku kirde yê dem a ayinde “bihê” wata ya xwe ya resen winda dike.

Ev amraz di ziman ê gell de bi watayek a din a kurtkirî dihê gotin, dem a dibêjin: “ka bê wê were cem me ya na!” ku ev hevek di petîbûn a xwe de weha ye: “ka bibêje dê bihê nik me yan na!”.. ango ew “bê” ya ku di vir de hatiye kurtkirin “bê” ya peyv a “bêje” yan a rasttir “bibêje” ye. Di ziman ê gell de û di hevek a “jêr bê bera bê cem me” de ev tevhevî baş xuya ye, ku ev hevek di petîbûn a xwe de weha ye: “jê re bibêje bila bihê nik me” ku “bê” ya yekem kurtkirî ya peyv a “bibêje, bêje” ye û “bê” ya duyem kurtkirî ya peyv a “bihê” ye.

Ev amraz jî gerek serbixwe bihê nivîsandin û şaş e dem a ku bi peyvê ve be. Di nimûneyekê de wek “bê deng” de dem a ku dixwazin wata ya jêder jê çê bikin, evî amrazî bi peyvê ve girê didin û dikin “bêdengî”. Ev heyvêz a weha jî ne di cih ê xwe de ye û wata ya bê dengîyê “mengî” ye. Heger “mengî” jî ne li angora dilan be, gerek ev heyvêz wek “bê dengî” bihê nivîsandin.

Ji xwe di nimûne ya “bê alî” de sosretek mezin di bare ya ziman de çê dikin, dem a ku evê heyvêzê wek “bêalî” dinivîsin. Di evê heyvêzê de (bêalî) şîraz a (sîstem a) fonetîk a Kurdî dihê

kilêskirin (xerabkirin) ji ber ku du pît ên dengdar di ziman ê Kurdî de nahên ber hevdu û bi hevdu re nahên levakirin û nivîsandin. Wek evê heyvêzê, heyvêz a rojava jî li nik hinekan bûye “roava” û di evê heyvêzê jî de sosretek mezin he ye, ji ber ku di fonetîk a Kurdî de du pît ên dengdar nahên ber hevdu û bi hevdu re nahên levakirin û nivîsandin.

Ev heyvêz ên weha yên ku ne li angora zimanvanî ya Kurdî ne, di bin sirêma (bandor a) ziman ên biyanî de derbasî nav ziman ê Kurdî dibin. Heger weha jî bixayêne (berdewam bike) dê ziman ê Kurdî ji ziman ê Turkî bi gelekî kilêstir bibe. Xuyanî ye ku ziman ê Turkî – û wek ku Turk bi xwe dibêjin – kevtiye bin sirêma a çendîn ziman ên biyanî de û ev sirêma di evî zimanî de baş xuyanî ye. Em jî naxwazin û gerek em nexwazin, ku ziman ê me jî weha bikeve bin sirêma a ziman ên din ên biyanî de û taybetmendî yên we ji dest bide.

Di:

Ev amraz ê kişanê xwedî gerinek giring e û di pirranî ya dekin ên (tekist ên) babetekî de he ye. Ew di hevekê de xwedî hevpar û hevkar e û ew jî “de” û “re” ne. Ango dem a ku “di” dihê gotin, an “de” yan “re” di hevekê de dibin hevpar û hevkar ên wî. Bê evan hevpar û hevkarên jî “di” wek terazû ya leng e, ango wek terazû ya yekalî ye.

Dem a em dibêjin: “xwîndevan di dibistanê de ne” amraz ê “di” bêyî hevpar û hevkar ê xwe “de” nabe. Dem a ku “di” bi hevpar û hevkar ê xwe “de” re be, wata ya di nav de dide û wata ya rawestanê û bê liv dide, ango dem a ez di nav tiştê de bim û di nav de rawestayî û bê liv bim, amraz ê “di” hevpar û hevkar ê xwe “de” distîne. Di nimûne ya “ez di malê de me” de, dihê xuyakirin ku ez di hinder (hundur) de me û rûniştî yan rawestayî me, ango ez bê liv im. Taybetmendî ya “di ... de” ew e ku tiştê bê liv di nav tiştê de ye, yan tiştê di rewşê rawestayî de, di nav tiştê de ye. Vajîyî (eksî) “di ... de” amraz ê “di” bi hevpar û hevkar ê xwe “re” re (di ... re) di rewşê bi bizav (bi hereket) de ye. Dem a em dibêjin: “ez di nav bajêr re derbas bûm” ango ez bi liv derbas bûm (di nav bajêr re derbas bûm). Amraz ê “di” bi hevpar û hevkar ê xwe “re” re, rewş a bi liv û bi bizav dide xuyakirin.

Hevpar û hevkar ê “de” di pirranî ya dever ên Kurdan de wek “da” dihê gotin û goman tê de nîne, ku ew “da” bi xwe “de” ye û ji bo qebekirinê bûye “da” yan jî di bin sirêma (bandora) zimanê Turkî de bûye “da”. Çimku “da” di ziman de ne tenê amraz e, ew bi xwe kirde jî ye (peyv e) û kirde yê dem a mêjîn a nêzîk e. Ji ber evê yekê nabe ew li şûna “de” be. Dem a em dibêjin: “min agahdarî da we” em peyv a “da” wek kirde bi

kar dihînin û bi xwe jî kirde ye. Ne tenê weha; li başûr peyv a “da” – ya ku gerek hevpar û hevkar ê amraz ê kişanê “di” be û “de” be – bi peyvê ve (bi nam ve) girê didin. Weha jî ew wek ziman ê Turkî lê dikin. Dem a ku Turk dibêjin “di dibistanê de” dibêjin: “okulda” ango ewê “da” ya ku di ziman ê Kurdî de “de” ye û hevpar û hevkar ê “di” ye, bi peyvê ve girê didin. Dem a ku Turk dibêjin “di baxçe de” dibêjin: “bahçede” û ewê “de” ya ku di ziman ê Turkî de beramber “di” ya Kurdî ye, bi peyvê ve girê didin. Li başûr jî evî hevpar û hevkar ê “de” wek “da” bi peyvê ve (bi nam ve) girê didin û wek nimûne dibêjin: “le Kurdistan-da” û gerek ne weha be, gerek bi kêmanî “le Kurdistan da” be. Herweha, di ziman ê gell de hevpar û hevkar “re” jî dibe “ra” û “ra” peyv e û xwedî wata ye û pêşgir e û wata ya xwe dide peyvê û ji ber evê yekê, nabe ew li şûn a “re” be.

Ev amraz ê han (di) û hevpar û hevkar ên xwe, di hevekê de serbixwe dihên nivîsandin. Li angora taybetmenî ya ziman ê Kurdî ew serbixwe ne. Ango çê nabe em “di” ya wek amraz ê kişanê bi peyvê ve girê bidin û çê nabe em hevpar û hevkar ên wî “de” û “re” jî bi peyvê ve girê bidin.

Amraz ê “di” bêtir girêdayî lîn (zerf, adverb) e û ew an lîncihî ye û yan jî lîndemî ye. Ango yan ew girêdayî cih e û yan jî girêdayî demê ye. Dem a em dibêjin: “ev mêr herdem di malê de ye” amraz ê “di” girêdayî lîncih e, ango bi lîn ê cih ve girêdayî ye. Dem a em dibêjin: “di zivistanê de befr û baran dibarin” amraz ê “di” girêdayî lîndem e, ango bi lîn ê demê ve girêdayî ye. Belê ev rewş bi xwe nabe binçîn (nabe qayide) ji ber ku amraz ê “di” di hemû biwar ên peyivîn û nivîsandinê de he ye.

Dem a di ziman ê gell de hevek a “de ka em biçin bazarê” dihê gotin, peyv a “de” ya ku di evê hevekê de he ye, bi hevpar û hevkar ê amraz ê kişanê “di” re – ku ew jî “de” ye – hevdij

dibe, ku herdu jî dibin “de”. Belê di rastî ya xwe de ev “de” ya ku di evê hevekê de he ye, bi xwe “dey” ye û ne “de” ye. Ango ev hevek “dey ka em biçin bazarê” ye. Rastî ya peyv a “dey” hîne di zarav a başûrî de maye û bi kar dihê, belê di zarav a Kurdmancî de hatiye kurtkirin û bûye “de” û weha bi hevpar û hevkar ê “di” re – ku ew jî “de” ye – hevdij bûye.

Ji:

Ev amraz ê kişanê di hevekê de xwedî hevpar û hevkar e û ew jî “re” û “ve” ne. Hevpar û hevkar ê “re” bi wata ya “ji bo, ji bona” ye û hevpar û hevkar ê “ve” bi wata ya “ji alî yê ... ve” ye û “dûrayî” ye. Di nimûneyekê de wek: “min ji te re perrtûkek hîna” ango ev perrtûk ji bo te ye, ku “ji ... re” wata ya “ji bo, ji bona” dide. Di nimûneyekê de wek: “ew dar a han ji min ve xuya ye” ango ew dar ji alî yê min ve û li ser dûrayî ya xwe, dihê xuyakirin û dîtin (ez wê dibînim). Dem a em dipirsin: “ji kengî ve tu li wir î?” ango em dibêjin: “ji bo çiqas demê, tu li wir î?” ku em pirs a dem a mayîn a te ya li wir dikin. Ev amraz ê han bêyî hevpar û hevkar ên xwe “re, ve” gerin a xwe ji dest dide.

Ev amraz ê han di hevekê de bi ten a xwe jî dihê wek: “ez ji baxçe çûm nav bajêr”.. “tu ji kuda dihêyî?”.. “em ji polê derkevtin”.. “hûn ji vir hat in veguhaztin”. Ev amraz gelek gerinan dibîne, ku ew ji bo hilbijartinê ye wek: “ji evana yekê bihilgire” herweha ji bo engîzê ye wek: “serkevtin ji têkoşînê çê dibe” û vebirrin e wek: “min baş ji ne baş nas kir”. Ev gerin ên han nabin binçîn (qayide) belê ew tenê gerin ên evî amrazî ne û wek nîşe (têbînî) dihên nîşandan.

Di evê dekinê (tekistê) de bi karhînan a “ji, ji ... re, ji ... ve” dihê xuyakirin: “Ez ji gund derkevtim û min ber ê xwe da bajêr. Ji min re hatibû gotin ku ez hinek tiştan ji malê re bikirrim. Yek ji ewan tiştan kevalekî surîştê bû. Ew keval li navîn a bajêr ji min ve xuya bû û ew li ber derî yê perrtûkxaneyekê bû, ji ber ku perrtûkxane kevalan jî difiroşin.”

Ev amraz ê han di hevekê de serbixwe dihê nivîsandin. Ango şaş e ku ew bi peyvê ve bihê girêdan. Di hinek dekin ên evê serdem a me ya dawî de, amraz ê “ji” – û herweha amrazinî

din ên kişanê yê wêk “li” û “bi” – bi peyvê ve girê didin wêk: “jiber, jibo, liser, biser de...” ku ev heyvêz ên han şaş in. Rastî ya evan heyvêzan weha ye: “ji ber, ji bo, li ser, bi ser de...” ku tê de amraz ên kişanê û hevpar û hevkar ên xwe, serbixwe dihên nivîsandin.

Hevpar û hevkar ê amraz ê “ji” ku “re” ye, di ziman ê gell de wêk “ra” dihê gotin û “ra” ne hevpar an hevkar ê amraz e û ji ber evê yekê, nabe ew li şûn a “re” be. Ew (ra) peyv e û wata ya bilindbûn û rabûnê dide û pêşgir e û wata ya xwe dide peyvê. Herweha, hevpar û hevkar ê amraz ê “ji” yê ku “ve” ye, di ziman ê gell de wêk “va” dihê gotin û “va” jî kok a peyv a “divê” ye û ew ne amraz e û ne jî hevpar an hevkar ê amraz e û ji ber evê yekê, nabe ew li şûn a “ve” be.

Di heyvêz ên wêk “ji ber” û “ji bo” de amraz ê kişanê “ji” bi evan peyv an re wata ya xwe guraş dîke. Wêk nimûne: “ez ji malê çûm bazarê ji ber ku hinek tişt pêdivî bûn” ango heyvêz a “ji ber” engîzê (sebebê) dide nîşandan. Di nimûneyekê de wêk: “ez ji ber te li vir mam” engîz a mayîn a min a li vir dide nîşandan û ew engîz jî bi te ve girêdayî ye. Nimûneyek wêk: “min ev perrtûk ji bo te kirriye” dide nîşandan ku ew perrtûk ji bo te û da ku bibe arzû yê te, hatiye kirrîn. Ev taybetmendî ya rêzimanî berfirehî ya ziman dide nîşandan. Gerek demek bihê û tê de ev taybetmendî yê wêha bi berfirehî jî bihên şirovekirin. Şirovekirin a herî baş û zanistî jî, şirovekirin a berawirdî ya navber a ziman ê gell û ziman ê petî yê bi rêziman e.

Bi:

Amraz ê kişanê “bi” xwedî yê sê hevpar û hevkaran e û ew jî “re, ve, de” ne. Heryek ji wan watayekê dide, ku “bi ... re” wata ya “li gel, pê re” dide û “bi ... ve” wata ya girêdan û peywendîyê dide û “bi ... de” wata ya “li ser, piştî” dide. Ango dem a em dibêjin: “ez bi te re me”.. “ew bi we re hat”.. “hûn bi wan re çûn”... dihê xuyakirin ku “bi ... re” wata ya “li gel, pê re” dide. Dem a em dibêjin: “ew bi te ve hat in”.. “ev sêv bi darê ve ye”.. “ev pirs bi we ve girêdayî ye”... dihê xuyakirin ku “bi ... ve” wata ya peywendî û girêdan a navber a alîyan û tiştan dide dîyarkirin. Dem a em dibêjin: “havîn bi duv biharê de dihê”.. “ev ne bes bû ew jî bi ser de hat”... dihê xuyakirin ku “bi ... de” wata ya “li ser, piştî” dide.

Hevpar û hevkar ê yekem “re” di ziman ê gell de wek “ra” dihê gotin û “ra” peyv û pêşgir e. Peyv a “ra” wata ya bilindbûn û rabûnê dide û wek pêşgir wata ya xwe dide peyvê. Ango ne rast e ku “re” wek “ra” bihê gotin, ji ber ku dem a “ra” dihê gotin mebest peyv û pêşgir e û mebest ne bi karhînan a hevpar û hevkar “re” ye. Herweha, hevpar û hevkar “ve” jî di ziman ê gell de wek “va” dihê gotin û ew jî ne rast e, ji ber ku “va” peyv e û ew kok a peyv a “divê” ye.

Amraz ê kişanê “bi” di hevekê de bi ten a xwe jî dihê wek: “em bi otomobîlê çûn bajêr”.. “ez bi xameyê (qelemê) dinivîsim”.. “tu daran bi birrekê dibirî”. Di evan nimûne yên weha jî de, amraz ê “bi” wata ya alavendê (wasîteyê) dide, ku ew dibe alav ê bi karhînan a beşekî nav hevekê.

Ev amraz dihê kurtkirin û ji “bi hev” dibe “pev”. Bê goman jî “pev” peyvek din û heyvêzek din e. Ev heyvêz a han jî di bin bar ê kurtkirin û sivikkirinê de çê bûye, ku ew di ziman ê petî de ne

pêwîst e. Ew di ziman ê petî de ne pêwîst e ji ber ku ew heyvêz a “bi hev” a ku beş ên wê dîyar in û di cih ên xwe de ne, ji cih ên xwe diderxîne û peyvek din çê dike û beş ên serekîn ên evê heyvêzê winda dike. Di peyv a “pev” de amraz ê kişanê “bi” hatiye kujtin û peyv a “hev” jî hatiye pûçkirin, ji ber ku tenê “ev” jê maye. Wek nimûne.. di rêziman û ziman ê petî de destewaje ya “bi hev kevtin” nabe “pev ketin” ji ber ku di rêziman û ziman ê petî de resenî dihê paraztin. Wek çawa ku resenî di biwar ê civakî de pêwîst e, ew di biwar ê ziman jî de pêwîst e. Ji ber ku wek çawa dem a resenî di biwar ê civakî de nebe, bingeh ne dîyar in û têk diçin, weha jî dem a resenî di biwar ê ziman de nebe, bingeh ne dîyar in û têk diçin.

Amraz ê gihanekê “ku”

Peywendî ya gihanîn û girêdanê ya navber a beş ên peyvê ya ku di hevekê de çê dibe, li ser mil ê amraz ê gihanekê ye. Amraz ê gihanekê xelex a gihandin a bi hev ve ye û wata ya peyivînê gurah (temam) dike. Amraz ê gihanekê gerin a (rol a) gihandin a bi hev ve ya beş ên peyvê di nav hevekê de dibîne. Ev pirsek naskirî ye, belê ya ku em dixwazin di evî biwarî de li ser amraz ê gihanekê “ku” bibêjin, girêdayî rastî ya vewêjînkirin, nivîsandin û levakirin a şîrazkirî ya evî amrazî ye. Ji ber ku ev amraz ê han bi gelek awa û şêwazan hatiye û dihê vewêjînkirin, nivîsandin û levakirin. Li angora dever ên Kurdan jî hatiye parkirin, ku hinek dever evî amrazî wek “ko” leva dikin, hinek wek “gi” hinek wek “ke” hinek wek “go” hinek wek “kû” û tenanet hinek wek “kî” jî leva dikin. Bê goman jî ye, ku tenê yek awa û şêwaz rast e û li angora rêziman dikeve ast a amraz ê gihanekê de û ew jî “ku” ye.

Ev amraz li dever a Botan “ko” ye û heger em li resenî ya wî binerin, em dê bibînin ku ew bi xwe “ku” ye û bi qebekirinê bûye “ko”. Dem a ew bûye “ko” jî, ew bûye peyv. Wata ya peyv a “ko” ango “ne tûj e”. Em dibêjin: “ev kêrd (kêr) ko ye”.. “şûr ê te ko ye û nabirre”.. “tevşo yê perçîn a daran ko bûye û nema daran diperçîne (diqetîne)”. Ango “ko” peyv e û ne amraz e û şûn a amraz ê gihanekê nagire. Awa yê “go” jî her sivikkirin a “ko” ye, ango ew ên ku evî amrazî dikin “go” ew “ko” bi xwe sivik dikin û “go” jî peyv e. Peyv a “go” kok a peyv a gotinê ye û ev peyv a ku kirde ye, pirsek a wê ya aloz di ziman ê Kurdî de he ye. Alozi di wir de ye dem a em wê di dem ên amad, mêjîn, ayinde û xizavê de kêsan dikin. Jêder a evê peyvê “gotin” e û di dem a amad de dibe “ez dibêjim, di dem a mêjîn de dibe

“min got” di dem a ayinde de dibe “ez dê bibêjim” û di dem a xizavê de dibe “bibêje, bibêjin” û alozî jî ev e. Alozî ew e ku ew di kêsanê de dibe peyvek din. Ango ev peyv ne akincî ye, ji ber ku bi jêder a xwe ve ne girêdayî ye û bi kok a xwe ve ne girêdayî ye. Ev peyv tenê di dem a mêjîn de girêdayî jêder û kok a xwe ye û di dem a amad, ayinde û xizavê de, peyvek din e û girêdayî kokek din e, ku ew kok jî “bêj” e ne “go” e. Heger em bixwazin ev peyv (go) bi jêder a xwe “gotin” ve girêdayî be, em dê heyvêzekê pêşkêş bikin, ku ew heyvêz di ziman ê Kurdî de nahê gotin, belê di dem ên dîrokî yên berê yên kevn de hatiye gotin. Ew heyvêz jî ev e: di dem a amad de “ez digoyim” di dem a mêjîn de “min got” di dem a ayinde de “ez dê bigoyim” û di dem a xizavê de “bigoye, bigoyin”. Herwek çawa kok a “bêj” dê weha be: di dem a amad de “ez dibêjim” di dem a mêjîn de “min bêja, min bêjt” di dem a ayinde de “ez dê bibêjim” û di dem a xizavê de “bibêje, bibêjin”. Weha “go” bi “gotinê” ve girêdayî ye û “bêj” bi “bêjtinê” ve girêdayî ye.

Awa yê “gi” bi xwe jî ji “go” ye û ji sivikkirin a “go” hatiye. Belê dem a ew bûye “gi” ew bê wata bûye, ji ber ku “gi” nikare bibe amraz ê gihanekê û di çarçêweyekî gelek teng de dihê gotin. Ev amraz di awa yê “gi” de ewqas hatiye sivikkirin ku êdî bê wata bûye. Ew ên ku di nav Kurdan de evî amrazî wek “gi” dibêjin jî, gelek kê m in.

Ev amraz ê han li başûr wek “ke” dihê gotin û nêzîkbûn a “ke” û “ku” li hevdu he ye. Ji ber ku wek çawa merc ê amrazbûnê di “ku” de he ye, ew merc di “ke” jî de he ye. Ew merc jî ew e, ku ne “ke” peyvek dine herwek ne “ku” jî peyvek dine. Ew tenê amraz ên gihanekê ne. Herwek çawa ku ne “ke” kurtkirin û sivikkirin e û ne jî “ku” kurtkirin û sivikkirin e. Ev herdu awa jî (ku û ke) di ziman ê Kurdî de resen in, ji ber ku gelek kevn in.

Awa yê “kû” yê evî amrazî bi yekcarî qebekirinek mezin e. Ango ew ên ku di destpêkê de gotine “kû” dil ê wan bi “ku” ya sivik hêsayî nebûye û ew kirine “kû”. Belê “kû” jî di zimanê Kurdî de peyv e û wata ya wê li angora Ferheng a Xal a şêx Muhemmed ê Xal weha ye: Kû li asîman komek a stêr ên nammadar e û “ko” jî jê re dibêjin, belê “ko” wata ya komê dide.. Kû: çawa.. Kû: kolan a teng e û jê re Kûcî jî dibêjin.. Kû: corekî kevokan e û Kûkû jî jê re dibêjin. Weha jî “kû” peyv e û ne amraz e.

Vexwendin çi ye ?

Peyv a “vexwendin” bi awayekî şaş û ne rast ji bo wata ya “de`we, invitation” bi kar dihînin û ev jî di evê serdem a me ya dawî de weha bûye. Ew ên ku peyv a vexwendinê (û ya rasttir vexwîndinê) ji bo wata ya de`weyê bi kar dihînin, pişt a xwe bi destewajeyek a gellêrî ve girê didin û ew destewaje “xwîndin a meydanê” ye. Dem a ku yek ji yekî din re dibêje: “ez meydanê dixwînim” wata “ez te de`wetî meydanê dikim” û ev wata ya han li angora rîziman û ferheng a ziman, ne li beramber “de`weyê” ye û ne wata ya “de`weyê” ye. Wata ya “ez meydanê dixwînim” ango “ez li meydanê amade me, ez di meydanê de me” û darijtinek anahîkar e (mecazî ye). Peyv a “dixwînim” a di evê hevekê de jî, her xwîndin bi xwe ye û ne tiştêkî din e. Êdî dem a ku “xwîndin” ew peyv be ya ku em wê nas dikin û pêşgir a “ve” ya naskirî jî pê ve hatibe girêdan da ku bibe “vexwîndin” çi peywendî ya wê bi wata ya “de`weyê, invitation” ve he ye ?! Peyv a “vexwîndin” ango dîsan xwîndin e, ango xwîndinek a wîrd (deqîq) û fireh e. Naskirî ye ku “xwîndin” çi ye û naskirî jî ye ku pêşgir a “ve” çi gerinê (rolê) bi peyvê re dibîne. Êdî çima peyv a “vexwîndin, vexwendin” bûye xwedî ya wata ya “de`weyê, invitation” ev pirsek rewya ye û gerek bihê kirin.

Heger em bibêjin ku wata ya watayîn a peyv a xwîndinê ne tenê girêdayî kiryar a xwîndinê bi xwe jî ye, hîngê em xwe dûrî wata ya rîzimanî û ferhengî dikin. Ji ber ku xwîndin di wata ya rîzimanî û ferhengî de dîyar e û ew jî xwîndin a perrtûkê, tiştê wek perrtûkê û xwîndin a pirsekê ye. Heger em bibêjin ku wata ya watayîn a xwîndinê ne xwîndin a perrtûkê tenê ye, dîsan jî xwîndin wata ya “de`weyê” nade, ji ber ku hemû cor ên wata yê wata yê wata yê xwîndinê, ji yek jêderê diderkevin û ew

jêder her “xwîndin” e. Xwîndin bi ti awayî ne girêdayî kiryar a “de`weyê” û “de`wetnameyê” ye.

Bingeh a evê watayê (de`we) di ziman ê Kurdî de peyv a “doz” e. Hemû parzad (iştîqaq, derivation) ên ziman, ên ku girêdayî evê watayê jî ne, ji evê peyvê diderkevin. Dem a ku di ziman ê Kurdî de hevek a pirsînî ya “tu doz a çi li me dikî ?” dihê gotin, cih û wata ya peyv a “doz” xuyanî ye. Peyv a “doz” di evê hevekê de “de`we” ye, ango hevek dibêje: “tu de`we ya çi li me dikî ?” ango “tu çi ji me dixwazî ?”. Dem a em dibêjin: “doz a Kurd rewa ye” em didin xuyakirin ku de`we û daxwaz a Kurd rewa ye. Dem a ku ev peyv bibe “dozî” dê wata ya de`weyê bi awa yê xwe yê tekezkirî bide û dê “dozîwer” û “dozîvan” wata ya dozdar ê giştî yê dadgehê bidin, herwek dê wata ya kes ê/a ku doz û daxwazê dike jî bide, dê “dozîber” ew be yê/ya ku doz lê hatiye rakirin, herwek dê “dozîname” wata ya “de`wetnameyê” bide. Ango peyv a “dozîname” li beramber de`wetnameyê ye û peyv a “vexwendin, vexwîndin” ne li beramber de`wetnameyê ye. Peyv ên “dozwerî” û “dozvanî” jî dê ji bo wata ya pirs ên daxwazkirî bin, ango dê ji bo ewan pirsan bin ew ên ku dibin engîz ên peydabûn û diristbûn a kar û kiryanan, ango dê bi wata ya “da`î, indication” bin. Bi evî awayî hemû parzad ên zimanvanî yên evê watayê ji peyv a “doz” diderkevin û pêwîst nake em jê re peyvek nû ji nik xwe ve çê bikin, an peyvekê nacûr bikin, ji ber ku “doz” kok û resenî ya wata ya “de`weyê” ye. Dem a ku kok a peyvekê li nik me he be, hemû wata yên pê ve girêdayî jî, jê dihên der.

Ji alîyekî din ve peyv a “doz” û parzad ên xwe yên ku evan wata yên jorîn didin, bi peyv a “doziran, dozînewe” re ya ku li başûr dihê gotin hevdij dibe, ji ber ku peyv a “doziran, dozînewe” bi kok a “doz” ve girê didin û şaşî di vir de ye. Şaşî ew e dem a

ku kok a peyv a “doziran, dozînewe” bi “doz” ve bihê girêdan û ew pê ve ne girêdayî ye. Ji ber ku kok a evê peyvê (doziran, dozînewe) ne peyv a “doz” e, belê peyv a “dî” ye, ji ber ku ev peyv ji “dî” û “ziran” pêk hatiye û dîziran e û ne doziran e. Wata ya peyv a “doziran, dozînewe” li angora çend ferheng ên başûrî yên wek ferheng a HenbaneBorîne ya Hejar Mukiryani, ferheng a Mehabad a Gîwî Mukiryani û ferheng a Xal a şêx Muhemmed ê Xal; vedîtin e, lêkolîn e, peydakirin e û keşfîkirin e. Belê kok a evê peyvê (doziran) dîtî e, ji ber ku ev peyv di resenî ya xwe de “dîziran” û “dîzînewe” ye û ev pirs di wata yê evê peyvê de xuyanî ye. Weha jî dihê naskirin ku ev peyv bi xwe “dîziran, dîzînewe” ye û ji ber giraniya levakirinê yan ji ber levakirin a bê şîraz, bûye “doziran, dozînewe”. Belê ew “dîziran” e, ji ber ku di zimanê gellêrî yê Kurdî de pît a “î” û “o” bi hev dihên guherandin û cihê hevdu digirin. Weha ji me re dihê xuyakirin ku peyv a “doziran, dozînewe” bi xwe “dîziran, dîzînewe” ye û weha ew dûrî kok a “doz” e.

Ji bilî evê çendê, peyv a “dozîn, doziran, dozînewe” ya ku ji “dîzîn, dîziran, dîzînewe” hatiye û kok a wê “dî” ye, ne nêzîkî peyv a “doz” e ji ber ku peyv a “doz” peyvek serrast e û nahê parçekirin, belê peyv a “doziran” ji beşê “do” yê ku “dî” ye û beşê “ziran” pêkhatî ye, ku “ziran” bi xwe – li angora ferheng a Xal – wata ya belavbûnê û dengdanê dide, ango wata ya resenî a peyv a “dîziran, doziran” dîtî û belavbûn e. Ev wata ya dawî ya peyv a “dîziran” a ku dîtî û belavbûn e, hevbendî wata ya dîtî û keşfîkirinê ye, ango wata ya peyv a “dîziran” dîtî û keşf e. Weha ji me re xuya dibe ka çiqasî peyv a “doziran, dozînewe” şaş hatiye levakirin û bi karhînan.

Belê kêsan a evê peyv a han (dîziran) di diyalekt a Kurdmancî de, ne wek kêsan a wê ya di diyalekt a başûrî de ye. Kêsan a

evê peyvê di diyalekt a başûrî de dihê kurtkirin, ango ji peyv a “doziran” tenê “doz” dimîne û weha ew bi kok a “doz” re hevdij dibe. Me da xuyakirin jî ku kok a peyv a “dîziran” birrgeh û wata ya “dî” ye û “ziran” beş ê duyem ê peyv a “dîziran” e, ango kok a peyv a “dîziran” ne “doz” e, belê “dî” ye û “dî” jî bingeh a wata ya keşîfkirinê ye. Li angora diyalekt a başûrî di dem a amad de “dedozim” e, di dem a mêjîn de “dozîm” e û di dem a ayinde de “dedozmewe” ye. Li angora diyalekt a Kurdmancî jî, di dem a amad de “ez didîzirim” e, di dem a mêjîn de “min dîzirand” e, di dem a ayinde de “ez dê bidîzirim” e û di dem a xizavê de dide “bidîzire, bidîzirin” e. Ango ev peyv di diyalekt a Kurdmancî de resenî ya xwe diparêze û ew resenî di kok a “dîzir, dîziran” de ye, ku “dîzir, dîziran” bi xwe wata ya dîtin û belavbûnê dide, ango keşîfkirin e (discovery ye). Bi evî awayî peyv a “doziran” ji bo wata ya keşîfkirinê şaş e û rastî ya wê “dîziran” e û peyv a “dîziran” weha bi peyv a “doz” re hevdij nabe û wek wata jî dûrî wê ye.

Weha me nas kir, ku peyv a “vexwendin, vexwîndin” ji bo wata ya “de`weyê, de`wetnameyê” nabe, ji ber ku “vexwendin, vexwîndin” bi xwîndinê ve girêdayî ye. Belê “dozî, dozîname” wata ya de`weyê û de`wetnameyê dide, ji ber ku bi peyv û wata ya “doz” ve girêdayî ye. Di hevekê de jî dibe “min wan dozîyî kombûnê kir, min wan dozîvanî kombûnê kir” ango “min wan de`wetî kombûnê kir”.. “me dozînameyek ji wan re şand” ango “me de`wetnameyek ji wan re şand”.. “ew dozîvanîyê dike ku ew serkevtî bûye” ango “ew iddi`ayê dike ku ew serkevtî bûye”. Hemû parzad ên evê peyv û watayê yên ku wata yên “de`we, invitation” jî didin, ji kok û peyv a “doz” diderkevin.

Bîrdoz çi watayê dide ?

Ev peyv a nû ya ku hîrane nav ziman ê Kurdî, wata ya teyorîyê danê. Mebest a ewan ên ku peyv a “bîrdoz” çê kirine, wata ya teyorîyê ye û ev peyv bi ti awayî ne girêdayî wata ya teyorîyê ye. Ev peyv a han (bîrdoz) ji du beşan pêkhatî ye, ku beş ê yekem “bîr” e û beş ê duyem “doz” e û herdu beş, çi her yek ji wan bi ser ê xwe be yan herdu beş bi hevdu re bin, naverok a wata ya teyorîyê nadin.

Me dabû xuyakirin jî ku ji bo çêkirin a peyvekê, em pêwîstî kokek nêzîkî wata ya daxwazkirî ne. Ne peyv a “bîr” ewqas nêzîkî wata ya teyorîyê ye û ne peyv a “doz” nêzîkî evê watayê ye. Heger em teyorîyê bi “bîr” ve girê bidin ne bes e, ji ber ku ne tenê teyorî pêwîstî bîrê û bîrkinê ye û ne tenê teyorî ji bîrê diderkeve û bîr bi xwe jî, ne tenê girêdayî wata ya teyorîyê ye. Teyorî ji hizrê diderkeve û ev rast e, belê teyorî hizrek rêxistî ye û hizir mak a hemû kiryar û watayan e. Ji xwe beş ê duyem (doz) bi ti awayî nikare wata ya teyorîyê çê bike, ji ber ku wata ya peyv a “doz” de`we, daxwaz û pirs e. Peyv a “bîr” bi xwe jî ne tenê girêdayî hizr û ramanê ye, belê ew di ziman ê Kurdî de bêtir wata ya bîrhatinê dide. Em dibêjin “hat bîr a min”.. “ew li bîr a min e”.. “ji bîr a min çû”.. ango wata ya peyv a “bîr” a bingeîn bîrhatin e û ne hizr û raman e û teyorî ji hizr û ramanê dihê û diderkeve. Ew ên ku peyvek wek “bîrmend” jî danîne û wata ya “hizirvan” danê, ne bi awayekî wird (deqîq) hizir kirine, ji ber ku “bîr” ne bi guraî (temamî) hizr û raman e. Ji ber evê yekê jî, hevekek wek “min tê de bîr kir” şaş e û rastî ya wê “min tê de hizir kir” e. Di ziman ê Kurdî de peyv a “bîr” bi bîrdankê ve girêdayî ye û bîrdank zakîre û memorî ye. Bîrdank jî di nav mejî yê mirov de cih ê bîrhînanê, bîrhatinê û henbarkirin a zan-

yarîyan e, herwek çawa di komputerê de weha ye.

Teyorî ya ku bi xwe nerîn û şîmane ye, ji bo şirovekirin a dî-yardeyekê yan çend dîyardayan e û dikeve bin bar ê rast an şaş de, di wata ya peyv a “bîrdoz” de nahê xuyakirin, ji ber ku pêkhat ên evê peyvê dûrî kiryar û naverok a nerîn û şîmaneyan e. Pêkhat ên peyv a “bîrdoz” bi wata ya bîrhînan a doz û pîrsekê ve girêdayî ne. Ango dozek an pîrsek bi bîr ve dihên an dihê xwaztin ku ew bi bîr ve bihên. Weha jî ew gelekî dûrî wata ya teyorîyê ye û ew wata ya memorandum (muzekkirî) dide. Herdu peyv ên “bîr” û “doz” bi hevdu re wata ya bîrhînan a dozekê didin û bi evî awayî, wata ya peyv a “bîrdoz” bîrhînan a pîrsekê yan çend pîrsan e, anga “muzekkirî ye, memorandum e”. Anga ne teyorî ye. Peyv a “bîrdoz” ji bo bîrhînan a dozekê û pîrsekê ye û ew di ziman de beramberî peyv a Erebi “muzekkirî” ye û beramberî peyv a Englîzî “memorandum” e.

Diristkirin a peyvek nû di ziman de kiryarek a xwedî binçîn e (xwedî qayide ye). Diristkirin a xwedî binçîn jî her ji nav ziman bi xwe çê dibe, belê divê çêkirinek di cih ê xwe de be. Ji bo ku çêkirin û diristkirin a rast û di cih ê xwe de he be, gerek wata li ber çav be û gerek di biwar ê semantîk de wirdî (diqet) he be û ew wirdî di hevgirî ya peyvê de he be. Wata bi xwe jî, di kok a peyv a daxwazkirî de ye, anga wata di ewê kokê de ye ya dihê xwaztin ku ew peyv a nû jê biderkeve û jê bizê. Peyv a çêkirî ya ku merc ê watayê li ber çav negire, peyvek bê bine-ma ye û zimanekî wek ziman ê Kurdî yê kevnar, bi watayê dijî û bi watayê jîya ye. Ji bo çêkirin a watayekê jî du yan sê beş ên peyvê bi hev ve dihên girêdan, belê divê her beşek ji beş ên ku beşdarîyê di çêkirin a watayek a nû de dikin, bi ewê watayê re gunçayî bin û pê ve girêdayî bin. Di peyv a “bîrdoz” de ya ku ji bo wata ya teyorîyê hatiye çêkirin, ev merc ê bingehîn ê

rêzimanî tine ye. Ji ber ku ne beş ê yekem ê evê peyvê (bîr) têt a wata ya teyorîyê dike û ne beş ê duyem ê evê peyvê (doz) bi teyorîyê ve girêdayî ye. Dibe bihê gotin ku teyorî ji bîrê diderkeve, belê ev ne bes e ji ber ku bingeh a watayê ne ev e. Bingeh a watayê nîşan a peyvê ye, semantîk e û naverok a wata ya peyvê ye. Teyorî û hemû corekî hizirkirinê (fîkrê) bi bîrê ve girêdayî ne, belê wata ne weha dixwaze. Wata dixwaze ku ji naverok a nîşan a peyvê be, da ku rûniştî û xuyanî be. Heger ne weha jî be, dê her peyvek ji bo her tiştî be, ango dê peyv nikaribin xwe bidin nîşandan û dê nikaribin taybetmendî ya xwe bistînin. Di zanist a ferhengî de dibe ku peyvek çend watayan bide – û ev rewş di ziman ên lawaz de weha ye – belê ew wata hemû jî ji hev in û nêzîkî hev in. Di ziman ê Kurdî de weha ye. Dibe di hinek ziman ên din de peyv ne weha hatibin jînê û dibe ku wata yê cuda bidin, belê di ziman ê Kurdî de ne weha ye. Di ziman ê Kurdî de her peyvek ji bo watayekê ye yan her peyvek ji bo watayinî nêzîkî hev in an jî ji watayekê re çend peyv he ne û heger ne weha be, pişîyek (xelelek, defect) he ye û şaşîyek he ye.

Bi evî awayî peyv a “bîrdoz” wata ya “muzekkire, memorandum” dide, belê wata ya teyorîyê nade, ji ber ku wata ya evê peyvê di biwarê semantîk de girêdayî wata ya “muzekkire, memorandum” e. Peyv a ku dê wata ya teyorîyê jî bide, gerek girêdayî kok a bînînê be, ji ber ku wata ya teyorîyê bi bînînê ve girêdayî ye.

Bînarî wata ya teyorîyê dide

Me da nasandin ku bînarî (teyorî) nerîn û şîmane ye, ji hizrê diderkeve û ji bo şirovekirin a dîyardeyekê yan çend dîyardeyan e û dikeve bin bar ê rast an şaş de. Ango bînarî pirsê ji pirs ên jînê, yan çend pirs ên jînê şirove dike û ewê şiroveyê pêşkêşî qad a zanistî dike, belê dibe ku ew şirove rast be yan şaş be. Di dawî de û piştî sihêt ên (tecrube yên) zanistî, her zanist bi xwe rastî yan şaşî ya bînarîyê biyaş dike.

Giringî ya evê pirsê ya ji bo gengeşe ya me ew e, ku bînarî (teyorî) bi bîninê ve girêdayî ye û ev gengeşe jî, zanistî û zimanvanî ye. Ew zanistî ye ji ber ku naverok û surîşt a bînarîyê dide nîşandan û zimanvanî ye ji ber ku dide xuyakirin çawa peyv a bînarî, ji bo wata ya teyorîyê guncayî ye. Pirs a ku ew zanistî ye jî di vir de ne ew e ya ku em li ser dirawestin, belê pirs a ku ew zimanvanî ye ew e ya ku em li ser dirawestin. Em dixwazin nas bikin ka çawa peyv a “bînarî” ji bo wata ya teyorîyê guncayî ye.

Li ser bingeh a girêdan a bînarîyê bi bîninê ve, dihê xuyakirin ku ev peyv wek “bînarî” ji bo wata ya teyorîyê bêtir wird e. Peyv a “bînarî” ji sê beş ên peyvê pêk dihê, ku beş ê yekem û yê bingehîn “bîn” e û beş ê duyem “ar” e û “ar” bi xwe kurtkirî ya “dar” e û beş ê sêyem “î” ye yê ku nam ê jêder dirist dike. Beş ên duyem û sêyem amraz in û ew naskirî ne, belê beş ê serekîn (bîn) kok a jêder a “bînin” e û ew e yê ku em wî didin xuyakirin, herweha ew e yê ku dibe bingeh a peyv a bînarîyê. Bînin ne tenê dîtî e, ew peyvek watayîn jî ye û nerînê di biwar ê xwe yê watayîn de jî şirove dike. Dem a ku Kurd dibêjin: “bînayî ya çavan” mebest a wan ne tenê dîtî û nerîn e, belê ew ronahî ye ya ku di çavan de he ye û ew ronahî bi mejî ve girêdayî ye. Ango heger nerîn ji bo dîtî a tişt ên derve be, bînin ji bo dîtî a tişt

ên hinder (hundur) e. Bi evî awayî, bînarî (teyorî) bi awayekî rêxistî ji hizr a mejî diderkeve û bînarî bi xwe jî her weha ye. Ew şirove ya ku ji bo pîrsekê yan çend pîrs ên jînê dihê pêşkêşkirin, ji mejî û li angora bînîn a mirovekî yan çend mirovan dihê der û ev kiryar a han, bi gelekî ji bîrê û bîrhatinê mezintir û giştgiştir e.

Ji alî yê din ve, peyv a bînarî ya ku kok a wê di ziman de “bîn” e, dide xuyakirin ku bînarî ya pêşkêşkirî, li angora dîd, nerîn û raman a kesekî yan çend kesan e. Peyv a “bînîn” jî hemû ewan watayan (dîd, nerîn û raman) di xwe de kom dike û ji ber evê yekê ew wata ya teyorîyê di biwar ê xwe yê zanistî û zimanvanî jî de dide. Ji xwe di biwar ê zanistî de “dîd” bingeh a avakirin a teyorîyê ye û “dîd” di destpêkê de û bi awayekî serekîn û bingehîn, piştî bînînê dihê û bi xwe jî yek ji wata yên bînînê ye. Tu dibînî û tu dîd a xwe (ra ya xwe, re`î ya xwe) pêşkêş dikî. Heger dîd li ser bingeh a bihîztinê bihê avakirin, hîngê ew pêwîstî girovan (delîlan) e û ew girov jî piştê bi dîtinê ve girê didin û ev babetekî din e. Ew ê ku bînarîyê didane (datîne) jî, bi xwe dibîne û li ser bingeh a dîtin a xwe bînarîyêkê pêşkêş dike, belê ew bînîn rêxistî û hizrî ye. Bînarî bi bînînê ve girêdayî ye, ji ber ku bînarî ne tenê dîtinek sade ye. Bînarî dîtinê û hizrê bi hevdu re kom dike û naverokek zanistî ya rêxistî dide. Ew xwedî ya evê saloxeyê jî ye, ji ber ku ew bi kûrayî ya mejî ve girêdayî ye. Wata ya evê yekê (dîtin û hizir) ew e, ku kiryarek a zanistî he ye û ew kiryar li ser bingeh a bînînê ava dibe, ji ber ku bînîn dibe ew hêz a ku bînarîyê divejîne. Ev bi xwe ye ya ku dihêle em bibêjin ku peyv a “bînarî” ji bo wata ya teyorîyê rast û guncaî ye.

Bê goman e ku di ziman ên zindî û hêzdar de, peyv li angora rewş û salix ên xwe hatine vejînkirin. Ango di ziman ên zindî û hêzdar de, peyv li pergala ên xwe divegerin û pergala ên xwe

şirove dikin. Pirranî ya peyv ên ziman ên ku ew weha ne, weha hatine vejînkirin. Yek ji pergal ên surîşt a ziman ê Kurdî jî ew e, ku peyv bi pirranî li angora rewş û salix ên xwe ne. Wek nimûne; peyv a “day, dayik” ji dayîne hatiye. Dayî jî di ziman ê Kurdî de bexşîn e, pêşkêşkirin e û berhemdan e. Ji ber evê çendê jî day (dayik) û xak (erd) di wata ya felsefî ya mirovan de bi hevdu ve hatine girêdan, çimku xak jî xwedî ya evan taybetmendîyan e. Peyv a “zayîn, zagîn” a ku kok a wê “za, zag” e, wata ya çêbûn û hafirandinê dide. Peyv a “zanîn” a ku kok a wê “zan” e, wata ya hişyarbûn, xurtbûn û wergirtinê dide. Peyv a “bînarî” jî ji bînîne hatiye û teyorî bînîn e û kok a bînîne “bîn” e.

Dibe bihê gotin ku “bîn” bêhn e û li hinek dever ên Kurdan ji bêhnê re dibêjin “bîn” belê “bîn” ne bêhn e. Kok a “bîn” ji bo peyv a “bînîn” e û kêsan a jêder a “bînîn” di dem a amad û ayinde de, evê pirsê çareser dike. Di kêsan a dem a amad de “ez dibînim” e, ku tê de “di” pêşkok e, kok “bîn” e û paşkok “im” e. Di kêsan a dem a ayinde de “ez dê bibînim” e, ku tê de “bi” pêşkok e, kok “bîn” e û paşkok “im” e. Di kêsan a dem a mêjîn jî de “min bîna, min bînî” ye. Ango “bîn” kok a jêder a “bînîn” e û ew bi ti awayî wata ya bêhnê nade. Bêhn hilm a tiştan e, belê “bîn” kok a “bînîn” e û ew bi dîtî û nerînê ve girêdayî ye, herwek çawa ew bi şêweyekî anahîkar bi ronahî ya çav û mejî ve girêdayî ye. Ronahî ya bînîne jî pîrsek anahîkar e (mecazî ye, metaphorical) e, ji ber ku di biwarê keresteyîn de ti ronahî di nav mejî de tine ye, belê ronahî dihê dîtî û ev dîtî bi rê ya çav e. Ew ronahî ya ku ew mebest a me ye, zanîn e û her tiştê e ku bi zanîne ve girêdayî be. Anahîkarî ya evê pirsê jî di vir de ye. Bînarî jî, ya ku ji dîtî û zanîne dihê û dîdekê yan çend dîdan pêşkêşî cîhan a zanistî dike, ji ewê bînayîyê diderkeve.

Zaskirin a peyv ên weha yê ku di nav ziman ê Kurdî de tine

ne mercekî zimanvanî ye, belê gerek sazkirin li ser bingeh ên ziman ê Kurdî bi xwe be. Herweha, gerek sazkirin li angora wata ya rast û guncayî be û li angora surîşt a ziman ê Kurdî be.

Guftûgo / gotûbêj

Ev herdu peyv ên çêkirî (guftûgo / gotubêj) di ferheng a ziman ê gell ê Kurd de û bi evî awayî tine bûne. Belê ew wek gelek peyv ên çêkirî hatine çêkirin, da ku wata ya “tefawud, negotiation” bidin. Heger çêkirin a peyvan di zimanekî wek ziman ê me yê Kurdî de pêwîst jî be, gerek ew çêkirin zanistî û zimanvanî be. Ev herdu peyv bi ti awayî ne zanistî û ne zimanvanî ne, ji ber ku şaşî di pêkhat an pêkhînan a wan de he ne. Ew şaşî jî, evan herdu peyvan dûrî surîşt a ziman ê Kurdî dixin. Dem a em evan herdu peyvan şirove dikin, ji me re xuya dibe ka çawa ew ne li angora surîşt a ziman ê Kurdî ne û ka çawa ew di pêkhînan a xwe de şaş in.

1- Guftûgo: ev peyv a han ji du peyvan pêk hatiye, ku peyv a yekem “guft” e û peyv a duyem “go” ye û bi rê ya amraz ê peywendîyê “û” bi hevdu ve hatine girêdan. Peyv a yekem (guft) ne Kurdî ye. Peyv a “guft” Parsî ye (Farisî ye) û li beramber peyv a Kurdî “got” e û ew kirde ye. Peyvek a ku mebest a me jê nam be, çawa ji kirde pêk dihê?! Peyvek a Parsî di nav peyvek a Kurdî de çi dike?! Ev e ya ku dihêle em bibêjin şaşî di pêkhînan a evê peyvê de he ye. Heger em bixwazin peyvekê Kurdî çê bikin, divê pêkhat ên ewê peyvê Kurdî bin û li angora wata ya daxwazkirî guncayî bin. Çawa çê dibe ku peyvek Kurdî ji peyvek ne Kurdî pêkhatî be?! Dibe ku peyvek hevpar di navber a ziman ê Kurdî û ziman ê Parsî de he be, ji ber ku reh a herdu zimanan yek e, belê peyvek he be nîv ê wê Parsî be û nîv ê din ê wê Kurdî be, ne di cih ê xwe de ye û pêkhînanek şaş e. Ji bilî evê yekê, peyv a “guft” û kok a peyv a gotinê “go” bi rê ya amraz ê peywendîyê “û” bi hevdu ve hatine girêdan û berê jî me da xuyakirin, ku ev pêkhînan a weha fetisandin a amraz e û

amraz nahê fetisandin, ji ber ku amraz serbixwe ye û serbixwe dihê nivîsandin.

Ev heyvêz ên weha li başûr çê bûne û beş ên din ên welat jê fêr dibin û ew ne heyvêzek rast e heta ku mirov jê fêr bibe. Girêdan a bi hev re ya peyvên bi rê ya amraz ê peywendîyê “û” peyvîni ku di pêkhînan a xwe de şaş in di ziman ê Kurdî de hafirandiyê. Êdî şaşî ya din a di pêkhînan a evê peyvê de jî ew e, ku tê de amraz ê peywendîyê “û” hatiye fetisandin. Peyv a din a ku “go” ye û di pêkhat a evê peyvê de ye, tenê kok a peyv a gotinê ye û em dizanin ku kok a peyvê bêyî girêdan ên xwe, bi giştî ti watayek a sererast a guraş nade. Kok a peyvê bi girêdan ên xwe watayek a sererast dide û girêdan ên wê pêşkok, paşkok, pêşgir, paşgir, amraz û peyv ên guncayî ne. Di evê peyvê de (guftûgo) kok a “go” hilawîstî (daliqandî) maye, ango di wata ya xwe de kêr maye. Êdî peyvek ku nîvê wê ye yekem ne Kurdî be û nîvê wê ye Kurdî jî kêr be, peyvek şaş e.

Paşê, mebest a hebûn a peyvek a Kurdî beramber wata ya “tefawud, negotiation” hebûn a peyvekê ye ku nam be yan jêder be. Ango gerek peyv a Kurdî ya li beramber evê watayê nam be. Belê peyv a “guftûgo” ji kirde dest pê bûye û bi kirde pêk hatiye. Ev jî şaşîyek zimanvanî ye. Di zimanan de, nam li beramber nam e, kirde li beramber kirde ye, jêder li beramber jêder e û ...hd. Ji bilî evê yekê, peyv a “guftûgo” bi xwe jî wata ya “tefawud, negotiation” nade ji ber ku kiryar a “tefawud, negotiation” bi dakarî ya (mu`amele ya) hevpeyvîni dest pê dibe û palê dide ser gotin a bi hev re ya navber a alîyan. Wata kok a evê watayê “go, goyîn” e û gerek wata ya “tefawud, negotiation” jê biderkeve.

2- Gotûbêj: ev peyv ji du beşên peyvê pêk hînane û bi rê ya amraz ê peywendîyê “û” bi hevdu ve girê dane. Beşê yekem

“got” e û beş ê duyem “bêj” e. Beş ê yekem “got” kirde ye û ew kirde yê dem a mêjîn a nêzîk e. Peyvek ku mebest a me jê nam be, çawa ji kirde pêk dihê?! Peyv a “got” kirde yê dem a mêjîn e û ne nam e, ango nabe ku li beramber wata ya “tefawud, negotiation” be. Amraz ê peywendîyê “û” jî di navber a herdu beşan de hatiye fetisandin û gerek ew herdem serbixwe be. Beş ê “bêj” ê ku ev peyv jê pêk hatiye, bi xwe kok a jêder a “bêjtin” e. Di kêsan a dem a amad de “ez dibêjim” e, ku “di” pêşkok a peyvê ye “bêj” kok a peyvê ye û “im” paşkok a peyvê ye. Di kêsan a dem a mêjîn a nêzîk de “min bêjt, min bêja” ye, ku tê de pêşkok nîne, kok “bêj” e û paşkok li angora kêsan a demê ye ku ew “t, a” ye. Di dem a ayinde de “ez dê bibêjim” e, ku “bi” pêşkok a peyvê ye “bêj” kok a peyvê ye û “im” paşkok a peyvê ye. Kok a peyvê jî bi giştî wata ya sererast nade û ew tenê bi girêdan ên xwe wata ya sererast dide û girêdan ên wê pêşkok, paşkok, pêşgir, paşgir, amraz û peyv ên guncayî ne. Beş ê peyvê “bêj” bê wata ye, ji ber ku tenê kok e û ti girêdan ên ku wî bidin naskirin pê ve ne girêdayî ne. Ev rewş a han jî kokê hilawîstî dihêle û di dawî de peyvê jî hilawîstî dike. Ji bilî evê çendê, peyv a “gotûbêj” wata ya “tefawud, negotiation” nade ji ber ku di evê peyvê de giyan ê “tefawud, negotiation” nahê xuyakirin. Giyan ê wata ya evê peyvê di dakarî ya li ser bingeh a hevpeyvînê de ye û ne “got” ewê watayê pêşkêş dike û ne jî “bêj” ewê watayê pêşkêş dike. Ji ber ku “got” kirde ye û “bêj” kok a jêder a “bêjtin” e, ku kirde ne li beramber nam e û kok a kirde bêyî girêdan ên xwe wata ya sererast nade.

Nîşe ya ku di evan herdu peyvan (guftûgo / gotûbêj) de ji me re dihê xuyakirin ew e, ku di her peyvekê de herdu alî yê pêkhat a wê heman watayê didin. Ango di peyv a “guftûgo” de hem “guft” gotin e û hem “go” ji gotinê ye, herweha di peyv a

“gotûbêj” de hem “got” ji gotinê ye û hem “bêj” ji gotinê ye. Êdî girêdan a bi hevdu ve ya du peyv ên wek hevdu, tiştêkî bê wata ye û wata ya daxwazkirî jî pêk nahîne.

Em di vir de pêşînyar dikin ku peyv a “dagoyî, dagoyîn” li beramber wata ya “tefawud, negotiation” be, ji ber ku berî her tiştî ew nam e (jêder e) û li beramber nam e. Ev peyv a han ji amraz ê “da” û jêder a “goyîn” pêkhatî ye û wata ya dayîn û standin a bi rê ya gotinê dide. Bê goman e ku “tefawud, negotiation” jî evê watayê dide. Beş ê yekem ê evê peyvê (da) wata ya dayînê, pêkêşkirinê û veguhaztin a ji rewşekê ber bi rewşek a din ve di ziman de dide û ew pêşgir e. Beş ê duyem ê evê peyvê (goyî, goyîn) jêder e û wata ya vexwîndinê, gotarê û veguhaztin a gotarê di ziman de dide. Peyv a “dagoyî, dagoyîn” li angora surîşt a ziman ê Kurdî ye, ji ber ku hem pêkhat a wê li angora ziman ê Kurdî ye û hem wata ya wê di ziman ê Kurdî de guncayî ye. Weha jî em evê watayê ji kok a “go, goyîn” diderxin û em peyv a “dagoyî, dagoyîn” li beramber wata ya “tefawud, negotiation” didanin (datînin).

Ji evê pêşînyarê giringtir û rasttir ew e, ku peyv a “binaşt” di ziman ê Kurdî de he ye û ew bi awayekî resen wata ya “tefawud, negotiation” dide. Ev peyv a resen di dem ên berê yê nêzîk de di nav gell de hebûye, belê wek gelek peyv ên din ên resen, ew jî hatiye ji bîrkin û nema bi kar dihê. Weha li şûn a peyvek a çêkirî û di çêkirin a xwe de şaş û bê binema, du peyv ên me yê Kurdî yê resen he ne ku ew jî “binaşt” û “dagoyî” ne û gerek ew li şûn a “guftûgo, gotûbêj” bin.

Hatûço ?! (çûn û hatin)

Ji dem ên berê ve gotine: “çûn û hatin li ser evê rêyê kême” (çûn û hatin li ser vê riyê kême) û gerek ev hevek weha baya: “çûyîn û hatin li ser evê rêyê kême” û di zarav a me ya Kurd-mancî jî de weha ye. Peyv a “çûn” kirde yê dem a mêjîn a nêzîk e û peyv a “hatin” jêder e. Di nivîsandinê de bi rê ya amraz ê “û” bi hevdu ve ne hatine girêdan û tenê di nav peyvînê de li duv hevdu dihên. Ji xwe heger her dem a ku em du peyvên bi rê ya amraz ê peywendîyê “û” bi hevdu re bibêjin û em wan bi hevdu ve girê bidin, dê gelek peyv ên ziman ê Kurdî cêmik bin û surîşt a ziman ê Kurdî ne weha ye. Di surîşt a ziman ê Kurdî de her peyvek bi ser ê xwe ye û her peyvek azad e. Amraz ê peywendîyê “û” jî herdem serbixwe dihê nivîsandin. Belê li başûr ev rêbaz a şaş hatiye hafirandin, ku gelek caran bi rê ya amraz ê peywendîyê “û” du peyvên bi hevdu ve girê didin û peyvekê jê çê dikin û ew çêkirin şaş e. Ev rêbaz a şaş ewan peyv ên cêmik û leng di ziman ê Kurdî de çê dibe û peyv ên cêmik di ziman ê Kurdî de nabin û tinebûne. Mebest ji peyv ên cêmik jî ne ew e ku peyvek he be ji du peyvên pêkhatî be, belê mebest ew e ku du peyv ên serbixwe bi rê ya amraz ê “û” bi hevdu ve bihên girêdan, çimku ev girêdan a han bi zorê ye û ne surîştî ye.

Di evê nimûneyê de ya ku “hatûço” ye û li başûr hatiye saz-kirin, şaşî yê mezîna ên zimanvanî he ne. Pêkhat a evê peyvê “hat – û – ço” ye, ku “hat” kirde yê dem a mêjîn a nêzîk e “û” amraz ê peywendîyê ye û “ço” qaşo “çû” ye belê bûye “ço”. Dem a ku “çû” dibe “ço” jî watayek a din dide û ew wata nema bi çûyînê ve girêdayî ye.

Mebest ji çêkirin a peyv a “hatûço” ew e ku wata ya “murûr, traffic” bide, belê gelek ne serkevtî ye, gelek şaş e û ne di cih

ê xwe de ye. Dem a em li wata ya “murûr, traffic” dinerin, em dibînin ku ew nam e û gerek peyv a Kurdî ya li beramber wê jî nam be. Belê me da zanîn ku pêkhat a evê peyvê ji kirdeyekî dem a mêjîn, amraz ê peywendîyê û peyv a “ço” ye. Ev rewş a han evê peyvê nake nam, ji ber ku bi xwe ji kirde pêkhatî ye. Bingeh a evê peyvê “çûyîn” û “hatin” e û ew şirove ya rewşekê ye û yek ji evan herdu peyvan kirde ye (çûn) û yek jêder e (hatin) û nabe ku bi hevdu ve jî bihên girêdan. Kirde bi xwe jî gerek serbixwe be da ku xwe û dem a xwe bide nîşandan. Ango gerek ev peyv a han “hat û çû” be yan “çû û hat” be û weha ew kirde ye, yan “çûn û hatin” be û weha ew kirde û jêder e. Belê di nimûne ya kirde de (hat û çû) du kirde he ne ku ew jî “hat” û “çû” ne û di nimûne ya kirde û jêder de (çûn û hatin) kirde û jêder he ne ku ew jî “çûn” û “hatin” in. Ne di nimûne ya kirde de çê dibe ku du kirde bi hevdu ve bin û bibin yek kirde û ne di nimûne ya din de çê dibe ku kirdeyek û jêderêk bi hevdu ve bin û bibin yek peyv. Di ziman ê Kurdî de her kirdeyek xwedî yê gerin a (rol a) xwe ya taybetî ye, herwek çawa her jêderêk xwedî ya gerin a xwe ya taybetî ye. Ji ber evê çendê jî peyv ên ku kirde û jêder bin, ticaran nabe ku bi hev ve bihên girêdan. Ango ne du kirde bi hevdu ve bihên girêdan, ne du jêder bi hevdu ve bihên girêdan û ne kirde û jêder bi hevdu ve bihên girêdan. Kirde û jêder bi awayekî taybetî serbixwe ne û ew du beş ên peyvê yên resen û bingehîn in. Bingehînbûn a jêder ew e, ku ew kok a peyvê diparêze û bingehînbûn a kirde ew e, ku ew dem û kar ên peyvê dide nîşandan û diparêze. Mixabin ku beş ên din ên welat ê Kurdan jî fêrî evê rêbaz a şaş bûne û peyv ên weha bi rê ya amraz ê peywendîyê “û” bi hevdu ve girê didin. Êdî herdu peyv ên serbixwe yên “çûn” û “hatin” bi hevdu ve girê didin û wê dikin “çûnûhatin” û şaşîyek mezin di bare ya

ziman de dikin. Ew dixwazin “çûn” û “hatin” bikin yek peyv da ku wata ya “murûr, traffic” çê bikin, belê ev heyvêz şaş e. Wata ya “murûr, traffic” di ziman ê Kurdî de he ye û ne pêwîst bû ku ev heyvêz a şaş bikeve nav ziman ê Kurdî de û ne pêwîst e jî ku di nav ziman ê Kurdî de he be.

Ew peyv ên ku di ziman ê Kurdî de wata ya “murûr, traffic” didin “buhurîn, çîminî, wîyertin” in û hemû jî peyv ên xurrû û resen in. Wek nimûne jî.. peyv a “buhurîn” jêder e her wek “çîminî, wîyertin” jêder in. Em dibêjin: “di ber min re buhurî” wata murûr a wî û derbasbûn a wî di ber min re bû û “buhurî” dem a mêjîn e. Hemû parzad ên buhurînê yên ku dihên xwaztin jî, di evê peyvê de he ne. Parzad ên evê peyvê yên wek buhur, buhurandin, dibuhure, bibuhure, buhurî, buhurîn, ... wata ya “murûr, traffic” di hemûyan de ye. Belê mixabin; dê bihê gotin ku êdî “hatûço” cih ê xwe girtiye û “buhurîn” jî li ser ziman giran e! Çi sosretek mezin e dem a ku şaşî cih ê xwe bigire û rastî giran be û ti kes ne amade be wê bihilgire.

Gerek şaşî bihên havêjtin û rastî bi cih bibin. Gerek ticaran şaşî cih ê xwe negire. Gerek em şaşîyan bihavêjin û rastîyan li şûn a wan bidanin. Gerek herdem û di her biwarekî de weha be. Peyv ên “buhurîn, çîminî, wîyertin” peyv ên resen, xurrû û sererast in û her ji destpêk a zayîn a ziman ê Kurdî ve hebûne û he ne. Di evê peyvê de (buhurîn) ya ku ji du beşan pêk dihê “buhur” wata ya “memerr, passage” dide û “în” amraz ê diristkirin a jêder e. Weha jî ew nam e û li beramber nam ê “murûr, traffic” e. Herweha, ew peyvek resen e û ne diristkirî ye. Heta ku peyvek a resen jî di nav ziman ê Kurdî de he be, gerek peyv ên çêkirî û diristkirî ne pêwîst bin, an gerek ne pêwîst be ku peyv bihên çêkirin.

Derbarê / di bare ya ... de

Yek ji heyvêz ên Parsî yê ku di nav ziman ê Kurdî de jî bi kar dihên “derbarê” ye. Ev heyvêz a han ji amrazê kişanê yê Parsî “der” û peyv a “barê” pêk hatiye û wata ya “li ser, li dor” dide. Amraz ê kişanê yê Parsî “der” beramber amraz ê kişanê yê Kurdî “di” ye. Ev heyvêz a han di nav peyivînê de wek “derbarê” dihê gotin û mebest ew e, ku tiştê li dor pirsê he ye û ew pirs ew e ya ku peyivîn li ser çê dibe. Ev heyvêz a han di nav peyivîn a Kurdî de û bi taybetî di nav ziman ê ragihandin a Kurdî de, bi awayekî şaş dihê gotin. Şaşî ya gotin a evê heyvêzê di wir de ye, dem a ku dibêjin: “di vê derbarê de”. Heger wek “derbarê” tenê bihê gotin, em dê bibêjin ku heyvêzek a Parsî ye û derbasî nav ziman ê Kurdî bûye û ew heyvêzek hevpar e, ango hem Parsî ye û hem Kurdî ye, belê heger wek “di vê derbarê de” bihê gotin hîngê ew şaşî çê dibe. Dem a ku me got amraz ê kişanê yê Parsî “der” beramber amraz ê kişanê yê Kurdî “di” ye, êdî di heyvêz a “di vê derbarê de” herdu amraz ên kişanê (yê Kurdî û yê Parsî) hatine gotin û ev ne dirist e, ji ber ku du amraz ên kişanê yê wek hevdu di yek heyvêzê de nabin. Ango yan divê em bibêjin “derbarê ...” û hîngê Parsî ye û yan divê em bibêjin “di bare ya ... de” û hîngê Kurdî ye.

Wata rastî ya evê heyvêzê di ziman ê Kurdî de “di bare ya ... de” ye, ango di evan nimûneyan de yê wek: “di bare ya bêhvan tiştî de” û “di bare ya babet ê me de” û “di bare ya pirs ên ziman de” ... heyvêz a “di bare ya ... de” heyvêzek a Kurdî ye û ew wek awa yê “di bare ya ... de” rast e. Dem a em dibêjin “di bare ya babet ê me de” mebest a me “li dor babet ê me” ye. Di ziman ê Kurdî jî de peyv a “bare” wata ya “alî, heq, dor, rewş, pergal, biwar” dide.

Em dikarin peyv a “derheq” jî di nav ziman ê Kurdî de bibînin û ew jî ji amraz ê kişanê yê Parsî “der” û peyv a Erebî “heq” pêk hatiye. Ev peyv li beramber heyvêz a Kurdî “di heq ê ... de” ye û pirranî ya caran, her wek peyv a Parsî, peyv a “derheq” jî di nav ziman ê Kurdî de dihê gotin. Belê aya (gelo) çê dibe em bibêjin “di derheq ê ... de” ? Bê goman nabe, ji ber ku wek me got; du amraz ên kişanê yê wê wek hevdu di yek heyvêzê de nabin. Heger em bibêjin “di derheq ê ... de” herwek em dibêjin “di di heq ê ... de” û weha nabe, ji ber ku di evê heyvêzê de yek ji ewan amraz ên kişanê ne pêwîst e. Bi heman şêweyî heyvêz a “derbarê” jî weha ye, ku nabe em bibêjin “di derbarê ... de” ji ber ku heger me weha got herwek me got “di di bare ya ... de” û weha şaş e.

Dem a ku ev heyvêz (di bare ya ... de) wek şêwaz ê heyvêz a “di derbarê ... de” bihê gotin, hîngê “derbarê” dibe peyvek û hemû bi hevdu re (der û barê) dê wata ya “ji evî alî ve, li dor, li dor evê rewşê” bide û ev şaşîyek mezin e, ji ber ku “der” amraz e û “barê” peyv e û her yek ji wan gerin û wata ya xwe he ye. Heger “derbarê” bû peyvek bi ser ê xwe, dê wata ya wê di ziman ê Kurdî de çi be? Bê goman wek çawa ku gelek caran çê jî bûye, dê watayek a ne di cih ê xwe de jê re çê bibe. Dibe wata ya “rewş, pergala, biwar” bidin peyv a “derbarê” û hîngê dê şaşîyek mezintir bikin, ji ber ku pêkhat a evê heyvêzê ji amraz ê kişanê “der” û peyv a “barê” ye û her yek ji wan xwedî gerinek taybetî ye. Di heyvêz a şaş a “di derbarê ... de” çî watayekê jî bidin peyv a “derbarê” şaş e, ji ber ku pêkhat a “derbarê” xuyanî ye û ew ji amraz ê kişanê “der” û peyv a “barê” pêkhatî ye. Peyv a “bare” ye ya ku wata ya “rewş, pergala, biwar, dor, heq, alî” dide û “derbarê” heyvêzek a Parsî ye û heyvêz a Kurdî ya li beramber wê “di bare ya ... de” ye.

Tişt ê gelek zehî (ecêb) ew e, hinek kes ên ku ziman ê Parsî dizanin bi xwe jî dikevin evê şaşîyê de û evê heyvêzê wek “di derbarê ... de, di vê derbarê de” dibêjin. Ev e jî ya dihêle em bitirsin ku “derbarê” di ayinde de bibe peyvek bi ser ê xwe, watayek ji ewan wata yê destnîşankirî jê re bihê çêkirin û êdî wek peyv bikeve nav ziman ê Kurdî de. Em ditirsin weha jî bibe, ji ber ku “der” di ziman ê Kurdî de xwedî watayek a din e û di ziman ê Kurdî de bi gelek peyvan re he ye. Peyv ên wek “dermale, derazîn, derbas, derber, derbend, derxistin, derxone, derdan ...hd” ji ewan peyvan in, ew ên ku di durv ê xwe de hinekî wek “derbarê” ne. Ji ber evê çendê jî gerek bi xustdarî (bi hessasî) dakarî bi peyv ên ziman re bihê kirin. Ango dibe peyv a “derbarê” bikin xwedî ya wata yê “rewş, pergal, biwar ...” û şaşî di vir de ye.

Me da nîşandan ku peyv a “bare” di ziman ê Kurdî de wata yê “rewş, pergal, biwar, alî, dor” dide û ew di ziman ê Parsî bi xwe jî de evan watayan dide. Ji ber evê yekê gerek hişyarî he be û di ziman ê Kurdî de “der” û “barê” bi hevdu re nebin peyvek, çimku ew heyvêz e û tê de “der” amraz ê kişanê ye û “barê, bare” ew peyv e ya ku di herdu zimanan de (Kurdî û Parsî) hevpar e. Em evê tirsê didin nîşandan, ji ber ku peyv ên bi evî awayî di ziman ê Kurdî de dibin û dê bibin engîz a hebûn a ziyaneke mezin. Ew ziyaneke jî dê li rêziman bibe, ji ber ku dê bihêle guherîn ên ne li angora surîşt a ziman ê Kurdî di ziman ê Kurdî de çê bibin. Heyvêz ên ne li angora surîşt a ziman ê Kurdî, wek girjûz ên (mîkrob ên) nav laş ê mirov in û dibin engîz a nexweşîyan.

Hanîn (anîn) an hînan (hênan) ?

Em dikarin bibêjin ku bi giştî di beş ê bakur ê Kurdistanê û rojava ya Kurdistanê de, gell peyv a “anîn, hanîn” bi kar dihîne û di kêsan a evî kirdeyî jî de “tîne, tanî” bi kar dihîne, ku “tîne” kirde yê dem a amad e û “tanî” kirde yê dem a mêjîn a xayan (berdewam) e.

Ev herdu peyv (hanîn û hînan) jêder in. Ew ên ku “hanîn, anîn” bi kar dihînin, di kêsan a dem a amad de dibêjin: “ez tînim” di kêsan a dem a mêjîn de dibêjin: “min anî, min hanî” di kêsan a dem a ayinde de dibêjin: “ez dê bînim” û di kêsan a dem a xizavê (ferman) de dibêjin: “bîne, bînin”. Me jî da xuyakirin ku surîşt a kêsan a kirde yê Kurdî weha ye, ku ew di dem a amad de di pêşkok a xwe de amraz ê “di” diwergire, di kêsan a dem a mêjîn de pêşkok tine ye û tenê kok û paşkok he ne û kirde her bi kok a xwe ve dest pê dibe, di kêsan a dem a ayinde de di pêşkok a xwe de amraz ê “bi” diwergire û di kêsan a dem a xizavê jî de di pêşkok a xwe de amraz ê “bi” diwergire. Bi evî awayî jî kirde yê “anîn, hanîn” nahê kêsankirin. Ango dem a em li angora binçîn a surîşt a ziman ê Kurdî biçin, ev kêsan çê nabe. Wek nimûne: di kêsan a dem a amad de (ez tînim) pêşkok ne “di” ye, ew li şûn a “di” pît a “t” ye, kok a peyvê “în” e û paşkok a wê “im” e. Pirs a ku amraz ê “di” bûye “t” girêdayî şêwaz ê bê binçîn ê peyivîn a gell e, ku gell xwe girêdayî rêziman nabîne û di levakirin a bê şîraz de weha bûye. Di evê nimûne ya dem a amad de (ez tînim) kok a peyvê heta radeyekî (heddekî) paraztî ye û ew jî “în” e, belê di dem a mêjîn de kok winda bûye. Di dem a mêjîn de (min anî) kok nema “în” e û gerek kok paraztî baya, ango “în” baya. Baş xuya jî ye, ku di dem a mêjîn de ev kok û ev kirde awejû bûye (qulipî ye) ango ji “îna, hîna” bûye

“anî, hanî”.

Peyv a li angora heyvêz a “anî” ji kuda hatiye ? Bê goman di levakirin a bê şîraz de weha bûye, anga “în, îna” bi evê levakirinê re bûye “anî” anga hatiye awejûkirin (qulipandin). Bi xwe jî “îna, hîna” ya rast hatiye awejûkirin û bûye “anî, hanî”. Levakirin a bê şîraz a şaş peyvê şaş dike, çimku kok û wata ya wê winda dike. Belê êdî ev şêwaz ê han li bakur û rojava ya Kurdistanê dihê gotin û heta niha li kar e.

Di beş ên başûr û rojhilat a Kurdistanê de “hînan, hênan” bi kar dihê û dem a ku em evê jêderê kêsan dikin, em dibînin ku ew li angora surîşt a ziman ê Kurdî ye. Anga di dem a amad de pêşkok a kirde amraz ê “di” ye, kok a kirde “hîn” e û paşkok a kirde li angora kirdedar û dem a kêsanê ye. Anga jêder a “hînan” di dem a amad de dibe “ez dihînim” di dem a mêjîn de dibe “min hîna” di dem a ayinde de dibe “ez dê bihînim” û di dem a xizavê de dibe “bihîne, bihînin”. Bi evî awayî, kok a kirde di hemû dem ên kêsanê de paraztî ye, ku ew jî “hîn” e û ya rast ev e.

Ev kok a han (hîn) her li başûr û rojhilat wek “hên” jî bi kar dihê û di kevnarî ya xwe de ew jî rast e. Anga di dem a amad de dibe “ez dihînim” di dem a mêjîn de dibe “min hêna” di dem a ayinde de dibe “ez dê bihînim” û di dem a xizavê de dibe “bihêne, bihînin”. Di evî şêwazî de kok a peyvê “hên” e û pirs a ku dibe “hên” ji “hîn” rasttir be ew e, ku “hîn” di ziman ê Kurdî de xwedî hinek wata yê din e. Ji ewan wata yê ku dibe peyv a “hîn” di ziman ê Kurdî de bide “tiştêk, heta niha (hîne) arzû, hînbûn (fêrbûn) û bi cihbûn” e. Belê çî ev jêder “hînan” be yan “hênan” be, ew ji “anîn, hanîn” rasttir e. Weha jî ew ên ku ji bakur û rojava ne, peyv ên wek “karanîn, pêkanîn, rahanîn, bi cihanîn, deranîn ...” bi kar dihînin û ew ên ku ji başûr û rojhilat

in, evan peyvan wek “karhînan, pêkhînan, rahînan, bi cihînan, derhînan ...” an jî “karhênan, pêkhênan, rahênan, bi cihênan, derhênan ...” bi kar dihînin û rastî ya evan peyv ên han li rojhilat û başûr e, ango “hînan, hênan” ji “anîn, hanîn” rasttir e.

Li angora rêziman, herdu peyv ên ku jêder in (hînan û hênan) ji peyv a “hanîn, anîn” rasttir in, ji ber ku di kêsanê de cih ê xwe yê rêzimanî digirin. Her peyvek a ku cih ê xwe yê rêzimanî ji dest dabe, ew kevtiye ber şûr ê levakirin a şaş a bê şîraz, kêmkirin û yanizkirinê de û ji hemû şaşîyan mezintir, ew kevtiye ber pêl a awejûbûnê (qulipandinê) de. Dem a ku “îna, hîna” dibe “anî, hanî” û “nik” dibe “kin” û “pît” dibe “tîp” û ...hd, ev awejûbûn çê dibe û terazû û wata ya peyvê têk diçe û ji rêzan a xwe ya rêzimanî diderkeve.

Li angora pirs a etîmolojîk a evan herdu peyvan, dê “hînan, hênan” ji “hanîn, anîn” rasttir be, ji ber ku ew wek wata jî rewş a bi cihbûnê dide. Em ji roj a “înê, hînê” jî re weha dibêjin (em dibêjin “în, hîn”) ji ber ku bi cihbûn tê de he ye. Bi cihbûn a roj a înê, bi cihbûn û gurahbûn a (temambûn a) hafirandinê bûye. Ji ber evê yekê ew di hobarî ya oldarî ya Islamî û ya berî Islamê de jî, roj a vehesînê bûye. Ji ber ku di hobarî ya oldarî de, di roj a înê de hafirandin bi dawî hat û êdî dem dem a vehesînê bûye. Peyv a “în, hîn” nîşan a hatinê ye û “hat” di biwar ê bi cihbûnê de bi peyv ên encamdayî re ye wek: “bi cih hat, pêk hat, bi dawî hat ...” an jî wek: “hat dîtin, hat girtin, hat zanîn, hat kirin ...”. Di nimûne ya “pêk hat” de kirde yê “înan, hînan” he ye, ango tiştê kevtiye biwar ê pêkhatinê de û ji ber evê yekê jê re (ji ewî tişt ê pêkhatî re) dibêjin “pêkhînan” an jî rewş a “pêkhînanê” didinê. Ango alî yê watayîn û naverokî yê “hatinê” kirde yê “hînanê” ye û “hînan, înan” li bakur û rojava di ziman ê gell de hatiye awejûkirin û bûye “hanîn, anîn”. Dem a ku ew weha

hatiye awejûkirin jî, wata ya xwe û rêzan a xwe ya rêzimanî ji dest daye. Ji ber evê yekê em dibînin ku wek nimûne.. di kêsan a jêder a wek heyvêz a “hanîn, anîn” de, rêzan a rêzimanî ya li angora surîşt a ziman ê Kurdî tine ye û çê nabe.

Dîyarkirin a pirs a ku peyv a “hînan, hênan” ji peyv a “hanîn, anîn” rasttir e, ji ber ewê yekê ye ku nabe şaşî di rêziman de he be. Dem a ku heyvêz a peyvekê şaş jî be, ew peyv nakeve rêzan û terazû ya rêziman de û herdem deramî ye (xerîb e). Deramî ya peyvê jî hîngê xuya dibe, dem a ku di kêsanê de ne li angora surîşt a ziman be.

Wek encam.. bi karhînan a peyv û jêder a “hînan” di nivîsandin û peyivîn a petî û fermî de rasttir e, ji ber ku merc ên rêzimanî yên girêdayî surîşt a ziman ê Kurdî bi cih dihîne. Ji jêder a “hînan” hemû parzad ên kirde yên dem ên kêsanê rast diderkevin û kok a evê peyvê dihê paraztin. Di heyvêz a “anî, hanî” de jî, kok a peyvê hatiye awejûkirin û ev di rêziman de şaş e, ji ber ku sirêmek darin (negatîv) li watayê dike.

Roj, rok, ron

Di evan hersê peyv an de pîrsek semantîk û etîmolojîk he ye, ku her yek ji wan girêdayî wata û rewşek taybetî ye, belê di zimanê gellêrî de bi giştî wek hev in. Her yek ji evan hersê peyv an wata ya xwe ya nemazeyî he ye û yek ji wan cihê ye ya din nagire. Di zimanê gellêrî de – bi taybetî jî “roj” û “rok” – her yek ji wan ji bo sê watayan dihê, ku wata ya yekem roj a salê ye, wata ya duyem ji bo hetavê ye û wata ya sêyem ji bo ronahîyê ye. Ev wata jî ne di cihê xwe de ne. Her yek ji evan hersê peyv an watayek a taybetî dide.

- **Roj** nîşan a rojekê ye û ew wata ya “yewm, day” dide, belê weha lê kirine ku ew wata ya ronahîyê û wata ya hetavê (rok, şems, sun) jî bide û ev şaş e. Di zimanê Kurdî de peyv a “roj” tenê wata ya rojê salê dide û wek xuyanî ye, rojê salê niha 365-366 roj in û wek çawa naskirî ye; mehê salê bi giştî ji sih rojan pêk dihên, hefte ji heft rojan pêk dihê û her rojek bi giştî bîst û çar xant (demjimar, sa`et) in. Bi evî awayî, wek nimûne û wek çawa naskirî ye, peyv a “rojname” wata ya belavokekê dide ku ew her roj diderkeve û name ya rojê ye. Kok a evê peyvê jî “ro” ye û ev peyv girêdayî wata ya ronahîyê ye, ji ber ku destpêk a her rojekê bi hilatin a rokê re ye, ango bi derkevtin a ronahîyê re ye. Belê “roj” di avabûn a rokê de bi dawî nabe û bîst û çar xantê xwe bi dawî nake. Roj bi hilatin a rokê re dest pê dibe û bi hilatin a rokek din re bi dawî dibe û weha ew bîst û çar xantê xwe derbas dike. Roj ev e.

Herweha, peyv a “roj” wata ya namê hetavê nade, belê di zimanê gellêrî de, li pîrranî ya deveran ji bo wata ya hetavê (rokê) jî bi kar dihê, yan jî peyv a “roj” û peyv a “rok” û peyv a “ron” tev li hev dikin û wata ya hetavê yan ronahîyê didin peyv a

“roj”. Dem a ku dibêjin: “dem hîne roj e” şaşîyek mezin çê dibe, ji ber ku “roj” weha dibe nîşan a ronahîyê, ango ne şev e, yan dem a dibêjin: “bi roj û bi şev” ku di vir de jî roj dibe beramber şevê û wata ya ronahîyê dide û ev jî şaş e. Roj ew peyv e ya ku ewan her bîst û çar xantan (demjimaran, sa`etan) bi xwe ve digire, ku dem a herdu alî yê wê wek hev bin, duyanizdeh (12) xant ên wê ronahî ne û duyanizdeh xant ên wê şev in. Wata peyv a “roj” ne “rok” e û ne jî “ron” e, ew peyvek serbixwe û sade ye û tenê wata ya lînekî (zerf, adverb) dide û ew jî “roj” e. Roj jî niha bîst û çar xant in.

- **Rok** tenê nîşan a hetavê (şems, sun) ye û li hinek dever ên Kurdistan weha dihê gotin. Ev peyv a han gelek resen û kevn e û ji bo wata ya hetavê gelek rast e. Ev peyv di serdem ên kevn de “xor, hor” bûye û awejû bûye (qulipî ye) û bûye “rox, roh” û paşê jî bûye “rok” ji ber ku “rox” û “roh” watayinî din didin û ew wata, ne girêdayî peyv a rokê ne. Peyv a “hor, xor” a ku bûye “rok” û niha jî li hinek deveran di nav ziman ê Kurdî de dihê gotin, bi gurahî û bi awayekî rast û dirist wata ya hetavê (şems, sun) dide. Ji bilî wata ya hetavê jî, peyv a “rok” ti wata yê din nade, ew tenê wata ya evê stêr a me ya ronahîdar û pirşingdar dide. Kok a serekîn a evê peyvê jî “ro” ye û ew girêdayî ronahîyê ye, ji ber ku “rok” bi xwe jêder a ronahîyê ye.

- **Ron** nîşan a ronahîyê ye. Ew ne “roj” e û ne jî “rok” e. Ew li beramber şevê û tarîtiyê ye. Ev nam ê han tenê di ziman ê Kurdî û Erebi de li rewşekê dihê kirin, ku di Kurdî de “ron” e û di Erebi de “nehar” e. Peyv a “ron” kok a peyv a ronahîyê bi xwe ye û tenê evê watayê dide. Dem a em bixwazin peyv a li beramber şevê jî bibêjin, gerek em peyv a “ron” bi kar bihînin, ango em bibêjin: “şev û ronek bîst û çar xant in” ku ev hevek a han heta niha weha dihê gotin: “şev û rojek bîst û çar se`et in”. Peyv a

“roj” jî, wata ya beş ê rojê yê li beramber şevê nade, beş ê rojê yê li beramber şevê peyv a “ron” e. Kok a evê peyvê jî “ro” ye û ew jî girêdayî ronahîyê ye.

Bi evî awayî em dibînin ku heryek ji evan hersê peyvan (roj, rok, ron) watayek a taybetî dide û hersê ne yek in. Belê dihê xuyakirin ku peyv a “ron” girêdayî ronahîyê ye, ji ber ku rewş a wê (ronahîyê) dide dîyarkirin. Peyv a “roj” jî serbixwe ye, peyvek sade ye û tenê wata ya “yewm, day” dide. Peyv a “rok” jî ji peyv a kevnar a “xor, hor” hatiye û tenê wata ya rok a me dide, ku rok a me stêrek a ronahîdar e û niha ji alî yê rohilat (rojhilat) ve li me diderkeve.

Weha, dem a em dibêjin “rojhilat” herwek em dibêjin “rojek hilat” û dem a em dibêjin “rojava” herwek em dibêjin “rojek ava bû” û roj ne dihilê û ne jî ava dibe. Roj derbas dibe û girêdayî demê ye û niha ji bîst û çar xantan pêk dihê. Belê ya ku dihilê û ava dibe “rok” e û bingeh a serekîn a evê peyvê jî “ro” ye. Ango weha rast e ku em ji rojhilat re bibêjin “rohilat” an “rokhilat” û em ji rojava re bibêjin “rohava” yan “rokava”. Herdu peyv ên rohilat û rohava, yan rokhilat û rokava jî mê ne, ji ber ku wek çawa em dibêjin “roj a we xweş be” em dibêjin “ro ya we, rok a we” û amraz ên “a, ya” nîşan ên regez ê mê ne.

Peyv a “ron” bi xwe jî kok û bingeh a peyv a “ronahîyê” ye û “ron” ew beş ê rojê yê ronahîdar e yê ku bi Erebi jê re “nehar” dibêjin. Ji ber evê yekê û wek nîşe (têbînî) peyv a “rojhilat” û “rojava” şaş dihên gotin, ji ber ku ew bi rojê ve dihên girêdan. Rastî ya evan herdu peyvan “rohilat” û “rohava” ye yan “rokhilat” û “rokava” ye û weha ew bi “ro” ve dihên girêdan, ku “ro” jî ronahî ye û jêder a evê ronahîyê rok a me ye. Ew jî çimku ya ku hil dihê (dihilê, bilind dibe) û ya

ku diçe ava, rok a me ye. Heger bihê gotin ku mebest ji peyv a “rojhilat” ew e, ku rojek derbas dibe û rojek din dihê yan dihilê rastî tê de he ye, belê heger em weha wata bikin; em dê bibêjin ku mebest ji peyv a “rojawa” jî derbasbûn a rojekê ye da ku rojek din bihê û ev şaş e, ji ber ku roj bi avabûn a rokê bi dawî nahê. Roj di bîst û çar xant ên xwe de bi dawî dihê û ew bîst û çar xant, bi avabûnê bi dawî nabin. Ango dîsan jî peyv a “roj” ji rokê (hetavê) re nabe, herwek çawa peyv a “roj” bi hilatin û avabûnê ve nahê girêdan, ji ber ku ew di dem a avabûn a rokê (hetavê) de bi dawî nahê. Gerek roj bîst û çar xant ên xwe gurah bike da ku bi dawî bihê û rojek din (rojek nû) dest pê bibe. Heger her rojek bi hilatin a rokê dest pê bibe û bi avabûn a rokê gurah (temam) bibe, hîngê dê her rojek me nêzîkî duyanizdeh xantan be û ne bîst û çar xant be. Roj bi şev û ron a xwe ve bîst û çar xant in. Wata ji dem a hilatin a rokê ve û heta dem a avabûn a rokê “ron” e û ji dem a avabûn a rokê ve û heta dîsan hilatin a rokê “şev” e û ev herdu bi hevdu re dibin yek roj.

Di ziman ê Kurdî de peyv a “ro” ji bo wata ya “çem, rûbar” bi kar hatiye û ew bi xwe kurtkirî ya peyv a “rod” e. Ango “rod” hatiye kêmkirin û bûye “ro”. Peyv a “rod” jî bêtir di ziman ê Parsî de maye û dihê gotin. Peyv a “rûbar, robar” a ku wata ya “çem” dide, bi xwe di ziman ê Kurdî de wek “rodbar, rûdbar” hatiye heyvizandin û ji bo sivikirinê bûne “robar, rûbar”. Dem a ku “rodbar” jî bûye “robar, rûbar, rîbar” wata ya evê peyvê dûrî kok a xwe ya resen kevtiye û kok a wê ya resen “rod” e, anga “çem” e. Bi evî awayî jî, peyv bi xwe “rod” e û ne “ro” ye û weha ew bi kok a “ro” re ya ku girêdayî ronahîyê ye, hevdij nabe.

Cudayî ya navber a kok a “ro” û peyv a “roj” jî ew e, ku kok a

“ro” bingeh a peyv a ronahîyê ye – ku ew ronahî ya rokê ye – belê peyv a “roj” ji bo roj ên salê dihê gotin û peyvek lîn e, sade ye û serbixwe ye.

Kengî “a, ya” ye û kengî “ê, yê” ye ?

Ev pirs a han gelek caran hatiye bersivdan. Bersiv jî weha ye; ku Kurd du pît ên dengdar bi hevdu re kirik nakin (leva nakin). Dem a ku di peyvîna zimanê Kurdî de du pît ên dengdar dihên ber hevdu, bi pîtekê ji evan hersê pîtan “y, h, w” ji hevdu dihên cudakirin û dem a ku du pît ên dengdar nehên ber hevdu, ev hersê pît (y, h, w) bi kar nahên ji ber ku pêwîst nake bi kar bihên. Bi giştî û di destpêkê de, pît a “y” ji bo evê mebestê bi kar dihê û pît a “h” kêmtir û pît a “w” kêmtirîn bi kar dihê.

Gelek bi kurtî bersiv a evê pirsê ev e; dem a ku pît a dawî ya peyv a berî “a” bê deng be “a” ye (“a” dihê nivîsandin û levakirin) û dem a ku pît a dawî ya peyv a berî “a” dengdar be “ya” ye (“ya” dihê nivîsandin û levakirin). Wek nimûne: “mal a me mezin e”.. di peyv a “mal” de pît a dawî bê deng e û amrazê “a” yê ku piştî wê dihê, ne pêwîst e ku wek “ya” bihê nivîsandin, ango ne pêwîste em bibêjin: “mal ya me mezin e”. Herweha wek: “kiç a min a zîrek” ku di evê nimûneyê de wek çawa pît a dawî ya peyv a “kiç” bê deng e, pît a dawî ya peyv a (bernamê) “min” jî bê deng e, ji ber evê yekê di herdu alîyan de jî “a” ye û pêwîst nake ku “ya” be. Ango di alî yê “kiç a min...” de û di alî yê “min a zîrek” de her “a” ye, ji ber ku di herdu peyvên de jî pît a dawî bê deng e. Şaşî di wir de ye dem a ku ev nimûne ya han weha dihê nivîsandin: “kiç a min ya zîrek” ku piştî peyv a “min” amrazê “ya” dinivîsin û weha ne dirist e. Binçîna zimanê Kurdî ya di evê bareyê de ew e, ku dem a pît a dawî ya peyvê bê deng be, amrazê “a” bi kar dihê û dem a ku pît a dawî ya peyvê dengdar be, amrazê “ya” bi kar dihê. Berî niha jî hatiye xuyakirin ku ev amrazê han (a, ya) ji peyvê cuda dihê nivîsandin, ango serbixwe ye. Herweha, ev amraz gelek gerinan (ro-

lan) dibîne û ew jî berî niha hatine nîşandan.

Amraz ê “ê, yê” jî her wek “a, ya” dikeve jêr bar ê heman binçînê de. Ango dem a ku pît a dawî ya peyv a berî wî bê deng be “ê” ye û dem a ku pît a dawî ya peyv a berî wî dengdar be “yê” ye. Em dibêjin: “genim ê evsal hindik e” ku pît a dawî ya peyv a “genim” bê deng e, ji ber evê yekê “ê” ye. Em dibêjin: “xanî yê Azad koşk e” ku pît a dawî ya peyv a “xanî” dengdar e, ji ber evê yekê “yê” ye. Kurd nabêjin: “genim yê evsal...” yan jî nabêjin: “ev genim yê me ye”.. ew dibêjin: “genim ê evsal...” û em dibêjin: “ev genim ê me ye” û nabêjin: “xanî ê Azad...” ji ber ku ew di ziman ê xwe de hevgehî a du pît ên dengdar napejirînin û weha leva nakin. Ev ziman ê weha jî ziman ê rewanîyê ye, ziman ê zelalîyê ye û ziman ê xustdarîyê ye. Ew ziman ê xustdarîyê ye, ango ew zimanekî xustdar e (hessas e). Di pirs a fonetîk de weha ye. Ango fonetîk a ziman ê Kurdî rewan, zelal û xustdar e. Dem a ku her lêkolînek jî li ser fonetîk a ziman ê Kurdî bihê encamdan, gerek ev hersê xal li ber çav bin.

Berî niha jî hatibû dîyarkirin, ku ev amraz ê han (ê, yê) ji peyvê cuda dihê nivîsandin û serbixwe ye, belê dem a ku ev amraz dixwaze regez ê peyvê bide nîşandan, hîngê bi peyvê ve dihê nivîsandin. Nimûne ya li ser dîyarkirin a regez û çawa hîngê bi peyvê ve dihê girêdan weha ye: “evê jinê karek mezî in kir”.. em dibînin ku “ê” bi peyv a “jin” ve ye, da ku regez bide nîşandan. Herweha wek: “kiçê bide ber xwîndinê” ku di ziman ê gell de weha ye: “keçê bide ber xwîndinê” ku di evan nimûneyan de amraz ê “ê” bi nam ve dihê girêdan da ku regez bide nîşandan. Ji bilî pergal ê (halet a) dîyarkirin a regez ku tê de ev amraz bi peyvê ve dihê nivîsandin, ev amraz ê han (ê) wek “a” di hemû pergal ên din de ji peyvê cuda dihê nivîsandin.

Di evê dekinê (tekistê) de ji me re xuya dibe ka çawa dem a ku pît a dawî ya peyv a berî “a, ê” bê deng be, ne pêwîst e ku “a, ê” bibin “ya, yê” û ne dirist e jî ku weha bibin, ji ber ku di fonetîk a ziman ê Kurdî de du pît ên dengdar li hevdu nakevin, bi hevdu re nahên û li tenişt a hevdu nabin: [Azad hat xelatkirin. Ew xelat a serkevtin a di biwar ê zanist a derûnnasîyê de bû. Dayik a wî pîrozbayî lê kir û heval ê wî jî gelek şad bû. Azad bi evê serkevtinê derbasî qonaxek a din a jînê bû, ku ew jî qonax a fêrdarîyê bû. Ango Azad bû mamos-ta.]. Di evê dekinê de destewaje yên wek: “xelat a..., serkevtin a..., biwar ê..., zanist a..., dayik a..., heval ê..., qonaxek a..., din a..., qonax a...” ev herdu amraz (a, ê) ji peyvê cuda ne û ne pêwîst bûye ku wek “ya, yê” bin, ji ber ku ew piştî pît ên bê deng hatine. Belê di peyv ên wek: “derûnnasîyê, fêrdarîyê” de, amraz ê “yê” bi wan ve hatiye nivîsandin ji ber ku ew piştî pît ên dengdar hatiye û xwaztiye ku regez ê peyvê bide nîşandan. Di peyv a “derûnnasî” de pît a dawî dengdar e û di peyv a “fêrdarî” de jî, pît a dawî dengdar e û ji ber evê yekê “yê” bi peyvê ve hatiye nivîsandin û regez ê peyvê dîyar kiriye û dem a ku “ê, yê” bi peyvê ve be, regez ê mê dide nîşandan.

Nerîn a ku dibêje: [dem a ku amraz ên “a, ê” ji peyvê cuda bin gerek her “a, ê” bin û pêwîst nake bibin “ya, yê”] jî şaş e, ji ber ku fonetîk a ziman ê Kurdî wek mûzîkê giştgîr e û ev amraz bi peyvê ve girêdayî bin an ne girêdayî bin, dem a ku pît a dawî ya peyvê bê deng be “a, ê” ne û dem a ku pît a dawî ya peyvê dengdar be “ya, yê” ne. Xwedî yên evê nerînê wek nimûne dibêjin: “welat ê me ê mezin” û nabêjin: “welat ê me yê mezin” û ji bîr dikin, ku pît a dawî ya peyv a “me” dengdar e û di levakirin a bi şîraz de, bi amraz ê “ê” re nesaz

dibe û fonetîk a ziman ê Kurdî evî pergalî napejirîne. Rastî ew e, ku ev nimûne wek “welat ê me yê mezin” bihê gotin û nivîsandin û di ziman ê Kurdî de her weha ye.

Çawanî ya nivîsandin a nam û peyv ên biyanî

Nam û payv ên biyanî hemû ew nam û peyv in, ên ku ne Kurdî ne. Her yek ji ewan nam û peyvên jî, li angora ziman ên xwe dihên nivîsandin. Pirranî ya zimanan jî pît ên xwe yê taybetî he ne û her tişt – bi naman jî ve – pê dihên nivîsandin. Tiştê ku hatiye nîşekirin (têbînîkirin) ew e, ku di zimanê Kurdî de namê biyanî yê ji bilî yê Erebi bi Engîzî dihên nivîsandin û ev pîrsekê çê dibe. Çima em namê biyanî yê ji bilî yê Erebi, tenê bi zimanê Engîzî û li angora nivîsandin a Engîzî dinivîsin? Aya binçînek ji evê pîrsekê re ne pêwîst e ?

Niha û li angora nivîsandin a niha ya di ragihandinê de û ya di nivîsandinê din de, em hemû namê biyanî yê ji bilî yê Erebi wek nivîsandin a Engîzî dinivîsin û em yê Erebi jî, li angora sistemê weha dinivîsin ku ew dîrî sistem a nivîsandin a zimanê Kurdî ye. Wata em namê biyanî bi du şeweyan dinivîsin; şeweyek jê Erebi ye û tê de arêşe yê pîtê Erebi û levakirin a wan he ne û şeweyê din Engîzî ye. Di nivîsandin a namê Erebi de taybetmendî yê nivîsandin a zimanê Kurdî bi cih nabin, ku wek nimûne; namekî wek “ni`met” wek “Niamet, Niemet, Niimet” dihê nivîsandin û ev şaş e. Şaşbûn a evê pîrsekê di pêşî de ew e, ku di zimanê Kurdî de du pîtê dengdar nahên ber hevdu, herweha du pîtê dengdar bi hevdu re dengê ewan pîtê Erebi yê ku di Kurdî de tine ne nade. Wek nimûne jî; di zimanê Engîzî de namê “George” he ye û ev nam bi Kurdî “Ge, or, ge” ye, wata li angora xwîndin a zimanê Kurdî nahê xwîndin. Aya ne pêwîst e ku nam bihê xwîndin û wek xwe bihê xwîndin ? Divê bihê xwîndin, da ku wata ya xwe bide û heger nehê xwîndin wata ya xwe ji dest dide û wata di levakirin a pîtê de ye û bi levakirin a pîtê parastî ye. Xwîndin a

nam jî gerek li angora levakirin a nam ê biyanî be û ew levakirin li angora ziman ê Kurdî bihê nivîsandin. Nimûneyek din ji bo nam ê Erebî “Mes`ûd” ku ew wek “Mesûd” dinivîsin û Mes`ûd û Mesûd du nam in, ku li angora ziman ê Erebî wata ya nam ê “Mes`ûd” ango kes ê bi bext e û wata ya nam ê “Mesûd” ango kes ê pêşewa ye. Bê goman ji evê pirsê re binçînek he ye û gerek em wê bidin xuyakirin.

Ji bo nivîsandin a nam ên Erebî em pêwîstî şanîdan a serbarê (´) ne ku bi Englîzî jê re apostrophe dibêjin, ji ber ku ew şûn a pît a ku di ziman ê Kurdî de tine ye digire. Şanîdan a serbarê di hemû yan pirranî ya ziman ên Latînî de jî evê gerinê dibîne. Şanîdan a serbarê cih ê ewê pîtê digire ya ku ti pît ên din ên ABC ya Kurdî, li beramber wê bi kar nahên. Di ziman ê Erebî de jî, tenê li beramber pît a “eyn, ع” û nîşan a “hemze, ء” ti pît ên Kurdî nahên danan û ji bilî wan, şanîdan a serbarê dihê danan. Danan a şanîdan a serbarê jî di nivê peyvê de û di dawî ya peyvê de ye û ew di destpêk a peyvê de nahê danan.

Pît a “eyn, ع” jî bi awa yê vekiranî (fethe) û hemgirî (demme) û şkanî (kesre) û bi pît a “ya`, ي” ve û dirêjîn (medde) û bi pît a “û, و” re û akinc (sakin) he ye û di her awayekî ji evan awayan de, nivîsandinek a xwe ya taybetî he ye. Dem a ku “eyn, ع” vekirî be û di destpêk a nam de be, serbar nahê nivîsandin.. wek nam ên “Elî, Enber, Ezîz,...” û dem a ku hemgir be û di destpêk a peyvê de be, serbar nahê nivîsandin.. wek nam ên “Uzeyr, Usman, Umeyr, Ubeyd, Umer...”. Dem a ku şkanî be û di destpêk a nam de be, serbar nahê nivîsandin.. wek “Ilm, Ille, Imran...”. Dem a ku “eyn, ع” bi pît a “ya`, ي” re be û di destpêk a nam de be, serbar nahê nivîsandin.. wek “Îsa, Îdan, Îlam, ...”. Dem a ku di pergala dirêjîn (medde) de be û di destpêk a nam de be, serbar nahê nivîsandin.. wek “Amir, Amil, Arif, Alî...”. Dem a ku

bi pît a “û, و” re dihê û di destpêk a nam de be, serbar nahê nivîsandin.. wek “Ûc, Ûd...”.

Dem a ku di nîv ê nam de be û vekiranî be, serbar dihê nivîsandin.. wek “Se`ed, Re`ed, Me`en, Mu`emmer...”. Dem a ku di nîv ê nam de be û hemgir be, serbar dihê nivîsandin.. wek “Uf`uwan, zer`una, ...”. Dem a ku di nîv ê nam de be û şkanî be, serbar dihê nivîsandin.. wek “Ra`iyan, qa`ide, sa`id...”. Dem a ku di nîv ê nam de be û bi pît a “î, ي” re be, serbar dihê nivîsandin.. wek “Se`îd, Ra`î, Mu`îd, Mu`în, ...”. Dem a ku di nîv ê nam de be û dirêjîn be, serbar dihê nivîsandin.. wek “Te`amud, Mu`arid, Teqa`ud...”. Dem a ku di nîv ê nam de be û bi pît a “û, و” re be, serbar dihê nivîsandin.. wek “Mes`ûd, Mew`ûd, Ma`ûn, Si`ûd...”. Dem a ku di nîv ê nam de be û akinc be, serbar dihê nivîsandin.. wek “Si`r, Qe`r, Şi`r, We`ke, De`f, Bu`d...”.

Dem a ku di dawî ya peyvê de be û vekiranî be, serbar dihê nivîsandin.. wek “Sefe`e, Refe`e, Mene`e...”. Dem a ku di dawî ya nam de be û hemgir be, serbar dihê nivîsandin.. wek “Meraci`u/un, Qa`u/un, Dir`u/un...”. Dem a ku şkanî be û di dawî ya peyvê de be, serbar dihê nivîsandin û şkanî dibe wek pît a “î” wek “Da`î, Şem`î, Lem`î...”. Dem a ku di dawî ya nam de be û bi pît a “î, ي” re be, serbar dihê nivîsandin.. wek “Sa`î, Mera`î, Zîra`î...”. Dem a ku di dawî ya peyvê de be û dirêjîn be, serbar dihê nivîsandin.. wek “Sene`a, Refe`a, De`a...”. Dem a ku di dawî ya peyvê de be û bi pît a “û, و” re be, serbar dihê nivîsandin.. wek “Da`û, Şa`û, Ceme`û...”. Dem a ku di dawî ya nam de be û akinc be, serbar dihê nivîsandin wek “Rafi`, Sati`, Nafi`...”.

Hemze (ء) jî di destpêk, nîv û dawî ya nam û peyvê de vekirî, hemgir û şkanî ye. Vekirî û di destpêk a nam û peyvê de wek “Emel, Ehmed, Erd, Edeb...”. Hemgir û di destpêk a nam û pey-

vê de wek “Urdî, Ucîb, Uraqib...”. Şkanî û di destpêk a nam û peyvê de wek “Istiqrar, Isim, Iza, Izn, Illa...”. Weha em dibînin ku di destpêk a nam û peyvê de, nivîsandin a serbarê ne pêwîst e. Belê di nivê de nam û peyvê de û di dawî ya nam û peyvê de, nivîsandin a serbarê pêwîst e. Di nivê de nam û peyvê de û dem a ku vekiranî be.. wek “Se`ele, De`ebe, Re`ebe, Mu`eyyed...”. Di nivê de nam û peyvê de û dem a ku şkanî be wek “se`ime, Qa`im, Da`im, ...”. Dem a ku di nivê de nam û peyvê de be û bi pît a “î, ي” re be.. wek “Le`îm”. Di dawî ya nam û peyvê de û dem a ku akinc be.. wek “Ela`, Wefa`, Diya`, Imla`...” û di evî biwarî de bi pît a “eyn, ع” re hevpar dibe, ji ber ku ev pît jî (eyn, ع) di nivê de dawî ya nam û peyvê de weha dihê nivîsandin.

Ji bilî evê pîtê û evê nîşanê (pît a “eyn, ع” û nîşan a hemzeyê “ئ”) pît ên din ên zimanê Kurdî dikevin beramber pît ên din ên zimanê Erebî de. Belê ew beramberbûn jî li angora surîşt a zimanê Kurdî ye. Wata wek nimûne; pît a “h” ya Kurdî dikeve beramber herdu pît ên Erebî “h, ه” û “h, ح” de. Gîrekirin (şedde) jî ya ku di zimanê Erebî de he ye, di zimanê Kurdî jî de he ye. Di zimanê Kurdî de gîrekirin bi nivîsandin a du pît ên bê deng ên wek hevdu li duv hevdu dihê dîyarkirin, wek “Ellah” ku pît a “l” gîrekirî ye û wek “Muhemmed, مُحَمَّد ” ku pît a “m, م” gîrekirî ye. Herweha, tenê di dem a nivîsandin a evê pîtê û evê nîşanê de, nivîsandin a serbarê di zimanê Kurdî de pêwîst e û di rewşê û pergala din de ne pêwîst e.

Nam û peyvê biyanî yê ji bilî yê Erebî jî, gerek li angora binçînek a zimanê Kurdî bihên nivîsandin. Heger wek xwe bi zimanê Kurdî bihên xwîndin û nivîsandin, wek xwe jî bi Kurdî dihên nivîsandin. Wek nimûne.. namê “Mark, James, Robert, John, Jennifer, Oliver, Isabella, Megan, Barbara, Susan, Margaret, Sarah, Ava, Linda, ...” li angora levakirin û nivîsandin a

Kurdî, wek xwe dihên xwîndin û nivîsandin û wek xwe dimînin, ji ber ku wek xwe bi Kurdî jî dihên xwîndin û nivîsandin. Belê nam ên wek “Jacob, George, Charlie, Oscar, Alexander, Joseph, Damian, Daniel, Sophia, Patricia, Jessica, Tracy, ...” divê li angora levakirin a xwe, li angora nivîsandin a ziman ê Kurdî bihên nivîsandin. Wata dê ev nam ên jorîn, bi ziman ê Kurdî bi evî awayî bihên nivîsandin: “Jakob, Corc, Çarlî, Oskar, Aleksander, Josef, Damiyan, Daniyel, Sofiya, Patrîşiya, Jessika, Trasi, ...”.

Nam ên din ên biyanî yên ne Englîzî jî, her li angora evê binçînê dihên nivîsandin. Binçîn jî ew e, ku gerek nam û peyv bi ziman ê Kurdî bihên xwîndin û li angora ziman ê Kurdî bihên nivîsandin. Ew nam û peyv ên ku bi xwe û wek xwe bi ziman ê Kurdî dihên xwîndin jî, wek xwe bi ziman ê Kurdî dihên nivîsandin. Heger ne weha be, nam û peyv ên biyanî yên ne Erebi bi ziman ê Kurdî nahên xwîndin. Ango Kurdek nikare nam ê “George” wek levakirin a “corc” bixwîne, ji ber ku ne merc e Kurdek bi Englîzî bizanibe û ewê çaxê, dê nam ê “George” bi Kurdî wek “Ge, or, ge” bihê xwîndin û dê weha şaş bihê xwîndin.

Heger bihê gotin ku gerek nam çawa be wek xwe bihê nivîsandin, ne gotinek wird e ji ber ku ti zimanek nikare nam û peyv ên hemû zimanan li angora wan binivîse. Herweha, ne diriste jî ku em nam û peyv ên hemû zimanan li angora ziman ê Englîzî binivîsin. Peyv ên wek “democracy, communism, dictator, diplomacy, economic, socialism, ideology, imperialism, international, journalist, parliament, scenario, syndicalism, xenophobia, ...” dê li angora levakirin a xwe û nivîsandin a Kurdî weha bin: “demokrasî, kommünizm, diktator, diplomasî, ekonomîk, sosyalizm, ideyolocî, imperiyalizm, internasyonal, jûrnalîst, parliyamant, senariyo, sîndikalizm, zenofobiya, ...”. Bi evî awayî hemû nam û peyv dê li angora levakirin a xwe û şêwaz ê

nivîsandin a Kurdî bihên nivîsandin, da ku bi Kurdî bihên xwîndin. Wata encamekî weha çê dibe ku dê ew binçîn ev be:

1- Heger nam û peyv a biyanî wek xwe bi ziman ê Kurdî bihê xwîndin, wek xwe dihê nivîsandin.

2- Heger nam û peyv a biyanî wek xwe bi ziman ê Kurdî nehê xwîndin, li angora levakirin a xwe bi ziman ê Kurdî dihê nivîsandin.

3- Şirovekirin a peyvan wek xwe ye, ango dem a em peyvekê biyanî şirove dikin em wê peyvê wek xwe dinivîsin û levakirin çawa jî be ne giring e. Wek nimûne.. em dibêjin: [peyv a “pîşe” ya Kurdî bi ziman ê Englîzî “vocation” e.. peyv a “asayiş, ewledarî” ya Kurdî di ziman ê Englîzî de “security” ye] û ji bo ziman ên din jî weha ye.

4- Kurtî ya naman wek xwe dihên nivîsandin wek: “UNICEF. WFP û ... hd”. Di evî biwarî de gerek kes ê ku dixwîne, zana be û evan kurtenaman wek xwe bixwîne. Herweha, dibe em namekî weha yê kurtkirî bikin Kurdî jî û hîngê em dikarin kurtî ya wî ya Kurdî jî bi kar bihînin wek:

- Kurtkirî ya UNICEF bi Englîzî ya xwe “United Nation International Children`s Fund” e û bi Kurdî ya xwe “Dezgeh a Netewe yên Yekbûyî ya Navdewletî ya ji bo Zarokan” e û ya Kurdî bi evî awayî “DNYNZ” kurt dibe.

- Kurtkirî ya WFP bi Englîzî ya xwe “World Food Programme” e û bi Kurdî ya xwe “Bername ya Xurek a Cîhanî” ye û ya Kurdî bi evî awayî “BXC” kurt dibe.

Em nam ê Englîzî “United Nation” ê ku kurtkirî ya wî “UN” e, bi awa yê Kurdî wek “NY” dinivîsin û ew kurtkirî ya “Netewe yên Yekbûyî” ye.

Hinek nam ên biyanî he ne ku li angora şêwaz ê ziman ê wan, du pît ên dengdar di wan de li ber hevdu ne. Em evan peyvan

wek levakirin a wan bi ziman ê Kurdî dinivîsin û em li angora ziman ê Kurdî pît ên wan ên dengdar ji hevdu cuda dikin. Di evan çend nimûneyan de ji me re ew şêwaz dihê xuyakirin:

- Peyv a “Australia” em bi ziman ê Kurdî wek “Awustraliya” dinivîsin. Ev nivîsandin jî li angora levakirin a wan û nivîsandin a Kurdî ye.

- Peyv a “Caribbean” em bi ziman ê Kurdî wek “Karibbiyan” dinivîsin. Em pît a “y” dixin navber a herdu pît ên dengdar ên li ber hevdu de û em pît a “C” ya wan dikin “K” ya Kurdî, çimku levakirin a wê “k” ye.

- Peyv a “Mozambique” em bi ziman ê Kurdî wek “Mozambîk” dinivîsin.

- Peyv a “Paraguay” em bi ziman ê Kurdî wek “Paraguway” dinivîsin.

- Peyv a “Greenland” em bi ziman ê Kurdî wek “Grînland” dinivîsin.

- Peyv a “Greece” em bi ziman ê Kurdî wek “Grîs” dinivîsin.

- Peyv a “Croatia” em bi ziman ê Kurdî wek “Krowatiya” dinivîsin.

- Peyv a “Austria” em bi ziman ê Kurdî wek “Awustiriya” dinivîsin.

- Peyv a “parliament” em bi ziman ê Kurdî wek “parliyament” dinivîsin.

- Peyvek wek “Washington” a ku tê de pît a “g” nahê levakirin, di ziman ê Kurdî de wek “Waşington” dihê nivîsandin û pît a “g” jî hem dihê nivîsandin û hem dihê levakirin.

Em bi evî awayî nam ên biyanî li angora taybetmendî û şêwaz ê ziman ê Kurdî dinivîsin û ev mafekî me yê zimanvanî ye. En-glîzan jî dem a ku nam ên biyanî nivîsandine û dinivîsin, li angora şêwaz û taybetmendî ya ziman ê xwe ew nam nivîsandine

û dinivîsin. Em Kurd bi xwe jî ne kotar in (ne mecbûr in) ku em li angora şêwaz û taybetmendî ya ziman ê Englîzî naman binivîsin. Em tenê di rewş û pergal ê şirovekirinê de peyv ên biyanî wek xwe dinivîsin, ango dem a em dibêjin wata ya peyv a “kar” a Kurdî bi ziman ê Englîzî “work” e, em peyv a Englîzî “work” wek xwe dinivîsin û peyv a “work” di ziman ê Englîzî de çawa jî bihê levakirin ne giring e.

Here, were

Ev herdu peyv ên han di ziman ê Kurdî de tenê ji bo heyvêz a xizavê (fermanê) ne. Ango di rastî ya xwe ya rêzimanî de, ew di heyvêz a dem a amad, mêjîn û ayinde de bi kar nahên. Belê di ziman ê gell de (û niha di ziman ê ragihandinê de) bi awa yê “dê were kirin, dê were nik me, dê were zanîn, ...” bi kar dihê û ev şaş e. Bingeh û rastî ya evê heyvêzê jî “dê bihê kirin, dê bihê nik me, dê bihê zanîn” e, anga rastî ya kirde “bihê” ye. Weha jî xuya ye, ku ew bi evî awa yê şaş tenê di dem a ayinde de bi kar dihê. Herweha, heyvêz a “here” di ziman ê gell de bi awa yê “ez diherim, ez dê biherim” jî bi kar dihê û ev jî li angora rêziman şaş e. Rastî ya bi karhînan a kirde di evî biwarî de ji jêder a “çûyîn” e, anga “ez diçim, ez dê biçim”.

Ev şaşî di dem a kêsanê de dîyar dibe. Dem a em di hersê dem ên kêsanê de evan herdu peyvan bi kar bihînin, em dê rastî ewê şaşîyê bihên. Heger em “here” di dem a amad de bi kar bihînin dê “ez diherim” be, heger em di dem a mêjîn de bi kar bihînin dê “ez çûm” be û heger em di dem a ayinde de bi kar bihînin dê “ez dê biherim” be. Anga kirde di dem a mêjîn de dihê guherandin, kok a xwe jî winda dike, dibe kirdeyekî din û ev nabe. Em di evê kêsanê de dibînin ku di dem a mêjîn de kirdeyekî din he ye û ew jî “çûm” e, ku ew ji jêder a “çûyîn” e. Anga jêder a evî kirdeyî di dem a kêsanê de bi dem a amad û ayinde ve ne girêdayî ye û şaşî ev e, ji ber ku kok a kirde di dem a amad, mêjîn, ayinde û xizavê de yek e û divê yek be. Kirde yê “çûm” ê ku ji jêder a “çûyîn” e, di kêsan a dem a amad de “ez diçim” e, di kêsan a dem a mêjîn de “ez çûm” e, di kêsan a dem a ayinde de “ez dê biçim” e û di kêsan a dem a xizavê de “biçe, biçin” e û ev rastî ya evê pirsê ye. Di evê heyvêz a şaş a jêder a

“çûyîn” de, kok a dem a amad û ayinde bûye “her” û di dem a mêjîn de tişteki din e (çûm e).

Ji xwe di kêsan a peyv a “were” de şaşîyek yekcar mezin he ye, ji ber ku ew di ti deman de nahê kêsankirin. Ango “were” di dem a amad de nabe û divê nebe “ez diwerim” di dem a mêjîn de nabe û divê nebe “ez weriyam” û di dem a ayinde de nabe û divê nebe “ez dê biwerim”. Heta niha jî weha nebûye û em hêvîdar in ku weha nebe.

Ev taybetmendî yê han, dihêlin ziman bi xwe taybetî be û ziman ê Kurdî zimanekî taybetî ye. Peyv ên ku tenê di demek a kêsanê de bi kar dihên, nîşan a ewê taybetmendî û darabûnê (dewlemendbûnê) ne. Belê em evê saloxe ya ziman ê xwe nas nakin û ji ber evê yekê, em wê şaş û ne di cih ê xwe de bi kar dihînin. Engîz a serekîn a çêbûn a evê şaşîyê jî, nebûn a vagir ê zimanvanî ye. Vagir ê zimanvanî (zabit ê zimanvanî) jî ji alî yê zimanvanan ve, li angora surîşt a ziman bi xwe dihê danan û destnîşankirin. Heta niha jî ew vagir ji ziman ê Kurdî re çê ne bûye û ev pirs ên ku di evê perrtûkê de hatine destnîşankirin, rê li ber hebûn a ewî vagirî divekin. Herweha, hemû tekela (muhawele, attempt) yê rastkirin a ziman, ên ku me ber bi diristbûn a zimanekî petî û rast ve dibin, rê li ber hebûn a ewî vagirî divekin.

Em weha nas dikin, ku ev herdu peyv ên han (here, were) di ziman ê Kurdî de xwedî cihekî taybetî ne û ew di biwar ê heyvizandinê de taybetî ne. Taybetmendî ya wan jî ew e, ku ew tenê di dem û heyvêz a xizavê (fermanê) de bi kar dihên û di dem ên din ên kêsanê de (amad, mêjîn û ayinde) bi kar nahên. Dem a em dibînin ku peyv a “were” tenê di dem a ayinde de bi kar dihê, ji me re xuya dibe ku nerastîyek he ye. Ew nerastî jî rêzimanî ye. Rêziman bi karhînan a kirdeyekî tenê

di demekê ji dem ên kêsanê de napejirîne. Rêziman dibêje ku her kirdeyek kok a xwe he ye û ew kok, di hemû dem ên kêsanê de he ye û parastî ye. Heger weha jî nebe, ziman bi xwe dikeve bin bar ê pirsê de. Pirs jî dê ev be: çawa kok a kirdeyekî di demekê de “her” be û di demek din de “ç” be?. Di evê nimûne ya me de (ez diherim, ez dê biherim) kok a “here” di dem a amad û ayinde de “her” e, belê ev kok di dem a mêjîn de dibe “ç” ango “ez diçim, ez dê biçim” e. Kok a kirde yê ku rast bi kar dihê, di hemû dem ên kêsanê de yek e û nahê guhertin. Belê tişt ê ku hay û agah a me jê tine ye ew e, ku ev herdu peyv (here û were) du heyvêz ên dem a xizavê (fermanê) ne û ew tenê di dem a xizavê de bi kar dihên.

Yanizkirin a “an” li hejmaran û “ê” li kurtî ya naman

Amraz ê “an” hîngê li hejmarê yaniz dibe dem a ku hejmar kom be, dem a ku hejmar destnîşankirî be û dem a ku hejmar wek nivîsandin be, ango ne hejmar bi xwe be. Ew li hejmarê bi xwe yaniz nabe, ji ber ku ew bi xwe di nav levakirin a hejmarê de ye. Nimûne: “neh sêvan bihîne”.. “çend sêvan bihînim ? Nehan bihîne” û nabe em bibêjin: “9an bihîne” ji ber ku “an” a peyv a “nehan” bi xwe di nav levakirin a wê de ye. Dem a ku em dibêjin “nehan” jî, em hem hejmar a “neh” dikin kom û hem em wê destnîşan dikin. Ango amraz ê “an” di dem a nivîsandin a pîtane (herfî) de dihê nivîsandin, belê ew di dem a nivîsandin a hejmarane de nahê nivîsandin, ji ber ku “an” bi xwe ji peyvê ye û di levakirin a peyvê de ye. Dibêjin: “di sal a 2009an de...” û pêwîst nake ku ew “an” a “neh” bi hejmar a “9” ve be, ji ber ku hejmar ne pît e. Dem a ku pîtane bihê nivîsandin dê weha be: “di sal a duhezlar û nehan de...” û dem a ku bi hejmar be dê weha be: “di sal a 2009 de...” û ya rasttir ew e ku ew “di sal a duhezlar û neh de..., di sal a 2009 de ...” be.

Ev pergala ne wek nivîsandin a “em, emîn” e dem a ku “em, emîn” bi hejmarê ve dihê nivîsandin, ji ber ku “em, emîn” bi hejmarê ve girêdayî ye û pê ve dihê nivîsandin û dem a ku ew bi hejmarê ve dihê nivîsandin, pîrsek hunerî ye û pîrsek rêzimanî jî ye. Ango rast e dem a ku em “9em, 9emîn” dinivîsin, ji ber ku di biwarê rêzimanî de “em, emîn” girêdayî naverok a wata ya hejmarê ye û di biwarê durvane (şeklî) jî de pîrsek hunerî ye û ya rasttir di vir jî de ew e, ku ew wek “nehem, nehemîn” bihê nivîsandin û ew pîrs a hunerî ne pêwîst e.

Weha, ji bilî hejmar a yekê ya ku “an” pê ve nahê girêdan (û hinek jî pê ve girê didin û dikin “yekan”) hejmar ên din bi awa

yê pîtane “an” bi hemûyan ve dihê girêdan, ji ber ku hemû jî kom in. Ango ji bilî yekê, yên din; “duyan, sêyan, çaran, pêncan, şeşan, heftan, heştan, nehan, dehan, yanizdehan, duyanizdehan, sêyanizdehan, çardehan, panizdehan, şanizdehan, heftdehan, heştdehan, nozdehan, bîstan, bîst û yekê, bîst û duyan, bîst û sêyan, ...” e. Ew weha ne, dem a ku dihên destnîşankirin û destnîşankirin jî hîngê ye, dem a em dibêjin: “duyan, sêyan, çaran, ... bihîne yan pê kar bike”. Li derveyî destnîşankirin û komê, her hejmarek wek xwe; anga “du, sê, çar, ...” bêyî yanizkirin a “an” dihê xwîndin û nivîsandin.

Wata; ya rast ew e ku em weha evê pirsê bi rê bikin û em bibêjin: “Di sal a 1991 de serhildanek a cemawerî li başûr ê Kurdistanê çê bû. Piştî salekê jî, anga di sal a 1992 de, parliyamant û hukûmet a herêm a Kurdistanê hat in damezrandin.”. Anga pêwîst nake em bibêjin: “di sal a 1991ê de ...” û pêwîst nake em bibêjin: “di sal a 1992an de ...” ji ber ku weha yanizkirinek şaş e. Şaşbûn a evê yanizkirinê yanizkirinek ne di cihê xwe de ye, anga yanizkirinek weha bi xwe şaşî ye çimku tevhevî û ajawe ye.

Kurtî ya nam jî wek xwe dihê nivîsandin, ji ber ku ew di nav xwe de û wek xwe wata ya xwe dihilgire. Belê bi awayekî şaş, ne pêwîst û ne ciwan, pît a “ê” li kurtî ya naman dihê yanizkirin. Ew şaş e ji ber ku ev “ê” levakirinek din a li derveyî kurtî ya nam yaniz dike, ew ne pêwîst e ji ber ku yaniz e û ew ne ciwan e ji ber ku kurtî ya nam ji sistem a xwe diderxîne. Dem a em dibêjin: “polîtbyuro ya PDKê kombûnek saz kir” em ewê “ê” ya ku bi PDK ve hatiye girêdan bê wata û ne pêwîst bi kar dihînin. Ew “ê” ya ku li PDK hatiye yanizkirin, ji me re levakirinek şaş, watayek şaş û sistemek a şaş pêşkêş dike. Rastî ya evê hevekê jî ev e: “polîtbyuro ya PDK kombûnek saz kir”. Ew weha rast e, ji

ber ku dem a em PDK leva dikin, em ji peyv a “Partî ya...” tenê pît a “P, Pe” bi kar dihînin, em ji peyv a “Demokrat a...” tenê pît a “D, De” bi kar dihînin û em ji peyv a “Kurdistanê” tenê pît a “K, Ke” bi kar dihînin. Ango pît a dawî “K, Ke” ye û ne “Kê” ye. Heger bihê gotin ku ew “ê” ji bo nîşandan a regez ê peyv a dawî ye (Kurdistanê) dîsan şaş e ji ber ku hem di evî biwarî de regez nahê nîşandan, ji ber ku kurtkirin e û hem jî heger weha be divê ew pît a yanizkirî ne “ê” be “yê” be û bê goman weha jî şaş e, anga çî “ê” be şaş e û çî “yê” be şaş e. Em dibêjin dê “yê” be, ji ber ku dem a tu di levakirin a kurt de pît a “K” wek “Ke” dixwînî, hîngê divê “Ke” bibe “Keyê” û şaşî ya li duv şaşîyê weha çê dibe.

Di ziman ê Kurdî de levakirin a pîtan bi alîkarî ya pît a dengdar a “E,e” ye. Dem a em pît ên tak ên kurtî ya naman jî dixwînin, em wan li angora vewêjîn a ziman ê Kurdî vewêjîn dikin. Wata em kurtî ya nam ê PDK wek “Pe, De, Ke” vewêjîn dikin. Ji ber evê yekê û wek nimûne; nabe ku pît a dawî (K, Ke) bibe “Kê”. Yanizkirin a pît a “ê” li dawî ya kurtî ya naman dibe engîz a guherandin a levakirin a pît a dawî, wek çawa ku di nimûne ya PDK de pît a “K, Ke” dibe “Kê” û ev guherandin, ne li angora vewêjînkirin a pît ên ziman ê Kurdî ye.

Di encam de ji me re dihê xuyakirin, ku pît a “ê” yan her pîtek a din a yaniz, li pît a dawî ya kurtî ya nam yaniz nabe û pît ên kurtî ya her namekî bi ten a xwe dihên nivîsandin. Herweha, kurtî ya nam bi çî zimanekî jî be, wek xwe dihê nivîsandin û wek xwe dihê vewêjînkirin. Kurtî ya naman wata ji her peyvekê pîtek dihê levakirin û levakirin a pîtan di ziman ê Kurdî de xuyanî ye û ew wek xwe bê yanizkirin a pît a “ê” dihê nivîsandin. Wek nimûne.. nam ên kurtkirî yê “WHO” nabe wek “WHOyê” bihê nivîsandin.. nam ên kurtkirî yê “IMF” nabe wek “IMFê”

bihê nivîsandin.. nam ên kurtkirî yê “UNESCO” nabe wek “UNESCOyê” bihê nivîsandin. Ev yanizkirin a pît a “ê” li kurtî ya naman, hem şaşîyek rêzimanî ye û ew şaşî girêdayî şîraz a fonetîkê ye û hem jî neciwankirin e. Şîraz a fonetîkê bi awayekî serekîn bi levakirin a rêziamnî ya resen ve girêdayî ye û dem a ku levakirin şîrazkirî be, vagir û binçîn jê re he ne û dem a ku levakirin bê şîraz be, vagir û binçîn namînin û hîngê şaşî çê dibin.

Sipî û spî

Tenê li hinek dever ên kêr ên Kurdistanê ji reng ê sipî re “spî” dihê gotin û ew jî ji ber lezatî ya levakirinê ye, ango lezatî ya levakirinê dibe engîz a ku “sipî” wek “spî” bihê vewêjînkirin. Li pirranî ya dever ên Kurdistanê ji reng ê sipî re “sipî” dihê gotin. Belê nerînek a şaş a weha çê bûye û dibêje, ku pît a (i) nakeve navber a herdu pît ên “s” û “p” de û ew ên weha dibêjin, engîzê jî nabêjin û nadin xuyakirin ka ev nerîn ji kuda hatiye. Nabêjin ka çima dê pît a (i) nekeve navber a herdu pît ên “s” û “p” de. Ango engîzek a rêzimanî nadin nîşandan.

Ev nerîn bê binema ye. Ziman ê Kurdî zimanekî birrgehîn e (kîteyîn e) û me berî niha cor ên ewan birrgehan daye nîşandan û ew li angora ewan birrgehan, hem cor ê “sipî” tê de he ye ku du birrgeh in (“si” û “pî”) û birrgeh a yekem “si” ye û ya duyem “pî” ye û hem cor ê “spî” tê de he ye ku yek birrgeh e, hem jî ev herdu peyv di ziman ê Kurdî he ne û di watayê de ji hevdu cuda ne. Her yek ji ewan herdu peyv xwedî wata ya xwe ya taybetî ye, ku “sipî” reng e û “spî” ew gos e (heşere ye, insect e) ya ku dikeve ser û laş de û ji biçûk ên (hêk ên) wê re “rişk” dibêjin. Li hinek dever ên Kurdistanê ji evê gosê re dibêjin “spih, espê, spê” jî û hemû ev nam ên han ên evê gosê, li angora diyalektan bi evî awayî rast in.

Ji ewan peyv ên ku tê de pît a (i) dikeve navber a herdu pît ên “s” û “p” de jî; “sipate, sip, siper, siple, siplot, ...” in û ti binçîn tine ye weha bibêje, ku pît a (i) nakeve navber a herdu pît ên “s” û “p” de. Wata yê ewan peyv ên namhatî jî ev in: “sipate: ciddî, tak û bi ser ê xwe ye.. sip: tam û kamil e, tamam e, guruh e.. siper: mertal e, senger e, ew tişt e yê ku mirov diparêze.. siple: bê wefa ye, bê bext e.. siplot: necis e, heram e.”.

Di helbestek a xwe de ya ku li ser ala ya Kurdistanê gotiye û destpêk a wê weha ye: “Al a rengîn pîroz û xweş te hildigrim diçim bi meş ...” Cegerxwîn di beş ê duyem ê evê helbestê de dibêje:

Îro me tu kirye hembêz rojek wê bê te bikin rêz
Li ser xana li eywana roj a şadî bi xeml û xêz
Kesk û sor û zerî sipî û gewherî nîşan a zaferî
Ey xort ê Kurda silavê lê b`kin
Kesk û sor û zerî sipî û gewherî nîşan a zaferî
Ey keç ê Kurda silavê lê b`kin

Tişt ê ku baş di evê helbestê de xuya ye ew e, ku peyv a “sipî” ne wek “spî” hatiye, belê ew wek “sipî” hatiye û ya rast jî ev e. Ji xwe heger ev peyv di evê helbestê de ji “sipî” bihê guhertin û bibe “spî” dê berî her tiştî beşavend a (kêş a, qafiye ya) helbestê bihê guhertin û şkandin. Cegerxwîn malik ên evê helbest a xwe bi evî awayî saz kiriye: herdu malik ên destpêkê heşt û heşt movik in “îro me tu kirye hembêz” heşt movik in “rojek wê bê te bikin rêz” heşt movik in “li ser bana li eywana” heşt movik in û “roj a şadî bi xeml û xêz” heşt movik in. Malik a sêyem ji sê beşan e û her beşek şeş movik in “kesk û sor û zerî” şeş movik in “sipî û gewherî” şeş movik in û “nîşan a zaferî” şeş movik in. Malik a çarem ji du beşan e û her beşek pênc movik in “ey xort ê Kurda” pênc movik in û “silavê lê b`kin” pênc movik in. Peyv a “bikin” di malik a çarem de wek “b`kin” hatiye, da ku movikek yaniz (zêde) nebe. Malik a pêncem wek malik a sêyem e û malik a şeşem jî wek malik a çarem e. Helbest a Kurdî li angora rêzan a movikan – an jî birrgehan – dihat nivîsandin (û dihê nivîsandin) û di helbest a bi beşavend (kêşsaz) de, divabû movik (birrgeh) wek hev bin da ku yek ji merc ên beşavendîyê (kêşsazîyê) pêkhatî baya. Ango Cegerxwîn di evê helbestê de

peyv a “sipî” wek “sipî” bi kar hînaye û goman di evê yekê de tine ye.

Ji alîyekî din ve; peywendîyek watayîn di navber a peyv a “sip” û “sipî” de he ye, ku peyv a “sip” wata ya “gurah, tamam, kamil” dide. Ev peywendî ya han di kok a peyvê de ye ku bi xwe “sip” e. Di ziman ê Kurdî de dihê gotin: “bêhvan kes sip î sax e” ango ti nexweşî lê tine ne, bê kêmanî ye û gurah e. Herweha, ji bêhvan tiştî re jî dihê gotin: “bêhvan tişt sip î sax e” ango bê kêmanî ye, gurah e û bê ziyar e. Belê ev peywendî ya han di reng ê sipî bi xwe jî de ye, ku reng ê sipî bi xwe gurah e. Destewaje ya “sip î ...” jî, di pergala ê nêrîn (nêr) de li beramber “sip ê ...” ye û di pergala ê mêyîn (mê) de li beramber “sip a ...” ye. Belê bernam ê biyaşkirinê “î” ji bo herdu regezan bi kar dihê. Ji ber evê yekê jî, ziman ê Kurdî zimanekî watayîn e û ne tenê keresteyîn e, ji ber ku ew peyvê li angora watayê didarêje.

Wata jî keresteyîn e, watayîn e û watayîn-keresteyîn e. Ango peyv he ye wata ya wê tenê keresteyîn e, peyv he ye wata ya wê tenê watayîn e û peyv he ye wata ya wê watayîn-keresteyîn e. Peyvek wek “giyan” watayîn e, peyv wek “xanî” keresteyîn e û peyv wek “xanedan” watayîn-keresteyîn e. Ev taybetmendî ya han jî di zimanekî wek ziman ê Kurdî de he ye, belê hîne bi awayekî têr û berfireh lêkolîn li ser ne hatine encamdan û ne kevtiye ber şirovekirinek a zimanvanî de. Ji ber evê yekê jî, dibe xwîndevan ê evan peyvan bibêje; ku ev pirs a ku peyv he be watayek a watayîn bide, peyv he be watayek a keresteyîn bide û peyv he be watayek a watayîn-keresteyîn bide, pirsê zehî û deramî ye (ecîb û xerîb e). Belê ev pirs gelek senev e (ciddî ye) û gerek di dem a xwe de bihê şirovekirin.

Ka, kay, kanê, kahenê, kanî, kan

Em evan peyvan di ziman ê xwe de, ne bi awayekî rêxistî bi kar dihînin. Em wan li cih ê hev bi kar dihînin û em wan kurtkirî û sivikkirî bi kar dihînin. Goman jî tê de nîne ku her yek ji evan peyvan, cih û wata ya xwe ya taybetî di ziman de he ye. Ji xwe yek ji engîz ên ku kok û resenî ya peyvan jî pê winda dibe, nacûr dibe (xerab dibe) û tevhev dibe, windakirin a çawanî ya kok a peyvan e. Dem a ku surişt a peyvan winda dibe, kok û resenî ya peyvan jî winda dibe. Dem a ku peyv li ser ziman dikevin ber pêl ên yanizkirin, kêmkirin, sivikkirin û kurtkirinê de, kok û resenî ya peyvan winda dibe. Ev hemû di ziman ê Kurdî de çê bûne û çê dibin, ji ber evê çendê peyv ên me ne cihgîr in û ne akincî ne. Weha dihê xwaztin ku em di ziman ê xwe de li kok û resenî ya peyvan bigerin. Kok û resenî ya peyvan jî di nav zarav ên ziman ê Kurdî de peyda dibin, di ziman ê Avêsta yê kevn de peyda dibin û di ziman ên girêdayî ziman ê Kurdî de peyda dibin. Ziman ê Avêsta yek ji jêder ên zimanvanî yên dîrokî, suriştî û kokane yê ziman ê Kurdî ye.

Di evê pirsê de ev peyv ên han “ka, kay, kanê, kahenê, kanî, kan” dikevin ber pirsînê de, da ku gerin a her yekê ji wan li angora wata ya xwe, surişt a xwe, kok û resenî ya xwe bihên dîyarkirin.

- **Ka:** ev beşekî peyvê ye û gihanek e. Wata ya pirsînê dide, bi heger ve girêdayî ye û ast û çawanîyê dide nîşandan. Dem a em dibêjin: “here binere ka ew hatiye yan ne hatiye” em “ka” di rewş a pirsînê û lêgerînê de bi kar dihînin. Dem a em dibêjin: “tu nizanî ka ew çiqasî zîrek e” em “ka” di rewş a çawanîyê de bi kar dihînin. Ev gihanek di ziman ê Kurdî de giring e, ji ber ku watayê di hevekê de gurah dike û girêdanê di nav hevekê de

diparêze.

- **Kay:** ev peyv nîşan a giya yê hişk e, ku dem a giya yan şînayî hişk dibe, reng ê wî zer dibe û dibe kay û di ziman ê gell de her “ka” ye, belê di rastî ya xwe ya dîrokî de “kay” ye. Dem a ku kesek dibêje: “ewê kayê bide ser hev û kom bike” ew kes peyv a “kayê” wek peyvek a mê bi kar dihîne, ku ew peyv a “kay” bi kar dihîne û amraz ê dîyarkirin a regez ê mê “ê” pê ve girê dide (kay a me). Belê giranî ya levakirin a peyv a “kay” hîştîye ku ew bibe “ka” û kêmkirin a pît ên peyv an di ziman ê Kurdî de he ye.

- **Kanê:** di ziman ê gell de wek “ka” û “kanî” jî dihê gotin. Wata ya evê peyvê “bide” ye. Ew bi ten a xwe bi kar dihê û dem a tu dixwazî kesek tiştê bide te, tu dibêjî “kanê” û ew kirdeyekî dem a xizavê ye. Hinek caran di hevekê de wek: “kanê ewê per-tûkê bide min” jî dihê gotin, ku tê de herdu wata bi hevdu re bi kar dihên. Herdu wata ango hem peyv a “kanê” û hem “bide” di yek hevekê de bi kar dihên û bi evî awayî peyv a “kanê” bi kirde yê nav hevekê re alîkar e. Ev pergal ê weha yê zimanvanî di ziman ê Kurdî de he ye, ku di hevekê de kirdeyek ji kirde yê bingehîn re dibe alîkar wek: “were evî kevalî bibîne” ku kirde yê dem a xizavê “were” bi kirde yê “bibîne” re alîkar e. Alîkarî ya kirdeyekî bi kirdeyekî din re di heman hevekê de, bi xwe pirsek a zimanvanî ya giring e û gerek lêkolîn a xwe ya taybetî jî he be.

- **Kahenê:** wata ya evê peyvê “li kuda, li kuderê” ye. Wata ew amraz ê pirsînê ye. Ew jî di ziman ê gell de her wek “ka” bi kar dihê. Di hevekê de û li hinek dever ên Kurdistanê, wek “kahenê ew li kuda ye” jî bi kar dihê, ku di evê hevekê de herdu wata bi hevdu re di yek hevekê de bi kar dihên. Ango peyv a pirsînê “kahenê” û peyv a pirsînê “kuda” dikevin hevekekê de. Ev hevparî ya han a di yek hevekê de, dihêle bihê xuyakirin ku ev peyv ên han ji hev re alîkar in.

- **Kanî:** wata ya evê peyvê çavîk a avê ye, ku ew çavîk ji bin xakê yan di çiya, mêrg û newalan de dizê û bi cih e. Ev peyv di navgell de bi wata ya “kanê, bide” bi kar dihê, belê wata ya wê ya bingehîn çavîk a avê ye. Cegerxwîn gotiye:

Welat ê min tu yî bûk a cîhanî hemû bax û biheşt û mêrg û kanî

- **Kan:** cih ê ku tûnc (me`den) lê he ye kan e û tûnc bi xwe jî kan e. Ji bo ku herdu wata ji hevdu bihên cudakirin jî, ji cih ê bi tûnc re “kan” dibêjin û ji tûnc bi xwe re “kanza” dibêjin, herçende ku peyv a “kanza” nîşan a cih ê kan e. Kanza ango cih ê zayîn a kan e. Kan bêtir di bin xakê de ye û tê de dîziran a (keşf a) tûncan dihê kirin, ango mirov tê de li tûncan digerin. Dibe bihê gotin ku peywendî ya peyv a “kan” bi evan peyv ên destnîşankirî re tine ye, belê bi herdu peyv ên “kanê” û “kanî” re, di kok a xwe de hevpişk in. Pît ên “ê” û “î” yên ku li kok a “kan” yaniz dibin, watayinî cuda çê dikin. Her pîtek ku li peyvekê yaniz bû, watayek a din dide ewê peyvê. Wek nimûne jî.. yek ji wata yên peyv a “kana” bişkok e.. yek ji wata yên peyv a “kane” stûr û dijwar e.. wata ya peyv a “kanê” ango bide.. wata ya peyv a “kanî” ango çavîk a avê ye.. yek ji wata yên peyv a “kano” zirz û dijwar e û yek ji wata yên peyv a “kanû” xurt û hêzdar e.

Di ziman ê petî de gerek her yek ji evan watayan (peyv) di cih ê xwe yê rast de û li angora levakirin a xwe ya rast bi kar bihên. Kanî ji kanê cuda ye û ka ji kay cuda ye, herweha ka û kanî ji hevdu cuda ne. Tevhevkin a peyvyan watayan bê bine-ma dike û wan ji rêzan a rêzimanî diderxîne.

Xew e, nivistin e, rakevtin e yan razan e ?

Bê goman xew e û xewn jî ji xewê ye. Xew nam e û jêder a wê “xewtin” û “xewîn” e. Em dikarin bibêjin ku bi başûrî “xewtin” e û bi bakurî “xewîn” e û ji hevdu ne cuda ne. Jêder a xewtin an xewîn di dem a amad de “ez dixewim” e, di dem a mêjîn de “ez xewiyam, ez xewtim” e, di dem a ayinde de “ez dê bixewim” e û di dem a xizavê de “bixewe, bixewin” e. Rastî ya evê peyv û watayê ev e û ew e ya ku gerek ji bo wata ya xewê bi kar bihê. Heger em bixwazin wata ya xewê pêşkêş bikin, gerek em peyv a “xew” bi kar bihînin, ji ber ku peyv ên din (nivistin, rakevtin, razan) wata ya xewê nadin. Her yek ji evan peyvvan (nivistin, rakevtin, razan) wata ya xwe ya taybetî he ye û ti yek ji wan jî bi xewê ve ne girêdayî ye. Peyv a “xew” bi xwe jî kok a jêder a xewtinê yan xewînê ye û tenê ew (xew) nîşan a xewînê ye.

Di diyalekt a Badînî de “nivistin” ji bo xewê bi kar dihê û nivistin ne xew e. Nivistin çûyîn a nav nivînê ye û nivîn cih ê nivistinê ye, ango cih ê çûyîn a nav nivînê ye û ne xew e. Dem a dihê gotin “Azad nexweş e û di nav nivînê de ye” wata Azad nexweş e, li ser doşekê ye û oberî (lihêf) li ser e û ser ê wî li ser balîfê ye. Her nivînek jî bi giştî ji doşek, balîf û oberîyekê pêk dihê. Ji peyv a “nivîn” re “livîn” jî dihê gotin û livîn ji bo evê watayê şaş bi kar dihê, ji ber ku livîn bizav e (hereket e). Ji xwe ew ên ku ji nivîn re dibêjin livîn, bi xwe pît a “n” kirine “l” û bi evî awayî tevhevî di levakirin a du peyv ên cuda de çê bûye, ku yek ji wan “nivîn” e û ya din “livîn” e. Dem a tu bibêjî “ez dilivim” ango tu dibêjî “ez bizavê dikim” belê dem a tu dibêjî “ez dinivim” ango tu dibêjî “ez di nav nivînê de me”. Ev peyv a han (nivistin) li dever a Badînan ji bo wata ya xewê bi kar dihê û ev şaşî ye. Di diyalekt a başûrî de peyv a “nivistin” wek “nûstin” jî bi kar dihê

û nûstin jî ji bo wata ya xewê şaş e. Di diyalekt a başûrî bi xwe jî de “xewtin” ji bo wata ya xewê rast e. Hêjayî gotinê ye, ku kok a peyv a nûstin “nûs” e û di ziman ê Kurdî de wata ya “nûs” çesipîn e (leziqîn e). Başûrî bi xwe dibêjin: “pê we nûsa” wata “pê ve çesipî, pê ve leziqî”. Rastî ya evê pirsê jî ew e, ku kok a “nûs” a ku ji bo nivistinê bi kar dihînin, bi xwe “niwis” e û “niwis” di levakirinê de bûye “nûs” û ev tevhevî çê kiriye. Kok a “niwis” bi xwe jî her “nîvis” e û ew kok a jêder a nivistinê ye.

Ji xwe peyv a “rakevtin” a ku jêder e û wê jî bi wata ya xewê bi kar dihînin, şaşîyek mezintir li duv e, ji ber ku ev peyv a han (rakevtin) ne xew e, belê wata ya “li xakê” dide. Dem a tu dibêjî “ez rakevtî me” wata tu dibêjî “ez li ser xakê dirêjkirî me” yan “ez li ser xakê kevtî me”. Dem a tu dibêjî “ez dê birakevim” (rakevim) wata tu dibêjî “ez dê xwe bidim ser xakê”. Ango rakevtin rewş a beramber rabûnê ye. Rakevtin ji pêşgir a “ra” û peyv a “kevtin” a ku jêder e pêk dihê û ev herdu beş jî ne girêdayî xewê ne. Pêşgir a “ra” nîşan a bilindîyê ye û “kevtin” jêder a kirde yê kevînê ye. Kok a peyv a kevtinê “kev” e û gerek ew weha jî bihê paraztin. Wata peyv a “rakevtin” jî wata ya xewê nade, ew wata ya xewê ya taybetî he ye û ew jî kevtin a ser xakê yan ser her cihekî din e.

Peyv a “razan” bi ti awayî wata ya xewê nade û ew xwedî watayek a xewê ya taybetî ye. Belê li bakur ê Kurdistanê û li rojava ya Kurdistanê, peyv a razan ji bo wata ya xewê bi kar dihê û ev şaşî ye. Peyv a razan ji beş ên “ra” û “za” pêkhatî ye. Beş ê “ra” bi bilindîyê ve girêdayî ye, ango ji rabûnê ye û beş ê “za” kirde yê dem a mêjîn a nêzîk e û ji jêder a zayînê ye. Ev peyv a han (razan) a ku jêder e, bi taybetî ji ewê jinê re dihê gotin dem a ku ew dikeve ber zanê de û dirazê. Kirde yê “dirazê” yê ku ji jêder a “razan” diderkeve, wata ya ewê rewşê (rewş a ber zayînê) di

dem a amad de dide xuyakirin. Dem a em dibêjin “ev jin raza ye” herwek em dibêjin “ev jin kevtiye ber zanê de” ango êdî di nav nivînan de ye û dê bizê. Ji ber evê yekê peyv a “razan” ji wata ya xewê dûr e û jê re jî nabe. Ev peyv a han (razan) berê li dever a zozan ên bakur ê Kurdistanê, ji pergala û rewşa a jin a li ber zanê (li ber zayînê) re dihat gotin. Ev wata ya han a peyv a “razan” a ku berê li dever a zozanan bi kar dihat, watayek a resen û di cihê xwe de ye. Wata ya peyv a “razan” a ku pergala û zanê û zayînê dide nîşandan, watayek a rast a rêzimanî ye.

Peyvên nivistin, rakevtin û razan wata yê anahîdar (meczî, metaphorical) ên xewê didin û wata ya xewê bi xwe nadin. Peyvên anahîdar jî di zimanê Kurdî de bi kar dihên û cihinî din digirin û watayînî din didin, ji ber ku vagirê rêzimanî tine ye û ji ber ku akincîbûn a di biwarê watayan de tine ye.

Xew ew rewşa û pergala e yê ku ji girtin a herdu çavan xav û bi hêminî dest pê dike û tê de mirov hinekî ji cîhan a derve dihe dabbirîn, da ku hinek endamên laş bivehesin û hinek kiryarên dinên keresteyî û giyanî di nav laş de bihên encamdan. Xew pêwîst e da ku guherînê pêdivê li nik mirov çê bibin. Mirov heta niha jî nikare bi ser rewşa û pergala xewê de zal bibe û sûdê jê bibîne, belê dê rojek bihê û dê tê de mirov bikaribe xewê ji bo gihijtina gelek armancan bi kar bihîne û dê ew armanc bêtir hizir bin. Niha mirov dikarin tenê di rewşa û pergala hişyarîyê de hizir bikin, belê dê rojek bihê û dê tê de mirov bikaribin di rewşa û pergala xewê jî de hizir bikin. Hîngê dê xew û hişyarî bi hevdu re bikevin rajedarî ya mirovatîyê de.

Nijwe

Wek çawa ji nivîsandînê re rêziman pêwîst û giring e û ew binçînan ji peyivînê re didane, weha jî ji nivîsandînê re rênivîs pêwîst û giring e. Rênivîs di zimanê Kurdî de wek vekît, peyvek çêkirî ye û wata ya nijweyê (imla`, dictation) dide. Belê peyv a “nijwe” di ferheng a Mehabad a Gîwî Mukrîyanî de hatiye û ew bi awayekî sip û gurah resen e û wata ya rênivîsê dide.

Nijwe ne peyvek çêkirî ye û ew di zimanê Kurdî de wata ya bingehîn a rênivîsê ye. Me berê daye xuyakirin, ku heta peyvek resen di zimanê Kurdî he be, gerek em peyvên çêkirî bi kar nehînin, an jî em peyvan ji nik xwe ve çê nekin. Gerek em bikaribin xwe hinekî mandû bikin (biwestînin) û li peyvên resen bigerin. Peyv a “nijwe” peyvek resen e û evê wata ya destnîşankirî dide, ji ber ku ew ji bo ti watayek a din bi kar ne hatiye û bi kar nahê. Tenê peyv a “nijînîn” nêzîkî peyv a nijwe ye û nijînîn bi xwe jî girêdayî nijweyê ye, ji ber ku yek ji wata yê peyv a nijînîn rastkirin a peyvê ye. Nijwe (imla`, dictation) bi xwe jî nivîsandîn a rast a peyvê ye û rêzan a nivîsandînê ye. Ev peyv û kiryarên xwe, di hemû zimanan de giring in û xwîndin li ser bingeh a wan dihê avakirin. Ango heger nijwe û kiryarên xwe ne rast bin, xwîndin jî rast nabe. Mebest ji kiryarên nijweyê jî ew e ku nijwe ne tenê peyvek e, belê ew kom a rê û rêzanên nivîsandînê ye û bi karê nivîsandînê ve girêdayî ye. Ango ji nijweyê re rê û sertag (prensîp) he ne û nivîsandîn û rêziman bi xwe jî, bi wan rast an şaş dibin. Heger ew rê û sertagên nijweyê li ber çav bihên girtin û di nivîsandînê de bi cih bibin, dê nivîsandîn rast û xawên be. Sertagên nijweyê jî pirs û babetekî bi serê xwe ye û gerek bi serê xwe bihê şirovekirin.

Nijwe nivîsandîn a rast a ziman e û ew ji nivîskar dixwaze, ku

rastî ya ziman di biwar ê rêziman û rênivîsê de biparêze. Ji ber evê çendê, peywendî ya navber a nijweyê û rêziman gelek serêkîn e. Di nijweyê de dihê xwaztin ku nivîskar bê şaşî û li angora rêziman, beş ên peyv ên ziman binivîse, hevekê bi awayekî rast binivîse û pît ên nav peyv û hevekan di cih ê xwe yê rast de bidane û pît û kît ên wan jî rast binivîse. Nivîskar jî di vir de ne tenê wêjevan û helbestvan e, belê her nivîskarekî ku ziman dinivîse nivîskar e. Hemû xwîndevan ên dibistan ên seretayî, amadeyî, awarteyî û zankoyan nivîskar in û hemû fêrdar (mamosta) û xwedî yên gewahname (şehade) yên nizm û bilind nivîskar in. Dem a ku nivîskar beş ên peyv ên ziman û hevek ên ziman jî dinivîse, nijwe dibe çavdar û li awa yê nivîsandin a wî/wê dinere. Weha nijwe rêziman diparêze û rêziman nijweyê destnîşan dike. Rêziman destûr a ziman e û nijwe parêzar ê evê destûrê ye. Ev peywendî ya giyanî û keresteyîn a navber a rêziman û nijweyê, di nivîsandinê de xuya dibe.

Ji alîyekî din ve, wek çawa sirêm a (bandor a) rêziman li ser levakirin a beş ên peyvê û hevek ên ziman he ye, weha sirêm a nijweyê li levakirin a beş ên peyvê û hevekan he ye, ji ber ku levakirin derkar û derhînar a deng û awa yê beş ên peyvê û hevekan e, bi tevî ku levakirin di rêziman de ne pirsek serêkîn û bingehîn e. Me dabû xuyakirin ku levakirin a şîrazkirî ji rêziman re giring e û levakirin a bê şîraz ji rêziman re ne giring e. Levakirin a şîrazkirî girêdayî zanista fonetîk a ziman e û levakirin a bê şîraz girêdayî awa û şêwaz ên corane yên peyivîn a gell e. Peywendî ya navber a nijweyê û levakirin a şîrazkirî jî ew e, ku levakirin deng e û nijwe awa ye. Ango deng bi nijweyê nivîsandin e, yan nijwe nivîsandin a pît ên ziman e, ku ev pît peyv û hevekan dirist dikin. Weha jî, dibe ku nijwe rast be yan ne rast be. Rastî û nerastî ya nijweyê di nivîsandinê de dîyar dibe û

girêdan a giyanî ya navber a nijweyê û nivîsandinê ev e.

Tiştê giring di nijweyê de, ne durvê peyvê û hevekan e, belê rastî ya nivîsandinê a peyvê û hevekan e, herçende ku durvê peyvê di nivîsandinê de girêdayî ciwanî ya nivîsandinê ye. Ciwanî ya nivîsandinê jî pêwîst e û ew jî beşekî zanînê a nijweyê ye. Bi giştî jî hîne ev zanîn (zanînê a nijweyê) bi awayekî têrê û berfireh ne hatiye pêşkêşkirinê û tekela yê (pîkolên) ku he ne, tenê di çarçêweyê nasandinê a nijweyê de ne û ji her zimanekî re awayê nijweyê hatiye danan. Me di vir de daye nasînê ku “nijwe nivîsandinê a rast a ziman e”. Hatiye nasînê jî ku “nijwe binçînê û bingehên nivîsandinê û girêdanê a peyvê” û ev nasînê ne têr e, ji ber ku nijwe ne girêdanê a peyvê e, girêdanê a peyvê yek ji karên rêzimanê e. Belê nijwe tenê girêdayî rastî û ciwanî ya nivîsandinê a ziman e. Ev rastî ya nivîsandinê pîtê, kîtê, peyvê, destewajeyê û hevekê bi xwe ve digire û li ser rêzimanê a nivîsandinê çavdar e. Ango ji bilî nivîsandinê a rast a pîtan, kîtan û peyvê, nijwe li rastî ya rêzimanê jî dinere û napejirîne ku di biwarê rêzimanê de şaşî hebin.

Dem a ku nivîsandinê çêbûye, nijwe jî çêbûye. Dihê gotinê ku nivîsandinê di hezarê çaremê berî zayînê de çêbûye û heta niha kevintirîn nivîsandinê, nivîsandinê a Mîxî (Mismarî) ye. Nivîsandinê a Mîxî jî bi Somerîyanê ve hatiye girêdanê û şehrîstanî ya Somerîyanê gelek kevne e. Heger dekin (tekist) ên Mîxî di hezarê çaremê berî zayînê de hebûbin, wata ew e ku dîrokê a nivîsandinê kevintir e. Her çawa be, nijwe piştî nivîsandinê hebûye, ji ber ku nijwe rêzimanê a nivîsandinê ye. Herweha, bi nijweyê ya rast re xwîndinê jî rast dibe. Wata peywendî ya nijweyê û xwîndinê bi hevdu re he ye û gelek serekîn e.

Bi evî awayî em dibînin ku peywendî ya rêzimanê, nijwe, xwîndinê û nivîsandinê bi hev re he ye û yekbûnê ew a din nabe. Sirêma

a (bandor a) evan herçar bingeh ên zimanvanî li ziman he ye û ew ji ziman re wek stûn ên malê ne. Wek çawa binçîn û bingeh ên rêziman dihên fêrkirin, gerek weha binçîn û bingeh ên nijweyê jî bihên fêrkirin, ji ber ku nijwe alî yê din ê rêziman e û ew rêziman gurah dike. Heger rêziman xwîndin û nivîsandinê dike xwedî binçîn, nijwe xwîndin û nivîsandinê dike xwedî sivîk (seqf, roof). Di her avayîyekê jî de, binçîn û sivîk pêwîst û giring in, wek çawa stûn û korzî giring in.

Aya ev şêwaz ê hevguherîn a pît û dengan rast e ?

Weha hatiye mezendekirin (texmînkirin) ku herdu pît ên “eh” ên ku di peyvekê de bihên ber hevdu, cih ê xwe didin pît a “a” û li şûn a “eh” pît a “a” dihê danan. Her çiqas ku ev pirs a han xwedî ya hinek rastîyê jî be, belê ew nabe binçîn ji ber ku di evê pirsê de, rastî yan nerastî ya kok û wata ya peyvê he ye. Herweha, ev pirs a han girêdayî levakirin a bê şîraz e û rêziman evê levakirinê ji xwe re nake bingeh a lêkolînê. Di evê bareyê de hinek nimûneyan jî dihînin û dibêjin; peyv a “çehv” dibe “çav” û peyv a “xwehr” dibe “xwar” û peyv a “şehr” dibe “şar” û peyv a “kehr” dibe “kar” û peyv a “behr” dibe “bar” û peyv a “çehr” dibe “çar” û ...hd.

Di evê bareyê de pirsek zimanvanî he ye û hay a evan mezendedaran jê tine ye. Ew pirs jî ew e, ku wek nimûne peyv a “çehv” a ku bi xwe “çav” e û levakirin a wê di nav gell de dihê guherandin û dibe “çehv” bi xwe şaşîyek zimanvanî ye û ew şaşî, ji ber levakirin a bê şîraz e. Ji xwe di ziman ê gell de û li gelek dever ên Kurdistan ne “çehv” jî ye. Li gelek dever ên Kurdistan “çav” wek “çe`v” dihê gotin, ango li şûn a pît a “h” pît a “eyn” a Erebi bi kar dihînin. Tenê levakirin a şaş dibe engîz a evê şaşîyê, herweha pirs a sivikkirin a levakirin a peyvê dibe engîz a hebûn a evê şaşîyê. Ev peyv bi xwe “çav” e û “çehv” awa yê levakirin a şaş a peyv a “çav” e. Wek nîşe (têbînî) jî, gerek bihê gotin ku peyv a “çehv” di serdem ên kevn de wata ya “girover, bazineyî” daye, belê di evê serdemê de nema ji bo evê watayê bi kar dihê. Ango “çehv” bi xwe jî peyvek din e û wata ya “bazineyî, girover” dide, belê niha bi peyv a “çav” re hevdij bûye. Ew pirs a ku hay a evan mezendedaran jê tine ye ew e, ku her yek ji evan peyvan xwedî watayekê ye, ne ku hevguherîn a pîtan di

wan de çê bûye.

Di nimûne ya peyv a “xwehr=xwar” de ev pirs a han ji me re baştir dihê xuyakirin, ku ev herdu peyv her yek ji wan watayekê dide û ne yek peyv in. Di rastî ya zimanvanî de peyv a “xwehr” wata ya “ne rast” dide û peyv a “xwar” kirde yê jêder a xwarinê yê dem a mêjîn a nêzîk e. Em dibêjin: “ez dixwim, min xwar, ez dê bixwim”. Ango peyv a “xwehr” ji bo wata ya “ne rast” e û peyv a “xwar” ji bo wata ya kes ê ku xwarin an tiştê xwariye. Ango peyv a “xwehr” rewş e û peyv a “xwar” kirde ye. Di evê bareyê de peyv a “xwarê” ya ku lîn e (zerf e, adverb e) jî dikeve nav evê tevhevîyê de, belê ev peyv wek lîn “xwarê” ye û ne “xwar” e. Ango dem a em dibêjin: “ez çûm xwar” şaş e û rastî ya wê ew e ku em bibêjin: “ez çûm xwarê”.

Herdu peyv ên “şehr” û “şar” jî ji hevdu cuda ne, ku wata ya “şehr” bajêr e, belê wata ya “şar” ser ê sedê ye û lod a çinîne ye û watayek a wê ya din jî he ye û ew jî hilorbûn e. Hilorbûn a agir e. Em dibêjin “agir şariya” wata “agir hilor bû” û bilind bû.

Peyv a “kehr” jî wata ya çêlîk a bizinê dide, belê “kar” îş û kirde ye, anga di rastî ya zimanvanî û ferhengî de “kehr” û “kar” ji hevdu cuda ne. Rastî ya evê pirsê jî weha ye, ku peyv a “kar” ji bo wata ya îş û kirde ye û wata ya çêlîk a bizinê “kehr” e. Herdu peyv ên “behr” û “bar” jî ne wek hevdu ne, ku “behr” wata ya beş e û wata ya “bar” ew giranî ye ya ku dihê hilgirtin.

Mezende ya din a ku dihê kirin ew e, ku herdu pît ên “ih” di peyvê de cih ê xwe didin pît a “î” wek: “cih=cî, sih=sî, mih=mî, bih=bî, rih=rî, tirih=tirî, hd ...”. Di rastî ya xwe ya rêzimanî de herdu peyv ên “cih, cî” ji bo war bi kar hatine, belê “cih” war ê biçûk e û “cî” war ê mezin û berfireh e. Ji ber evê yekê jî peyv a “cîhan” bi kok a “cî” hatiye gotin, ji ber ku cîhan cih ê mezin û berfireh e. Peyv a “cî” di dekin ên (tekist ên) mîxî (mismarî)

de ji bo wata ya war bi kar hatiye, belê war ê hoz û neteweyekê daye nîşandan, wata warekî mezin ku nîşan a welat e. Ango herdu peyv ên “cih, cî” ji hevdu ne û herdu jî he ne, belê her yek ji wan watayekê dide. Heta di ziman ê gell jî de peyv a “cî” bi war ve hatiye girêdan, dem a ku destewaje ya “cî û mesken” bi kar hatiye.. “welat ê me Kurdistan e cî û mesken ê me Kurdistan e”. Belê peyv a “cih” ji bo deverek a biçûk a destnîşankirî ye.

Peyv a “sih” jî ya ku hejmar e, ji peyv a “sî” ya ku endamekî laş ê mirov e cuda ye. Peyv a “sî” wata ya herdu sî yên ba dide, ku mirov ba bi rê ya wan derbasî nav sîngê û laş dike û ew beşekî giring û serekîn ê awîz ê henasedanê ye. Herweha ew ji peyv a “sîber” cuda ye û peyv a “sîber” di nav gell de li hinek deveran wek “sîk” dihê gotin. Dem a ku bûye “sî” jî, bi yekcarî tevhevî di watayê de çê bûye. Ango peyv a “sih” hejmar e, peyv a “sî” beş ê serekîn ê awîz ê henasedanê ye û “sîber” ew reşayî ya wêne yê mirov e ya ku dem a ronahî he be ew jî çê dibe.

Peyv a “mih” a ku wata ya pez a sipî dide, di levakirinê de û ji bo sivikirinê bûye “mî” belê peyv a “mî” di ziman de wata ya lawaz û bê desthilat dide. Peyv a “bih” a ku li hinek deveran “bî” ye, bi xwe “bîhok” e û di peyv a “bîhok” de hem “bih” çê bûye û hem “bî” çê bûye. Ji ber evê yekê jî hinek dibêjin “bih” û hinek dibêjin “bî”. Dîsan di bin bar ê sivikirin a levakirinê de weha bûye. Belê ev peyv bi xwe “bih, bihok, bîhok” e û ne “bî” ye û peyv a “bî” anga jin a ku mîrê wê miriye yan jî mîrê wê jin a wî miriye. Peyv a “rih” jî ji peyv a “rî” cuda ye, ku wata ya peyv a “rih” mû yê rû û çenê ye, belê wata ya peyv a “rî” girêdayî kiryar a rîtinê ye û “rî” bi xwe kok a jêder a rîtinê ye. Herçiqas ku peyv a “tirî” ya resen li hinek deveran wek “tirih” dihê gotin, belê peyv a “tirî” ji bo wata ya evê mîweyê rasttir e

û peyv a “tirih” wata ya reh ên tirş ên tirî dide. Ew reh ên tirş bi tirî re şîn dibin û nam ê wan “tirih” e.

Weha em dikarin nas bikin, ku ev peyv ên han xwedî wata yê cuda ne, bi tevî ku hevguherîn jî he ye. Belê hebûn a hevguherînê di ziman ê Kurdî de cih ê xwe yê taybetî he ye û ne weha bê ser û bê ber e û ne weha bê binçîn û bê bingeh e. Yek ji taybetmendî yê serekîn ên ziman ê Kurdî jî ew e, ku dibe her birrgehê watayekê bide. Wek nimûne.. peyv a “jî” a ku di ziman de amraz ê kişanê ye, ew bi xwe jî kok a peyv a “jîn” e, belê dem a ku bûye “jîn” ji peyv a “jî” dûr kevtiye û watayek a din daye û dide. Peyv û birrgeh a “ma” kok û jêder a çendîn peyvan e, belê dem a ku pîtek lê yaniz bûye watayek a din daye. Wata ya peyv a “ma” berî her tiştî girêdayî dayikê ye, belê ku bûye “man” ango dem a ku pît a “n” lê yaniz bûye, êdî watayek a din daye. Dem a ku pît a “ş” li peyv û birrgeh a “ma” yaniz bûye, peyv a “maş” çê bûye û maş corekî nîskê ye, yan dehnekî wek nîskê ye û lib a wê ji lib a nîskê mezintir e.

Belê tiştê giring û yê ku gerek em nîşe bikin (têbînî bikin) ew e, ku kok a peyv û birrgeh ên ji corê duyem – ango pîtek dengdar û pîtek bê deng û pîtek bê deng û pîtek dengdar – gelek caran dibin jêder û bingehê peyvê ziman û dibin bingeh a parzadî ya ziman. Heger di ayinde de lêkolînê di evê bareyê de li ser zimanê çêbibin, dê encamê hêja û bi nirx biderkevin.

..Ek a ye, ne ..eke ye / ..inî ye, ne ..ine ye

Berê jî me pirs a amraz ê nenas ê ku wek “..eke” dane nîşandan û amraz ên regez ên ku lê yaniz dibin, bi kurtî dabû nîşandan, belê em dixwazin evê pirsê hinekî berfirehtir şirove bikin û tenê tişteki giring di bare ya evê pirsê de bibêjin.

Ev amraz ên nenasînê “..ek, ..ekê, ..ekî” wek çawa naskirî ye, hem wata ya tişt ên tak didin, hem wata ya mê û nêr in û hem jî nenasîn e. Amraz ê nenasînê “ek” jî bi nam, jêder, pergala û hinek caran rewşê ve jî dihê girêdan. Wek nimûne.. peyv a “karek” nam e û amraz ê nenasînê “ek” pê ve ye û peyv a “kevtinek” jêder e û amraz ê nenasînê “ek” pê ve ye. Peyv a “nexweşek” pergala e. Peyv a “sorek, reşek, ...” rewş e û kêma bi kar dihê û cihê bi karhînan a xwe he ye. Belê amraz ê “..ek a” wata ya tak û mê ye wek: “jinek a xwîndevan, kiçek a jêhatî, Kurdistanek a azad, malek a mezin, zevîyek a fireh, mizgînîyek a xweş, ...”. Di rêziman de nabe em “jinek a, xebatek a, malek a, zevîyek a,” bikin “jineke, xebateke, maleke, zevîyeke” ji ber ku amraz ê ku di zimanê Kurdî de û di evê peyvê de mê dide nîşandan “a” ye û ne “e” ye. Ev pît a “e” di zimanê Kurdî de çî gerinê jî bibîne, ew gerin a amraz ê mê nabîne. Belê weha dane xuyakirin ku ew amraz ê mê ye û ev şaşîyek rêzimanî ye. Amraz ê “a” yê ku wata ya mê dide, ji peyvê cuda dihê nivîsandin. Ango amraz ê “ek” bi peyvê ve ye û takbûn û nenasîn a peyvê dide nîşandan, belê amraz ê “a” ji peyvê cuda ye û ji ber evê yekê jî “..ek a” ye û ne “..eke” ye. Herweha, amraz ê “..ek a” dibê “..yek a” dem a ku pît a dawî ya peyv a wî dengdar be wek: “hêmayek a aşkira, kanîyek a gund, nimûneyek a xwîndinê, ...”. Ango ev amraz ê han tenê wek “..ek a” ye, wata amraz ê “a” bi nîşan a tak û nenasînê “ek” ve nahê girêdan.

Dem a ku em dibêjin “yekê ji min re got...” peyv a “yekê” nenas e û tak e û mê ye. Dem a ku em dibêjin “yekî ji min re got...” peyv a “yekî” nenas e û tak e û nêr e. Ev pirs a han jî taybetî ye, ji ber ku bi peyv a “yekê” nenas ê mê yê tak dihê destnîşankirin û bi peyv a “yekî” nenas ê nêr ê tak dihê destnîşankirin. Ev pirs a han hizrek a şaş direne (jê dibe). Ew hizr a şaş dibêje; ku peyv a “yek” tenê amraz ê “ê” diwergire. Em di evê taybetmendiyê de dibînin, ku peyv a “yek” hem amraz ê “ê” yê mêkirinê diwergire û hem jî amraz ê “î” yê nêrkinê diwergire.

Amraz ê “ek ê” yê ku dem a “ê” jê cuda be, wata ya tak û nêr dide û ew bêtir li dever a Badînan bi kar dihê û gelek jî rast e. Dibêjin: “Azad kurrek ê çalak e, welatek ê ciwan, mêrek ê xebatkar, ...”. Dem a ku salixdan di hevekê de he be, amraz ê “ê” yê ku wata ya tak û nêr dide, ji peyvê cuda dihê nivîsandin. Ango amraz ê “ek” bi peyvê ve ye, belê amraz ê “ê” ji peyvê cuda ye, ji ber evê yekê jî “..ek ê” ye. Dem a ku amraz ê “ê” bi peyvê ve be, wata ya mê dide, ango hîngê regez ê peyvê yê mê dide nîşandan wek: “gulê bêhn bike, li malê be, li Kurdistanê bijî, ...”. Amraz ê “..ek ê” dibe “..yek ê” dem a ku pît a dawî ya peyv a wî dengdar be wek: “xanîyek ê biçûk, birayek ê serkevtî, pemboyek ê pirr, ...”. Dem a ku “ekê” be, ango “ê” bi “ek” ve û bi peyvê ve be, nenas û mê ye wek: “defterekê bikirre, xameyekê bide min, derfetekê bibîne”.

Amraz ê “..ekî” wata ya tak û nêr dide û ew weha bêtir li bakur û rojava ya Kurdistanê bi kar dihê. Dem a ku ev amraz wek “..ekî” be, ango amraz ê “î” bi peyvê ve be, tenê wata ya tak û nêr û nenasînê dide. Dibêjin: “mêrekî got, welatekî tije hormezî, derdekî giran, derîyekî vekirî, ...” û di evan nimûneyan de amraz ê “..ekî” tenê wata ya tak û nêr û nenasînê dide. Amraz ê “..ekî” dibe “..yekî” dem a pît a dawî ya peyv a wî dengdar be

wek: “derîyekî şîn, melayekî zana, gezoyekî şîrîn, ...”. Di nimûne yên “mêrekî got, derîyekî biveke, derdekî ji ser milan birake, ...” de “mêrekî, derîyekî, derdekî” nenas in.

Amraz ê “..inî” wata ya komê dide. Dem a ku ev amraz wek “..inî” be, ango amraz ê “î” bi peyvê ve be, wata ya komê û biyaşkirinê dide û nenasîn e. Dibêjin: “gelîyinî ku pirr kûr in, deştinî ku gelek fireh in, çiyayinî ku pirr bilind in, xwîndevaninî ku herdem dixwînin, ...” û di evan nimûneyan de amraz ê “..inî” wata ya komê, biyaşkirinê û nenasînê dide. Amraz ê “..inî” dibe “..yinî” dem a ku pît a dawî ya peyv a wî dengdar be wek: “hêvîyinî geş, nizayinî Xwedayî, mizgoyinî bi sûd, ...”.

Tişt ê giring ê ku gerek di evê pirsê de bihê gotin ew e, ku bi karhînan a amraz ê “..eke” wek amraz ê nenasînê yê tak ê wata ya mê şaş e, ji ber ku amraz ê “a” bi levakirin a şaş a bê şîraz bûye “e”.

Herweha, bi karhînan a amraz ê “..ine” wek amraz ê nenasînê yê komê şaş e. Şaşî ya evê pirsê ji me re di şîkarî ya peyvê bi xwe de dîyar dibe. Heger me got: “mahîneke reş” di peyv a “mahîneke” de ev beş he ne: mahîn – ek – e, ku “mahîn” namekî mê ye û “ek” amraz ê nenasînê yê tak e û “e” yê ku ne amraz ê mê ye, belê weha dane nîşandan ku ew amraz ê mê ye û gotine ku ew amraz ê mê ye. Em dizanin ku amraz ê mê di ziman ê Kurdî de “a” ye û ji peyvê cuda ye û “ê” ye dem a ku bi peyvê ve be. Ango “mahîneke” bi xwe “mahînek a ...” ye. Ev “e” ya han bi xwe “a” ye û di bin bar ê sivikirin a levakirinê de bûye “e”. Dem a ku bûye “e” jî bê wata bûye, ji ber ku “e” di ziman ê Kurdî de watayinî din dide û wata ya amraz ê mê nade.

Amraz ê “..ine” jî bi şîkarîyekê ji me re dihê xuyakirin ka çawa şaş e. Dem a em dibêjin: “jinine jêhatî” di peyv a “jinine” de ev beş he ne: “jin – in – e” û jin nam e û “in” amraz ê komê ye û

“e” yê ku ti watayê nade û tenê li angora “..eke” hatiye levakirin û sazkin. Belê dem a em dibêjin: “..inî” bi kêmanî amraz ê “î” wata ya tekezî û biyaşkirinê dide. Paşê jî, heger “e” nîşan a mê be, ew bi amraz ê “..in” ê komê re çî dike ? Em dizanin ku di heyvêz a komê de ne mê dîyar e û ne nêr dîyar e. Ango “jinine” bi xwe “jininî” ye. Weha jî wata ya hemû beş ên peyvê cih ê xwe digire û ti beş tê de bê wata namîne. Pirs a ku di “..eke” de fonîm a “e” nîşan a mê be şaş e, ji ber ku “e” di ziman ê Kurdî de ne nîşan a mê ye.

Heger bihê gotin; ku “..eke, ..ine” ji alî yê gell ve hatine û dihên bi karhînan, ne gotinek wird e û ne di cih ê xwe de ye, ji ber ku gell rêziman û surîşt a ziman nizane. Amraz ê “..eke” ne resen e û ew bi xwe “..ek a” ye, herwek çawa amraz ê “..ine” ne resen e û ew bi xwe “..inî” ye. Paşê jî, heger “..eke, ..ine” ji alî yê gell jî ve bi kar hatibin û bi kar dihên, ew li angora rêziman û surîşt a ziman ê Kurdî şaş in. Dibe ev heyvêz wek diyalekt bi kar bihê, belê wek rêziman şaş e ku bi kar bihê.

Di pirs a nenas a kom de heyvêz a “..ina” jî he ye wek: “mêrina ji min re got in..., jinina ji me re got in...” belê kengî pirs a nenas a kom “inî” ye û kengî “ina” ye, pirs û lêkolînek a din e.

Pirsek a din a girêdayî evî babetî ew e, ku amrazekî wek “en” kirine amraz ê komê yê pirs a nasîn û nenasînê û nimûneyek a weha di bare ya wê de belav kirine, ku bi ti awayî ne li angora surîşt a ziman ê Kurdî ye. Ew nimûne jî ev e: “hespine min en qenc hebûn”.. ku şaşî yê evê hevekê kujek in. Ji xwe peyv a “hespine” li angora heyvêz a watadar a peyvê “hespinî” ye, herwek çawa morfîm a “en” di ziman ê Kurdî de “ên” e û peyv a “hebûn” bi xwe jêder e û di evê hevekê de wek kirde bi kar hatiye, ku rastî ya nivîsandin a evî kirdeyî jî “he bûn” e.

Di encam de xuya dibe, ku gerek ev pirs a han – pirs a nas û ne-
nas di ziman ê Kurdî de – ji nû ve bihê şirovekirin û di lêkolînek
a taybetî de bihê pêşkêşkirin.

Taybetmendîyek a peyv a hevgir

Yek ji tabetmendî yên surîşt a ziman ê Kurdî yên giştî, hebûn a peyv a mîvin (hevgir) an peyv a pêksaz e. Di peyv a mîvin (hevgir, murekkeb, compound) de bi kêmanî û bi awayekî serekîn, du peyv bi hev ve girêdayî ne, belê ew girêdan ne bê binema û binçîn e. Wek çawa naskirî jî ye, dem a ku du peyv mîvinî (hevgirî) hevdu dibin watayek din – watayek nû – çê dibe. Ev mîvinî û hevgirî ya han, li angora pêwîstî ya watasazîyê hatiye hafirandin û dihê hafirandin. Watasazî jî, li kêlek a rêziman û dengsazîyê, astek ji ast ên ziman e. Ji ber ku ev salix (hevgirî ya peyvan) di ziman ê Kurdî de he ye, êdî diristkirin û sazkirin a peyvan jî bê vagir (bê zabit) û bê ti sînor dihê encamdan. Belê ji evê pirsê re vagir û sînor jî he ne.

1- Di ziman ê Kurdî de bi giştî; amraz ên serekîn “a, ê, û” ji bo diristkirin û sazkirin a peyv a mîvin (hevgir) bi kar nahên û bi vajîyî (eksî) evê yekê, ev amraz di dem a hebûn a peyv a hev-gir de dihên ladan û renkirin. Heger em li destewaje ya “gul a sor” a ku di hevgirî ya xwe de dibe “sorgul” binerin, em dê evê yekê bibînin. Em dê bibînin ku amraz ê “a” hatiye ladan, da ku herdu peyv ên “gul” û “sor” hevdu bigirin û bibin “sorgul” û di kiryar a evê hevgirîyê de, peyv a yekem dibe duyem û peyv a duyem dibe yekem. Bê goman jî, ne di hemû pergala ên sazkirin a peyv a hev-gir de peyv a duyem dibe yekem û peyv a yekem dibe duyem û ev ne merc e. Heger em li destewaje ya “masî yê mar, masî yê wek mar” a ku dibe “marmasî” binerin, em dê evê yekê bibînin. Ango em dê bibînin dem a ku peyv a hev-gir ji du peyvan hatiye diristkirin, amraz ji destewajeyê hatiye ladan, renkirin û havêjtin. Nimûne ya “reşmal” a ku ji “mal a reş” hatiye û nimûne ya “reşmar” a ku ji “mar ê reş” hatiye jî,

weha didin xuyakirin. Di nimûneyekê wek “yar ê/a can” de ya ku dibe “canyar” jî weha ye, herçende ku beş ê “yar” ê evê peyvê paşgir e, belê ew di evê nimûneyê de peyv e û em dizanin ku pirranî yan hemû paşgir gerin a peyvê jî dibînin. Paşgir a “dar” hem peyv e û hem paşgir e, ku li angora heyvêz a peyvê dihê xuyakirin ka ew gerin a paşgir dibîne yan jî bi xwe beşekî peyv a hevgir e. Wek nimûne jî.. di peyv a “namdar, navdar” de “dar” paşgir e û wata ya nam ê kirdedar dide, belê “dar” di peyv a “sipîndar” de wata ya darê dide û beşekî evê peyv a hevgir e, ku peyv a “sipîndar” ji pêkhat a “dar a sipîne” ye. Ango “dar a sipîne” bûye peyv a hevgir a “sipîndar”. Di hinek peyv ên weha de yê ku nîşan a daran in, peyv a “dar” dikeve destpêk a peyv a hevgir de û dibe pêşgir wek: “darçinar, darberrû, darkinêr, ...” ango “dar a çinarê” bûye “darçinar” û “dar a berrûyê” bûye “darberrû” û “dar a kinêrê” bûye “darkinêr”. Ango pît a “a” hatiye havêjtin.

Peyv a hevgir ji du peyvên û bêtir pêk dihê, belê bi giştî ne ji amraz ên “a, ê, û” pêk dihê. Di pêkhat a peyv a hevgir de amraz ên “a, ê, û” tine ne û ew peyv ên ku hevgirî ya wan ji evan amrazan pêk dihê, çêkirî ne û goman tê de nîne ku dibe peyv a wan a resen he be yan jî şaş bi kar hatine. Li ser peyv ên çêkirî yê ku dibe wata yê wan ên resen he bin, em nimûne ya peyv a “lêveger” pêşkêş dikin, ku peyv a “lêveger” a ku ji amraz ê “lê” (yan peyv a “lê”) û peyv a “veger” pêk hatiye, di ziman ê Kurdî de “pîryam” e û pîryam kirdedar e û pîryamî nam e (nam ê jêder e). Şîkarî ya peyv a “pîryam” ew e, ku kok a “pîr” tê de ye û naskirî ye ku kes ê pîr ji gell re lêveger e. Morfîm a “yam” a ku bi peyv a “pîr” re hatiye, wata ya taybetî dide, ango “pîr ê taybetî” yê ku ji hemû gell re rêber e. Peyv a resen a ku wata ya “mûteqa`id, retired” dide, di ziman ê Kurdî de “wereştad” e,

belê peyv a “xanenişîn” çê kirine û amraz ê “e” xistine navber a peyv a “xan” û peyv a “nişîn” de. Bi giştî jî; ev peyv ên hev gir nam û jêder in.

2- Amraz ên kişanê yê bingehîn “li, ji, bi, di, ...” û amraz ê peywendîyê “û” peyv a hev gir saz nakin. Amraz ên “li, ji, bi, di, ...” û amraz ê peywendîyê “û” bi peyvê ve nahên girêdan û nabin beşekî peyv a hev gir, ji ber ku serbixwe ne û her di ziman ê Kurdî de serbixwe bûne. Heger evroj em dibînin ku ev amraz (li, ji, bi, di, ...) û amraz ê peywendîyê “û” bi peyvê ve dihên girêdan, em şaşîyek mezin destnîşan dikin. Şaşî ye dem a ku em “jiber, ligel, bibêr, ...” binivîsin û rastî ya evan destewajeyan “ji ber, li gel, bi bêr, ...” e. Di evan nimûneyan de: “min xwe ji ber baranê da alî, ez li gel wî/wê çûm bakur, wî yadgarî ya xwe bi bêr hîna” ji me re xuya dibe, ku amraz ên kişanê yê bingehîn “li, ji, bi, di, ...” di ziman ê Kurdî de serbixwe dihên nivîsandin û bi peyvê ve nahên girêdan. Ji ber evê yekê jî, amraz ên kişanê “li, ji, bi, di, ...” nikarin peyv ên hev gir dirist bikin û peyv ên hev gir bi wan saz nabin.

Ka werin em li peyvek a çêkirî ya hev gir a wek “jilîholêrakirin” binerin, ku di hinek nivîsandinan de hatiye! Kurdan ticarî weha ne gotine û weha nabêjin. Ew ên ku peyvek wek “jilîholêrakirin” çê kirine, mebest a wan “rakirin a ji holê” bûye, ku bê goman “rakirin a ji holê” Kurdî ye û wata ya wê ya serekîn “vebirrîn, qirrkirin” e. Di evê heyvêz a şaş de em amraz ên “ji, li” dibînin ku ticarî di peyv a hev gir a resen de nahên. Herweha, ticarî peyv a hev gir bi evî awayî nahê sazkin. Berê jî me da xuyakirin, ku ev hêş a han (ev êş a han) a ku li ziman ê Kurdî kevtiye, ji başûr ê Kurdistanê hatiye û li başûr ê Kurdistanê çê bûye. Peyv ên wek “dengûbas, miştûmirr, kelûpel, demûçaw, reşûrût, karûbar, hatûço, tarûmar, danûstan, guftûgo, ...” li

başûr hatine çêkirin û ev şîraz a (sistem a) şaş a diristkirin a peyv ên hevgir, li başûr hatiye danan û engîzek a sazkirin a bi evî awayî ya peyv a hevgir ew e, ku ew li angora heyvêz a ziman ê Erebi hatiye danan. Di ziman ê Erebi de peyv a “qeme`e” ya ku bi Englîzî “suppress” e yek peyv e û wan xwaztine ku peyv a Kurdî ya beramber evê peyv a Erebi jî yek peyv be û weha ew peyv a Kurdî kirine “jiliholêrakirin”. Ango berî her tiştî, peyv a “jiliholêrakirin” li angora ziman ê Erebi hatiye heyvizandin. Gelek peyv ên weha li angora heyvêz a ziman ê Erebi hatine danan û hîne jî dihên danan, belê peyv ên weha ne li angora surîşt a ziman ê Kurdî ne. Mixabin ku bê hizir û bê lêkolîn, beş ên din ên Kurdistanê jî – beş ê bakur û rojava – lê dinerin (li evê heyvêz a weha ya şaş dinerin) û jê fêr dibin. Sosretek mezin e ku mirov ji şaşîyê fêr bibe.

Li başûr peyv a “pêkvejîyan” çê kirine, ku wata ya wê di ziman ê Kurdî de “hevjîyar” e. Belê dîsan li angora ziman ê Erebi çê kirine, çimku peyv a “hevjîyar” di ziman ê Erebi de yek peyv e (te`ayuş) û di ziman ê Englîzî de “coexistence” jê re dibêjin. Destewaje ya “jîyan a pêk ve” ku ya rasttir “jîn a pêk ve” ye, kirine “pêkvejîyan” û amraz ê “ve” kujtine, çimku amraz ê “ve” di evê peyv a çêkirî de, ne ji kok a peyvê ye. Ji bilî evê şaşîyê, şaşîyek din a watazasî jî kirine, dem a ku wata ya “jîyan” û “jî-yar” tevhev kirine û ev jî babetekî din e. Heger gelekî pêwîst jî baya, bi kêmanî gerek destewaje ya “jîyan a pêk ve, jîn a pêk ve” li angora binçîn a me ya destpêkê “pêkjîyan” baya, heger “hevjîyar” jî nebaya. Ev destewaje yê weha li angora binçîn a ku me da dîyarkirin çê nabin, ji ber ku destewaje yê ku amraz ên “a, ê, û” di wan de he ne, ev amraz dihên ladan û renkirin.

3- Weha jî hatiye naskirin, ku di peyv a hevgir de fonîm û amraz ên wek “a, e, i, o” gerin a gihanekê dibînin û du peyvyan hevgirî

hevdu dikan. Ev pirs a han rast e, belê ne pirsek cihgîr e û di biwar ê zimanvanî yê suriştî de – wata di biwar ê surişt a ziman de – ne akincî ye. Ew fonîm ên ku bi xwe amraz in û dikevin navber a du peyvan de û gerin a gihanekê dibînin û peyv ên hevgir çê dikan, tenê fonîm ên “e, i, o” ne. Belê amraz ê “a” bi giştî evê gerinê nabîne û peyv a hevgir çê nake. Fonîm “a” bi yekcarî şaş e ku di navber a du peyv ên hevgir de bihê, ji ber ku “a” di ziman ê Kurdî de amrazekî serbixwe ye û wata yê xwe yê cihgîr he ne. Wek nimûne.. peyv a “serabin” a ku tê de amraz ê “a” du peyvan hevgirî hevdu dike, bi xwe wek “serobin, serebin” rast e. Kurd dibêjin “serobinî hev bû, serobino bû”. Peyv a “seredan” a ku bi rê ya amraz ê “e” bûye peyvek a hevgir, bi xwe wek “serdan” rasttir e, belê “seredan” jî ne şaş e, ji ber ku weha ew li angora surişt a ziman ê Kurdî ye. Peyv a “cengewer” a ku wê wek “cengawer” bi kar dihînin, şaş e ji ber ku “e” ji bo qebekirinê bûye “a”. Ew fonîm a “e” ya ku dikeve navber a du peyvan de, ne di hemû pergala de pêwîst e, ji ber ku me di destpêkê de dît ku di peyv a “sorgul” de em nabêjin “soregul” herçiqaş ku dibe hinek weha jî bibêjin. Belê “soregul” şaş e û rastî ya wê “sorgul” e. Bi tevî evê yekê, peyv he ne ku bi rê ya evan fonîman “e, i, o” bûne û dibin hevgir û bi taybetî jî peyv ên wek hev, wek: “rasterast, zîrezîr, nalenal, hinohino, ...” ku bi amraz ê “e, o” dibin hevgir. Pît a “i” ya ku serwaz e (amraz ê ku gerin a serwazê dibîne) dibe ku bikeve navber a du peyvan de û wan bi hevdu ve girê bide (bike hevgir) wek: “Kurdistan, dayînistan, arcimend, pêşîniyar, ...”. Ev peyv a dawî (pêşîniyar) wek “pêşîniyar” an “pêşinyar” dibêjin û rastî ya wê ya watasazî “pêşîniyar” e. Şîkarî ya wê jî “pêş-în-i-yar” e. Di evê şîkarîyê de “pêş” wata ya pêşî û pêşkêşkirinê dide, amraz ê “în” ji bo jêder e – ango ji bo ku peyv a “pêş” bike “pêşîn” – û amraz ê “i” ser-

waz e û gerin a gihanekê û rewanîyê dibîne, ku peyv a “pêşîn” û peyv a “yar” hevgirî hevdu dike û peyv û paşgir a “yar” wata ya hez û daxwazê dide. Kom a wata yê evê peyv a hevgir (pêşîniyar) dibe wata ya pêşkêşkirin a dîd û nerînekê.

4- Destewaje yê “li yek, di yek, bi yek, ji yek, ...” ên ku bûne “lêk, têk, pêk, jêk ...” êdî weha bûne peyv. Ango dem a ew bûne “lêk, têk, pêk, jêk ...” ew bûne peyv û ku ew bûne peyv, ew êdî ne amraz in û beşdarîyê di sazîkirin a peyv a hevgir de dikin. Em bersiv a peyivbûn a “lêk, têk, pêk, jêk...” jî ji ayinde re dihêlin, ji ber ku evroj hîne intellegensiya ya ziman tine ye û ji ber evê yekê, dibe ku peyivbûn a wan nehê pejirandin.

Peyvek a hevgir a wek “lêkdan” ji du beş ên peyvê pêk dihê, ku beş ê yekem “lêk” e û beş ê duyem “dan” e. Peyv a “têkdan” jî weha ye. Di nimûneyekê wek “pêkhatin” de, beş ê yekem ê evê peyv a hevgir a ku jêder e “pêk” e û beş ê duyem “hatin” e, ku beş ê “hatin” bi xwe jî ji “hat” û “in” pêkhatî ye û “hat” kirde ye û “in” amraz ê diristkirin a jêder e. Belê peyvek a hevgir a wek “pêkhatin” ji du beşan pêkhatî ye, ku beş ê yekem “pêk” e û beş ê duyem “hatin” e. Hebûn a amraz ê “in” di beş ê “hatin” de binçîn a me ji kar naxe, ji ber ku di evê peyv a hevgir de ev amraz ji kok a peyvê ye. Peyvek wek “jêkvebûn” di şîkarî ya xwe de ji “jêk” û “vebûn” pêkhatî ye, ku amraz ê “ve” yê di peyv a “vebûn” de ji kok a peyv a “vebûn” e, ango ew di evê peyvê de ne amrazekî serbixwe ye, ew bûye ji kok a peyvê. Ango “vebûn” peyv e û peyv a “jêk” jî pê ve hatiye girêdan, da ku watayek a din çê bibe. Çimku xuyanî ye ku “jêk” bi ten a xwe çî watayekê dide û “vebûn” bi ten a xwe çî watayekê dide, belê dem a ku herdu hevgirî hevdu dibin watayek a din didin. Ev peyv ên weha (lêk, têk, pêk, jêk, ...) wek peyv a hevgir nam û jêder in û dem a ku bi kirde re yan wek kirde bi kar dihên, bi

ser ê xwe dihên nivîsandin û bi ti peyvê re nabin hevgir wek: “ev herdu otomobîl lêk kevt in.. ev rêkevtin a han têk çû.. em bi hev re pêk hat in.. rêkevtin a me pêk hat.. ew jêk dûr bûn ...”. Dem a ku “lêk, têk, pêk, jêk” di evan nimûneyan de nam û jêder bin weha ne: “lêkkevtin a du otomobîlan, têkçûn a rêkevtinê, pêkhatin a wan a bi hev re, pêkhat a rêkevtinê, jêkdûrbûn a wan a ji hev/hevdu”.

5- Amraz ê “lê” yê ku ji “li wî/wê” ye, amraz ê “jê” yê ku ji “ji wî/wê” ye, amraz ê “pê” yê ku ji “bi wî/wê” ye û amraz ê “tê” yê ku ji “di wî/wê ... de” ye, ...” bûne peyv dem a ku bûne “lê, jê, pê, tê, ...”. Ji ber evê yekê; dem a em dibêjin “lêzan” em peyvek a hevgir pêşkêş dikin, ku ev peyv ji “lê” û “zan” pêk hatiye. Em dikarin bibêjin ku “lê, jê, pê, tê, ...” bi peyvan ve dihên girêdan û dikarin peyv a hevgir saz bikin, ji ber ku ew di pêkhat a xwe de êdî peyv in. Dem a ku ev amraz ji pergala û derevê “li, ji, bi, di, ...” diderkevin û dibin “lê, jê, pê, tê, ...” û dibin peyv, dikarin peyv a hevgir saz bikin. Nimûne yên wek “lêxistin, jêhatî, pêzanîn, têgihjî, têbînî, ...” ji me re peyvên hevgir didin dî-yarkirin.

Di vir de pirsek he ye ku ne hatiye gotin û ew jî ew e; aya dem a ku amrazên kişanê “li, ji, bi, di, ...” dikevin derevê “lê, jê, pê, tê, ...” de, dibin morfîm û peyv? Em bersiv a evê pirsê jî ji ayinde re dihêlin, ji ber ku di evê dem a niha de nahê pejrandin; çimku wek me got; hîne tiştêk bi namê intellegensiya ya zimanîne ye.

Hevgirî ya “lê, jê, pê, tê, ...” bi peyvên din re, li ser bingeh a sazkirin a nam û jêderê û li dem a ku bi kirde re (di hevek a kirdeyî de) bi kar dihên, bi serê xwe dihên nivîsandin wek: “lêxistin ne karekî pêwîst e.. Ferhad kesekî jêhatî ye.. pêzanînên te ciwan in.. têgihjîtin a waneyê fer e.. têbînî yên te gir-

ing in” û di evan nimûneyan de peyv ên “lêxistin, lêzan, jêhatî, pêzanîn, têgihjtin, têbînî” nam û jêder in û “lê, jê, pê, tê” bi peyvê ve girêdayî ne û hevgerî peyvê ne. Belê di hevek a kird-eyî de “lê, jê, pê, tê” serbixwe dibin wek: “wî baş lê xist.. min perrtûkek jê xwazt.. em pê çûn bazarê.. tiştêk tê de tine”. Li ser pirs a “tê” jî, me berî niha şirovekirin daye ku em sê caran “tê” wek hev bi kar dihînin û ev şaş e. Di watayekê de “tê” bi xwe kirde yê “dihê” ye, di watayekê de “tê” ji destewaje ya “tu dê ...” ye û di watayek a din de “tê” ji “di wî/wê ... de” ye. Ev “tê” ya ku dibe “têk” jî, ji “di yek de, di êk de” ye.

Kar û kir e, êdî “ker” ji kuda hatiye ?

Naskirî ye ku di ziman ê Kurdî de paşgir xwedî wata ye. Ango ew hem peyvek a xwedî wata ye û hem jî paşgir e. Ji xwe divê paşgir – û her weha jî pêşgir – xwedî wata be, ji ber ku beşdarîyê di watasazîyê de dike û ew beşekî giring ê watasazîyê ye. Hemû paşgir ên ziman ê Kurdî peyv ên xwedî wata ne, belê mixabin ku heta niha ev pirs hilawistî maye û ti lêkolîn li ser ne hatine encamdan. Heta paşgîrek a wek “van” a ku dibe hizir bihê kirin ew bê wata be, wata ya wê he ye. Paşgir a “van” wata ya parêzê dide û ne tenê paşgîrek weha ye ku nam ê kirdedar dirist dike. Dem a em dibêjin “kesekî şoreşvan” mebest a me ew e ku ev kes şoreşê diparêze, dem a ku em dibêjin “kes ê dergehvan” mebest a me ew e ku ev kes derî yê malê yan derî yê her cihekî din diparêze. Ango paşgir hem bi wata ye û hem jî wata ya wê di cih ê xwe de ye yan jî divê wata ya wê di cih ê xwe de be û paşgir û pêşgir wata yê xwe didin peyvê. Heger ku pêşgir û paşgir bihên nasandin jî, divê bi awayekî rast û di cih ê xwe de bihên nasandin. Paşgîrek a wek “lan” wata ya cih dide, belê ne cihekî wek hemû cihan e. Ne cihekî wek “geh” e. Paşgir a “lan” wata ya cih ê paşa dide, wata ya cihekî bi paye dide. Dem a em ji cih ê şêr re dibêjin “bêşelan a şêr” mebest a me “erş ê şêr e” anga “lan” cih ê ku “erş, throne” e destnîşan dike, cih ê ku ne wek ti cihekî din e destnîşan dike. Cihekî mezin û bi mezinayî destnîşan dike.

Peyv a “ker” a ku di ziman ê Kurdî yê gell de wek paşgir bi kar dihê, mebest jê ew e ku kirinê bide nîşandan. Pirs ew e çima dê kok, wata û peyv a “kir, kirin” bibe “ker” ? Bê goman ev pergala girêdayî pirs a yanizkirin, kêmkirin û guherandin a bê vagir û bê şîraz a ku di ziman ê Kurdî de çê dibe, ku ev pergala di destpêkê

de di nav gell de çê dibe, çimku gell surîşt a rêzimanî ya ziman ê xwe nas nake. Dem a pirs bihê kirin; ti peywendî ya watayîn di navber a “kir, kirin” û “ker” de he ye ? Dê li angora rêziman bersiv ew be, ku ti peywendî di navber a wan de tine ye. Peyv a “ker” di ziman ê Kurdî de ji alî yê watayê ve û wek pîrsek semantîk, ajelek e ku jê re guhdirêj dihê gotin, belê ne keroşk e. Ew ajel e yê ku bar lê dihên barkirin û bêtir gundî wî/wê bi kar dihînin. Dibe bihê gotin ku pît a “k” ya peyv a “ker” a ku wek paşgir bi kar dihê, sivik e û weha ew nabe wata ya guhdirêj, belê ev bersiv di ziman de ne zanistî ye. Ziman dakariyê bi peyv a heyî re dike û li mezende û gomanan nanêre. Rast e ku pît a “k” di ziman ê Kurdî de du dengên diderxîne, ku yek ji wan sivik e û yek ji wan giran e yan jî yek tenik e û yek stûr e, belê di peyv a “ker” de pirs ne tenê girêdayî pît a “k” û levakirin a wê ye. Di evê peyvê de (ker) ya ku ji sê pîtan pêk dihê, dûrî ya ji wata ya “kir, kirin” he ye û ew watayek a din dide, ku ew wata ne girêdayî kirde yê “kir, kirin” e. Pirs ev e. Ev peyv hemû bi ser hev de dûrî wata ya “kir, kirin” e û dûrî wata ya “kar” jî ye. Wata ev peyv nikare bibe paşgir a ku wata ya kar û kirinê dide. Ji herdu peyv û paşgir ên “kar, kir” re jî wata yê ji hevdu cuda he ne, ku peyv û paşgir a “kar” wata ya kar ê ku dihê kirin dide û ew kar cor ên xwe he ne. Ango “kar” nîşan a xebatê ye, belê ne nîşan a xebitînê ye. Belê peyv û paşgir a “kir” wata ya xebitînê (action) dide. Ji ber evê yekê dem a em dibêjin “hesinkar” mebest a me destnîşankirin a ewî kesî ye yê ku kar ê wî yê hesin e. Ango hesinkar ew kes e yê ku kar ê girêdayî hesin dike. Weha jî peyv a hesinkar dibe nam ê kirdedar, ji ber ku ew wî kesî destnîşan dike yê ku kar ê hesin dike. Dem a em dibêjin “karkir” jî em saloxe yê kirinê didin kesekî/ê ku bi kar dirabe. Ji ber ku peyv û paşgir a “kir” wata ya xebitîn û karkirinê dide.

Pirs ew e; peyv û paşgir a “ker” di ziman ê Kurdî de çi watayê dide ? Ji bilî wata ya ku me di nav evî babetî de da xuyakirin – ku ew ajal ê guhdirêj e – peyv a “ker” bi pît a xwe ya tenik jî ve, evan watayan dide û rastî ya wê ya zimanvanî ev e:

1- Li angora tenikbûn a pît a “k” yan sivikbûn a wê, wata ya qelş a zirav û biçûk dide. Dem a ku di dîwarekî de qelş çê dibin, dibêjin ev dîwar ker bûye û di rastî ya xwe ya zimanvanî de ev wata ya han – an ev peyv a han a bi evê watayê ve – ne “ker” e belê “kerih” e. Dem a ku di pêst (çerm) jî de kerih çê dibin, wata qelş ên biçûk û zirav çê dibin, dibêjin “kerkerî” bûye û gerek bigotana “kerihkerihî” bûye. Belê ji ber ku peyv a “kerih, kerihkerihî” li ser ziman giran e, sivik kirine û tenê “ker, kerkerî” gotine û dibêjin. Peyv a “kerih” a ku wata ya qelş a zirav û biçûk dide, kurt kirine û bûye “ker” û ku weha jî kirine tevhevî di biwar ê watayê de çê bûye. Pêst jî dibe kerihkerihî – wata kerih tê de çê dibin – dem a ku nexweşîyek a pêst he be yan jî ji ber kar û sirê mên (bandor ên) surîştî kerihî dibe.

2- Peyv a “ker” wata ya parçe dide û li angora rastî ya wata ya zimanvanî, ew “kerin” e belê kurt kirine û bûye “ker”. Li şûn a ku bibêjin “kerinekî bide min” gotine “kerekî bide min”. Di vir jî de pirs girêdayî yanizkirin, kurtkirin û guherandin a kît, pît û peyv e, ku ev kiryar di nav ziman ê gell de çê dibin. Ango “kerin” hatiye kurtkirin û bûye “ker” û pê re ev tevhevî çê bûye.

3- Dem a em dibînin ku peyv a “kerî” wata ya colê dide – wata ya “qetî, herd” dide – em nas dikin, ku ev peyv a han di watayê de girêdayî parçe yê beş e yan beşekî ji tiştêkî ye. Wek nimûne.. dem a ku destewaje ya “kerî yê pez” dihê gotin, mebest beşekî pez e ku ew beş ji çend mihan pêk dihê yan jî beşekî ji çend pez ên din destnîşan dike.

Weha em dibînin ku ev peyv a han di hemû qonax ên xwe

yên watayîn de, girêdayî wata ya parçe û beş e. Belê di her pergalekî de (di her halekî de) taybetmendî ya xwe ya watasazî he ye; ku di wata ya qelşbûn a tiştêkî de “kerih” e, di wata ya parçeyekî ji tiştêkî de “kerin” e û di wata ya parçeyekî wek beş de “kerî” ye. Peyv a “ker” di hemû evan qonaxan de, wek hev hatiye bi karhînan û pê re tevhevîyek mezin di biwar ê watayê de çê bûye.

Weha jî em dibînin, ku peyv a “ker” dûrî wata yên “kar, kir, kirin” e û ji ber evê yekê şaş e ku ew di peyvê de ji bo evan watayan bi kar bihê. Ango dem a em dibêjin “karker” em şaş dikin û rastî ya wê “karkir” e. Dem a em dibêjin “zarîker” em şaş dikin û rastî ya wê “zarîkar” e. Herweha “şiroveker” şaş e û “şirovekar” rast e û dem a ku şirove di rewş a kirinê de be “şirovekir” e. Paşgir a “kar” xebatê, kar û îş dide nîşandan û paşgir a “kir” xebitînê û karkirinê dide nîşandan. Peyv û paşgir a “kar” nîşan a xebatê ye, belê peyv û paşgir a “kir” nîşan a xebitînê ye, ku “kar” nam e û “kir” kirde ye. Dem a ku paşgir a “kir” bi peyvê ve dihê girêdan, nam ê kirde yê kirinê dihê nîşandan û dem a ku paşgir a “kar” bi peyvê ve dihê girêdan, tenê nam ê kar dihê nîşandan.

Peyv û paşgir a “kar” – wek peyv û paşgir a “wer” – pêşgir jî ye, ango hem pêşgir e û hem paşgir e wek: “karyar, karsaz, karmend, kardan, karvan, karzan, ...” û pirs a ku peyvek hem pêşgir be û hem paşgir be jî, babetekî din e.

Peyv û pêşgir a “hil”

Ji me re hat xuyakirin ku pêşgir û paşgir, dibin beşekî peyv a ku pê ve dihên girêdan û bingeh a evê girêdanê wata ye. Tiştê giring û serekîn di peyv a bi pêşgir de jî, jêderbûn e. Ango kêsan ji jêder dest pê dike. Di ewan peyvên de yê ku “hil” di wan de dibe pêşgir; jêder, nam, rewş û kirde yê dem a mêjîn a nêzîk, gura û dûr e. Ango peyv û pêşgir a “hil” di jêder, nam, rewş û di heyvê a dem a mêjîn a nêzîk, gura û dûr de, ji peyvê re pêşgir e. Wek nimûne ji bo evê pirsê: “hilweşîn” jêder e “hilweş” nam e “hilweşiyayî” rewş e “hilweşiya” dem a mêjîn a nêzîk e “hilweşiyaye” dem a mêjîn a gura e “hilweşiyabû” dem a mêjîn a dûr e. Di nimûne ya “hilgirtin” de jêder “hilgirtin” e “hilgir” nam e “hilgirtî” rewş e “hilgirt” dem a mêjîn a nêzîk e “hilgirtiye” dem a mêjîn a gura e “hilgirtibû” dem a mêjîn a dûr e. Di peyv a jêder de laşê peyvê dihê destnîşankirin û ew laş di kêsanê de kokê diparêze û divê ew laş parçe nebe.

Peyvek a din he ye ku bi “hil” re tevhev dibe û ew jî “hel” e, belê “hel” xwedî watayînî din e û ji “hil” cuda ye. Wek daxuyakirin jî, peyv a “hel” wata ya derfet, rev, delîve, cudabûn û derçûnê dide û em niha û di vir de wê şirove nakin. Niha – ango di evê pirs a li ber destê me de – em li ser peyv û pêşgir a “hil” dirawestin.

Peyv û pêşgir a “hil” di zimanê Kurdî de wata ya rabûn û bilindbûnê û ber bi serî ve dide, ku bi serê xwe wek “hil” wata ya bilind û rabûyî dide. Jêder a wê jî “hilbûn, hilatin” e û di peyvê wek “hilatin” de, peyv a “hil” ji kokê peyvê ye û ne pêşgir e, belê peyv bi xwe ye. Peyv a “hil” di nimûneyekê wek “hilatin” de bi amraz ve hatiye girêdan, an jî amraz lê yaniz bûye û ew amrazê “in” bi taybetî yê jêder e. Weha jî şîkarî ya

peyv a “hilatin” dibe “hil, at, in” ku “hil” peyv e û “at” amraz ê dem a mêjîn a nêzîk e û di hinek peyvyan de bi kok a peyvê re tenê “t” dimîne wek “kevt” ku “kev” kok a jêder a “kevtin” e û “in” amraz ê jêder e. Ev babet ê girêdayî amraz ên ku di dem a mêjîn de li kok a kirde yaniz dibin, gerek bi awayekî taybetî û berfireh bihê şirovekirin, da ku baş bihê hobarkirin.

Bi evî awayî peyv a “hilatin” wata ya derkevtin, rabûn û bilindbûnê dide û ew ji peyv a “hil” re jêder e. Belê di kêsan a ewan peyvyan de yên ku pêşgir a wan “hil” e, arêşeyek a senevî (ciddî) he ye. Ew arêşe di parçekirin a laş ê peyvê de ye. Ango peyv dihê parçekirin û weha sirêmek (bandorek) mezin li watayê dibe. Wek nimûne.. heger me xwazt em peyv a “hilgirtin” a ku jêder e, li angora ziman ê gell kêsan bikin, em dê bibêjin: “ez hildigirim, min hilgirt, ez dê hilgirim” û ev kêsan di dem ên amad, mêjîn û ayinde de ye. Ev kêsan a han li angora surîşt a ziman ê Kurdî, di dem a amad û ayinde de şaş e û rastî ya wê ev e: “ez dihilgirim, ez dê bihilgirim” ji ber ku wek me berê jî da xuyakirin, di dem a amad de pêşkok a kirde “di” ye û di dem a ayinde de pêşkok a kirde “bi” ye. Ji xwe li angora ziman ê gell, di dem a ayinde de “bi” her dihê havêjtin û di dem a amad de, ew parçebûn çê dibe ya ku me got ew laş ê peyvê parçe dike û sirêmê (bandorê) li watayê dike. Ew parçebûn weha dihê encamdan, dem a ku jêder a “hilgirtin” di kêsan a dem a amad de dibe “hildigirim” ku weha watayek a din çê dibe û ew jî girtin e (wek girtin a derî yan rê yan her tiştekî din) û ne hilgirtin e, ji ber ku “digirim” ji jêder a girtinê ye û dem a ku “hil” bi girtinê ve dihê girêdan, wata ya rahijtinê dide û dûrî wata ya girtin a tiştekî dikeve. Girtin a tiştekî ji hilgirtin a tiştekî cuda ye. Kok a girtinê “gir” e û kok a hilgirtinê “hilgir” e. Li angora ziman ê gell, di dem a amad de “ez hildigirim” peyvê li angora

rêziman dike xwedî wata ya girtin a tiştêkî û dûrî wata ya hilgirtinê dikeve. Peyv a “hilgirtin” yek peyv û yek laş ê peyvê ye û li angora kêsan a deman “di” di dem a amad de li pêşî ya peyvê dihê danan û dibe pêşkok a wê û di dem a ayinde de “bi” li pêşî ya peyvê dihê danan û dibe pêşkok a wê. Weha “hilgir” kok a peyvê ye, di pêşkok a wê de “di” yan “bi” he ye û di paşkok a wê de li angora kêsan a dem a amad, mêjîn û ayinde, amraz ên taybetî lê yaniz dibin. Wek nimûne.. peyv a “hilatin” (ango hilatin a rokê) di kêsan a li angora rêziman û surîşt a ziman de û di hersê deman de – amad, mêjîn û ayinde – weha ye: “rok dihilê, rok hilat, rok dê bihilê” û weha ew kêsan a awa yê serekîn ê bingeh a peyvê ye. Belê ev kêsan di ziman ê gell de weha ye: “rok hil tê, rok hilat, rok dê hilê” û ev bi xwe jî gerek bi kêmanî weha baya: “rok hil dihê, rok hilat, rok dê hil bihê” û weha ew li angora kêsan a awa yê alîkar ê bingeh a peyvê ye. Ango şewaz ê “rok dihilê, rok hilat, rok dê bihilê” bi awayekî bingehîn rast e û ew kêsan a awa yê serekîn ê bingeh a peyvê ye û ew li angora rêziman e û pê re jî, şewaz ê “rok hil dihê, rok hilat, rok dê hil bihê” rast e, ji ber ku rêziman wê dipejirîne û ew kêsan a awa yê alîkar ê bingeh a peyvê ye. Di evê kêsanê de “rok dihilê, rok hilat, rok dê bihilê” em dibînin ku kok a peyvê “hil” e û ji ber evê yekê me got ku pêşgir a “hil” di vir de, ne tenê beşekî peyvê ye û ne pêşgir e, belê ew peyv bi xwe ye. Dem a em dibêjin “agir ê Nûrojê hil e” ji me re xuya dibe ku “hil” peyv e û wata ya xwe ya taybetî he ye. Weha, di peyvîni wek “hilatin, hilîn, hilor, hilmend, hilend, ...” de, herçiqas ku “hil” di destpêk a peyvê jî de hatiye, belê ew ne pêşgir e, ji ber ku ew ji peyv a “hil” û amrazan pêk dihê û ew peyv bi xwe ye.

Di nimûneyekê wek “hildan” de, pêşgir a “hil” wata ya xwe ya destnîşankirî dide, ku ew jî rakirin û bilindkirin e. Ew bi peyv a

kirdeyî ya “dan” re hevgir bûye û jêder çê bûye, ji ber ku peyv a “dan” bi xwe kirde yê dem a mêjîn a nêzîk e û dem a ku bi peyvê ve dihê girêdan, jêder jê çê dibe. Ev jêder di kêsan a amad, mêjîn, ayinde û xizavê de û li angora ziman ê gell weha dibe: “ez hil didim, min hilda, ez dê hil dim, hilde, hildin” û di dem a ayinde de li angora ziman ê gell “ez dê hildim” kême û ne di cihê xwe de ye. Peyv a “hildan” li angora rêziman û kêsan a awa yê serekînê bingeh a peyvê weha dihê kêsan kirin: “ez dihildim, min hil da, ez dê bihildim, bihilde, bihildin” û weha ew di demên amad, mêjîn, ayinde û xizavê de ye. Di kêsan a awa yê alîkarê bingeh a peyvê jî de weha ye: “ez hil didim, min hil da, ez dê hil bidim, hil bide, hil bidin”. Peyv a “hildan” a ku jêder e, bi gurahe weha dihê kêsan kirin:

- Di dem a amad de: li angora kêsan a awa yê serekînê bingeh a peyvê “ez dihildim”e û li angora kêsan a awa yê alîkarê bingeh a peyvê “ez hil didim” e.

- Di dem a mêjîn de: “min hil da” ye û di evê hevê de peyv a “hil” bi serê xwe ye.

- Di dem a mêjîn a gurahe de: “min hil daye” ye û tê de peyv a “hil” bi serê xwe ye.

- Di dem a mêjîn a dûr de: “min hil dabû” ye û tê “hil” bi serê xwe ye.

- Di dem a mêjîn a xayan de: “min hil dida” ye û tê de “hil” bi serê xwe ye.

- Di dem a ayinde de: li angora kêsan a awa yê alîkarê bingeh a peyvê “ez dê hil bidim” e û li angora kêsan a awa yê serekînê bingeh a peyvê “ez dê bihildim” e.

- Di dem a xizavê de: li angora kêsan a awa yê serekînê bingeh a peyvê “bihilde, bihildin” e û li angora kêsan a awa yê alîkarê bingeh a peyvê “hil bide, hil bidin” e.

Ji evê kêsanê ji me re dihê xuyakirin, ku ev peyv li angora kêsan a awa yê alîkar ê bingeh a peyvê bêtir guncayî û rast e. Ango ev peyv weha dihê kêsankirin: “ez hil didim, min hil da, min hil daye, min hil dabû, min hil dida, ez dê hil bidim, hil bide, hil bidin”. Bi Evî awayê jî “hil” peyv e.

Peyv a “hil” di pergal ê jêder, kêsan a dem a mêjîn a nêzîk, gurah û dûr de pêşgir e, ji ber ku dikeve pêşî ya peyvekê de da ku watayek a din bide. Em evê yekê di nimûneyek a jêderî ya wek “hilmijtin” de dibînin, ku tê de “hil” bûye pêşgir a peyv a “mijtin” û ew jêder e û bûye beşekî laş ê evê peyvê. Ji ber evê yekê jî çê nabe ku ev laş di dem a kêsanê de parçe bibe, wata bibe “ez hildimijim”. Rastî ya kêsan a evê peyvê li angora binçîn a ziman ê petî û rêziman weha ye: “ez dihilmijim, min hilmijt, ez dê bihilmijim, bihilmije, bihilmijin” û weha ew di dem ên amad, mêjîn, ayinde û xizavê de ye. Ev kêsan a han li angora ziman ê gell jî weha ye: “ez hildimijim, min hilmîşt, ez dê hilmijim, hilmije, hilmijin”. Di dem a amad de parçekirin a peyvê he ye, ku li şûn a “ez dihilmijim” bihê gotin “ez hildimijim” hatiye gotin. Di dem a mêjîn de “min hilmîşt” hatiye gotin û peyv a “hilmîşt” dûrî wata ya mijînê ye û ew wata ya “tije, zengîn” dide. Di dem a ayinde de “ez dê hilmijim” hatiye gotin û pêşkok a “bi” ya ku nîşan a ayinde ye, pê ve ne girêdayî ye û di dem a xizavê jî de amraz ê xizavê “bi” windayî ye. Dîsan jî, di vir de ji me re xuya dibe ku “hil” di pergal ê jêder de dibe pêşgir a peyvê û di dem a kêsanê de dibe kok û beşekî serekîn ê peyvê. Nimûne ya “hilawîstin” jêder e û kêsan a wê ya dem ên amad, mêjîn, ayinde û xizavê weha ye: “ez dihilawîsim, min hilawîst, ez dê bihilawîsim, bihilawîse, bihilawîsin” ku di heyvêz a dem a amad de “di” pêşkok a peyvê ye û “hilawîs” kok a peyvê ye û “im” paşkok a peyvê ye û bi xwe kirde yê bûyînê yê girêdayî

bernam ê “ez” e û li angora evî bernamî, bi evê peyvê ve hatiye girêdan. Ango peyv a “hil” a ku bi morfîm a “awîs” re hev gir bûye, kok a evê peyvê pêk dihîne û ew kok “hilawîs” e. Di peyvek a giring a wek “hilbijartin” de, kok a peyvê “bijar” e û di kêsanê de weha ye: “ez dihilbijêrim, min hilbijart, ez dê bihilbijêrim, bihilbijêre, bihilbijêrin” ku “dihilbijêrim” dem a amad e “hilbijart” dem a mêjîn a nêzîk e “bihilbijêrim” dem a ayinde ye û “bihilbijêre, bihilbijêrin” xizav e. Di kêsan a dem a mêjîn a nêzîk de jî “min hilbijart” e, di dem a mêjîn a gurah de “min hilbijartiye” ye û di dem a mêjîn a dûr de “min hilbijartibû” ye. Taybetmendî ya pêşgir a “hil” a wek pêşgir di ewê yekê de ye, ku ew bi jêder, dem a mêjîn a nêzîk, dem a mêjîn a gurah û dem a mêjîn a dûr ve dihê girêdan û dibe pêşgir û bi awa yê serbixwe jî peyv e. Di dem a mêjîn a xayan jî de, peyv a “hil” li angora awa yê serekîn û alîkar ê bingeh a peyv a Kurdî, nakeve destpêk a peyvê de wek “min dihilbijart”.

Peyv û pêşgir a “hil” awayekî taybetî di ziman ê Kurdî de diwergire û wek heyvêz a xizavê bi şêwaz ê “hilo” bi kar dihê. Peyv a “hilo” wata ya “birabe, dey” dide û bi evî awayî jî, her wata ya xwe ya serekîn di ziman de diparêze.

Amraz ê bizavdar ê “ane, yane”

Hemû ew amraz ên ku dikevin pêşî û paşî ya peyvan de bizavdar (herekî, kinetic) in, ji ber ku sirêmek (bandorek) kûr di biwar ê watayê de li peyvan dikin. Ji ber evê yekê jî ew amraz herdem bi peyvê ve dihên nivîsandin û jê cuda nabin. Ji bo amraz ê “ane, yane” ew sirêma bi taybetî di nam, rewş, lîn û pergala de çêdibe û durv û awa dide nîşandan. Amraz ê “ane, yane” yê ku bi giştî li paşî ya peyvan dihê yanizkirin, wata ya “wek, her, mînayî” dide û wata ya xunamîyê (nesebê) û rewşê dide, ango peyvê dike xwedî wata ya “wek bêhvan tiştî, her weha, mînayî bêhvan tiştî, wek xunamî bi bêhvan tiştî ve girêdayî”. Nimûne ya “azadane” nam e, nimûne ya “zerane” rewş e, nimûne ya “rojane” lîn e, nimûne ya “hêminane” pergala e û ... hd. Wata dem a em dibêjin “Azad dilêrane şerr dike” ango Azad wek kesekî dilêr şerr dike û kes ê dilêr jî, kes ê mêr û bi cerg e û kes ê ku dil ê wî xurt e. Dem a em dibêjin “reftar ê wî malxwêyane bû” ango em xunamîtiya malxwêbûnê didin reftar ê wî. Malxwêbûn jî (wek malxwê yê/ya malê) salixekî mirovane ye û di destpêkê de di nav xizman de he ye û paşê jî di nav hemû mirovan de he ye. Peyvên wek “şêrane, hovane, merdane, çelengane, şahane, ...” ji me re didin xuyakirin, ku ev amraz wek “ane” ye, dem a ku pîta dawî ya peyva wî bê deng be. Peyvên wek “azayane, birayane, heloyane, kedîyane, rastgoyane ...” ji me re didin xuyakirin, ku ev amraz wek “yane” ye, dem a ku pîta dawî ya peyva wî dengdar be.

Di zimanê Kurdî de heyvêza şirovekirin a evê watayê jî he ye, dem a ku amraz ê “bi” yê kişanê bi peyvê re bi kar dihê û “ane, yane” bi kar nahê. Wek nimûne.. heyvêza “bi kom ve, kom bi kom” şirovekirin a peyva “komane” ye û “cor bi cor” şirovekirin

a peyv a “corane” ye û “bi zîrekî” şirovekirin a peyv a “zîrekane” ye. Herdu awa jî rast in, belê wek wirdînî (diqçet) her awayek wata ya xwe he ye û her awayek cih ê xwe di rêziman de he ye. Heyvêz a “bi kom ve” şirovekirin e (destewaje ye, saz waje ye) û ne peyv e, belê “komane” peyv e û “bi kom ve” şirovekirin a peyv a “komane” ye. Heyvêz a “bi zîrekî” ne peyv e, belê “zîrekane” peyv e û “bi zîrekî” şirovekirin a peyv a “zîrekane” ye. Heyvêz a “sal bi sal” ne peyv e, belê şirovekirin e û peyv a wê “salane” ye. Heyvêzek wek “bi qehremanî” şirovekirin a peyv a “qehremanane” ye û ... her weha.

Ev cudakirin a han jî, nahê ewê watayê ku heyvêz a “cor bi cor, kom bi kom, bi kom ve, reng bi reng, der bi der, û ... hd” di ziman ê Kurdî de nîne, belê em dixwazin bibêjin ku yek ji wan heyvêz û şirove ye û yek ji wan peyv e û bi karhînan a peyvê cih ê xwe he ye, her wek çawa bi karhînan a heyvêzê û şiroveyê cih ê xwe he ye. Em dixwazin bibêjin ku peyvek wek “merdane” şirove ya wê “bi merdî” ye, peyvek wek “corane” şirove ya wê “cor bi cor” e, peyvek wek “qehremanane” şirove ya wê “mînayî qehremanan” e û ... hw. Em nabêjin ku “cor bi cor, kom bi kom, bi kom ve, bi zîrekî, bi merdî, û ...hd” di ziman ê Kurdî de nahê gotin an nînin. Wek çawa “corane” peyv e û pêwîst e, heyvêz a “cor bi cor” jî pêwîst e. Wek nimûne.. heyvêz a “yek bi yek” nabe yekane, ji ber ku wata û mebest a “yek bi yek” tiştêk e û wata û mebest a “yekane” tiştêkî din e. Heyvêz a “yek bi yek” wata û nîşan a hejmarê ye û wata û mebest a “yekane” ango “bi ten a xwe, tenê” ye. Ango wata û nîşan, evê pirsê biyaş û bi rê dikin û di rêziman de bi cih dikin. Dem a em rastî wata ya coraneyîyê (new`iyetê, quality) dihên, em peyv a corane (coraneyî) ya ku amraz ê “ane” pê ve ye, bi kar dihînin. Belê dem a em rastî wata ya “her corek bi ten a xwe” û hejmarê dihên, em

heyvêz a “cor bi cor” bi kar dihînin. Ji hemû jî girîngtir ew e, ku gerek em heyvêz a “cor bi cor” wek “corbicor” nenivîsin, ji ber ku heger em evê heyvêzê wek “corbicor” binivîsin, em dê amraz ê “bi” dîl û tengezar bikin û bifetîsînin û amraz ê “bi” amrazekî serbixwe û azad e û serbixwe û azad jî dihê nivîsandin.

Amraz ê “ane, yane” ji kok a “an, yan” e û di ziman ê Kurdî de “an, yan” çar gerinan dibîne..

- Gerin a yekem ew e, ku “an, yan” amraz ê komê ye.

- Gerin a duyem ew e ku ew amraz ê peywendîyê ye.

- Gerin a sêyem ew e ku ew amraz ê jêder e.

- Gerin a çarem ew e ku ew ji kok a peyvê ye û beşekî laş ê peyvê ye.

Naskirî ye; dem a ku ew amraz ê komê be, wek “perrtûkan, derîyan, zûran, zerîyan” ew peyvê dike kom. Dem a ew amraz ê peywendîyê be, wek “perrtûk an namîlke, xanî yan koşk” ew gerin a xwe ya naskirî dibîne. Dem a ew amraz ê diristkirin a jêder be, wek “dêran, hêran, lêdan, danan, ...” ew dibe jêder a kirde û kêsanê. Dem a ku ew ji kok a peyvê jî be, wek “stan, zîwan, alan, leylan, heyvan, cîhan, baran, sermiyan, ...” ew beşekî peyvê ye û ne amraz e.

Ji nav evan herçar gerin ên “an, yan” em dikarin bibêjin ku “ane, yane” girêdayî jêder e û ji jêder derkevtiye. Dem a ew ji jêder derkevtiye, fonîm a “e” wergirtiye da ku bibe amraz ê diristkirin a wata û nîşan a “wek, her, mînayî, rewş û xunamîtiyê” û durv û awa bide nîşandan. Ango niha em dizanin ku kok a amraz ê “ane, yane” jêder e û bi yanizbûn a pît a “e” re, ew evê wata ya destnîşankirî dide. Bê goman jî dem a ku ev fonîm a han (e) lê hatiye yanizkirin, êdî ew nema gerin a jêder dibîne.

Dem a ku amraz ê “ane, yane” wata ya “wek, her, mînayî, rewş û xunamîtiyê” dide û durv û awa nîşan dide, di ziman de

ne bi ser ê xwe ye û herdem bi peyvê ve girêdayî ye. Belê wek nîşe (têbînî) gerek bihê gotin, ku amraz ê “yane” bi xwe û bi ser ê xwe jî peyvek e û dem a ew peyv a serbixwe be, ew wata ya “nadî, club” dide. Ango dem a ku “yane” peyvek bi ser ê xwe be, ew wata ya “nadî, club” dide. Wek ku tu bibêjî: “yane ya pagogê.. yane ya rewşenbîrî.. yane ya peşarî (siyasî) û ... hw” ku di her yaneyekê de taybetmendî ya xwe dihê wergirtin. Ango di yane ya pagogê (fûtbolê) de taybetmendî yê girêdayî gog a pa dihên zanîn, di yane ya peşarî de taybetmendî yê girêdayî pirs ên peşarî dihên zanîn û ... hw.

Amraz ê “ana, yana”

Amraz ê “ana, yana” di ziman de nîşandan a komê ye û hem nîşandan e û hem jî kom e. Ew tenê bi dawî ya peyvê ve dihê girêdan. Ev nîşandan a han taybetmendîyek a ziman ê Kurdî ye û tê de peyivîn û haxavtin bêtir xwedî araste ye û ew arastekirin jî, ji bo wirdîtîyek a bêtir e. Ango ev nîşandan a han, tişt ê mebestkirî û armanckirî bi wirdî û bi awayekî xuyanî destnîşan û biyaş dike. Dem a em dibêjin “ev perrtûkana.. ew mêrana.. ev zarokana.. ew xanîyana.. ev zevîyana.. ew birayana ...” em evan peyv ên destnîşankirî bi wirdî û bi giştîbûnek guruh didin nîşandan. Ji nimûne yên wek “perrtûkana, mêrana, zarokana, ...” ji me re xuya dibe ku ev amraz “ana” ye, dem a ku pît a dawî ya peyv a wî bê deng be û ji nimûne yên wek “xanîyana, zevîyana, birayana, ...” ji me re xuya dibe ku ev amraz “yana” ye, dem a ku pît a dawî ya peyv a wî dengdar be.

Di çiyawazî ya navber a destewaje ya “ev sêvana” û “evan sêvan” de xuya dibe, ku amraz ê komê “an” bizavek giring dike. Ango amraz ê “an” di nimûne ya “ev sêvana” de morfîm a “a” diwergire, da ku wata ya arastekirin û biyaşkirinê bide peyv a “sêvan”. Wata arastekirin a komê bi evê morfîmê bi cih dibe û arastekirin a komê ne tenê nîşandan a komê ye, belê dîyarkirin a alî yê wê bi xwe jî ye. Alî yê komê jî anga ew cih ê ku kom a nîşankirî lê ye û lê dimîne. Di evê kiryarê de morfîm a “a” bi peyvê ve ye û her dem a ku “a” ji peyvê cuda be amraz ê mê ye. Herweha, ev morfîm a han (a) ji kok a wata ya “ana, yana” ye, ku dem a ew bi “an” ve dihê girêdan û dibe “ana” ew dibe parçeyekî peyvê yê ku jê cuda nabe. Di nimûne yên “ev sêvana, ew darana, ew çiyayana, ev gelîyana, ...” de ji me re xuya dibe, ku amraz ê “ana, yana” sînorekî ji peyv a nîşankirî re

didane (datîne). Ango amraz ê “ana, yana” dixwaze ku em li tişt ê nîşankirî bi xwe binerîn û tenê wî nas bikin. Ji ber ku ew tişt ê nîşankirî ji nav gelek tişt ên din ên der û dorê cuda dike. Ew tenê peyv a nîşankirî destnîşan dike.

Di bi karhînan a “ana, yana” de ya bi peyvên re û di nav hevekan de weha jî xuya dibe, ku ev amraz bi giştî tenê du amraz ên nîşandanê diwergire, ku ew jî amraz ê nîşandan a nêzîk “ev, evan” e û amraz ê nîşandan a dûr “ew, ewan” e. Naskirî jî ye, ku “ev” ji bo tak e û “evan” ji bo kom e, herwek “ew” ji bo tak e û “ewan” ji bo kom e. Herweha naskirî ye, ku “evan, ewan” di zimanê gell de “van, wan” e û di bi karhînan a “van, wan” de, wirdîtî ya rêzimanî li ber çav nahê girtin.

Em di vir de ewê wirdîtîyê gelek bi kurtî didin nîşandan; ku di rêziman de û di zimanê petî de, çê nabe amraz ên nîşandanê “ev, evê, evî, evan, ew, ewê, ewî, ewan” bihên kurtkirin û guherandin û bibin “va, vê, vî, van, wa, wê, wî, wan” ji ber ku weha ew wata ya xwe ya wek amraz ên nîşandanê ji dest didin. Wek nimûne.. dem a ku “evan” dibe “van” êdî ew nema amrazê nîşandanê ye, ji ber ku “van” paşgir e û gerin a diristkirin a namê kirdedar dibîne. Bi karhînan a “ewan, wan” wek bernam jî cihê xwe he ye, ku di kêsan a dem a amad de “ewan” e û di kêsan a dem a mêjîn de “wan” e. Dem a ku “evê, evî” jî dibin “vê, vî” amrazê nîşandanê winda dibe, ji ber ku amrazê nîşandanê “ev” e û dem a ku dibe “va, vê, vî” amrazê nîşandanê “ev” bê wata dibe, ji ber ku tenê pîta “v” dimîne. Tenê pîta “v” dimîne, ji ber ku “ê” ya ku bi “evê” ve ye amrazê regezê mê ye û “î” ya ku bi “evî” ve ye amrazê regezê nêr e. Dem a ku tu amrazê nîşandanê “ev” de bi kar nehîni, dê tenê pîta “v” ji amrazê nîşandanê “ev” bimîne û pîta “v” bi tenê xwe bê wata ye. Ji ber evê yekê nabe ku di rêziman de “evê, evî, evan” bibin “vê, vî, van”.

Pirs a ku “va, wa” jî wek amraz ê nîşandanê di nav gell de – û bê goman di rêziman jî de – bi kar dihê pirsek berfireh e. Dibe bihê pirskirin; ka “vaye, waye” di ziman de li kuda dimînin û cih ê wan li kuda ye ? Bersiv jî ew e, ku “vaye, waye” du amraz ên nîşandanê yê taybetî ne û ev taybetîbûn, di kirde yê bûyîne “ye” de û di wata ya agahdarkirinê de ye. Ango “va, wa” hem nîşandan e û hem agahdarkirin e. Di evan amraz ên nîşandanê (vaye, waye) de kirde yê bûyîne yê alîkar bi kar dihê û watayek a taybetî ji wan re çê dibe. Em dikarin bibêjin ku wata ya yekem a “vaye” ango “ev li vir e û nêzîk e” û wata ya yekem a “waye” ango “ew li wir e û dûr e”. Weha ji me re xuya dibe ku “va” ji “ev” e û “wa” ji “ew” e. Belê dem a ku “va, wa” bi kar dihên wek: “va Azad hat, wa pêşmerge hat in” wata ya nîşandan û agahdarkirinê ye. Ango ne tenê nîşandan e. Ev bi ser ê xwe babetek e û lêkolîn a xwe ya taybetî he ye.

Divabû ku pirs a amraz ê “ana, yana” me bikişîne nav babet ê hemereng ê amraz ên nîşandanê, ji ber ku wek me da nîşandan peywendîyek xustdar û giring di navber a “ana, yana” û amraz ên nîşandanê de he ye. Belê gerin û wata ya yekem a amraz ê “ana, yana” kom e yan nîşandan a komê ye û ew nîşandan, arastekirî ye û bi wirdî destnîşankirî û biyaşkirî ye.

Rastî ya peyv a “milmilane”

Peyv ên çêkirî di ziman ê Kurdî de gelek in û heger em bidin duv hemûyan, divê ferhengek a şîkarî ya taybetî ji wan re bihê danan. Pirs a hebûn a ferhengek a şîkarî jî giring e, ji ber ku ev cor ê ferhengê rastî û çawanî ya derkevtin a peyvê dîyar dike. Dê cor ê ferhengek a şîkarî jî, di nav cor ên ferhengan de, corekî ferhengê yê taybetî û nû be.

Belê me berê jî da xuyakirin ku hinek peyv ên çêkirî he ne ziyaneke mezin didin ziman ê Kurdî, ji ber ku bi awayekî gelek şaş hatine çêkirin. Em bi taybetî çêh li (behs a) ewan peyvan dikin, ew ên ku ziyaneke didin ziman û bi giştî, pirranî ya peyv ên çêkirî ji ziman re bi ziyaneke in, heger bi awa yê zanistî (zanist a ziman) û surîşt a ziman ê Kurdî nehên çêkirin. Her çiqas ku ew peyv jî – ew ên ku ziyaneke didin ziman – ne kêma in û hinek ji wan he ne, ne tenê ziyandar in, belê ziman dûrî wata û rêsa yê xwe dixin. Bi evî awayî jî, ew wêranîyek mezin di ziman de çê dikin. Çêkirin an diristkirin a peyvan li ser bingeheke a wata û nîşanê ye û her dem a ku peyveke ne li angora wata û nîşanê be, ew peyveke wêrankar e û ne tenê şaş e.

Yek ji ewan peyv ên çêkirî peyv a “milmilane” ye û ev peyv li başûr hatiye çêkirin. Ew ên ku ev peyv çê kirine, xwaztine wata ya “sîra`, conflict” pêşkêş bikin û wek hercar xwe mandû ne kirine (xwe ne westandine) û li peyv a resen ne geriyane. Belê ka em bi awayekî şîkarî li evê peyvê binerin, da ku em nas bikin ka ew evê watayê dide yan nade.

Beş ê serekîn ê evê peyvê “mil” e û ew hatiye dubarekirin da ku wata ya lêkdanê dirist bibe û amraz ê “ane” pê ve hatiye girêdan. Weha ev peyv dibe sê beş; ku beş ê yekem “mil” e, beş ê duyem jî “mil” e û beş ê sêyem amraz ê “ane” ye. Pirs ev e;

aya dubarekirin a peyv a “mil” da ku bibe “milmil” evê wata ya destnîşankirî dide ? Çi peywendî ya “mil” an “milmil” bi wata ya rikberîyê û lêkdanê ve he ye ? Ew ên ku mil didin hev, bi hev re alîkar in û ne rikber in û şaş e ku em bibêjin; ev peyv wata ya li hev xistin a milan dide û dem a ku mil li hev dikevin, dihê zanîn ku rikberî û lêkdan he ne. Em dizanin ku di ziman ê Kurdî de ev hevek dihê gotin: “jin mil bi mil li gel mêr xebatê dike” yan jî: “jin mil bi mil ê mêr xebatê dike” ango jin mil ê xwe dide mil ê mêr û bi hevdu re xebatê dikin û weha ne rikberî ye û ne jî lêkdan e, belê hevgirtin û hevawazî ye. Weha rast e û weha wata ya destwaje ya “mil bi mil” hevgirtin e, hevxebat e û hevkarî ye.

Dem a ku amraz ê “ane” li peyv a “mil” yaniz dibe, peyv a “milane” çê dibe û wata ya peyv a “milane” hevgirtin e, hevxebat e û hevkarî ye “tekatuf e, shoulder to shoulder e”. Weha jî em nas dikin, ku “milane” hevgirtin û hevalî ya milan e da ku hêz çê bibe û da ku hevsengî jî çê bibe. Belê “milmilane” ya ku xwaztine wata ya şerr û lêkdanê bidinê, heyvêzek a gelek şaş e û wata û nîşanek a ne di cih ê xwe de ye.

Di ziman ê Kurdî de ev wata – wata ya sîra`, conflict – di peyv ên “gemş, afend, perxaş ” de ye. Ango di ziman ê Kurdî de ev hersê peyv jî evê watayê didin û hersê jî xurrû û petî Kurdî ne, lewra pêwîst nebû ku peyvek şaş wek peyv a milmilane bihê çêkirin. Jêder a peyv a gemş “gemşî” ye û di kêsan a dem a amad, mêjîn, ayinde û xizavê de weha dibe: “ez gemşîyê dikim, min gemşî kir, ez dê gemşîyê bikim, gemşîyê bike, gemşîyê bikin”. Peyv a “gemşî” wata ya “sîra`, conflict” dide û ew peyvek a kevn a Kurdî ye û evê watayê dide. Belê bê goman e ku ew yek ji peyv ên Kurdî yên windabûyî ye. Ji bo herdu peyv ên “afend, perxaş” jî her weha ye, ku jêder a peyv a afend “afendî”

ye û jêder a peyv a perxaş “perxaşî” ye û ev herdu peyv jî, wata ya “sîra`, conflict” didin. Peyv jî hîngê winda dibin, dem a ku mirov wan bi kar nahînin. Yek ji hêş ên ziman ê Kurdî jî ew e, ku peyv ên resen ên wî li alîyekî dihên danan an jî bi kar nahên û li şûn a wan peyvînî din dihên çêkirin. Di çêkirin a peyvan jî de şaşî yê senevî (ciddî) he ne. Yek ji ewan şaşîyan jî ew e, ku peyv ne li angora surîşt a ziman ê Kurdî dihên çêkirin.

Ango berî her tiştî peyv a “milmilane” ji bo wata ya “sîra`, conflict” şaş e û ewê watayê nade, ji ber ku pêkhat ên evê peyvê dûrî evê wata û nîşanê ne û paşê jî, ev peyv di beş ê xwe yê “milane” de wata ya “tekatuf, shoulder to shoulder” di ziman de dide. Bê goman jî peyv a “milane” di pêkhat a xwe ya zimanvanî de dirist e û ew peyvek a Kurdî ya weha ye, ku ew ji bo wata ya “tekatuf, shoulder to shoulder” gelek giring, pêdivê û rast e. Jêder a evê peyvê “milaneyîn” e û di kêsan a dem ên amad, mêjîn, ayinde û xizavê de weha ye: “ez milaneyê dikim, min milane kir, ez dê milaneyê bikim, milaneyê bike, milaneyê bikin”. Di hevekê jî de weha ye: “milaneyîn ji bizav a rizgarîxwaz a Kurdî re pêwîst e, ji ber ku bi milaneyînê yekbûn pêk dihê”. Ango dem a em mil ên xwe bidin hev, em dê yekbûnê di nav xwe de pêk bihînin û em dê bi hêz bibin.

Pirs a çêbûn a evê şaşîyê ew e, ku wata ya peyv a dubarekirî “milmil” kirine şerr û rikberî. Ev kiryar a han jî ne di giyan ê ziman de ye, belê di daxwaz a derûnî ya ewan kesan de ye yê ku ev peyv çê kirine. Peyv wata ya xwe ji surîşt a xwe diwergire û ew surîşt wek darekê di nav sal û deman de hatiye heyvizan-din. Ji ber evê yekê jî, dem a ku em peyvan li angora daxwaz a derûn a xwe saz bikin, em dê ne tenê şaşîyek zimanvanî bihafirînin, belê em dê sosretekê di surîşt a ziman de çê bikin. Ev peyv a ku em di vir de çêh lê dikin (behs a wê dikin) kevtiye

nav ziman û tê de bi cih bûye, belê her çawa jî be gerek peyv a şaş di ziman de bi kar nehê. Vatinî ya her zimanvanekî ye, ku li peyv a resen bigere û wê li şûn a peyv a ne rast bidane. Peyv a “milmilane” ji bo wata ya “sîra`, conflict” ne rast e û peyv ên resen ên ku evê watayê didin “gemş, afend, perxaş” in.

Dibe bihê gotin ku peyvek di ziman ê Kurdî de bi awa yê “gemşo” he ye û ew wata ya “gêl, ne hobar, nezan” dide û ev rast e, belê di ziman de herdu peyv ên “gemş, gemşî” û “gemşo” ne wek hevdu ne. Yek pît a ne wek hevdu jî, dibe engîz a ku du peyv ne wek hevdu bin. Ev pirs a han girêdayî babet ê watayê ye û ew di ziman de giring e.

Pirsek di bare ya nam (nav) de

Nam beşekî bingehîn ê ziman e û nîşan û nasîn a derve û giştî ya heyînan e. Her heyînek bi namekî – yan bi çend naman – dihê naskirin. Peyv a “nam” bi xwe di ziman de nêr e, ji ber ku Kurd dibêjin “nam ê te çi ye” û nabêjin “nam a te çi ye” (nav ê te çi ye). Di ziman ê Kurdî de her wek di ziman ên din ên Ariyayî de, ji evê peyvê re “nam” hatiye gotin û ew rast e. Peyv a “nam” a ku di evan serdem ên dawî de li nik beş ê herê mezin ê Kurdan bûye “nav” ji ber ewê yekê bûye, ku pît ên “p, b, m, v, w” di ziman ên Ariyayî de cih ên xwe didin hev û bi hev dihên guherandin. Belê dem a ku “nam” bûye “nav” hevdijîyek di watayê de çê bûye. Ew hevdijî bi wata ya “nav” re çê bûye, çimku “nav” wata yê “hinder, hinav” dide. Dem a em dibêjin “di nav baxçe yê me de gul ên binefşî he ne.. zarok di nav av a çem de melevanîyê dikin.. em di nav gund re derbas bûn” peyv a “nav” wata ya hinder (hundur) û hinav dide. Dibe bihê gotin ku êdî weha bûye û nav hem pênase ya tiştan e û hem jî hinder û hinav e. Em jî dipirsin; çima dê weha be ? Çima em dê her peyvekê, ne di cih ê xwe de bi kar bihînin ? Em di destpêk a naskirin a ziman ê Kurdî de ne û gerek ji niha ve, hay a me ji rastî û şaşîyan he be. Divê rast biyaş û bi cih bibe û divê şaşî bihên havêjtin.

Nam ji çend alîyan ve dihê naskirin û yek ji wan, nam ji alî yê hebûnê û heyînê ve ye. Ango nam ên tişt ên heyî yê ku di jînê de he ne û ew sê cor in; corek keresteyîn e, corek watayîn e û corek keresteyîn-watayîn e. Cor ê keresteyîn wek “komputer, mase, dar, kevir, pencere, derî, ...” û ew bi xwe sade jî ye. Cor ê watayîn bi xwe jî dibe du beş, ku beş ê yekem bingehîn e û beş ê duyem sazkirî ye. Cor ê watayîn ê beş ê bingehîn ê nam

wek “giyan, evîn, hiş, hoş, bawerî, derûn, ceng, hizir, derd, ...” û ev bi xwe sade ye û cor ê watayîn ê beş ê sazkirî yê nam wek “ronayî, başî, Kurdayetî, zanayî, mirovanî, Kurdînî, wirdînî, binar, birayetî, ...” ku ew ewan amrazan di paşî ya xwe de diwergire, ew amraz ên ku “ar, îni, atî, ayetî, yetî, anî, î, ayî, ...” ne û ew sazkirî ne û sazkirin a wan bi ewan amrazan e. Wata di ziman ê Kurdî de nam ên keresteyîn (maddî) ji nam ên watayîn (me`newî) cuda ne. Ev cudayî ya han nîşan a zengînî ya ziman e û ji zengînîyê jî girîngtir, ew nîşan a vagirîbûn a ziman e. Vagirîbûn ango “zebt û rebt” e, ango di ziman de ji her pergalekî re peyv û destwaje ya xwe ya taybetî he ye. Nam jî yek ji ewan beş ên peyvê ye yê ku di destpêk a çêbûn a ziman de hatiye hafirandin. Ango di destpêkê de nam li tiştê der û dorê hatiye danan. Cor ê nam ê keresteyîn-watayîn jî wek: “xanedan, neteweparêz, olperest, hişbirîn, jîngehdost, ...” ku ev cor peyvek a hevger e û ji hevgerîna peyvek a watayîn û peyvek a keresteyîn pêk dihê. Herweha, nam he ye ku ji du peyvên watayîn pêkhatî ye û dibe ew cor ê watayîn-watayîn be û nam jî he ye ku ji du peyvên keresteyîn pêkhatî ye û dibe ew cor ê keresteyîn-keresteyîn be. Belê cor ên serekîn ên nam; keresteyîn, watayîn û watayîn-keresteyîn in.

Nam ji alî yê hinav û naverokê ve jî sê cor e; giştî, taybetî û komşan e. Nam ên giştî ew in ên ku yê kesekî û tişteki giştî ne wek “çiya, gund, bajêr, rûbar, çem, deşt, kurr, kiç, mêr, jin, mindal, xort, sêv, gurg, şêr, mamosta, fêrdar, ...” ku ew li angora surîşt û naverok a xwe hatine destnîşankirin û xurrû ne. Nam ên taybetî ew in ên ku kesekî û tişteki destnîşankirî didin nîşandan û rojê heftiyê, meh, olê asmanî, bone yê dîrokî, peymangeh û rêxistinê heyî, xwedî yê namê taybetî ne. Namê komşan jî ew in ên ku komekê bi sînorê xwe ve didin

nîşandan û nasandin wek “gell, deste, gulb, supa, çênî (xelk) ...”. Dem a ku nam ê komşan di hevekê de tak be, kirde yê ku pê ve girêdayî dibe jî tak e wek “gell ê Kurd rizgarîyê dixwaze”. Belê dem a ku nam ê komşan kom be, kirde jî dibe kom wek “gell ên cîhanê azadîyê dixwazin”. Ango nabe em bibêjin: “deste ya hukûmetê serdan a Hewlêrê kir in” ji ber ku “deste” komşan e. Rast e “deste” komşan e, belê em wê wek tak bi kar dihînin. Dem a em dibêjin “deste ya” angoy me deste kiriye tak. Ji ber evê yekê hevek a “deste ya hukûmetê serdan a Hewlêrê kir in” şaş e û rastî ya wê “deste ya hukûmetê serdan a Hewlêrê kir” e. Ango heger amraz ê tak bi nam ê komşan re hatibe bi karhînan, kirde tak e û heger amraz ê komê bi nam ê komşan re hatibe bi karhînan, kirde kom e. Wek nimûne.. “supa yê me hêrîş kir, supa yê me hêrîş kir in” û “deste ya me dixwîne, deste yê me dixwînin” û “şande ya hukûmetê çû derveyî welat, şande yê hukûmetê çûn derveyî welat”.

Nam ji alî yê pêkhatê ve jî peyvek a watadar a serbixwe ye û sê cor e; nam ê sade, nam ê sazkirî û nam ê hevgir e. Nam ê sade wek “Azad, Elind, dil, reng, befr, baran, zevî, dar, giya, ...” û ew di ziman de kevintirîn pêkhat e, herwek kevintirîn peyv e. Nam ê sazkirî (û darijtî jî jê re dibêjin) wek “şoreşger, serbaz, hunermend, çayxane, fêrdar, mizgîn, mirovanî, merdayetî, bilindî, ...” ku ew paşgir û amrazan di dawî ya xwe de diwergire. Di evan nimûne yê ku di vir de hatine, em dibînin ku paşgir ên wek “ger, baz, mend, gîn, xane, dar” hatine û em dibînin ku amraz ên wek “anî, ayetî, î” hatine. Nam ê hevgir (û lêkdayî jî jê re dibêjin) wek “dilxwaz, biraza, dartaş, mêrgesor, şaheng, çolemêrg, ...” ku ew ji peyvekê bêtir bi hev re ne, angoy bi kêmanî du peyv bi hevdu re hevgir in.

Pêkhat a nam angoy çêbûn a nam û ew di corê xwe yê yekem

de (nam ê sade) ziman dide nasîn, di cor ê xwe yê duyem de (nam ê sazkirî) taybetmendî ya bizav a amraz ên nav ziman dide nasîn û di cor ê xwe yê sêyem de (nam ê hevgir) taybetmendî ya hevgyrtin a peyvyan dide nasîn.

Nam ji alî yê regez ve bi nêr, mê û nêtar ê xwe ve naskirî ye, belê tişt ê ku em dixwazin di vir de bibêjin ew e, ku bi tekezî û bi biyaşî, wek çawa nam ê nêr ê mirov “mêr” e û nam ê mê yê mirov “jin” e, weha jî di nav ajelan (heywanan) de nam ê nêr ê ajal he ye û nam ê mê yê ajal he ye. Ango wek çawa nam ê “çêlek” mê ye û nêr ê wê “ga” ye, nam ê “mih” mê ye û nêr ê wê “beran” e û nam ê “bizin” mê ye û nêr ê wê “nêrî” ye, weha jî nam ên ajal ên din, nêr ê xwe û mê yê xwe he ye. Di evî biwarî de dihê xwaztin ku nam ên nêr û mê yê hemû yan pirranî ya ajelan (û heger bûwer be şînayîyan) di ziman de bi cih û biyaş bibin, anga bihên nivîsandin û tomarkirin, ji ber ku ev pirs a han hîne di ziman ê Kurdî de ne cihgîr û ne akincî ye. Tomarkirin a nam ên nêr û mê yê ajal û şînayîyan jî, zengînîyekê din dide ziman û ji zengînîyê giringtir, ast a zanistîbûn a ziman bilindtir dike.

Nerînek li ser jêder

Jêder peyvek e ku kirdeyekî dide nîşandan, belê ew kirde ne girêdayî kesekî yan tiştekî ye, dem tê de nahê dîyarkirin û hemû kirde di hemû dem ên kêsanê de jê diderkevin. Ango ew bingeh a parzadîyê ye. Jêder bi awayekî serekîn ji nam an kok a kirde û kirde yê dem a mêjîn a nêzîk pêk dihê û çê dibe û amrazekî diristkirin a jêder pê ve dihê girêdan, herweha ji peyvekê ku yek ji amraz ên jêder pê ve girêdayî be çê dibe û pêk dihê. Jêder bûyer e û ew pirsek a watayîn e.

Amraz ên serekîn ên ku jêder dirist dikin û yên ku naskirî ne û dane xuyakirin “in, an, î, ûn” in, belê em dikarin bibêjin ku amraz ê “î” jî yek ji ewan amrazan e yên ku jêder dirist dikin, kirde yê bûyînê “bûn” ê ku bi xwe bi ten a xwe kirde yê dem a mêjîn a nêzîk e û girêdayî bernam ên “em, hûn, ewan” e jî yek ji ewan amrazan e yên ku jêder dirist dikin, kirde yê dem a mêjîn a nêzîk “dan” jî jêder dirist dike û jêder a “kirin” bi xwe jî yek ji ewan amrazan e yên ku jêder dirist dikin û kirde yê dem a mêjîn a nêzîk “çûn” jî yê ku girêdayî bernam ên “em, hûn, ewan” e jêder dirist dike, dem a ku ew – û ev hemû – bi peyvê ve dihên girêdan. Weha jî, em dikarin bibêjin ku “ûn” ne amraz ê diristkirin a jêder e.

Ango amraz ê “î” ji bilî ewan gerin ên ku me wan destnîşan kirine, gerin a diristkirin a jêder jî dibîne. Amraz ê “î” gerin a diristkirin a jêder bi nam û rewşê re dibîne, wek “azadî, xweşikî, rindî, zelalî, merdî, lehengî, ciwanmêrî, comerdî, ...”. Heger peyv a “comerd” rewş be, peyv a “comerdî” jêder a wê ye, heger peyv a “Azad” nam be, jêder a wê “azadî” ye. Amraz ê jêder “î” dibe “yî” dem a ku pît a dawî ya peyv a wî dengdar be wek “gedayî, tergizeyî, tenhayî, ...”.

Kirde yê bûyînê “bûn” jî bi nam û rewşê ve dihê girêdan û wan dike jêder wek “havîbûn, birîndarbûn, şilbûn, zîzbûn, qelewbûn, reşbûn, şînbûn, zîrekbûn, azadbûn, ...”. Ango dem a ku “bûn” bi peyvê ve dihê girêdan amraz ê jêder e û dem a ku ji peyvê cuda be, kirde yê bûyînê ye û girêdayî bernam ên “em, hûn, ewan” e (em bûn, hûn bûn, ewan bûn). Peyv a “azadbûn” jêder e û destewaje ya “azad bûn” kirde ye, anga “em, hûn, ewan azad bûn”.

Kirde yê “dan” jî bi nam ve dihê girêdan û wî dike jêder wek “avdan, bazdan, serdan, berdan, xwepêşandan, ...”. Ango dem a ku “dan” bi peyvê ve dihê girêdan amraz ê diristkirin a jêder e û dem a ku ji peyvê cuda be, kirde yê dem a mêjîn a nêzik e û girêdayî bernam ê “me, we, ewan” e (me perrtûk ên xwe dan dibistanê, we perrtûk ên xwe dan mamosta yê xwe, ewan perrtûk ên xwe dan nivîsgehê).

Jêder a “kirin” jî bi peyvê ve dihê girêdan û peyvê dike jêder, wek: “dîlkirin, azadkirin, rizgarkirin, derkirin, vederkirin, kinkirin, dirêjkirin, ...” ku ev jêder, jêderbûn a xwe dide peyv a ku pê ve dihê girêdan.

Peyv a “nivîsandin” a ku bi amraz ê “in” bûye jêder, bi xwe “nivîsand” e û wek xuya ye, ew (nivîsand) kirde yê dem a mêjîn a nêzik e û yanizbûn a amraz ê jêder “in” wê dike jêder. Amraz ê “in” kirde û alîkar ê kirde ye û dem a ku kirde nikaribe wata ya xwe ya serrast bide, bi kirde ve dihê girêdan. Heger kirde bikaribe wata ya xwe ya serrast jî bide, ji peyvê cuda dihê nivîsandin. Dem a ku kirde di kêsan a dem a mêjîn a nêzik de dikare wata ya xwe ya serrast bide “in” jê cuda dibe, wek “kevtin” jêder e û “kevt in” kirde ye û “kevt” bi ten a xwe watayê dide. Kirde yê ku nikarin watayê jî bidin amraz ê jêder bi wan ve dihê girêdan. Belê amraz ê “in” di kêsan a dem a amad û ayinde de bi peyvê

ve ye, ji ber ku kirde di dem a amad û ayinde de nikare wata ya xwe ya serrast bide, wek “dixwînin, dilîzin, dê bizanin, dê bixwînin”. Em nikarin di kirde yê “dixwînin, dilîzin, dê bizanin, dê bixwînin” de “in” ji peyvê cuda bikin, ji ber ku “dixwîn..., dilîz..., dê bizan..., dê bixwîn...” wata ya xwe ya serrast nadin. Wek nimûne.. di hevek a “zarokan wane ya xwe nivîsand in.. zarokan wane yê xwe nivîsand in” de, peyv a “nivîsand in” kirde ye. Di nimûne ya “nivîsandin a waneyê erk e” de, peyv a “nivîsandin” jêder e. Paşê jî, kirde di hevek a “nivîsandin a waneyê erk e” de “e” ye. Weha jî dijberî ya ku amraz ê “in” çê dike, di hevekê de namîne.

Peyv ên wek “xwarin, kevtin, kirin, birin, hilbijartin, hingavtin, ...” jêder in, belê bi xwe kirde ne, dem a ku dibin “xwar in, kevt in, kir in, bir in, hilbijart in, hingavt in, ...”.

Di dem a mêjîn a gurah de amraz ê “in” li angora heyvêz a “ine” bi peyvê ve ye, ji ber ku jê cuda nabe û jê cuda nabe ji ber ku wata ya peyvê pê ve girêdayî ye, wek: “xwînd in, xwîndine.. kevt in, kevtine.. bir in, birine.. kir in, kirine ...”. Jêderbûn an kirdebûn a wan jî, di hevekê de û di dem a kêsanê de bi evî awayî dîyar dibe.

Di encam de weha dîyar dibe, ku heger “in” bi peyvê ve be û ew peyv kirde be û di dem a mêjîn a nêzîk de be jêder e û heger “in” di dem a mêjîn a nêzîk de ji peyvê cuda be, kirde ye û ne jêder e. Wek nimûne.. di hevek a “wan kar ên xwe kir in” de “kir in” kirde ye û di hevek a “kirin a kar erk e” de “kirin” jêder e. Di hevek ên “wan xwarin a xwe xwar in.. wan hinar ên evê salê xwar in” de “xwarin” jêder e û “xwar in” kirde ye.

Dibe ku “in” ji kok a peyvê be û ne amraz ê jêder be û ne jî kirde yê bûyînê be, belê nam be yan rewş be wek “mezin, bizin, darin, dekin, çetin, sosin, şûjin, ...” ku wata ya peyv a “darin”

ango negatîv e (selbî ye) û wata ya peyv a “dekin” ango tekist e. Li başûr ji peyv a “dekin” re dibêjin “deq” û ev kêmkirin e û ew ji peyv a “dekin” hatiye, ku “dek” kirine “deq” û fonêm a “in” jî havêjtine. Wek nîşe jî.. peyv a “dek” di ziman ê Kurdî de wata ya “plangêrîyê” dide, belê peyv a ku em çêh lê dikin “dekin” e û wata ya wê “tekist” e û peyv a “dekin” xurrû ye û kît ên wê ji hev cuda nabin.

Amraz ê jêder “an” ê ku dem a pît a dawî ya peyv a wî dengdar be dibe “yan” bi xwe amraz ê komê jî ye. Di peyv a “hildan” de ya ku jêder e ji me re sê pirs ên rêzimanî dihên xuyakirin, ku yek ji wan jêderbûn e, yek nîşan a komê ye û ya din di bare ya kok a kirde de ye û ev şaşî ye. Dem a em dibêjin “wan ala ya xwe hil dan.. wan ala yê xwe hil dan” em dibînin ku peyv a “hil dan” kirde ye û nîşan a komê ye, ango “wan, komekê” ala hil dan, belê gerek “hil” ji “dan” cuda bihê nivîsandin, ji ber ku heger bi peyvê ve be – hildan – jêder e. Peyv a “hil dan” di vir de kirde yê dem a mêjîn a nêzîk e û ew bi tak ê xwe “hil da” ye. Bi kirde yê “hil dan” re tenê pît a “n” ya kirde yê bûyînê yê kom “in” bi “dan” re maye û ew weha bûye ji ber ku pît a dawî ya peyvê dengdar e, ango “da” ye. Ango amraz ê “an” ê ku di dawî ya kirde yê “hil dan” de ye, ne “an” e. Di evê peyvê de pît a “a” ya dawî ya wê bi dem a mêjîn a nêzîk ve girêdayî ye û pît a “n” bi xwe “in” e. Belê dem a em dibêjin “hildan a alayê karekî pîroz e” em peyv a “hildan” wek jêder bi kar dihînin. Pirs a sêyem a ku di peyv a “hildan” de dihê xuyakirin û gelek giring e ew e, ku kok a kirde tenê pît a “d” ye. Ev kirde yê han li angora ziman ê gell weha dihê kêsankirin: “ez hil didim, min hilda, ez dê hildim” û li angora surîşt a ziman ê Kurdî ya rêzimanî weha dihê kêsankirin: “ez dihildim, min hil da, ez dê bihildim” û weha ew li angora kêsan a awa yê serekîn ê bingeh a peyvê

ye û di dem a xizavê jî de “bihilde, bihildin” e. Li angora kêsan a awa yê serekîn ê bingeh a peyvê, kok a evî kirdeyî “hild” e û ew ji amraz ê “hil” û kok a kirde yê didim “d” pêk hatiye. Girov ê me (delîl ê me) yê li ser ku kok a evî kirdeyî tenê pît a “d” ye, di kêsanê de dîyar dibe. Dem a em dibêjin: “ez didim, min da, ez dê bidim” û em di dem a amad de şîkarîyê dikin, em dibînin ku kirde yê “didim” ji “di – d – im” pêk dihê, ku “di” amraz ê bi karhînan a dem a amad e û “d” kok a kirde ye û “im” kirde yê bûyînê yê girêdayî kes ê yekem ê tak e. Weha ji me re xuya dibe ku kok a kirde yê “didim” tenê pît a “d” ye. Ev rewş a han di hemû kirde yên ziman ê Kurdî de weha ye. Me kêsan a rast a jêder a “hildan” di pirs a “peyv û pêşgir a hil” de bi evî awayî şirove kiribû:

- Peyv a “hildan” a ku jêder e, bi gurahî weha dihê kêsankirin:
- Di dem a amad de: li angora kêsan a awa yê serekîn ê bingeh a peyvê “ez dihildim” e û li angora kêsan a awa yê alîkar ê bingeh a peyvê “ez hil didim” e.
 - Di dem a mêjîn de: “min hil da” ye û di evê heyvêzê de peyv a “hil” bi ser ê xwe ye.
 - Di dem a mêjîn a gurah de: “min hil daye” ye û tê de peyv a “hil” bi ser ê xwe ye.
 - Di dem a mêjîn a dûr de: “min hil dabû” ye û tê “hil” bi ser ê xwe ye.
 - Di dem a mêjîn a xayan de: “min hil dida” ye û tê de “hil” bi ser ê xwe ye.
 - Di dem a ayinde de: li angora kêsan a awa yê alîkar ê bingeh a peyvê “ez dê hil bidim” e û li angora kêsan a awa yê serkîn ê bingeh a peyvê “ez dê bihildim” e.
 - Di dem a xizavê de: li angora kêsan a awa yê serekîn ê bingeh a peyvê “bihilde, bihildin” e û li angora kêsan a awa yê alîkar ê

bingeh a peyvê “hil bide, hil bidin” e.

Ji evê kêsanê ji me re dihê xuyakirin, ku ev peyv li angora kêsan a awa yê alîkar ê bingeh a peyvê bêtir guncayî û rast e. Ango ev peyv weha dihê kêsankirin: “ez hil didim, min hil da, min hil daye, min hil dabû, min hil dida, ez dê hil bidim, hil bide, hil bidin”.

Dibe ku amraz ê “an” ji kok a peyvê be, ne amraz ê jêder be, ne jî amraz ê komê be û nam be wek “baran, stan, aman, zîwan, zozan, jan, kalan, halan, nan, liyan, giran, ...” ku ev pirs a han di watayê de dîyar dibe.

Şaşî di çêkirin a jêder a amraz ê “an” de dihê kirin, dem a ku kirde wek jêder didin nîşandan. Wek nimûne jî; peyv ên wek “hêran, sûtan, şêlan, kêşan” wek jêder didin nasîn û ew ne jêder in. Ev peyv ên weha kirde ne û ew kirde yên dem a mêjîn a nêzîk in. Em dibêjin: “dehn ê xwe hêran.. ev kel û pel sûtan.. hevîr ê xwe şêlan.. wêne ji xwe re kêşan” û ev kirde yên han girêdayî bernam ên komê ne. Ango peyv ên wek “hêran, sûtan, şêlan, kêşan” kirde ne û ne jêder in û ji bo ku em nekevin evê şaşîyê de, gerek jêderbûn a evan peyv ên weha bi amrazekî din ê jêder bibin jêder. Gerek di evan nimûne yên weha de, bi kêmanî û bêtir, amraz ê jêder “în” bi kar bihê, da ku ev şaşî çê nebe. Ango dê ev nimûne bibin “hêrîn, sûtîn, şêlîn, kêşîn”. Ango gerek em di destnîşankirin a amraz ê jêder a “an” de serkevtî bin û em amraz ê jêder ê rast ji peyvê re bi kar bihînin, da ku em nekevin şaşî ya navber a jêder û kirde de. Jêder a bi amraz ê “an” bi xwe jî gelek xustdar e (hessas e) û gerek bi hişyarî bihê destnîşankirin. Wek nimûne.. ji kirde yê “dan” re amraz ê jêder “în, yîn” rast e ku pê ve bihê girêdan û bibe jêder. Ew jî ku kirde “da” be û amraz ê jêder “yîn” pê ve bihê girêdan. Peyv a “danîn” jî kirde yê dem a mêjîn a nêzîk e û ne

jêder e. Em dibêjin: “wan perrtûk ên xwe danîn ser maseyê” û dem a em bixwazin ev peyv jêder be, gerek em bibêjin: “danan a perrtûkan li ser maseyê nîşan a xwîndin a wan e”. Ango jêder a ji bo peyv a “da” amraz ê “an” dixwaze, ne amraz ê “în, yîn” dixwaze.

Amraz ê jêder “în” di levakirinê de gelek caran durv ê xwe yê pîtane winda dike û ji “în” dibe “î”. Ango di bin bar ê levakirin a lezgîn de pît a “n” dihê havêjtin. Peyv ên jêder a “în” ên wek “serekîn, bingehîn” dikevin bin evî barî de û dibin “serekî, bingehî” û bi tenê bi amraz ê “î” jî wata ya xwe ya jêderbûnê winda nakin, ji ber ku wek me berê jî da xuyakirin, amraz ê “î” gerin a diristkirin a jêder jî dibîne. Belê peyv ên wek “zêrîn, malîn, goyîn” ewî bar ê levakirinê napejirînin, ji ber ku heger ew guherîn di “în” a evan peyvan de çê bû û bû “î” wata ya wan dihê guherandin û gurah jî nabin.

Ji alî yê din ve, kêsan a jêder a “danîn” – a ku gerek danan be – di nav gell de weha ye “ez datînim, min danî, ez dê deynim” û di evê kêsanê de kok û resenî ya peyv a “danîn, danan” hatiye şêwandin û wêrankirin. Rastî ya kêsan a peyv û jêder a “danîn, danan” li angora surîşt a rêzimanî weha ye “ez didanim, min danî .. min dana, ez dê bidanim” û weha kok a evê peyvê – ku “da” ye – dihê parastin.

Di peyv û jêder a “hilanîn” jî de heman arêşe (muşkile) he ye, ku kêsan a wê ya li angora gell weha ye: “ez hiltînim, min hilanî, ez dê hilînim” û rastî ya kêsan a wê ya li angora surîşt a rêzimanî weha ye: “ez dihilînim, min hilanî, ez dê bihilînim”. Di kêsan a xizavê jî de weha ye: “bihilîne, bihilînin”.

Di peyv ên jêder a “în” ên wek “şîn, şîrîn, hêlîn, kîn, birîn” de, amraz ê “în” ji kok a peyvê ye û ne jêder e.

Amraz ê “ûn” ê ku kirine diristkar ê jêder, şaşîyek mezin di

hobarkirin a wî de he ye. Wek nimûne.. peyv a “çûn” a ku wê dikin jêder a amraz ê “ûn” bi xwe kirde ye û ne jêder e. Jêder-bûn a peyv a “çû” ne “çûn” e, belê “çûyîn” e û em dibînin ku amraz ê jêder “yîn” bi peyv a “çû” ve hatiye girêdan û wê kiriye jêder. Kirde yê “çûn” kirde yê dem a mêjîn a nêzik e û girêdayî bernam ê komê “em, hûn, ewan” e (em çûn, hûn çûn, ewan çûn). Kêsan a wê jî weha ye “ewan diçin, ewan çûn, ewan çûne, ewan çûbûn, ewan diçûn, ewan dê biçin, biçe, biçin”.

Nimûne ya din a ku wê li ser amraz ê jêder “ûn” dihînin, peyv a “dirûn” e û jêder a evê peyvê ne “dirûn” e, belê “dirûtin” e. Ev pirs a han di kêsanê de dîyar dibe wek “ez didirûm, min dirût, ez dê bidirûm”. Me nas kiriye ku jêder ji kirde yê dem a mêjîn a nêzik dihê diristkirin û kirde yê dem a mêjîn a nêzik di evê nimûneyê de “dirût” e. Ango amraz ê jêder “in” bi peyv a “dirût” ve dihê girêdan û wê dike “dirûtin” û weha dibe jêder. Di hevekê jî de weha ye “dirûtin a te ciwan e” û peyv a “dirûtin” di vir de jêder e û “tu gelek ciwan didirûyî” û peyv a “didirûyî” di vir de kirde ye. Di evan nimûne yên li ser “dirûtin” de, kok a peyvê “dirû” ye û ev rastî ya evê pirsê ye.

Di nimûne ya “girûn” de kêsan weha ye “ez digirûm, min girûyand, ez dê bigirûm” û ji me re xuya dibe, ku jêder a evê peyvê “girûyandin, girûyîn” e û ne “girûn” e. Kok a peyv a “girûyandin, girûyîn” jî “girû” ye.

Di peyv a “sûn” de jî kêsan weha ye “ez disûm, min sûyand, ez dê bisûm” û ji me re dîyar dibe, ku dê jêder a evê peyvê “sûyandin, sûyîn” be û ne “sûn” be. Kok a peyv a “sûyandin, sûyîn” jî “sû” ye.

Di nimûne ya “cûn” de jî kêsan weha ye “ez dicûm, min cût, ez dê bicûm” û ji me re dîyar dibe, ku jêder a evê peyvê “cûtin, cûyîn” e û ne “cûn” e. Kok a peyv a “cûtin, cûyîn” jî “cû” ye.

Di nimûne ya “bûn” de ya ku wê ji bo jêder a amraz ê “ûn” dihînin, baş xuya ye ku ew kirde ye û ne jêder e. Me da xuyakirin ku heger “bûn” bi peyvê ve be, peyvê dike jêder û heger bi ten a xwe be kirde ye. Ew di vir de evê peyvê bi ten a xwe didin xuyakirin ku ew jêder a amraz ê “ûn” e û ev şaş e. Peyv a “bûn” kirde yê dem a mêjîn a nêzîk e û girêdayî bernam ên komê “em, hûn, ewan” e (em, hûn, ewan bûn). Jêderbûn a peyv a “bûn” jî “bûyîn” e û em dibînin ku amraz ê jêder “yîn” pê ve hatiye girêdan. Ango di kêsanê de ji me re weha xuya dibe, ku “ewan dibin, ewan bûn, ewan dê bibin” jêder ji “bûn” dihê sazîkirin û dibe “bûyîn”.

Di peyv ên wek “hiyûn, şûn, rûn, xûn, cûn, dijûn” de “ûn” ji kok a peyvê ye û ne jêder e. Herweha, peyv a “cûn” nîşan a reng ê cûn e û reng ê cûn di navbera reş û sipî de ye. Reng ê cûn reng ê “resasî, gray” ye.

Wata; amraz ên jêder ên serekîn “in, an, î” in û “î, bûn, dan, kirin” jî amraz ên jêder in. Weha ji me re heft amraz ên serekîn ên jêder he ne, ku ew jî “in, an, î, bûn, dan, kirin” in û weha jî dihê xuyakirin, ku dem a kirde yê “çûn” jî bi peyvê ve dihê girêdan, peyvê dike jêder wek: têkçûn, zikçûn, derçûn, roçûn, hilçûn, pêşveçûn, ... hd û weha heşt amraz ên jêder di ziman ê Kurdî de çê dibin. Ango dem a ku “çûn” bi peyvê ve dihê girêdan, peyvê dike jêder û dem a ku ji peyvê cuda be kirde yê dem a mêjîn a nêzîk e û girêdayî bernam ên komê yê “em, hûn, ewan” e. Êdî amraz û peyv ên “in, an, î, bûn, dan, kirin, çûn” dem a ku bi kok a peyvê ve dihên girêdan, peyvê dikin jêder.

Jêder hem wek peyv (jêder) mê ye û hem wek surîşt a peyv a xwe mê ye. Ev di hevekê de dîyar dibe dem a em amraz ê mê “ê, yê” bi jêder ve girê didin û dem a em amraz ê “a, ya”

bi jêder re bi kar dihînin. Wek nimûne.. “em bi xwîndinê li pêş dikevin.. em dagîrkirin a welat ê xwe napejirînin” ku me bi peyv a jêder “xwîndin” ve amraz ê mê “ê” danîye û me bi peyv a jêder “dagîrkirin” re amraz ê mê “a” bi kar hînaye. Di evan nimûneyan de ji me re mêbûn a jêder dihê xuyakirin: “qarîn a zarokan.. lêdan a dijminan.. sûd û ziyarên xwarinê.. piştî kevîtinê xwe ji rabûnê re amade bike.. evê nexweşiyê derdek çêkir.. azadî ya me daxwaz e”.

Jêder hevekê gurah (temam) dike û ev yek ji gerinên jêder e. Wek nimûne.. “giringtirîn pirs di jînê de xwîndin e.. armanc a min komkirin a wêne yê kevî e.. daxwaz a me rizgarbûn a welat e”. Peyvên jêderên “xwîndin, komkirin, rizgarbûn” di evan hevekan de gerin a gurahkirin a hevekê dibînin.

Jêder di hevekê de kirdedar e û berkirde jî ye. Dem a em dibêjin: “xwîndin mirov hişyar dike” jêder (xwîndin) kirdedar e. Dem a em dibêjin: “ez bi xwîndinê şad dibim” jêder (xwîndinê) berkirde ye.

Êdî jêder ji kêsan a kirde yê dem a mêjîn a nêzîk û nam çêdibe, ku amrazekî diristkirin a jêder “in, î, an, î, bûn, dan, kirin, çûn” lê yaniz dibe. Herweha, amrazên jêder “in, î, an” bi kok a kirde yê dem a mêjîn ve dihên girêdan û amrazên jêder “î, bûn, kirin” bi nam û rewşê ve dihên girêdan û amrazê jêder “dan” bi nam ve dihê girêdan û “çûn” bi nam û peyvên din ve dihê girêdan.

Em weha dibînin ku jêder a ji kirde yê dem a mêjîn a nêzîk çêdibe û amrazên diristkirin a jêder “in, î, an” lê yaniz dibin jêder e, belê jêder a ku ji nam çêdibe û amrazên diristkirin a jêder “î, bûn, dan, kirin, çûn” lê yaniz dibin namê jêder e. Weha em dikarin bibêjin; ku di zimanê Kurdî de hem jêder heye û hem namê jêder heye. Ango jêder a ku ji kirde dirist dibe

jêder e, belê jêder a ku ji nam dirist dibe nam ê jêder e, yan jî; jêder a ku li ser bingeh a kirde çê dibe jêder e û jêder a ku li ser bingeh a nam çê dibe nam ê jêder e yan jêdernam e.

Herçende ku di rêziman de bi giştî weha hatiye ku jêder û nam ê jêder yek in, belê em dikarin di ziman ê Kurdî de evê cudayîyê di navber a jêder û nam ê jêder de bibînin.

Di encam de nîşeyek giring di bare ya diristbûn a jêder de he ye û ew jî ew e, ku amraz ê jêder “in” bi kirde yê dem a mêjîn a nêzîk re jêder dirist dike û me got ku ev awa yê serekîn e, ji ber ku pirranî ya jêderan di ziman ê Kurdî de amraz ê jêder “in” diwergirin. Belê amraz ên “an, î, î, bûn, dan, kirin, çûn” ên diristkirin a jêder, bi beş ên din ên guncayî yên peyvê ve dihên girêdan û jêder dirist dikin.

Hevek û cor ên xwe

Hevek şîraz a çend beş ên peyvê ye, kirde tê de he ye û watayek a gurah û armancdar dide. Hevek di zimanê Kurdî de bê kirde nabe. Bi giştî di hemû zimanan jî de weha ye. Wek çawa peyivîn ji beş ên peyvê pêk dihê, peyivîn ji evê şîrazê jî pêk dihê. Ango peyivîn şîraz a peyv û hevekan e. Giringî ya peyvê ji peyivînê re wek giringî ya hevekê ji peyivînê re ye. Bê hevekê babet çê nabe.

Di vir de sê cor ên hevekê dihên xuyakirin, ku ew ên bingehîn in û di peyivînê de cihê xwe digirin. Her yek ji wan jî xwedî ya taybetmendî ya xwe ya rêzimanî ye û gerinekê dide nîşandan. Ew taybetmendî jî, cihê kirde, kirdedar û berkirde bi awayekî serekî dide nîşandan.

1- Hevek a sakar: şîrazek a çend beş ên peyvê ye, kirdeyek tenê tê de he ye, gurah û serbixwe ye. Ji evê hevekê re sade (besît, simple) jî dibêjin û di evê hevekê de tenê kirdeyek he ye, gurah û serbixwe ye, aşkira û rasterast e. Wek nimûne.. “min kêvroşkek dît”.. “kêvroşkê gêzer dixwar”.. “li vir be”.. “em gelek şad in”.. “we karekî baş kir”.. “te ev perrtûk ji kuda kirrî?”.. “welatê me rizgarîyê dixwaze”.. “gerek em ji zimanê xwe hobar bikin”.. “ez Kurd im”.. “em dê ala ya xwe bilind bikin”.. “ez perrtûkê dixwînim” hevek ên sakar, gurah û serbixwe ne. Tenê yek kirde di her yekê ji wan de he ye û her hevekek a ku bêtirî kirdeyekî tê de he be, ne hevekek a sakar e.

Hevek a sakar pirsekê, mebestekê, wata û daxwazekê pêk dihîne û heger wek pend (hikmet) be, gelek watayan dide. Wek nimûne.. “tiştê nedîtî nebêje” hevek a pendê ye û di evê hevekê de gelek wata yên watayîn he ne. Bê goman e jî, ku hevek a pendê ji hevek a asayî (normal) cuda ye û ew cudabûn,

di heyvêz û watayê de ye.

Ev hevek a han ji ber sakarbûn a xwe bi giştî di nav ziman de bê şaşî dihê gotin, belê hinek caran bi şaşî jî dihê gotin. Wek nimûne.. di waneyek a ziman ê Kurdî de ya mamostayekî ziman ê Kurdî, ev hevek a han weha dihê nivîsandin: “Kurdistan beheşte le behar da” ango (Kurdistan biheşt e di biharê de) û ev hevek li angora diyalekt a başûr e. Di evê hevekê de şaşî he ye û ew şaşî ya heveksazîyê ye. Rastî ya evê hevekê ev e: “Kurdistan le behar da beheşt e” ango (Kurdistan di biharê de biheşt e) çimku dasazî ya peyvê (tertîb a peyvan di nav hevekê de, W.O) di nav hevekê de, bi giştî kirde di dawî ya hevekê de bi cih dike. Ew dasazî ya han jî weha ye: “kirdedar + berkirde + kirde” û di evê hevekê de “ez nan dixwim, min nan xwar, ez dê nan bixwim” dîyar dibe. Bi awayekî sakar jî weha ye.

2- Hevek a hevgir: şîrazek a çend beş ên peyvê ye, ji du hevek ên sakar pêk dihê ku bi rê ya amraz ên peywendîyê bi hevdu ve dihên girêdan û dibin hevekek a hevgir. Di evê hevekê de bêtirî kirdedarekî he ye û bêtirî kirdeyekî jî he ye. Ango du kirdedar û du kirde tê de he ne. Di nimûne ya “Azad cot dikir û Ayaz alîkarî ya wî dikir” de, du kirdedar û du kirde he ne, ku ev du hevek ên sakar bi rê ya amraz ê peywendîyê “û” bi hevdu ve hatine girêdan û hevek a hevgir çê bûye. Di nimûne ya “Azad xwîndevan e belê Ayaz nivîskar e” de, du hevek ên sakar bi rê ya amraz ê peywendîyê “belê” bi hevdu ve hatine girêdan û hevek a hevgir çê bûye. Ne merc e ku kirde di hevek a hevgir de wek hev bin, wek: “Azad rojnameyê dixwîne û Ayaz li televîzyonê dinere” ku di hevek a yekem de kirde “dixwîne” ye û di hevek a duyem de kirde “dinere” ye.

Cor ê hevgir ê hevekê pirsekê li nik mirov çê dike û ew pirs jî ev e: çima ne bêtirî du hevek ên sakar bi hev re nahên girêdan

? Ango: aya em nikarin bibêjin “Azad doktor e, Ayaz mamosta ye û Şêrîn endazyar e?”. Bersiv jî ew e, ku hevek a hevger ji bêtirî du hevek ên sakar çê nabe, çimku em du hevek ên sakar bi rê ya amrazekî peywendîyê bi hevdu ve girê didin û em dabirrê (bêhnokê) ji bo evê mebestê bi kar nahînin. Heger dabirr jî bi kar bihê, hîngê her hevekek a ku bi dabirrê bi dawî bûye, hevekek a serbixwe ye û bi ya piştî xwe re ne hevger e.

3- Hevek a girêkdar: şîrazek a çend beş ên peyvê ye, ji hevekek a serekîn û hevekek a awarte pêk dihê û bêtirî kirdeyekî tê de he ye. Hevek a girêkdar beşdarîyek serekîn di berfirehkirin a peyivînê û babet ê nivîsandin û peyivînê de dike, çimku ev hevek dikeve ast û biwar ê şirovekirinê de. Hevek a girêkdar dihêle hizir di pêkhat a wê de çê bibe û ew di biwar ê hizrê de babet geş û fireh dike.

Heger em li evê hevekê “dem a ew hat in; me bi germî pêşwazî ya wan kir” binerin, em dê bibînin ku beş ê yekem ê wê “dem a ew hat in” hevekek a awarte ye û beş ê duyem “me bi germî pêşwazî ya wan kir” hevekek a serekîn e. Hobarî ya (têgihîn a) hevek a awarte jî, ango hevek a ku di wata û mebest a xwe de ne gurah e û hobarî ya hevek a serekîn jî, ango hevek a ku di wata û mebest a xwe de gurah e. Di evê nimûneyê de “herçiqas ku ez nikarim; ez dixwazim biçim rojava” hevek a “herçiqas ku ez nikarim” awarte ye û hevek a “ez dixwazim biçim rojava” serekîn e. Nîşe ya (mulaheze ya) giring di evê pirsê de ew e, ku bi giştî di navber a hevek a awarte û hevek a serekîn de serxal (;) dihê danan, an jî divê serxal bihê danan.

Di hevek a girêkdar de, hizr û armanc ên cuda dihên xuyakirin. Girêkdarî ya evê hevekê jî, ji evî pergali dihê. Belê ev girêkdarî pêwîstîyek ji pêwîstî yên babet ê pêşkêşkirî yê ziman e. Ev girêkdarî bi xwe girêk ên kiryar a şirovekirinê di nav babet de

diveke û gerek nam ê wê “hevek a vekiranê” baya, ji ber ku ew hem girêkê diveke û hem jî babet diveke.

Li angora hobarî ya me, çend cor ên din ên hevekê he ne û gerek di dem a xwe de bihên destnîşankirin û şirovekirin.

Nîşeyek di bare ya destewajeyê de

Destewaje yan sazwaje, şîraz a watadar û mebestdar a beşekî hevekê ye û ne hevek e, ew bi xwe du peyv an çend peyv in ku dibin yekîneyek a peyvînê û tê de peyvek a serekîn he ye û peyvînê din yawerî ya wê dikin. Destewaje bê kirde jî be, watar dar û mebestdar e.

Di ferheng a “Mehabad” a “Gîwî Mukrîyanî” de peyv a “destewaje” wata ya “ibare, phrase” dide û heta niha ew rast e, belê dibe peyv a “sazwaje” ji destewajeyê jî rasttir be. Ango peyv a “destewaje” wata ya “ibare, phrase” dide û wata ya “musteleh, term, idiom” nade. Di hinek jêder ên Kurdî de peyv a “destewaje” ji bo wata ya “musteleh, term, idiom” bi kar hatîye û ev şaşî ye. Herweha, pirranî ya jêder ên ku di bare ya destewajeyê de ne, destewajeyê ji hevekê cuda nakin. Ango dem a ew wê bi nimûne didin xuyakirin, ew wê di nav hevekê de didin xuyakirin. Ango wê bi kirde re didin xuyakirin. Rast e ku destewaje di nav hevekê de dihê, belê destewaje bi ten a xwe jî dihê û ne merc e ku hemû deman di nav hevekê de be. Di evê nîşeyê (mulahezeyê) de, destewaje ji hevekê dihê cudakirin û cuda lêkolîn li ser wê dihê kirin. Ji ber ku dem a destewaje bi ten a xwe bihê dîyarkirin, bêtir dihê hobarkirin.

Dibe ku di nav hevekek a dirêj de çend destewaje he bin, wek: “seqa gelek sar e û hemû mirov di mal ên xwe de girêdayî mane” ku di evê hevekê de “gelek sar e” destewajeyek e û “hemû mirov” destewajeyek e û “di mal ên xwe de” destewajeyek e û “girêdayî mane” destewajeyek e. Ev hevek ji kom a evan destewajeyan pêkhatî ye. Di destewaje ya “gelek sar e” de hobarkirin (têgihîn) he ye, herçende ku ne hevekek a serrast e. Ango destewaje watadar e û divê watadar be, bi tevî ku ew

ne hevek e.

Pirranî ya caragan (adresan) wek destewaje dihên nivîsandin, wek: “binçîn ên ziman ê Kurdî”.. “rizgarî ya me”.. “ji vir û ji wir”.. “di bajêr de”.. “dar bişkivîn”.. “gul divebin”.. “kanis ên Kurdan”... ku her yek ji evan destewajeyan, watayê li angora derbirrînê û darijtinê dide û merc ên avabûn a hevekê jî tê de tine ne, ji ber ku ne hevek e.

Di şirovekirin a destewajeyê de dihê xuyakirin, ku destewaje namî, rewşî, kişanî, kirdeyî û lînî (zerfî) ye. Ango destewaje ya ku nam tê de peyv a serekîn be namî ye, destewaje ya ku rewş tê de peyv a serekîn be rewşî ye, destewaje ya ku amraz ê kişanê tê de peyv a serekîn be kişanî ye, destewaje ya ku kirde tê de peyv a serekîn be kirdeyî ye û destewaje ya ku lîn tê de peyv a serekîn be lînî ye û ev rast e. Belê em dibînin ku beşinî dinî peyvê jî destewajeyê bi xwe ve girê didin. Ango destewaje namî ye, bernamî ye, jêderî ye, kirdeyî ye, rewşî ye, pergâlî ye, lînî ye, kişanî ye, peywendînî ye û hejamrî ye. Dem a ku di destewajeyê de nam he be û nam peyv a serekîn be, ew destewaje namî ye, dem a ku di destewajeyê de bernam an kirdedar peyv a serekîn be, ew destewaje bernamî ye, dem a ku di destewajeyê de jêder peyv a serekîn be, ew destewaje jêderî ye û ji bo hemû beş ên peyvê yên ku hat in destnîşankirin jî weha ye.

Destewaje ya namî, nam tê de peyv a serekîn e wek: “hevalekî baş.. Azad ê sitranbêj.. kebanî ya malê.. dîrok a Kurd.. dibistan a seretayî.. tilî yên dest.. mêr ê çê.. ew ê dirêj.. hêz a yekîtîyê”.

Destewaje ya bernamî, bernam tê de peyv a serekîn e wek: “ew ê hanê.. hûn ên azadîxwaz.. em ên dil bi birîn.. ewan ên li Kurdistanê”.

Destewaje ya jêderî, jêder tê de peyv a serekîn e wek: “avakirin a welat.. merc ên xwîndinê.. azadî ya niştimanî”.

Destewaje ya kirdeyî, kirde tê de peyv a serekîn e wek: “baş dihajo.. lê kir.. lê xist.. dê biçe.. diçin mal .. jê kirrî.. li hev kevt”.

Destewaje ya rewşî, rewş tê de peyv a serekîn e wek: “seqa yê sar.. surişt a ciwan.. mal a mezin.. mirov ê rastgo.. çiya yê bilind”.

Destewaje ya pergalî, pergal tê de peyv a serekîn e wek: “dil ê birîndar.. mirov ê nexweş.. bask ê şkestî.. av a paqij”.

Destewaje ya lînî, lîn tê de peyv a serekîn e wek: “bin ê xanî yê me.. roj a zagînê.. dem ên xweş.. şev a Yelda.. çax a baranê.. spêdê zû.. piştî nivrojê”.

Destewaje ya kişanî, amraz ê kişanê tê de peyv a serekîn e wek: “di biharê de.. her ji destpêkê ve.. bi anahî ya Xweda.. li tenişt a gund”.

Destewaje ya peywendîyê, amraz ê peywendîyê tê de peyv a serekîn e wek: “ez û tu.. pakî û xawênî.. buha ye belê baş e.. peyvek a ku tenanet raz e”. Destewaje ya peywendîyê tenê du peyvan bi hevdu ve girê dide.

Destewaje ya hejmarî, hejmar tê de peyv a serekîn e wek: “du bira.. çar alî yê welat.. çîrok a duyanizdeh siwaran.. heft wêzev ên qanûnî”.

Giringî ya destewajeyê (sazwajeyê) di ziman de, ne tenê ew e ku ew di pêkhat a hevekê de ye, belê ew giring e ji ber ku di biwar ê heveksazîyê de gerinek a mezin dibîne. Herweha, ew giring e ji ber ku ew di biwar ê watayê û mebestê de bingehekê didane (datîne). Ango pêkhat a peyivînê peyv, destewaje û hevek e.

Cor ên peyvê ji alî yê hevgirîyê ve

Di beş ên peyvê de cor ên peyvê dihên xuyakirin, ku em dikarin her beşekî peyvê wek corekî peyvê nas bikin. Belê peyv ji alî yê hevgirîyê ve corinî din dide xuyakirin. Ango peyv ji alî yê pêkhat û heyvizandin a xwe ve corinî din dide dîyarkirin. Cor ên peyvê yên ku di beş ên peyvê de dihên xuyakirin, cor ên peyv ên ziman bi giştî ne û cor ên peyvê yên ji alî yê pêkhat û hev-girîyê ve, cor ên peyvê yên di biwar ê pêkhat û heyvizandinê de ne. Bi giştî jî du cor ên peyvê ji alî yê pêkhat û hev-girîyê ve he ne, ku ew jî “sakar” û “ne sakar” in.

Dibe ku ev dabeşkarî ya weha jî di ayinde de bihê guherandin, ji ber ku pêkhat û hev-girî ya peyvê bi têrî ne hatine şirovekirin. Dibe ew guherandin a ku em wê pêşbînî jî dikin, bêtir di pirs a peyv a heyvizandî de, di pirs a peyv a hev-gir de û di pirs a peyv a girêkandî de çê bibe, ji ber ku peyv a heyvizandî bi awayekî dihê hafirandin (pêşgir, paşgir, pêşkok û paşkok jê re he ye) peyv a hev-gir bi awayekî din dihê hafirandin (peyv bi hevdu ve dihên girêdan) û peyv a girêkandî bi awayekî dihê hafirandin, ku tê de çend peyv û amraz hevbendî hev dibin.

Peyv a sakar (sade) bi ten a xwe ye û ti beş an amraz pê ve nahên girêdan û peyvek a xurrû ye, belê peyv a ne sakar amraz û beşinî din ê peyvê pê ve dihên girêdan û ew jî sê cor in. Cor ê yekem ê peyv a ne sakar peyv a heyvizandî ye, cor ê duyem ê peyv a ne sakar peyv a hev-gir e û cor ê sêyem ê peyv a ne sakar peyv a girêkandî ye.

1- Peyv a sakar: ev cor ê han ê peyvê ji cor ên din ên peyvê kevintir e û di destpêkê de ew hatiye hafirandin û çê bûye (zagîn bûye). Peyv a sakar ji du pîtan û bêtir pêk dihê û hemû pît ên wê, ji pêkhat û hev-girî ya wê bi xwe ne û ew peyvek a resen e.

Divabû ku nam ê wê peyv a resen baya, ji ber ku ew bingeh û nasîn a ziman e û ji ber ku ew ji alî yê gell ve di nav dîrok û jîn a gell de hatiye hafirandin. Peyv ên wek “ser, rû, dil, dest, pa, ling, roj, ron, şev, rok, heyv, xak, zemîn, jin, mêr, meh, sal, giya, çiya, kanî, gund, şehr” peyvîni sakar in (resen in) û ew resen in ji ber ku ew ên gell in. Pirs a ku dibe hinek ji peyv ên Kurdî di zimanîni din jî de he bin, girêdayî dîrok a civakî ye û bê goman e ku di ewê dîrokê de gell ê Kurd hafirînar e û gell ên din wergir in, ango gell ê Kurd ew peyv hafirandine û gell ên din jê wergirtine. Tişteki din ê giring jî di evê pirsê de he ye û ew jî ew e, ku gell ê Kurd û gell ên din ên ku peyv ên wan ên hevpar he ne, ji heman reh û kok a regezî ne û ev pirs di dar a zimanan de xuya ye. Ango peyv dibin hevpar dem a ku xwedî yê wan ji yek regezî bin, yan jî dem a ku di bin merc ên jîyarî, civakî, çandeyî û afendî de ji hev biwergirin.

Em dibînin ku pirranî ya nimûne yê li ser peyv a sakar nam in. Hobarî ya (têgihîn a) peyv a sakar ew e, ku ew xurrû ye, bi ten a xwe ye û ti beşîni din ên peyvê pê ve ne girêdayî ne. Peyv a sakar çi nam be yan rewş be yan lîn be yan bernam be yan berkirde be yan kişan be yan peywendî be, ... bi ser ê xwe ye. Kirde di dem ên amad, ayinde û xizavê de, ne peyvîni sakar in ji ber ku di evan deman de amraz, pêşgir û paşgir bi peyvê ve dihên girêdan.

2- Peyv a ne sakar: ew “ne sakar” e ji ber ku amraz û beşîni din ê peyvê pê ve dihên girêdan. Herweha, heger em dixwazin sakar “resen” be, nahê ewê watayê ku “ne sakar” jî “ne resen” e. Gerek nam ê peyv a “ne sakar” jî peyv a “hevbend” baya, çimku ew di beş ê xwe yê heyvizandî de hevbendî amrazan dibe, di beş ê xwe yê hevgir de hevbendî peyvîni din dibe û di beş ê xwe yê girêkandî de hevbendî amraz û peyvan dibe. Di

evan hersê beşan de peyv dihên sazkirin. Ango peyv a ne sakar (hevbend) sê beş in:

A- Heyvizandî: peyv a heyvizandî bi pêşgir û paşgir dihê heyvizandin, anga pêşgir û paşgir pê ve dihên girêdan û durv û wata ya xwe bi wan diwergire. Peyv ên wek: “lêzan, rakirin, veguhaztin, daxistin, wergirtin...” pêşgir bi wan ve ne û weha hatine heyvizandin û peyv ên wek: “hesinkar, evîndar, dadgeh, xwîndevan, masîgir...” paşgir bi wan ve ne û weha hatine heyvizandin. Heyvizandin a peyvê di biwarê watayê de pêwîst e, çimku ew hem peyvekê dihafirîne û hem jî watayek a nû çê dike.

Heyvizandin a peyvê di zimanê Kurdî de, di rê ya bi karhînan a amrazan, pêşgir û paşgiran de çê dibe û ev pergala di ziman de pêwîstî lêkolînek taybetî ye, ji ber ku ev pergala girêdayî bizava a zimanê Kurdî ye. Bizava a zimanê Kurdî jî anga dînamîkî ya zimanê Kurdî ye û ew girêdayî babetê surîşt a ziman e. Di her zimanekî de ew bizava (ew dînamîkî) he ye, belê ev bizava a han di zimanekî de lawaz e û di zimanekî din de hêzdar e (bi hêz e). Xuya dike ku ev bizava di zimanê Kurdî de heta radyekî baş hêzdar e, ji ber ku datakê (mufredatê, vocabularies) zimanê Kurdî yê heyvizandî pirr in. Em dikarin bibêjin ku zimanê Kurdî tije datakê heyvizandî ne û di evê pirsê de nîşeyek (têbînîyek) he ye û ew jî ew e, ku heyvizandinê ji alî yê gell ve he ne û heyvizandinê ji alî yê nivîskar, rewşenbîr û hinekê din ve he ne. Bê goman e jî ku heyvizandinê ji alî yê gell ve bi pirranî surîştî ne û girêdayî surîşt a zimanê Kurdî ne, belê ne merc e ku heyvizandinê ji alî yê nivîskar, rewşenbîr û hinekê din ve jî surîştî bin û girêdayî surîşt a zimanê Kurdî bin.

B- Hevgir: peyv a hevgir bi kêmanî ji du peyvên hevgerî hevdû pêk dihê û ew weha watayekê dide nîşandan. Peyvê

wek: “rûgeş, demjimar, çavreş, namnîşan, gulbihar, xûnxwar, şêrkoh...” hevgir in û weha wata ya xwe ya daxwazkirî didin. Peyv a hevgir jî yek ji taybetmendî yên ziman ê Kurdî ye û ew jî hem ji alî yê gell ve hevgir bûne û he ne yên ku ji alî yê nivîskar, rewşenbîr û hinek ên din ve hevgir bûne. Ew ên ku ji alî yê gell ve hevgir bûne bi pirranî surîştî ne û bê kêmanî ne, belê ne merc e ku ew ên ji alî yê nivîskar, rewşenbîr û hinek ên din ve hevgir bûne bê kêmanî bin.

C- Peyv a girêkandî: ev cor ê peyvê bêtir ji peyv ên sakar û amrazan pêk dihê yan dihê sazkin. Ew di ziman ê Kurdî de peyvek a weha ye ku di pirranî ya pergala de dihê çêkirin û sazkin. Pirs a rastî yan ne rastî ya sazkin a peyvekê jî, di evî corî de bêtir aşkira ye.

Di nimûneyekê de wek “destpêkirin” em dibînin ku peyvek a girêkandî he ye, ji ber ku ev peyv ji hevbendî ya navber a “dest” û “pê” û “kirin” pêk hatiye yan hatiye sazkin, ku peyv a “dest” nam e, peyv a “pê” amraz e û peyv a “kirin” jêder e. Di nimûneyekê de wek “serbixwe” peyvek a girêkandî he ye, ku ji peyv a “ser” û amraz ê “bi” û bernam ê “xwe” pêk hatiye yan hatiye sazkin. Peyvek a wek “têkhilkin” girêkandî ye, ji ber ku ji “têk” û “hil” û “kirin” pêkhatî ye. Peyv a “têkhilkin” di nav gell de bûye “têkelkin, têkilkin” û weha evê peyvê di bin bar ê levakinê de, resenî ya xwe ji dest daye û resenî ya wê “têkhilkin” e. Peyv a girêkandî jî nam ê wê li wê ye. Em di vir de dipirsin; aya (gelo) hebûn a evê peyvê di nav ziman ê me de pêwîst bûye ? Em evê bersivê ji dem ên bihên re dihêlin.

Nîşe: di evan nimûne yên pêşkêşkirî de yên di bare ya cor ên peyvê de ji me re xuya dibe, ku di destpêk a diristkin û heyvizandin a peyvê de bêtir nam û jêder bi kar hatiye. Ev jî

ji me re dide zanîn, ku di destpêkê de nam hatiye nasîn, dest-
nîşankirin û heyvizandin. Mebest ji “destpêkê” jî, destpêk a
çêbûn a ziman e.

Darayî yan diravî ?

Ev pirs di alîyekî xwe de girêdayî wata ya peyvane ya pereyan e (dirav). Ew babetekî semantîk û etîmolojîk e û dide xuyakirin ka kîjan ji evan herdu peyv (darayî, diravî) wata ya mal û pereyan dide. Peyv a “mal” jî peyvek a Erebî ye û wata ya wê “pere, money” ye û ew di zimanê Kurdî jî de wek “mal” bi kar dihê, belê ew di zimanê Kurdî de “dirav” e. Herweha, ev babet dide xuyakirin ka wata ya peyv a “dara, darayî” di zimanê Kurdî de çi ye. Ev du peyv, di nav zimanê fermî û zimanê ragihandinê de tev li hevdu bûne, yan jî yek ji wan – ku “darayî” ye – herdu watayan dide û ew bi xwe ne weha ye.

Her yek ji evan herdu peyv wata ya xwe ya taybetî he ye û ne weha tev li hevdu ne yan jî peyv a “darayî” ji bo wata ya “maliyyetê, finance” bi kar dihînin û peyv a “dirav” a ku bi xwe evê watayê dide ji bîr dikin. Dibe ku ev herdu peyv di pirs a arzûyê pereyan de bigihêjin hevdu, belê şirovekirin dihêle ku em tiştêkî din nas bikin.

Peyv a “dara” di zimanê Kurdî de, wata ya wê ya taybetî “xenî, rich” e û jê re peyv a “zengîn” jî dihê gotin û hinek jê re peyv a “dewlemend” dibêjin. Ev peyv ne tenê girêdayî wata ya “peredar, kesê/a xwedî pere” dide, belê ew peyvek a giştî ye û wata ya zengînîyê ya berfireh, giştî û corane dide. Ango ew peyvek e, ku hem wata ya wê ya keresteyîn he ye û hem jî wata ya wê ya watayîn he ye. Peyv a “dara” bi awayekî serekîn jî, wata ya wê ya watayîn li cih e û ew jî “kesê/a xwedî heyîn” e û gelekî wata ya keresteyîn nade. Ango wata ya “dara” heyîn û hebûnê dide nîşandan û heyîn û hebûn ne tenê pereyan bi xwe ve digire, belê ew arzû (mulk) û desthilatdarîyê jî bi xwe ve digire. Mebest ji wata ya watayîn jî ev e. Bi evî awayî em nas

dikin, ku wata ya peyv a “dara” ango “kes ê/a xwedî heyîn, kes ê/a xwedî hebûn, desthilatdar” e û ew bi evî awayî, ne tenê girêdayî wata ya pereyan e û wata ya “mal, maliyyetê” jî nade. Belê di hemû saziman û dezgeh ên başûr ê Kurdistanê de, wek wata ya “mal, maliyyetê” cih ê xwe girtiye û gerek ji evî cih ê xwe yê şaş birabe.

Peyv a “zengîn” a ku wata ya “xwedî pere, xenî, rich” dide, bi xwe Kurdî ye. Di şîkarî ya evê peyvê de ji me re xuya dibe, ku ev peyv ji beş ê “zen” û paşgir a “gîn” pêk hatiye. Wata ya peyv a “zen” di ziman ê Kurdî de “mal, pere” ye û ew di dem ên berê de pere yê tûnc ên wek zîv û zêr bûye, ew bi wata ya “niqûd, coin” bûye. Paşgir a “gîn” di ziman ê Kurdî de wata ya “xwedî, xwedan” dide û weha wata ya peyv a “zengîn” ango “ê/a ku xwedî yê/ya mal e, ê/a ku xwedî yê/ya pereyan” e. Ji bo em nas bikin ku paşgir a “gîn” evê watayê dide, em dibêjin ku di peyvekê wek “xemgîn” de ya ku ji “xem” û “gîn” pêk hatiye, wata ya “kes ê/a xwedî xem” dihê dîyarkirin. Ango peyv a “zengîn” jî bo wata ya “xenî, rich” di cih ê xwe de ye û peyvek a Kurdî ye.

Peyv a “dewlemend” peyvek a Erebi-Kurdî ye û çêkirî ye. Bingeha evê peyvê “dewlet” e û berê (û niha jî) ji kes ê/a xwedî pere û zengîn re digotin “ew dewlet e”, ango zengîn e. Ev wata ya han jî anahîkar e (meczazî ye, metaphorical e) ji ber ku her dewletek xwedî ya pereyan e (xwedî ya heyîn û desthilatdarîyê ye). Êdî kes ê/a ku xwedî pere be, ew jî dewletmend e. Ango peyv a “dewletmend” bûye “dewlemend” û şîkarî ya evê peyvê weha ye, ku ew ji peyv a Erebi “dewlet” û paşgir a Kurdî “mend” pêk hatiye û di nav kirikkirinê (levakirinê) de, pît a “t” ya peyv a “dewlet” hatiye havêjtin. Paşgir a “mend” jî wata ya “xwedî, xwedan” dide. Êdî Peyv a “dewlemend” jî wata ya zengîn ê/a xwedî pere nade û wata ya pereyan bi xwe jî nade, ji ber ku ew

bi awayekî giştî, bi heyîn û desthilatdarîyê ve girêdayî ye û ev peyv jî anahîkar e.

Peyv a “dirav” wata ya rast a “pere, mal, coin, money, niqûd” dide û ew bi awayekî xurrû û bê beşdarî evan watayan dide. Hemû ev wata jî keresteyîn (maddî) in û dirav kereste ye. Peyv a “dirav” li peyv a kevn a “zen” dinere û wek wata ya wê ye. Ev peyv li beramber “mal, maliyyetê, finance” e û gerek di biwar ê fermî de ew bi kar bihataya. Gerek li şûna destewaje ya “wezaret a darayî û aborî” destewaje ya “wezaret a diravî û aborî” bi kar bihataya. Ji ber ku peyv a “dara” nam ê kirdedar dide nîşandan û wata ya wê “xwedî heyîn, xwedî hebûn, desthilatdar û zengîn” e, peyv a “darayî” jêder e û wata ya wê “heyîn, hebûn, desthilatdarî û zengînbûn” e. Peyv a “dirav” wata ya “pere, mal, niqûd” bi xwe dide û peyv a “diravî” wata ya “maliyyet, finance” bi xwe dide.

Bi evî awayî, herdu peyv ên “darayî” û “diravî” ne wek hevdu ne, belê peyv a “darayî” ji bo wata ya “maliyyetê, finance” şaş e. Rastî ya evê pirsê ew e, ku peyv a “diravî” wata ya “maliyyetê, finance” dide.

Wata ya destewaje ya “Kurdmançî” çî ye ?

Peyv ên dem ên kevn, ên ku bi karhînan a wan di bin bar ê ne giringî ya watayê de be, wata yê wan di dem ên nû jî de winda dibin. Ango ew peyv û destewaje yê ku di dem ên kevn de sade û serrast hatine gotin û ji bo watayinî destnîşankirî bûne, di destpêkê de xwedî yê wata yê xwe bûne, belê di nav demê de nema naskirin a wata yê wan giring bûye, çimku wata yê wan naskirî bûne û weha ew wata winda bûne, ji ber ku hatine ji bîrakirin. Gelek ji evan peyv û destewaje yê weha bi derbasbûn a dem ên dîrokî yê dirêj re, wata yê xwe winda dikin û ji evê yekê re engîz (sebeb) jî he ne. Em dikarin bibêjin ku engîz a yekem û serekîn ew e, ku dem a ew peyv û destewaje yê weha di rê û rêbaz ên zanistî û wêjeyî de bi kar nehên, wata yê xwe yê bingehîn winda dikin. Dem a ku wata ya bingehîn jî winda dibe, rê ji şegdayîyê (ictîhadê, diligence) re divebe. Xuyanî ye jî yê ku şegdayîyê dikin, têkoşînekê ji ber xwe ve dikin da ku pirsekê çareser bikin an nerînekê pêşkêş bikin an karekî bi serî bikin. Şegdayî jî pirsek rewya ye, belê ne bê zanist, bingeh û vac e, yan jî gerek ne bê zanist, bingeh û vac be û vac lojîk û mentiq e.

Destewaje ya “Kurdmançî” yek ji ewan destewaje û peyv ên ziman ê Kurdî ye yê ku di dem ên gelek kevn de hatine hafirandin. Ev destewaje ji du peyv ên serekîn û resen ên Kurdî pêk hatiye, ku peyv a yekem “Kurd” e û peyv a duyem “mançî” ye. Peyv a yekem naskirî ye û ew bûye nam ê neteweyekê ji netewe yê herî kevn ên rojhilat a nêzîk, belê peyv a duyem nema naskirî ye, herçende ku berê naskirî bûye. Ew kes ên ku di bare ya peyvnasîyê jî de dixebitin, tekela (pîkol) kirine ku wata ya evê destewajeyê bidin xuyakirin û di encam de, gelek

nerîn û şirove yê nêrî vac û dîrî rastîyê derkevtine. Yek ji ewan şirove û nerînan weha ye: [Dem a ku gemî ya Nûh li ser çiya yê Cûdî danî, êdî tenê Kurd li cîhanê man û hemû mirov ên din qirr bûn. Ji ber evê yekê hat gotin ku “Kurd man li cî” û destwaje ya “Kurdmancî” ji destwaje ya “Kurd man li cî” hatiye. Herweha, nam ê peyamber Nûh jî ji peyv a Kurdî “nû” hatiye.]. Nerînek din ji ewan nerînan weha ye: [Manco û Banco nam ên du hoz ên mezin ên Kurdan bûne û ev herdu hoz, di dem ên gelek kevn de hebûne. Manco jî bira yê mezin ê Banco bûye. Destwaje ya Kurdmancî ya ku berê Kurdmanco bûye, weha çê bûye.]. Mixabin jî, ku hemû nerîn û şirove yê nêrî, her di çarçêwe yê evî vacî de ne û hezar mixabin jî, ku heta niha nerîn û şirove, ne li angora kok û resenî ya peyv in. Mixabin ku nerîn û şirove, li angora bûyeran û wata yê nêrî ne kûr in û gelek ji wan jî, li angora daxwaz a derûnê ne.

Di dem ên kevn de, çend gell ên ku di biwar ê regezî de nêzîkî hev bûn, li rojhilat a nêzîk dijîyan. Ew dem ên kevn jî, bi kêmanî bîst hezar sal ên evê dawîyê yê temen ê mirov in. Di evan bîst hezar sal ên dawî de, bav û bapîr ên me mirovan bêtir li rojhilat a nêzîk û navîn akincî bûn, ji ber ku ev dever bêtir ji bo jî nê li kar bû. Ev dever ji bo jî nê bêtir guncayî (munasib) bû, ji ber ku befr bû û ne sehol (ne bûz) bû. Herweha, befrê li evê deverê zûtir û bi leztir dest bi buhujînê kir û rê ji bo jî nê a mirov a li ser xakê vekir. Gulb ên (grûp ên) mirovan, ên evê deverê yê nê ku wek xêzan nêzîkî hev bûn, nêzîkî hev jî akincî bûn. Regez ê Kurd ê yekem û regez ên gell ên din ên ku bi Kurd ve girêdayî bûn û ji regez ê Kurd bûn an nêzîkî regez ê Kurd bûn, li rojhilat a nêzîk akincî bûn û ew dever a ku Somerîyan nam ê wê kir in welat ê du rûbaran û Yonanan nam ê wê kir in Mezopotamiya, navend a ewê deverê bû. Ji ewan gell ên ku di

evan 10-12 hezar sal ên dawî de nam ên wan hat in naskirin jî, Somerî, Sobarî, Gotî, Lûlobî, Horî, Kaşî, Xatî, Arartî, Mîtanî û gellinî din bûn, ku Hindî û Mîdî jî ji nav wan derkevt in. Rast e ku nam ên evan gellan bêtir di hezar ê çar-pênc ê berî zayînê de hatine naskirin, belê ew berî evê dîrokê bi gelekî hebûne û li evê deverê dijîyan. Naminî wan ên din jî hebûne û dê di dem ên pêş de bihên naskirin û weha dê ew gell jî bêtir bihên naskirin. Di evê dawîyê jî de, ango bi kêmanî ji hezar ê dehem ê berî zayînê ve ye. Ev hemû gellana jî akincî yê çiyayan bûn û ji ber evê yekê Somerîyan nam ê “Kûrda cî, Kurda kî” li wan dikir. Peyv a “kûrda cî” ango “cîh ê ku çiya ye” û nam ê “kûrda” yê ku bi xwe nam ê millet ê Kurd e û ji millet ê Kurd re ma û millet ê Kurd pê hat naskirin, wata ya çiyayî dide û peyv a “cî” ya ku di Somerî de “kî” jî ye, her wata ya “cîh” dide. Di ziman ê Kurdî de heta niha jî taybetmendîyek zimanvanî he ye û ew jî ew e, ku pît a “d” bi hinek peyvan ve ye û hinek caran jî ji wan cuda dibe, wek: zer = zerd, mêr = mêrd, pir = pird, kêr = kêrd, ... û heger ku ev pît a han (d) bi peyv a xwe ve be rasttir e. Wek nimûne jî; peyv a “kêr” gerek wek xwe ya berê “kêrd” be, peyv a “pir” wek xwe ya berê “pird” be û peyv a “mêr” wek xwe ya berê “mêrd” be, ji ber ku bi evî awayî resenî ya peyvê dihê parastin û pê re jî arêşeyinî zimanvanî dihên çareserkin. Peyv a Somerî “kûr” a ku bûye “kur” pît a “d” pê ve bûye û ew jî li angora evê binçînê, wek “kûr, kur” hatiye nivîsandin û hinek caran wek xwe ya resen “kûrd, kurd” jî hatiye nivîsandin û wek me got; ev peyv a han di ziman ê Somerî de ango çiya ye. Bi gotînek din û li angora nexşe ya evroj; ev gell ên han ji Hindistanê heta Pakistan, Afganistan, Îran, Iraq, Turkiya, Sûriya û Libnanê belav bûn û di nav evê nexşeyê de dijîyan. Ziman ê hemû evan gellan ziman ê Kurdmancî bû, ango ziman ê çiyayî

yan çiyayîyan bû û ew ziman ji hezar ên salan ve, di nav gell ên Mezopotamiya û rojhilat a navîn de zagîn bûbû û bi taybetî jî, di nav gell ên çiyayî yên çiya yên Zagroz, Ararat, Toros, Amanos, Metîna û heta Hemrîn zagîn bûbû. Ji xwe gell ên evê deverê çiyayî ne, ji ber ku xwedî yên evan çiya yên mezin û dirêj in û navend a evan çiyayan bi xwe jî çiya ne. Herweha, cih ê mayîn a guncayî ya mirov bû, ji ber ku çiya şkeft ên ku ji wan re xanî bûn berdest dikir. Di bawerî ya me de, peyv a “kûr, kur, kûrda, kurda û karda” ya Somerî, dever a çiyayî nîşan dide û bi taybetî jî, dever a niha ya ku Kurdistan e nîşan dide û ev peyv a han hem Somerî ye û hem jî Kurdî ye. Peyv a “bakur” di xwe de ewê watayê dihilgire, ku beş ê wê yê yekem “ba” xuyanî ye ka çî ye, belê beş ê wê yê duyem “kur” peyv a çiya ya kevn a Kurdî-Somerî ye. Wata ya evê peyvê (bakur) dibe ba yê sar ê ku ji alî yê çiya ve dihê û ew herdem ji serî ve û ji alî yê bilind û jor ve dihê. Weha wata ya peyv a “kûr, kur” a Kurdî -Somerî dibe alî yê jor jî û weha ew hem ji bo çiya ye û hem jî ji bo jor e. Çiya di ser mirov re ye û li jor e û ev ji bo Somerîyan bi xwe jî weha bû, çimku ew ji dever ên çiyayî hat in xwarê û êdî li deştê diman û ew deşt xaknîgarî ya naverast û başûr ê Iraq a niha bûye.

Weha me bi kurtî nas kir ka peyv a “Kurd” ji kuda hatiye, belê peyv a “mancî” çî ye û dibe ku çî be ? Peyv a “mancî” angoy ziman e.. belê ziman e. Ev peyv a han ziman ê Kurd dide nîşandan – ziman ê ewan çiyayîyan dide nîşandan – û em dibînin ku ew weha bê destnîşankirinek taybetî ye, angoy ew ji bo hemû ewan gellan e yên ku bi evî zimanî peyivîne û dipeyivîn. Bi rastî jî weha bûye. Angoy ew gell ên evê deverê bi ziman ê Kurd-mancî dipeyivîn, ku Kurdmancî ziman ê çiyayî û çiyayîyan e. Raz a (sirr a) ku ziman ên evan gellan heta niha jî nêzîkî hev e, di evê çendê de ye. Angoy “Kurdmancî” ziman ê peyivîne yê hemû

gell û gulb ên mirovan, ên evan dever ên destnîşankirî bûye. Weha jî “Kurdmancî” ne zaravek ji zarav ên ziman ê Kurdî ye, belê ew ziman ê Kurd bi xwe ye û ziman ê hemû Kurd e û hemû zarav ên heyî yên ziman ê Kurdî, jê derkevtine. Kurdmancî angò ziman ê Kurd e, ji ber ku ev ziman di bûyîn a xwe ya resen de ji Kurd re ma û Kurd ew gell e yê ku di Mezopotamiya û rojhilat a nêzîk de bi cih bû û nam ê xwe ji çiya wergirt, an jî nam ê çiya lê hat danan. Kurd nam ê neteweyê ye û “mancî” ziman e. Peyv a “mancî” ji peyv a “ziman” cuda ye, ku ziman ew parçe yê goşt e yê ku di dev de ye û di ber peyivînê û hinek kiryar ên din de berpirsyar e. Kiryar ên ku ziman ê nav dev pê dirabe jî bêtir fîzîkî ne û girêdayî laş ê mirov in, belê “mancî” amraz ê peyivînê ye û di ziman ê Erebi de jê re “luxe, elluxe” dibêjin û di ziman ê Englîzî de jê re “language” dibêjin. Angò peyv a “mancî” wata ya “luxe, language” dide û di resenî ya xwe de “manc” e. Kurdmanc jî angò ew gell ê ku bi Kurdmancî dipeyive û Kurdmancî ne zaravek ji zarav ên ziman ê Kurdî ye, belê ew ziman ê Kurd – hemû Kurd – bi xwe ye. Ji ber evê yekê jî, di Kurdmancî de heger heta radeyekî jî be, guraî ya (kamilbûn a) rêzimanî he ye, ku di ti zarav ên din ên Kurdmancî de ew guraî peyda nabe. Weha Kurdmancî mak û kanî ya hemû zarav ên Kurdî ye, çimku ew ziman ê Kurdî bi xwe ye, ew kok û bingeh a ziman ê Kurdî ye û hemû zarav ên heyî yên Kurdî jê derkevtine. Ev mancî ya han (ev ziman ê han) ji hezar ên salan ve he ye û ew di bin merc û kawdan ên (zerf ên) destpêkî yên çêbûn a mancîyan (zimanan) de çê bûye. Angò ev mancî (ev ziman) ji dem a livîn a ziman ê nav dev ê mirov ve çê bûye, ku ew dem bi xwe nahê zanîn ka kengî bûye. Belê bi giştî hatiye zanîn, ku nîfş ê mirov xwedî yê hafirandin a mancî ye (xwedî yê hafirandin a ziman e). Xweda weha xwaztibûye, ku nîfş ê mirov xwedî yê

mancî be.

Di dawî jî de tiştêkî suriştî bûye, ku mancî ya Kurdî bi nam ê Kurd be, ji ber ku ev mancî ji Kurd re ma û bû arzû yê Kurd, herwek çawa nam ê çiya (kûr, kur, kûrd, kurd) ji Kurd re ma û Kurd ew civak a çiyayî ye, ya ku di rojhilat a nêzîk de bi cih bû û bi tevî hemû şerr, hêrîş û cengan bi ti dever ên din ve neçû. Ew arzû yê Kurd e jî, ji ber ku Kurd ev mancî parast û hîne jî diparêze. Ji hemû jî giringtir ew e, ku navend a hafirandin û bi karhînan a mancî ya Kurdî (Kurdmancî) Kurdistan bi xwe bûye û Kurdistan navend a welat ê çiyayan e. Herweha, gerek bihê zanîn ku peyv a “mancî” peyvek mê ye, ango nabe em bibêjin “mancî yê me” belê divê em bibêjin “mancî ya me”. Destewaje ya “mancî ya me” jî ango “ziman ê me” ku peyv a “mancî” mê ye û peyv a “ziman” nêr e. Engîz a ku peyv a “ziman” nêr e ew e, ku ew berî her tiştêkî din di peyivîn a Kurdî de nêr e. Kurd dibêjin “ziman ê me” û ne gotine “ziman a me”. Belê peyv a “mancî” mê ye, ji ber ku peyivîn mê ye û mancî û peyivîn mê ne, ji ber ku salix ên dayîn û berhemdanê tê de he ne. Ev pirs a han weha dike ku heger mancî ziman be, dê rêziman jî binçîn be. Peyv a “rêziman” jî di peyivînê de mê ye, ji ber ku peyv a wê ya serekîn a ku “rê” ye mê ye. Me berî niha jî dabû nîşandan, ku di pirs a nêr û mê de, peyv a serekîn (peyv a yekem) a peyv a hevger bingeh e. Weha jî ev pirs di mancî de (di ziman de) akincî dibe (bi istiqrar dibe) ku ziman mancî ye û rêziman binçîn e. Mancî ya Kurdî ango ziman ê Kurdî ye û binçîn a mancî ya Kurdî ango rêziman a ziman ê Kurdî ye.

Çima Kurdmancî mak û kanî ya ziman ê Kurdî ye ?

Kurdmancî – ango ziman ê Kurd – kok a ziman ê Kurdî ye, ji ber ku ev ziman di dem ên kevn de giştî bû û ji hemû gell ê Kurd re bû. Heger dem a ku hinek zarav ên Kurdî yên wek zazakî, soranî, hewramî, goranî, lek û lurrî ji Kurdmancî çê bûn û taybetmendîyînî dûrî Kurdmancî di wan de he ne, ew ji ber ewê yekê ye ku ev zarav ên han piştî çêbûn a xwe û derbasbûn a demek a destnîşankirî, kevtine bin sirêm a (bandor a) zimanînin din ên heyî yên wek Parsî, Îlamî, Xatî û Erebî. Em dikarin bibêjin ku zarav ên wek soranî, hewramî, goranî, lek û lurrî kevtine bin sirêm a ziman ê Parsî û Îlamî yê kevn û zarav ên wek zazakî û yên wek wê yên li rojava ya bakur ê Kurdistanê, kevtine bin sirêm a ziman ên Parsî, Xatî û rojavayî yên serdem ên kevn, ên ku li rojava ya welat ê Kurd akincî bûn. Ziman ên Îlamî, Parsî û Xatî jî, sê ziman ên ji dar a Kurdmancî ne û li angora demê jê dûr kevtine û her yek ji wan bûye darek bi ser ê xwe. Sirêm a ziman ên gell ên li dor a xaknîgarî û demografiya ya Kurd, li ziman ê Kurdî hebûye û he ye, herwek çawa sirêm a Kurdmancî jî li ziman ên evan gell ên li dor a Kurd hebûye. Em dibînin ku Kurdmancî darek zimanvanî ya serbixwe ye, ji ber ku di dem ên kevn de ew bi ser ê xwe xuya bûye û wek ziman ê Çînî yê li rojhilat, ziman ên hoz ên rojava ya zemînê (ango ziman ên Amerîkayî) û ziman ên Afrîkayî, taybetmendî ya xwe hebûye. Me weha jî daye nîşandan ku cih ê zagîn û belavbûn a Kurdmancî rojhilat a nêzîk bûye û em dikarin bi kêmî û yanizî bibêjin, ku hîne jî weha ye belê di belavbûnê de kêmî çê bûye.

Ji bilî giştîbûn a Kurdmancî ya ku di dem ên kevn de li hemû rojhilat a nêzîk belav bû – ji ber ku rojhilat a nêzîk bi xwe war ê Kurd bû – fermîbûn a Kurdmancî jî he ye û ev fermîbûn hem

ji zengînbûn û binçîneyî ya Kurdmancî dihat û dihê û hem jî ji resenî ya Kurdmancî dihat û dihê. Kurdmancî kok û bingeh bû, kanî û jêder bû û giştgîr bû û niha jî her weha ye. Binçîneyî jî ango rêzimaneyî ye, ango Kurdmancî di biwar ê binçîneyî (rêzimanî) de têr bûye û salix ê dernûyê (derbîrînê, te`bîrê, expression) tê de hêzdar bûye. Evroj jî salix ê têrî ya binçîneyî û dernûyî, di Kurdmancî de he ye û gelek jî hêzdar e.

Tişt ê dihêle em bibêjin ku Kurdmancî mak û kanî ya ziman ê Kurdî ye ew e, ku yekem di biwar ê dîrokî de ew bingeh e ji ber ku gelek kevnar e, duyem di biwar ê surîştî de ew jêder e ji ber ku danyar e, sêyem di biwar ê zanistî de ew şîraz a zimanvanî diparêze û di evî biwarî de nêzîkî gurahîyê (kamîlbûnê) ye. Heger em di biwar ê datakan de li ziman ê Kurdî yê giştî yê bi hemû zarav ên xwe ve binerin, em dê bibînin ku hemû ev datak ên han Kurdmancî ne, ji ber ku jêder a wan a dîrokî û civakî Kurdmancî ye. Wek nimûne jî.. peyvek wek “verûjandin” di zarav a başûrî de “wurûjandin” e, peyvek wek “giş” di zarav a başûrî de “gişt” e, peyvek wek “ebor” di zarav a başûrî de “abor” e, ango datak ên Kurdmancî di zaravan de li angora zaravan hatine kêmkirin, yanizkirin, guherandin û guncandin. Herweha, Kurdmancî ewqas fireh û giştgîr bûye, ku têr a hemû zaravan kiriye û bi ser wan de belav bûye. Ango peyv ên Kurdmancî bûne pehr a hemû zaravan. Di bin bar ê sirêm ên corane jî de, di her zaravekê de taybetmendî yên zaraveyî çê bûne. Belê gelek mixabin, ku ew taybetmendî yên zaraveyî gelek kûr in û weha kirine hinek bibêjin; ku hinek zarav he ne êdî bi ser ê xwe ziman in. Wek nimûne jî, hinek kes zarav a hewramî wek zimanek din amar dîkin, ji ber ku ew taybetmendî tê de kûr in û hîştine ku gelekî ji Kurdmancî dûr be.

Hemû peyv ên nav hemû zarav ên ziman ê Kurdî, Kurdmancî

ne û di nav zaravan de taybetmendî yê nwe wergirtine. Ji bilî evê yekê; Kurdmancî ewqas berfireh û berbelav bûye, ku sirê m li ziman ên Ewropayî jî kiriye. Hebûn a peyv ên Kurdmancî di nav zimaninî wek Englîzî, Fransayî, Germanî, Romî, ... û heta bi Rûsî, nîşan a evê yekê ye. Dem a em dibêjin; ku hebûn a peyv ên Kurdmancî di nav ziman ên Ewropayî de ji ber ewê yekê ye ku Kurdmancî jî yek ji ziman ên dar a Arîyayî ye, em şaşîyek mezin dikin. Ji ber ku ev dar a han a Arîyayî, ne rast hatiye şirovekirin. Ewropayîyan nam ê evê darê geh kirine Hindo-Ewropayî û geh kirine Hindo-Îranî û ev herdu sap (çîq) ên han, kirine çîq a darekê û ev yek di biwar ê surîştî de şaş e, herwek ew di biwar ê dîrokî û civakî jî de şaş e. Şaşbûn a wê ya di biwar ê zimanvanî jî de he ye, ji ber ku her yek ji ewan ziman ên hatine destnîşankirin, bi ser ê xwe darek a ziman e. Ango Ewropayîyan di evî biwarî de şaşîyek zanistî kirine. Ji darê re tov he ye, reh he ne, sap (çîq) he ye û şax he ne û Kurdmancî bi xwe darek a ziman e û serbixwe ye. Ji Kurdmancî şax derkev-tine û Kurdmancî ne şaxek a ziman e û ji hinek dar ên din ne derkev-tiye. Dar a Kurdmancî bi ser ê xwe çê bûye, di rojhilat a nêzîk de hatiye avdan û şax ên wê ji rojhilat a nêzîk ve ber bi cih ên din ve çûne. Ev gotin a me ne dilînî û dînarî ye (ne sozdarî û atîfe ye) ev gotin ji nav girov ên (delîl ên) dîrokî û civakî yê dûr û dirêj ên herê m a rojhilat a nêzîk ve diderkeve. Hemû ew dîziran ên (keşf ên) dîrokî yê n ku heta niha derkev-tine, di biwar ê ziman de ji me re didin biyaşkirin ku çênî yê n (xelk ên) rojhilat a nêzîk, bi Kurdmancî peyvîne yan jî di bin sirê m a Kurdmancî de bûne. Ango çênî yê n Kurd, ên evê deverê bi Kurdmancî peyvîne û bi kêmanî sirê m a Kurdmancî li çênî yê n din, ên ne Kurd jî bûye.

Ew dar a zimanan, a ku ji alî yê Ewropayîyan ve hatiye danan

tije kêmanî ye û dûrî rastî ya zanistî û dîrokî ye. Em dibînin ku dar hemû wek hev in, belê tov ê wan û berhem ê wan ne wek hev in. Di bare ya zimanan jî de, her zimanekî serekîn darek e û xwedî ya tov ê xwe û berhem ê xwe yê taybetî ye. Di dawî jî de hemû dar di biwar ê surîştî de ji nifşekî ne, wek çawa ku hemû mirov ji nifşekî ne. Ango gerek ziman ê Kurdî ne ji kok a dar a ziman ê Hindo-Îranî baya – wek çawa ku di dar a Ewropayîyan de hatiye xuyakirin – belê gerek wek darek a serbixwe bihatiba xuyakirin. Bê goman e jî, ku ji her darekê re şax he ne û şax ên dar a ziman, zarav ên wî zimanî ne. Bi evî awayî kok a dar a ziman ê Kurdî Kurdmancî ye û şax ên wê zarav ên wek zazakî, soranî, lurrî û yê din in. Ev nerîn a me di bare ya hemû ziman ên mirovan de weha ye. Wek nimûne.. ziman ê Englîzî darek a zimanvanî ya taybetî ye û şax ên wê zarav ên wê ne, ziman ê Erebbî darek a zimanvanî ya taybetî ye û şax ên wê zarav ên wê ne û ji bo her zimanekî din jî weha rast e. Ji bilî evê yekê, ne tenê zarav şax ên dar a ziman in, devok ên zimanvanî jî pop û çuqlî yê dar a ziman in. Ango em dikarin dar a ziman ê Kurdî weha nîgar bikin; ku tov, reh û sap an çîq ên kok a ziman ê Kurdî Kurdmancî ye, ji evê sapê (çîqê) şax diderkevin û ew şax zarav ên serekîn ên ziman ê Kurdî ne û ji şaxan devok û şêwaz ên din ên peyivînê diderkevin. Ev nîgar ê han, ji bo her zimanekî din ê ser rû yê evê zemînê jî weha ye.

Ji bilî evê yekê, heger em bibêjin ku ziman ên mirovan hemû ji yek darê ne, hîngê dê darek bihê nîgarkirin û dê tê de hemû ziman ên mirovan bihên dîyarkirin. Belê di nîgar a evê darê de, naskirin a ziman ê yekem ê ku kok a hemû ziman ên mirovan bû pêwîst e û ev pirs a han jî, hîne ne hatiye vebirrkirin û yekalîkirin. Ango di encam de em du cor ên dar ên zimanan nas dikin: 1- Cor ê yekem ew e, ku her zimanek darek e û şax û çuqlî

yên evê darê zarav, devok û şêwaz ên din ên peyivînê yên evî zimanî ne.

2- Cor ê duyem ew e, ku ji hemû ziman ên hemû mirovan re darek he ye. Belê kîjan ziman ziman ê destpêkê û ziman ê mak bû ye, hîne ne hatiye naskirin an jî hîne ne hatiye gotin û dest-nîşankirin.

Weha em dikarin bibêjin, ku cor ê yekem ê dar a ziman taybetî ye û cor ê duyem ê dar a ziman giştî ye. Ev herdu dar jî di surîştê de nîşekî hafirandin a Xwedayî ne, ji ber ku tov ê wan û giyan ê wan yek e.

Heger em niha jî li nexşe ya belavbûn a ziman ê Kurdî binerin, em dê bibînin ku hîne jî Kurdmancî belavtirîn e. Hemû çênî yên bakur ê Kurdistanê bi Kurdmancî dipeyivin û zaravek wek zazakî jî ji Kurdmancî ye, hemû çênî yên rojava ya Kurdistanê bi Kurdmancî dipeyivin, çênî yên beş ê bakur ê başûr ê Kurdistanê – ango nêzîkî nîv ê çênî yên başûr – bi Kurdmancî dipeyivin û zaravek wek badînî jî ji Kurdmancî ye û çênî yên beş ê bakur ê rojhilat a Kurdistanê jî – ango nêzîkî nîv ê çênî yên rojhilat a Kurdistanê – bi Kurdmancî dipeyivin. Ev nexşe ji me re dide xuyakirin, ku hîne jî pirranî ya millet ê Kurd bi Kurdmancî dipeyive û ev jî di biwarê bingehîn a Kurdmancî de pîrsek girîng e, ji ber ku ev pîrs bi petîbûn a ziman ê Kurdî ve girêdayî ye û bi hemû pîrs ên zimanvanî yên bingehîn ve jî girêdayî ye. Em ewê nexşe ya belavkirî ya zaravê Kurdî şaş dibînin – ku ew nexşe kirine sê beş û jê re bakur, naverast û başûr gotine – ji ber ku zaravê beşê li xwarê yê nexşe ya Kurdistanê ji hev in û nêzîkî hev in. Weha jî em dibînin ku Kurdmancî du beş e; beşê bakur e û beşê başûr e. Kurdmancî ango zimanê Kurdî, du beş e û di evê nivîsandin a derbasbûyî de hat dîyarkirin, ku Kurdmancî zimanê Kurd e (Kurdziman e) û zaravê wî ji bakur heta başûr

dibin du beş, ku zaravînê wek botanî, zazakî, badînî, mukrî û yê
din Bakurî ne û zaravînê wek soranî, goranî, hewramî, lekî, lurrî
û yê din başûrî ne. Kurdmancî bi xwe jî ne zarav e, belê ziman
ê Kurdî bi xwe ye û hemû zarav ên ziman ê Kurdî, ji Kurdmancî
derkevtine û taybetmendî yê xwe yê civakî, dîrokî û surîştî
wergirtine.

Wata û şirovekirin a peyvvan

A

Afend: gemş. Perxaş. Bi Erebi jê re sîra`, nîza` dibêjin. Bi Englîzî jê re conflict dibêjin.

Afirînar - hafirînar: çêkar, xaliq, ê ku çê dike. Xweda hafirînar ê her tiştêkî ye.

Ajawe: gerebol, anarşî. Ne rêkî û ne pêkî ye. Tevehevî ya hizrê, kanis û reftaran e. Bê endazeyî ya hizrê, kanis û reftaran e.

Ajel: heywan. Giyandar ê ji bilî mirov e.

Akinc: sakin, sukûn, neliv. Di ziman ê Erebi de nîşanek a biza-
vtinê ye û dem a ku li ser pîtekê dihê danan, ewê pîtê diraw-
estîne ango disekinîne û bê liv dike.

Akincî: musteqirr, bi istiqrar, bi cih. Sakin. Mirov ê ku li cihekî
akincî be, wata ew mirov li wir dimîne.

Alavend: wasîte, tişt ê ku ji bo encamdan a karekî ji mirov re
dibe alîkar. Alavend alavek a keresteyîn an watayîn e û kar pê
dihên encamdan.

Amad: dem a niha, nihayî, present. Amad ji peyv a “amade”
hatiye û ew di rêziman de nîşan a dem a niha ye.

Aman: firax, awezend ên (kel û pel ên) xwarin û vexwarinê ji
wan re “aman” dihê gotin.

Amarkirin: hesabkirin, hesibandin, hesabkirin.

Amerzî: efû ye. Efûkirin e.

Amêtebûn: mîks, tevhevî ya du tiştan û bêtir, imtizac, indimac.

Anahî: icaze, izn.

Anahîkar – Anahîdar: metaphorical, mecazî.

Antaxî: ger a li duv şopê, li dûvçûn.

Arcimend: muhterem.

Arêşe: muşkile, problem.

Arzû: mulk, mulkiyet.

Asayî: normal.

Awat: hêvî, rica, umêd. Bi Erebi jê re tetellu`at dibêjin.

Awejû: qulipandî.. awejû bike: biqulipîne.

Awezend: kel û pel, tişt û mişt.

Awîz: cîhaz, apparatus.

Aya: gelo

Ayaz: safî, qal

Ayinde: dem a dahatî, dem a bihê. Bi Englîzî future jê re dibêjin. Bi Erebi musteqbel jê re dibêjin.

Aza: dilêr, mêr, bi ceger.

Azirandin: verûjandin, hilkirin a tişteki yan pirsekê.

B

Bala: bilind, herî bilind ê biwar ê watayîn.

Berawirdî: hemberî, hemberkirin, muqarene.

Berdewerî: mutleq, bê dawî, bê sînor.

Bergo: ê/a ku peyv li ser e û peyv ji bo wî/wê ye.

Berkirde: objekt, ê/a ku kar lê dihê kirin, ê/a ku kirde li ser e û dikeve bin bar ê kirde.

Berkirdevîn: derbas. Têperr. Ew kirde ye yê ku di hevekê de pêwîstî berkirde ye û wî dixwaze, da ku wata ya hevekê girah bibe. Kirde yê berkirdevîn bi berkirde ve girêdayî ye.

Bêhvan: filan, bi Erebi filan e û bi Kurdî bêhvan e.

Bêtar: bi Erebi muşkile, mu`dile ye. Bi Englîzî problem e.

Binçîn: qayide, bingeh a tiştan, bingeh a hemû pirsekê.

Binema: bingeh a ku li ser dihê avakirin.

Birrlan: zîvar. Hûr û mûr ên pirsekê. Bi Erebi tefasîl e. Bi Englîzî detail e.

Biyaş: isbat, tesbît, bi awayekî hetmî û sabit.

Bînarî: teyorî, nerîn a heyvizandî ya di bare ya pirseke de.

Bîrdank: zakîre, memory. Bi Erebi zakîre ye. Bi Englîzî memory ye.

Bîrdoz: memorandum, muzekkire. Wata ya evê peyvê muzekkire ye û ne teyorî ye, ango bîrdoz nivîsînek e yan her tişteki din e ku pê tişteki dihê bîr a mirov an tişteki dihîne bîr a mirov. Bi Erebi muzekkîre ye. Bi Englîzî memorandum e.

Bone: munasebet, hilkevt a pirseke.

Buhur: memerr, passage, cih ê derbasbûnê. Bi Erebi memerr e. Bi Englîzî passage jê re dibêjin.

Buhurîn: trafik, murûr, jê re “hatûço” dibêjin û “hatûço” gelek şaş e. Bi Erebi murûr e. Bi Englîzî traffic e.

Bûngad: kewn, kayinat, univers. Bi Erebi kewn e. Bi Englîzî univers e.

Bûwer: dibe, mumkin e, mumkinat.

C

Carag: namnîşan, adres.

Corane: cor bi cor.

Cûn: reng ê cûn, reng ê di navber a reş û sipî de. Bi Englîzî gray ye. Bi Erebi remadî ye.

Ç

Çande: kultur e.

Çemandin: tewandin, xwehrkirin.

Çesp: lezqe, şîrêz.

Çêh: behs, çêh li te dikim: behs a te dikim, qal a te dikim.

Çênî: xelk, jê re “şênî” dibêjin û ew bi xwe “çênî” ye. Bingeh a evê peyvê “çê” ye û “çêkirin” jê ye.

Çist: bi bizav, bi hereket, çalak. Bi Erebi neşît e.

Çîminî: buhurîn. Bi Erebî murûr e. Bi Englîzî traffic e.

D

Daber: bi sûd, sûddar, bi fayde.

Daçinîn: hilkirin a berhem ên daran an her tişteki din.

Dagoyî, dagoyîn: binaşt. Bi Englîzî negotiation e. Bi Erebî mu-fawedat, tefawud e.

Dakarî: mu`amele, te`amul, deal.

Dara: zengîn, dewlemend.

Dariman: wêranbûn, herriîn.

Darin: selbî, negatîv. Bi Erebî selbî ye. Bi Englîzî negative jê re dibêjin.

Darû: alavek e ku du ga wê dikişînin û gullî yê genim pê dihên hûrkin, da ku lib ên genim ji gullî ya xwe biderkevin. Cencere ye.

Dasazî: rêzîn, tertîb.

Dasazîn: rêzînî, tertîbî.

Datak: peyv ên ziman. Bi Erebî mufredat e. Bi Englîzî vocabu-lary ye.

Daylan: herî zana û herî dana. Bi Erebî ebqerî ye. Bi Englîzî ge-nius e.

Delîve: mecal, furset.

Dekin: deq, tekist, nes.

Deramî: xerîb.

Derazîn: derî yê mezin ê derbasbûnê û çûn û hatinê. Bi Erebî medxel e.

Derbend: derteng, buhur a nav du çiyayan.

Derber: bi sebr, bi tehemmul.

Derev: qalib.

Derkar: cih ê derçûnê. Bi Erebî mexrec e. Bi Englîzî exit e.

Dernû: derberrîn jê re dibêjin. Ango derberrîn a hizr û bîran, peyv û hevkan e. Bi Erebî jê re te`bîr dibêjin. Bi Englîzî jê re expression dibêjin.

Derûnî: nefsî, girêdayî nefsê.

Derxone: dapoş a amanê, wek dapoş a beroşê yan her amanek a din.

Dijgar: nakok. Bi Erebî mutenaqid e. Bi Englîzî contradiction e.

Dijûn: cimîn, xeber. Bi Erebî seb, şetim e.

Dilêr: xwedî yê dil ê bi hêz.

Diverûjînin: di hazirînin, isare dikin, hil dikin.

Diwît: hibir, av a şîn an reş a nivîsandinê.

Dîd: re`î, ra, ra û boçûn, nerîn a di bare ya pirsekê de. Bi Englîzî opinion e. Bi Erebî re`î ye.

Dozîname: kart a de`wetkirinê, kart a daxwazkirinê.

Dozir, dîzir, dîziran: keşf, discovery. Bi Erebî keşf e. Bi Englîzî discovery ye.

E

Engîz: sebeb.

Exter: hesare, kewkeb, planet. Bi Erebî kewkeb e. Bi Englîzî planet e.

F

Fena: heyet. Çend kes bi hev re heyetekê pêk dihînin û karina encam didin.

Fermî: resmî.

Fêrdar: mamosta.

G

Geda: xwazok, feqîr, me`dûm, miskîn.

Gemş: afend. Perxaş. Rikberî. Bi Erebî sîra` jê re dibêjin. Bi Englîzî conflict e.

Gerin: rol, dewr. Bi Erebî dewr e. Bi Englîzî rol e.

Girçin: zehmet.

Girjûz: mikrob e. Kurdan ji giyanewer ên bi zîyan ên hûr ên nav avê re gotine girjûz.

Giyanî: rûhî.

Gîrekirin: şiddandin. Şedde.

Guf: qelew. Bi Erebî zexm e. Bi Englîzî amplify ye.

Gulb: komek a tiştan, grûp.

Guncayî: munasib, lêhatî.

Gurah: sip, kamil, tam, tamam, perfekt.

Goranî: sitran, song.

Gos: heşere, insect. Bi Erebî heşere ye. Bi Englîzî insect e.

H

Helo: baz, firrînde yê baz.

Heman: eynî, nefis a tiştî, bêhvan tişt bi xwe.

Hemgirî: demme. Di zîman ê Erebî de nîşanek a bizavtinê ye, wek pît a “u” ye û gîrekirin a wê jî wek “un” e.

Henase: nefes.

Henbarkirin: xezinkirin, hilan. Bi Erebî texzîn e.

Herz: qîmet, nirx.

Hetav: rok, xor. Bi Englîzî sun e. Bi Erebî şems e.

Hevahengî: tevrêzî. Bi Erebî tensîq e. Bi Englîzî coordinate jê re dibêjin.

Hevjîyar: jîn a pêk ve. Bi Erebî te`ayuş e. Bi Englîzî coexistence jê re dibêjin.

Hevsazî: sazan. Bi Erebî tewafuq e.

Heyvizandin: siyaxe, formula. Bi Erebî siyaxe ye. Bi Englîzî for-

mula ye.

Hêma: remz, elamet.

Hêmin: hêdî, rehet. Bi Erebi hadî`. Bi Englîzî quiet.

Hilawîstin: daliqandin, elliqandin.

Hilend: gelek bilind, serbilind, serfiraz.

Hilîn: pirs a girêkandî. Bi Erebi luxz e. Bi Englîzî mystery ye.

Hilmend: bilindkirî, bilindî.

Hinder: hindir, hundur, hundir, hindur, ew bi xwe hinder e.

Hiyûn: tehfil, tahir, tehare.

Hobar: fêm, fehîm, fam, têgihîn, understanding. Ez hobar bûm, min hobar kir: min fam kir. Ez hobar dikim: ez fam dikim. Ez dê hobar bikim: ez dê fam bikim. Hobar bike: fam bike.

Hobarî: fêmkirin, fehmkirin, famkîrin, têgihîjtin.

Hormezî: xêr, xêrat, xêr û xêrat.

J

Jêlî: hej, lerizîn. Bi Erebi ihtîzaz e. Bi Englîzî vibration e.

Jûlîn: parazît ên radyoyî. Bi Erebi jê re teşwîş dibêjin. Bi Englîzî jê re jamming dibêjin.

Jûr: ode.

K

Kan: mincem. Cihekî bin xakê ye û tê de tûnc (me`den) an her hormezîyek a din a evê zemînê he ye. Kan di bin xakê de, di şkeftan de û di buhur ên bin çiyayan de he ne.

Kanis: adet. Bi Erebi adat û teqalîd e. Bi Englîzî habit e.

Kardan: infî`alat, emotion. Bi Erebi infî`alat jê re dibêjin. Bi Englîzî jê re emotion dibêjin.

Kardayîn: mu`amele, mu`amele ya karekî.

Kehêndar: mudîr, rêvebir.

Keresteyîn: maddî.

Keval: tablo, lewhe. Bi Erebi lewhe ye. Bi Englîzî painting e.

Kewden: nehobar, bê hiş. Bi Erebi xebî ye. Bi Englîzî stupid e.

Kêlgeh: cih ê çandinê û kêlanê. Bi Erebi mezre`e ye. Bi Englîzî farm e.

Kêsan: tesrîf, conjugation. Bi Erebi tesrîf e. Bi Englîzî conjugation e. Kêsan ango rewş û pergal ê kirde yê di dem ên amad, mêjîn, ayinde û xizavê de ye.

Kilês: xerab. Xerabe. Ew mirovekî kilês e, ango ew mirovekî xerab e.

Kirdarîni: fa`ilîyyet, effectiveness. Bi Erebi fa`ilîyyet e. Bi Englîzî effectiveness e.

Kirde: fi`l, verb. Nam ê “kar” di rêziman de “kirde” ye. Kirde û kar bi xwe jî, di watayê de ji hevdu cuda ne.

Kirdedar: fa`il, subject. Bi Erebi fa`il e. Bi Englîzî subject e.

Kirdedarvîn: ne derbas, ne têperr, têneperr. Ew kirde ye yê ku di hevekê de pêwîstî kirdedar e û wî dixwaze, da ku wata ya hevekê gurah bibe û kirde yê kirdedarvîn ne pêwîstî berkirde ye.

Kirik: lewa, lefz. Bi Erebi lewz e. Bi Englîzî pronunciation e.

Kişan: amraz ê kişanê, pêrbest. Bi Englîzî preposition e.

Kopîd: ser ê herî bilind. Bi Englîzî summit e. Bi Erebi qimme ye.

Korzî: rukn, erkan, pillar. Bi Erebi rukn, erkan e. Bi Englîzî pillar e.

Kotar: mecbûr, bê perwa.

L

Ladan: nehiştin, rakirin, renkirin.

Lawaz: weza, ze`îf.

Lêfan: mezinkirin a pirsekê yan tiştêkî ye. Bi Erebi mubalexe ye.

Bi Englîzî exaggeration e.

Lêj: cih ê vêl û ser ber jêr. Bi Erebî munheder e. Bi Englîzî cliff e.

Lêl: şêlû, ne zelal, ne safî.

Lêmişt: lehî.

Lêr: çîrr, darisatanek a lêr wata daristanek a tije dar û dar ên wê di nav hev de ne yan gelekî nêzîkî hev in.

Lîn: kawdan. Bi Erebî zerf e. Bi Englîzî adverb e.

M

Mezendekirin: texmînkirin.

Mêjîn: derbasbûyî, dem a derbasbûyî. Bingeh a evê peyvê “mêj” e û wata ya wê dem a derbasbûyî ya bûyî ye. Ji ber ku dîrok jî dem a derbasbûyî ye, dîrok û mêjû heman watayê didin. Bi Erebî madî ye. Bi Englîzî past e.

Mizgo: xutbe, xitabe, kelim.

Mizgober: ê/a ku peyivîn jê re û pê re ye. Bi Erebî muxateb e.

Mizgovan: ê/a ku dipeyive. Bi Erebî muxatib, mutekellim e.

Milahîm: bi edeb. Bi Erebî mu`ddeb e. Bi Englîzî polite jê re dibêjin.

Mirwarî: bi Erebî jê re lu`lu`, le`ali` dibêjin. Bi Englîzî pearl e.

Mî: lawaz, weza, ze`îf.

Mîvin: hevgir. Bi Erebî jê re murekkeb dibêjin. Bi Englîzî jê re compound dibêjin.

N

Nacûr: xerab, ne di rê de kilês, çêvsa.

Namo: xerîb, nenas.

Nerît: urf û adet.

Nijwe: rênivîs. Bi Erebî imla` jê re dibêjin. Bi Englîzî dictation e.

Niza: du`a.

Nîgar: resm, resim.

Nîşe: têbînî, mullaheze.

P

Pagog: gog a pa, gog a pê, fûtbol, football.

Palinar: tiştê ku dihêle tiştekan bihê kirin. Bi Erebi dafi` jê re dibêjin. Bi Englîzî motive jê re dibêjin.

Paras: rehbik. Bi Erebi rahib jê re dibêjin û rehbik jê hatiye. Bi Englîzî jê re monk dibêjin.

Parzadî: îştîqaq, derivation. Dem a ku di rêziman de peyv ji hev dihên derxistin parzadî çê dibe. Bi Erebi îştîqaq e. Bi Englîzî derivation e.

Pasawe - pasaw: engîz a ku ji pirsekê re dihê pêşkêşkirin. Bi Erebi muberrir e. Bi Englîzî justification e.

Peçivîn: iltihab. Birîn dipeçive ango birîn iltihabê digire.

Pena: şikêr, cihê ku mirov xwe lê digire da ku bihê paraztîn.

Penhan: veşartî, perdekirî, ne dîyar. Bi Erebi mechûl, mexfî ye.

Pergal: hal, hale, rewş a giyanî.

Perş: belavekirî, belavbûyî, belav.

Perxaş: gemş. Afend. Rikberî. Lêkdan. Bi Erebi sîra`, nîza`. Bi Englîzî conflict.

Peşarî: komeyî. Konevanî. Siyaset.

Petî: zimanê petî, zimanê standard, zimanê fesîh, fusha, zimanê paqijê li angora rêziman.

Peyarbûn: meş.

Peyvevan: ê/a ku dipeyive, mutekellim.

Pêksaz: siwarkirî. Bi Erebi murekkeb. Bi Englîzî compound.

Pêsor: qeyran. Bi Erebi ezme ye. Bi Englîzî crisis.

Pêst: çerm, cild.

Pirşingdar: bi ronahî, ronahîdar. Bi Erebi lami`, mudî`. Bi Englîzî

bright.

Pirtewazî, pertewazî: belav û welav, pirtikî.

Pişî: xelet, defect. Bi Erebi xelet e. Bi Englîzî defect e.

Pişkinîn: teftîş, check, fehs. Bi Erebi teftîş, fehs e. Bi Englîzî check e.

Pîryam: lêveger. Bi Erebi merce`. Bi Englîzî reference.

Pol: di dibistanê de jûr a xwîndinê ye. Bi Erebi sef e. Bi Englîzî class e.

R

Rade: sînor ê pîrsekê yan peyvekê yan kirdarekî ye. Bi Erebi jê re hed dibêjin.

Rajedarî: xizmet.

Rawar: meqam.

Rayend: serkevtî. Bi Erebi naci e. Bi Englîzî successful e.

Raz: sîr, tişt ê nihênî. Bi Erebi sîr e. Bi Englîzî secret e.

Reftar: kirar, kar û kirde yê ku mirov dike. Bi Erebi sulûk e. Bi Englîzî behavior e.

Regez: unsur, cins, element. Bi Erebi unsur, cins e. Bi Englîzî element e.

Renkirin: nehiştin, jêbirin, mesihkirin. Bi Englîzî delete, omit e.

Rewa: meşrû`, şer`î, rê jê re he ye.

Risteyî: zîncîreyî, bi duv hev de, teselsulî.

S

Sazwaje: musteleh, term, destewaje.

Sebet: sellik, basket. Bi Erebi selle ye. Bi Englîzî basket e.

Senev: sipate. Ciddî. Bi Erebi jê re ciddî dibêjin.

Sertag: tişt ê ku di serî û pêşî de ye. Bi Erebi mebde`. Bi Englîzî prensîp e.

Serwaz: îzafe, addition. Bi Erebî îzafe ye. Bi Englîzî addition e.

Sexbêrî: xwedîkirin. Bi Erebî ri`ayet e. Bi Englîzî care.

Sihêt: tecrube.

Sip: kamil, tam.

Sipate: tak û ciddî, senev. Bi Erebî ciddî ye. Bi Englîzî serious e.

Siper: senger, cih ê ku mirov xwe ji bo paraztinê lê digire. Bi Erebî melce`. Bi Englîzî shelter.

Siple: bê wefa.

Siplot: heram, necis.

Sirêm: bandor. Karîgerî. Bi Erebî jê re te`sîr dibêjin. Bi Englîzî jê re impact dibêjin.

Sirûş: ilham, inspiration. Bi Erebî ilham e. Bi Englîzî inspiration e.

Sivîk: seqf, roof. Bi Erebî seqf e. Bi Englîzî roof e.

Sûd: fayde, fêde.

Ş

Şegdayî: kok a wê şeg e. Mirov ê/a şeg mirov ê/a jêhatî ye û ew di biwarê pirsên keresteyîn û watayîn de jêhatî ye û ev jêhatîbûn jî, ji hizrê ye. Bi Erebî ictîhad jê re dibêjin. Bi Englîzî jê re diligence dibêjin.

Şêwandin: teşwîhkirin, xerabkirin. Bi Erebî teşwîh e. Bi Englîzî distortion e.

Şîkarî: teşrîh, anatomy. Bi Erebî teşrîh e. Bi Englîzî anatomy.

Şîmane: bi Erebî ihtimal, ferediyye. Bi Englîzî hypothesis, prospect.

Şîraz: sistem, nizam.

Şîrazkirin: tenzîmkirin.

Şkanî: kesre. Di zimanê Erebî de nîşan a bizavtinekê ye ku li binê pîtê dihê danan û wê dişkîne. Hinekî wek dengê “î” ye û

gîrekirin a wê jê “in” e.

T

Tekela: pîkol, hewl û hewl ji Erebî hatiye. Bi Erebî muhawele ye. Bi Englîzî attempt e.

Terazû: mîzan, mêzên.

Tergize: xeter, tehlike.

Tibab: bi Erebî kemmiyye. Bi Englîzî quantity.

Tila: şax ê darê.

Tivêj: kategorî, fi`e. Bi Erebî fi`e ye. Bi Englîzî category ye.

Tomarkirin: qeydkirin, tescîl, tedwîn. Bi Erebî qeyd, tescîl, tedwîn jê re dibêjin.

Tund: dijwar, bi şiddet.

V

Vagir: zebt, zabit.

Vajî: eks, opposite. Bi Erebî eks e. Bi Englîzî opposite jê re dibêjin.

Vatinî: wezîfe, muhimme, mission. Bi Erebî wezîfe, muhimme. Bi Englîzî mission.

Vebirrîn: qirrkirin. Bi Erebî qem`. Bi Englîzî suppress.

Vebûr: paşkevt. Bi Erebî iddîxar.

Vehesîn: istîrahet, rest. Bi Erebî istîrahe. Bi Englîzî rest.

Vekiranî: fethe. Di ziman ê Erebî de nîşan a bizavtinekê ye ku li ser pîtê dihê danan û li baramber pîta “e” ye, di gîrekirin a xwe jê de dibe “en”.

Veresîn: xelasbûn.

Verûjandin: hazirandin, hilkirin.

Vewejartin: safîkirin.

Vewêjîn: hecekirin. Bi Erebî hica`. Bi Englîzî spell.

Veydan: komkirin, danhevî.

Vêwer: pabend, pêgîr, multezim.

W

Watayîn: me`newî.

Weçe: mîras. Irs. Legacy. Bi Erebî mîras, irs. Bi Englîzî legacy.

Wereşad: xanenişîn. Bi Erebî muteqa`id. Bi Englîzî retired.

Weris: aciz, ne rehet.

Werzişvan: ê/a ku werzişê (sportê) dike. Bi Erebî riyadî. Bi Englîzî athlete.

Wêzew: bend a qanûnî, bend a nav qanûnan.

Wird: deqîq, hûr.

Wirdî: diqqet.

X

Xaknîgarî: erdnîgarî, ciyografî.

Xant: se`et, demjimar, katjimêr. Peyvek a Avêstayî û Sansikrîtî ye.

Xawên: paqij.

Xayan: berdewam.

Xayandî: berdewamkirî, berdewambûyî.

Xizan: feqîr.

Xizav: ferman. Bi Erebî emr. Bi Englîzî imperative.

Xizm: ehl, eqarib. Kes ên nêzîkdar ên mirov.

Xunamî: hesab û neseb, hesîb, nesîb.

Xustdar: hessas, bi his.

Xûn: jê re xwîn dibêjin.

Y

Yane: nadî, club. Bi Erebî nadî ye. Bi Englîzî club e.

Yaniz: zêde, ziyade.

Yawerî: pê re, rifqet, murafeqet.

Yekmanî: tişt ê ku di serî de pêwîst e. Bi Erebi ewlewiyyet.

Z

Zagîn: ji dayikbûn. Bi Erebi mîlad. Bi Englîzî birth.

Zal: girtin a bi ser de. Bi Englîzî control. Bi Erebi seytere.

Zarîkar: mumessil, actor / actress. Bi Erebi mumessil / mumessîle. Bi Englîzî actor / actress.

Zehî: ecêb.

Zehîman: ecêbmayîn. Bi Erebi te`eccub. Bi Englîzî exclamation.

Zûr: girik, cih ê xakê yê ku hinekî bilind e. Bi Erebi hedebe. Bi Englîzî plateau, hill.